# ÇIYAYÊ KURMÊNC
# ((EFRÎN))
## Lêkolîneke Xaknîgarî ye Gistî



**Dr. Mihemed Ebdo Elî**

# ÇIYAYÊ KURMÊNC
# (( EFRÎN ))

## Lêkolîneke Xaknîgarî ye tevahî

# Danîn û Amadekirin

**Dr. Mihemed Ebdo Elî**

**EFRÎN … 2008**

**Amadekirina qabê: Îmad Kûse**

**Xwendevanên berêz..**

**Em hêvîdar in, ku têbîn û pêşniyarên xwe li derbarê pirtûkê li ser vê îmêlê ji me re bişînin:**

rozadefrin@gmail.com.

**Navnîşan: Efrîn.**

*spas*

# Pêşgotin

Li destpêkê, û dema ku me dest bi vî karî û bi vê lêkolînê kir, tenê me xwast li ser bingeh û wateya navên Xaknîgarî li navça Çi.Kurmênc (Efrînê) rawestin, sedem jî ew bû, ku çend pirtûk li ser mijara navên xaknîgarî û warên şên li Sûryê û li Libnanê hatin weşandin, gelek navên Na.Efrînê jî tê de hebûn, lê mixabin pirek ji wan navan bi şêweyekî ne rast hati bûn şirovekirin, gelek navên ku ji binyata xwe de Kurdî û resen in jî, vegerandi bûn Aramî, Siryanî, Tirkî, Erebî, Farisî … û hwd.

Ji bilî ku ew mijar bi xwe jî mijareke balkêş û giring e, û hêja ye ku mirov pir guh bidê. Çinkî sûdine din jî dê jê hebin, wek: Mirov kane di riya wan re, rewşên navça Çi.Kurmênc di serdemên dîrokî yên têvel de nas bike. Ji ber ku, gelek caran, di riya navên xaknîgarî re, rewşên civakî û nijadî yên navçekê tên nasîn, carina jî ew demên dîrokî ku tê re derbas bûne jî dest nîşan dikin.

Dema ku em di mijara navan de dixebitîn, me pêwîst dît, ku em kurtelêkolînekê li derbarê rewşên xaknîgarî yên tevahî ji Na.Efrînê re bikin. Me ew lêkolîn jî danî destpêka pirtûkê.

Bi tevahî, armanca me ji vê pirtûkê ew bû, ku em van mijarên sereke rave bikin, û van encaman jê wergirin:

**Yek**: Binavkirinên kevin ên li navça Çi.Kurmênc bidin nasîn. Em bawer dikin, ku ew zanîn dê ji kesên guh didin “zanînên mirovane” re gelek sûdar bin. Me ji bo pêkanîna vê yekê, seredana piraniya gundên navçeyê kir, û piraniya salix û dîmenên wan ên Xaknîgarî yên giring jî dîtin û nas kirin.

**Didu:** Me beşê diduyan ji pirtûkê, wek lêkolîneke salixdanî ye kurtkirî ji dîmen û pergalên kendûkorî û Xaknîgarî yên berz re danî, û binavkirinên wan ên herêmkî yên resen jî hewaldan.

**Sisê**: Em bawer dikin, ku di riya wateya navan re, emê kani bin nijadên ku li demên dîrokî gihîştine navçê, nas bikin, û herwiha hin rastiyên dîrokî jî tomar bikin.

Ji bo pêkanîna van mijaran, me sê jêderên sereke bi kar anîn:

**1.**Jêderên nivîskî, ew li dawiya pirtûkê hatine danîn.

**2.** Şêniyê navçê û kesên ku guh didin wan mijaran û pê dizanin.

**3.** Zanîna me ya taybet. Ji ber ku, em jî têra xwe bi rêzimana zimanê Kurdî û veguhastina bêjeyên wî dizanin. Çinkî, lêkolînvanên bilî me jî, ango yên Ereb, Siryan… wan jî şêweya veguhastina zimanî di warê diyarkirina wateyên navan de bikar anîne, me jî wek wan kir, û di hin deran de li şopa wan çûn.

Ma em bêjin, ku:

Mamosteyê dibistanê yê zanîna Xaknîgariyê rêzdar **Xalid Dîko**, bi têbînên xwe yên hêja, alikariyeke pir baş, ji bo amadekirina beşê yekê ji pirtûkê ji me re kir, û li beşên din jî vegerî.

Her du mamosteyên hêja **Mistefa Henan** û **Siyamend Birîm** jî bi hûrnêrînî li tîprêz û lêdana komputerê vegerîn.

Em wan her sê dostan û hemî kesên ku alîkariya me kirine spas dikin.

Hêvîdar im, di vî karî de ser keftî bim.

**Dr.Mihemed. E. Elî**

## Têbînên Pêwîst

Ji bo belgekirineke rast ji navan re, hat xwastin ku em navên kesan, navên xaknîgarî û navên tiştên din jî, wekî ku ji hêla şêniyê Çi.Kurmênc ve tên bilêvkirin, binivîsin. Loma jî pêwîst bû, ku em van têbînan bêjin:

- Ji ber ku, hin tîpên Erebî: ح ،غ ،ع, ketine nav zimanê me yê niha, û da ku em bilêvkirina durust a navan bidin nasîn, me carina hin tîpên taybet li şûna wan bi kar anîn, ew jî ev bûn:

**Ĥ ĥ = ح , Ĝ ĝ = غ , ' = ع**

- Me hin bêjeyên ku di pirtûkê de pir bi kar tên kurtebirî kirin, û ev nîşandek li şûna wan danîn:

**Na = Navçe. De = Dever. Gu = Gund. Ge = Gelî.**

**Çi = Çiya. Ka= Kanî.**

***Sspas***

# Beşê Yekem

# Çiyayê Kurmênc
# (Efrîn)
# Taybetiyên Xaknîgarî
# Û
# Jiyana Rûniştvanan

# Lêkolîna Yekê[(1)]

## Pêşgotineke tevahî

Navça Çi.Kurmênc, li aliyê Bakur Rojhilat ji perava Rojhilatî ya Derya Naverast dikeve. Ew di quncikê tewir Bakur û Rojava de ye ji navça fere ku bi navê "Kevana Şov" tê nasîn.


Wekî ku tê zanîn, Na.Çiyayê Kurmênc li serdemên dîrokî, riyeke derbasbûnê ye sereke bû di navbera beşên jêrîn ji welatên Mezopotamya, Sûrya Kevin, perava Deryaya Sipî, Asyaya Biçûk û Ewrupa de. Ji ber wê jî, gelek dewlet û gelên ji nijad û şaristaniyên têvel tê de rûniştine, li ser axa wê rabûne hev jî, û gelek bûyerên dîrokî yên giring jî li ser xaka wê çê bûne.

Ji aliyên kendûkorî de, Çi.Kurmênc perçak e ji Çi.Torosê û dawîneyeke wî ye Başûr Rojavayî ye.

Sirtên Çi.Kurmênc ji Rojavayê bajarê Dîlokê "'Entabê" de li Bakurê Kurdisana-Tirkiyê dest pê dibin, û bi badaneke dora 30-40 radeyî berê xwe didin Başûr Rojava, û piştî dirêjbûna dora 100/km, li Başûr Rojavaya bajarokê Cindirêsê, bi nêzîk 9/km kuta dibin. Pehnahiya sirtên Çi.Kurmênc jî di navbera 25 û 45/km de ye.

Hêja ye em bêjin jî, ku li serdemên têvel, Çi.Kurmênc tev deşta Cûmê û Çi.Lêlûn, li derdora newala çemê Efrînê, yekîneyeke Xaknîgarî ye yekbûyî bû, û ji hêla rûniştvanî û şaristanî de jî civakeke diyar, cudawaz û li ser hev bû, **[Nexşe 1]**.

[1]- Ji bo vî beşî, me gelek zanîn ji nama"geştevanî li Na.Efrînê" ya şagirt Yûsif Şoro ya derçûna wî ji Kolîca Xaknîgariyê ya zanîngeha Helebê birine.




((Nexş -1- Herdu beşên çiyayê Kurmênc-Sûrî û Tirkî ))

# Beşê Sûrî ji Çiyayê Kurmênc

# Xaknîgariya Sirûştî

## Cîgeha Xaknîgarî

Piştî şerê cîhanê yê yekê, hêzên Firensî derbas Sûryê bûn, û di encama şerê di navbera wan û tirkan de, navça Çi.Kurmênc kirin du perçe: Bakurî, bi ser Tirkiyê de çû, Başûrî jî Firensiyan destê xwe danî ser û xistin nav sînorên kargêrî yên parêzgeha Helebê, û paşê jî bi navê Na.Efrînê hat nasîn.

Na.Efrînê di quncikê herî Başûr Rojava de ye ji nexşeya Sûryê. Cihê wê yê Xaknîgarî li gor xêzên dirêj û pehin ên serzemînî wiha ye: Xêza dirêjahî di navbera pile 36.33$^{o}$ û 37$^{o}$ Rojhilat, Xêzên pehnahî di navbera pile 36.20$^{o}$ û 36.50$^{o}$ Bakur.


Deşta Lêçe jî bi pehnahiya (10 ra 20)km, di navbera Çi.Kurmênc û Çi.Gewr “Amanos” de ye, û wan ji hev dike.

Cihê Na.Efrînê yê nêzîktir ji Derya Sipî de, Gu.Qermîliqê li devera Şiyê ye, ew 38/km wek xêznêrîn ji bajarê Iskenderonê ku li ser kenarê Derya Sipî ye, dûr e.

Sînorên Na.Efrînê wiha ne: Li Bakur û Rojava Tirkiyê, li Rojhilat Na.Ezazê, li Başûr Na. Sem'anê û Na.Hêrimê ji parêzgeha Idlibê.

Na.Efrînê parve heft deverên kargêrî dibe: Efrîn- devera navend, Cindirês, Mabeta, Şiyê, Reco, Bilbil û Şera.

Li gora warên hozan, û hin salixên Xaknîgarî jî, ew ji berê de, ji hêla warên hozan û cihên xaknîgarî de, parve heşt deveran bûye, ew jî wiha ne: Şikak li Bakur Rojhilat, Biya li Bakur, Şêxan li Bakur Rojava, Heştiya û Xastiya li Başûr Rojava, Cûm û Şêrewa li Başûr û Robarî jî li Başûr rojihlata Na.Efrînê ne, **[Nexşe 2]**.




Nexşe -2-


**Dabeşkirina gelêrî û hozane li Çi.Kurmnênc**

## Rûbera navça Efrînê

Li gor jêderên fermî, rûbera Na.Efrînê 2027.75/$km^2$ e. Ew rûber li ser deverên navçê wiha parve dibe, [Lîste 1- xêzeşêwe 1]:

| Efrîn- Devera Navend | Şera | Mabeta | Bibil | Reco | Cindirês | Şiyê |
|---|---|---|---|---|---|---|
| ٣٧٧,٧٦ | ٣٣١,٣٥ | ٢٤٥,٧٤ | ٢٢٩,٩٥ | ٣٥٢,٣٥ | ٣٢٥,١٠ | ١٦٥,٥٠ |

**Lîste -1- Rûbera deverên Efrînê, pîvan: $km^2$.**




**Xêzeşêwe -1- Rûbera deverên Efrînê. Amadekar: Xalid Dîko.**

## Binyata Zemînasî/Ciyolocî ya Çi.Kurmênc[(1)]

- Ji destpêka **Serdema Zemînasî(qadnasî ya yekê** de[(2)]: Deryake pir fereh bi navê "Tîts" hebû, rûbera wê tevahiya Başûrê Ewrupayê,

[1]- Jêder: Dr.Mîxaîl Mu'tî: Pirtûka Ciyolocî, Şalyara Perwerdê li Sûryê, 1972-1973.

[2] - Gozemîn berî 4.5 milyar sal peyda bûye. Av û zemîn berî 2.5 milyar sal li ser belav bûye. Serdemên Ciyolocî jî wiha parv dibin:
- Serdema yekê: Ji 500 ta 200 milyon sal e. Tê de, geyayên deryayî, paşê jî sewalên deryayî peyda bûn.
- Serdema diduyan: Ji 200 ra 60 milyon sal e. Jîndarên bi memik û şaxên wan peyda bûn.
- Serdema sisiyan: Ji 60 ra 20 milyon sal de ye. Jîndarên sereke hatin naskirin.
- Serdema çaran: Ji 3 milyon sal de ye. Mirov tê de peyda bûye.

Bakurê Afrîkayê û ra Çînê digirt, ew bi navê "Derya Mîzocî" jî bi nav dibû. Di serdemên Zemînasînî yên yekê û duyem de, guhertinên pir mezin di binê wê deryayê de çê bûne. Tê de Çiyayên mîna Alib, Toros, Zagros û Hêmelaya ji binê wê rabûn.

- Di **Serdema Zemînasî ya Diduyan** de: Mercên Xaknîgarî li navça Rojhilata Derya Naverast hatin guhertin. Piraniya çiyayên perava Sûryê, Çi.Kurmênc jî di nav de, hatin hildan, av ji ser vekşiye û dîmenên sereke yên navça Rojhilata Derya Naverast diyar bûne. Roja îro, gelek qabqabûşkên deryayî yên wan serdeman di tehtên Çi.Hawarê de, ku benzê xwe kesk in, tên dîtin, nemaze jî di rûyê çiyê yê Başûr de.


- Di **Serdema Zemînasî ya Sêyem** de: Tortên (teresubat) pir stûr di Kora Efrînê de niştine, û lebateke Têktonî ye pir xort jî li çiya û navçeyên perava Derya Sipî çê bûne û salixên navçê yên sereke ji wê hîngê de hatin diyarkirin. Bêla Helebê jî li wê demê bilind bû, û korên Idlib û Efrînê ji hev cida bûn. Navça Çi.Kurmênc bi xwe jî toşî hilweşînên zemînî yên giran bû, wê yekê kir ku hin kaniyên hilweşînî yên giring lê derbin, mîna kaniyên Basût, 'Endar, Betmanê...û hwd.

Li derbarê encamên lêkolînên ku li ser rewşa Zemînasî ya Çi.Kurmênc hatine kirin, Dr.Kemal Xelîl wiha dibêje[1]:

((Sirtên Çi.Kurmênc ji gelek cureyên tehtan hatine darijtin, wek "Megmanî, Tortî, Guhertinî…", ango ew ji hêla Zemînasiyê de dibistaneke Zemînasî ye serbixwe ye.

[1] - Dr.Kemal Xelîl: Dîplomaya diktora di zanîna Ciylocî de wergirtiye. Ew ji Gu.Me'riskê- Efrînê ye.

Lêkolîna Zemînasî ya destpêkê li Çi.Kurmênc, li salên di navbera 1883 û 1897an de, ji hêla Almanan de hatiye kirin. Ew lêkolîn li ber roniya peymana ku di navbera Qeyserê Almanî û Siltanê Osmanî de hati bû îmzekirin, hatin kirin. Di peymanê de, Almanan li xwe girtin, ku riyeke çîmanê di navbera Stembûl, Bexdad û Ĥîcazê de raxin. Li hember wê, Aleman dê xêrûbêrên serzemînî û bizemînî, ku li dora riya hêsin bi deh kîlomitran hene, ji xwe re derînin. Û ji ber ku, Ciyolociyên Alemanî hebûna Hêsin û madenên din li Çi.Kurmênc bi cih kiri bûn, loma jî wan riya çîmanê di nava navçê re birine.



Xêzeşêwe -1- Kûrbirîneke Ciyolocî ji kendûkorên Çi.Kurmênc re, (Rojhilat-rojava).

Li gor lêkolîna Înglîzan jî, ku li sala 1946an ji bo pêtrolê li Gu.Baflûnê hati bû kirin, kevintirîn tehtên wê deverê ji bêtirî 225 milyon sal de ne, û ji serdema Ciylocî ya Pêrmî ne. Stûrbûna asta tehtên Mîzozoyîk jî li wir 330/m e, tê de tehtên ji serdema Corasî, Tortî-Dolomît û Marilî ji serdema Tiryasî de li dû

hev hatin dîtin, bermahiyên jîndarên kilsgirtî jî di wan de tên dîtin, ew teht ji 180 milyon sal de ne.

Li ber riya Efrîn-Reco jî, tehtên Kilisî û Dolomîtî tên dîtin. Tehtên Kesk (Evyolît) ên serdema Corasî jî di navbera Bilbilê û Rojhilata Reco de belav dibin.

Tehtên ji serdema Tebeşûrî jî li devera Reco tên dîtin, û temenê wan digihê 135 milyon sal, ew li ser asta tehtên Corasî bicih bûne, û stûrbûna wan 10-15 mitr in, ew tehtine sorik û nîvqûmî ne, û Hesin jî di wan de heye.

Mîna ku hatiye naskirin, Tortên deryayî li Çi.Kurmênc ji serdema Tebeşûrî de dest pê kirine, ew ast ji tehtên Kilsî ne, li ser ên kesk niştine, û bi şêweyekî eşkere li ber riya Reco- Gu.Kotana xuya dibin. Rengê wan tehtan qurşîniya dagerî ye, jîndarên kilsgirtî jî tê de hene.

Gelek cureyên tehtên ji van serdeman jî li Çi.Kurmênc hene: Cenoman, Turon, Seneyo, ew di astên zemînî yên di navbera Gu.Qitmê û Bilbilê de baş xuya dibin, ew hemî ji tehtên Kilsî (Ĥelanî gewr) Marlî ne, û jîndarên kilsgirtî ji cureya “Orbîtolîdis” tê de hene, lêkolînvanê Firensî Liwîs Dobirtirê jî wan bi navê “tehtên kesk” salix dide, navên wan ev in: Bîrîdonît, Sêrbêntîn, Bisîroksînêt, Gibro, Diyorît, Bazilt…)), **/xêzeşêwe 1/.**

Gelek cîgehên Baziltî yên volkanî jî li Na.Efrînê hene, ew li ber van gundan tên dîtin: Turundê, Kurzêla Cûmê, Keferbetrê, Maratê, Keferdelê Jêrin, li Bakur û Rojava jî, li ber sînorê Tirkiyê tên dîtin.

Bi tevahî em kanin bêjin, ku Çi.Kurmênc ji hêla Zemînasî de Tortî ye, û gelek cîgehên zemînî yên Kilisî, Ĥelanî Gewr, Kîlî û Qûma bi rengê Qûma Bingehîn lê hene, hin cihên xama hêsin jî lê hatine naskirin, ew hemî jî ji serdema Zemînasî ya duyem in.

## Taybetiyên Zemînhejînê li Çi.Kurmênc[1]

Herêma Rojhilata Navîn û Rojhilata Derya Sipî, perçak e ji çar tertên zemînhej yên sereke, ew tert jî ev in: **Erebî**, **Efrîqî**, **Anadolî** "**Çiyayên Torosê"**, **Êranî** "**Çiyayên Zagrosê**", **[Nexşe 3].**

Ew tert, bi tîşên zemînî yên gewre ji hev hatine birîn, û zemînhej li direjiya wan tîşan dibin. Ew tîş jî ev in:

- Tîşa Derya Mirî (hilweşîna Efrîqî - Sûrî ya mezin): Ew ji kendava 'Eqebê de li Başûrê Urdunê dest pê dike, û li navçên Entekê û Çi.Kurmênc li Bakur, bidawî dibe.
- Kevana Hilînî (Orasî): Piraniya wê tîşê, li beşê Rojhilatî yê Derya Sipî ye, berê wê Rojhilat Rojavayî ye, ew tîş tertê Efrîqî ji beşê Rojavayî yê tertê Anadolî dike, û tertê Anadolê jî ji yê Erebî dike.
- Tîşa Anadolî ya Bakur- Başûrî li Asya Biçûk.

Bi şêweyekî tevahî, gava ku ew tertên rûzemînê dilivin, çi bere paş û çi bere pêş, û çi bi jêr de û çi bi jor de, zemînhej çê dibin.

Lê bi taybetî herêma Rojhilata Navîn, ew zemînhej wiha çê dibin: Tertê Efrîqî li yê Anadolî dikeve û tê de cûm dibe. Tertê Erebî jî ku ji nîvgirava Erebî, Welatê Şamê û Êraqê pêk tê, û berê wê bi 40 ta 45 pileyan bi aliyê Bakur Rojava de ye, bi aliyê Bakur Rojava de dilive, û li dora tertê Efrîqî digere. Ew bi wê tevgerê salê /1/cm dişimite bin çiyayên Kurdistanê "Toros li Bakur û Zagros li Rojhilat". Ew liv dike ku tertê Êranî "Zagros" jî bi Rojhilat de were têvedan, û ya Anadolî "Toros" jî bi Rojava de here.

Li derbarê Çi.Kurmênc jî, ew li serê quncikê herî Bakur Rojava ye ji tertê zemînhejî yê Erebî, û beşek e ji keviya Rojhilatî ya tîşa hilweşînî ya Deryaya Mirî.

Wek tê zanîn, li serdemên Zemînasî yên nêzîk, Sûrya ji navçeyên herî bêtir bû ku volkan(arpij) lê dibûn. Di dîrokê de hatiye zanîn, ku zemînhejên herî mezin li navça Rojhilata Derya

---

[1] - Jêderên vê bendê: Dr. Mi'awiye Berzincî, rojnama Tişrîn, hejmar 677, dîrok 29.3.1997. Dr. Telal Bellanî, rojnama Tişrîn, hejmar 750, dîrok 18.9.1999.

Sipî li derdora tertê Erebî û tîşa Derya Mirî bûne. Ji ber wê jî, ew navçe ji hêla bûyîna zemînhejan de, li pileya sêyem piştî tîşa Kevana Hilînî û tîşa Anadolî tê.


Belgeyên dîrokî didin zanîn, ku ji sala 37an zayînî û ra sala 1882an, 14 zemînhejên giran li navça Çi.Kurmênc û derdorên wê bûne. Gava ku zanyar wan bûyerên zemînhejî rave dikin, dibînin ku li dawiya her 250-300î sal, zemînhejeke bi hêza pênc pile/Rêxtir rûdide. Lê hêza herî bilind a zemînhejên navçê, hîn tu caran pileya 7.6/Rêxtir derbas nekiriye.

Jêderên dîrokî bi bîr tînin jî, ku li sala 1822an, zemînhejeke bi hêza 7.3pile/Rêxtir li navçê çê bûye, û navenda wê li Çi.Kurmênc bû. Zemînheja hêzdar a dawîn jî li sala 1872an bûye û navenda wê li ser sînorên Başûr ên navça Çi.Kurmênc bû.

Bi tevahî, salê gelek zemînhej çê dibin, lê mirov pê hestewar nabe û tu ziyanê jî peyda nakin.

Emê dîrokên hin zemînhejên ku li navçên Helebê û Entekê bûne, û di pirtûkan de hatine tomarkirin, bibîr wînin:

- Zemînhejine wêranker li salên 1132- 1134- 1136 zayînî li Entekê û li Bakurê Sûryê bûne.
- Li meha Mijdarê/Tişrîna Duyem a sala 1156an zayînî, zemînhejên gewre li herêma Rojhilata Derya Sipî bûne, û 14 mehan dirêj kirin.
- Zemînhejeke hêzdar li sala 1403an zayînî li Helebê bûye.
- Li meha Tebaxa sala 1822an, zemînhejeke gewre li Bakurê Helebê çê bûye, pileya wê 7.3/Rêxter bû, navenda wê jî Çi.Kurmênc bû.
- Zemînhejine hêzdar li salên 1842 û 1872an jî çê bûne.




**Nexşe -3-**

((Teybetiyên zemînhejî li herêma Rojhilata Nêzîk. Sûrya, bi taybetî jî Bakur û Rojavaya wê, li ser sînorên çend tertên zemînî, ku ji hêla zemînhejê de ne bi tebat in, dikeve)).

# Samanên Binzemînî[1]

## Hesin:

Hebûna Hêsin li navça Çi.Kurmênc, ji serdema Eyûbiyan de hatiye naskirin û bikaranîn. Lêkolînên dîrokî diyar dikin, ku li serdema Eyûbî Şûr ji hesinê ku li Bakurê Helebê hebû, dihatin çêkirin. Bi rastî jî dema ku lêkolan ji bo hebûna hêsin li navça Çi.Kurmênc dihatin kirin, xaliya ûcaqên şewtandina hêsin li sê cihan hat dîtin, li gundên Ĥec Xelîl, Sorkê û Şediya, /Dr.Kemal Xelîl/.

Wekî ku hatiye nasîn, tertên hêsin li Çi.Kurmênc, ji Rojavayê bajarokê Bilbilê de dest pê dikin, bi Rojava dirêj dibin û di van gundan re derbas dibin: 'Elendara, Hec Xelîl, bajarokê Reco, Şediya û ta li aliyê herî Rojava digihên gundê Sorkê, û pişt re derbas deşta Ĥemqê û nava sînorên Tirkiyê dibin.

Stûrbûna kerma(qada) xama hêsin di navber 10 û 25/m de ye, pehnahiya wê jî ji çend deh mitran ra(ta) 4/km e.

Li dema me, Hesinê Na.Efrînê netê bikaranîn, tenê tibabine hindik jê, ji bo karxaneyên pêşesazkirina çemento li Helebê têne kişandin.

Lêkolînine din jî ji bo dîtina xama hêsin li ber bajarokê Reco û gundên Kurê, 'Elendara û Meydankê hatin kirin, wan jî xuya kiriye, ku tibaba wî ji 12 ra 16 milyon ton e, tibaba hesinê sade jî tê de digihê %21-51an. Ev yek jî, gengaziyê ku bi şêweyekî aborî were deranîn, peyda dike, /Dr.Kemal Xelîl/.

## Pêtrol:

Ji bo lêgerîna li Pitrolê, Înglîzan li sala 1946an bîrek bi kûrbûna 900/m li Gu.Baflûnê kola, li encamê hat xuyakirin, ku goleke Pêtrolê li wan deveran heye. Guman ew e, ku ew gola ji aliyê Rojava de digihê Gu.Coqê, li Başûr jî digihê Gu.Ĝezîwê. Li sala

[1] - Ev bend bi alîkariya Dr. Kemal Xelîl hatiye amadekirin.

2006an, lêkolîneke Zemînasî ye din jî ji bo Pêtrolê, ji hêla kompanyeke Çînî de li navçê hat kirin, lê encamên wê ne hatin belavkirin.

### Baqir:

Ew di tehtên kesk de, li navbera van gundan tê dîtin: Gu.Qurnê li Rojhilata Bilbilê, Gu.Bêxçe li Rojava wê, Gu.Xidirya li Başûra wê û sînorê Tirkiyê jî li Bakur. Alemanan û Çîkan lêkolîn li ser Bêqir çê kirin, rêjeya/nisba wî di xama wî de di navbera %1-17.7an de ye. Li dema ravekirina wê xamê, piçek zêr jî di nav de hat dîtin. Ew ravekirina kîmawî ji hêla Dr.Kemal Xelîl de, li salên 1989-1990-1991ê li zanîngeha Monstir a Aleman hatin kirin.

### Fosfat:

Kana wê li ber Gu.Dîkmedaşê ye, lê ew ne pir mezin e.

### Kevirê Rixamê:

Kevirên Rixamê di bin hikariya kirdeyên sirûştî de hatine darijtin. Ew li Rojavaya Bilbilê di nav tehtên kesk de tê dîtin. Jê, rengên sipî, aravî û kesk hene, ew ji bo avahiyan tê bikaranîn.

### Kevirê Sicîlê yê zêtî:

Li Gu.Qirigolê tê dîtin, gengaz heye, ku Pêtrol jê derê, lê ew niha ne aborîdar e.

### Kirom:

Li serdema Osmanî, lêkolînên ji bo xamên me'denên Kiromê û Megnîziyomê, li Bakur Rojavaya Sûryê, ji hêla Alemanan ve hatine kirin, lê ew lêkolîn di cihê xwe de rawestîn, û bi serî ne bûn. Xama me'denê Kirom mîna govan, yan wek tamaran bi dirêjiya 1-20/m, û stûriya 20-30/sm tê dîtin, rêja Kiromê sade jî tê de di navbera % 30-40 de ye. Lê rewşên wî yên binzemînî dijwar in, loma jî deranîna wî zor e, û ji hêla aborî de kêm sûde ye, /Pirtûka Xaknîgariya Sûryê ya tevahî, rûpel 399/.

### Espêstos:

Ew wek tamarên gewr di nav tehtên kesk de xuya dibe û Emyent jê dertê. Tamarin jê jî, li ber riya Bilbilê û Gu.Ze'rê diyar dibin. Tibaba wê ne aborîdar e, û ji hêla tendurustî de jî ziyandar e.

**Kevirên avakirinê:**

Cureyên baş ji kevirên avakirinê ji Çi.Lêlûn tên birîn, rengên wan sipî û zer in. Ew ji bo avakirinê û pêdviyên avahiyan tên bikaranîn. Hêjayî gotinê, ku avahiyên Efrînê ên destpêkê. Ji kana sirta ku bajar li ser hatiye avakirin dihatin birîn. Kevirên wê nerm bûn û zû dihatin şekirin. Cihê kanê li aliyê sertê yê Rojava li ber çemê Efrînê ye. bi hêvî me ku tu hinekî li ser kana Tirtewîlê ya kevirên avahiyê jê derdixistin û bi wan kevirên şehkirî gelek avahiyên kevin li Efrînê pê hatine avakirin.

## Kendûkor

Na.Efrînê navçeke çiyayî ye, ew ji du komesirtan pêk tê, Çi.Kurmênc û Çi.Lêlûn (Sem'an). Ew çiya ji bingehên xwe yên Ciolocî de hatin guvaştin, badan û tîş jî bûne. Li ser û di navbera sirtên wan de, gelek gelî û zewrên deştî hene. Detşa Cûmê ya navdar û fereh di navbera wan her du çiyan de ye.

Salixdana kendûkorên Na.Efrînê, di beşê pirtûkê yê duyem de hatiye.

## Heyam[1]

Heyama her herêmekê bi kirde û endamên wê yên taybet ve girêdayî ne. Kirde û endamên bingehîn ku heyam pê tê afrandin jî ev in: Cigeh û kendûkor, germahî, lihêm, ba, hilhatina rojê û barîna baranê û berfê.

Emê bi kurtî li ser endam û kirdeyên heyamê li navça Çi.kurmênc baxivin.

### 1. Cigeh û kendûkor:

[1] - Jêdera sereke: Pirtûka /Heyama Sûryê/, Dr. Elî Mûse.

Navça Çi.Kurmênc perçak e ji herêma Derya Naverast, ew di çarçewa navça heyama sarûgermî ya germ de ye. Sirtên Çi.Kurmênc jî ji çiyayên Sûryê yên hundurîn tên jimartin.

Cihê tewir bilind li Çi.Kurmênc çiyayê “Girê Mezin” e, ew li ber bajarokê Bilbilê ye, bilindiya wî digihê 1269/m e. Cihê tewir nizim jî li navça Efrînê, di zikê Ge.Circim de li ber sînorê Tirkiyê li ber Gu.Merwanê ye, asta bilindiyê li wir dadikeve 85/m. Herwiha bilindiya navîn li Na.Efrînê digihê 675/m.

Li aliyê Rojava jî, avrazên sirtên Çi.Kurmênc bi ser deşta Lêçe û Ĥemqê de dadikevin, û li Rojavaya wan deştan, Çi.Gewr/Amanos aso digire. Li Başûr jî, sirtên Çi.Kurmênc bi deşta Cûmê bi dawî dibin. Herwiha, bi tevahî, sirtên sereke yên Çi.Kurmênc ji Bakur de berve Başûr dirêj dibin, û hinekî xwe bi Rojava de badidin.

Dûrbûna Na.Efrînê ji kendava derya Sipî wek çavnêrîn 38km in, lê ew di riya deşta Ĥemqê û bajarê 'Entekê re dora 80/km ye. Û digel ku bergeh di navbera Çi.Kurmênc û Deryayê de hindik e, lê Çi.Gewr ê ku dora 2226/m bilind e, û 100/km jî dirêj e, û ji 10 ra 20/km jî pehne, ew wek dîwarekî di navbera Çi.Kurmênc û deryayê de disekine. Wê lomê jî, pestên bê yên nizim, ku ji Rojava de tên, li ber bilindiyên Çi.Gewr radiwestin, û berî ku bigihên Çi.Kurmênc, piraniya lihêm û barana xwe li ser wî vala dikin. Loma jî, nizmepestên baranê yên giring, ku ji aliyê Başûr Rojava de tên, di riya Kendava Iskenderonê re, û di derbenda Bêlangê re bi ser Çi.Kurmênc de tên. Ev rewşa xaknîgarî ya taybet, dike ku heyama Na.Efrînê, nîv ziwa û nîv lêhêmî be, li havînê germ be, û li zivistanî jî sar be.

Bi tevahî, sirtên Çi.Kurmênc li aliyê Bakur, ji ber sînorê Tirkiyê û bi Başûr de, parve sê komesirtan dibin, ew hersê zincîrên sirtan di ber hev re dirêj dibin, ew dirêjbûn berekî Başûr Rojavayî distînin. Ev rewşa kendûkorî ya taybet, dihêle ew hikariya bayê deryayî, yê ku ji hêla Başûr Rojava de tê, bi qaserî hev derbas nav wan hersê zincîran bibe, li nav wan belav be, û hemahema bi qaserî hev jî baranê bibarîne.

## 2. Barîn

Barîn, ango barîna **baranê**, **berfê** û **zîpikan**.

**- Baran:** Navça Efrînê ji hêla baranê de, ji navçeyên rawestiyayî yên yekê û ji nofa (B) ye li Sûryê. Navîn barana salê digihê 546.6/mm an. Kêmepestên bayî ku ji hêla Derya Sipî de tên, jêderên sereke ne ji barana navçê re.

Barîna baranê ji meha Êlûlê de dest pê dike, û li miha Rêbendanê/Çele digihê radeya xwe ya herî bilind. Baranên Payîzê û Buharê gelek caran wek tavan, tev birûskan tên, û gelek caran ziyanên mezin digihînin çandinî û darûberan, û axa sirt û qeracan jî rêş dikin.

Li navça Çi.Kurmênc, rêjeyên baranê ji Rojava de berve Rojhilat, û ji Bakur de berve Başûr kêm dibe, sedem jî dûrbûna deverên Rojhilat ji deryayê ye, û dagerîna bilindiya sirtên çiyayî ji Bakur de berve Başûr e. Ji xwe li cihên daristanî jî, tibaba barînê ji %10 ta %15 bilindtir e.


Ev e lîstek bi tibaba navîn a barana salane li Na.Efrînê, li nîvê duyem ji sedsala bîstan, /lîste -4- û xêzeşêwe 2/:

| **Navend** | Mabeta | Meydan Ekbez | Şiyê | Reco | Bilbil | Efrîn |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **peleya baranê ya salane** | 655 | 648 | 630 | 615 | 585 | 455 |

**Lîste -4- Barîna baranê/mm li nîvê duyem ji sedsala bîstan li Na.Efrînê.**

**- Berf:** Bi tevahî, li Na.Efrînê berf li ser sirtên ku ji 1000/m bilindtir in, dikeve. Ew bêtir li mehên Rêbendan û Reşemehê/Şubatê dikeve. Lê hin awarte jê re hene, wek: Li sala 1998an berf li 28 Adarê ket, li sala 2000î jî, li 23 Cotmehê/Tişrîna Yekê barî.

Jêderên dîrokî bi bîr tînin, ku li zivistana 1910/1911ê, berfeke mezin li navçê û li derdorên wê ket, wê li roja 30 meha Berfenbarê/Kanûna Yekê ya sala 1910an dest pê kir, û ra roja 10ê meha Reşemeha sala din, ango 1911ê, heroj dibarî, xelk wê berfê bi van navan bi nav dike: Çel berf, Berfa Reş, Berfa kûr. Li wê salê çemê Efrînê qerimî, mirov û dewar di ser re dimeşîn. Dîroknivîsê Helebî Kamêl El-Ĝezzî di pirtûka xwe de, li derbarê rewşa wê salê wiha dibêje: Hejmarine mezin ji Xezal, Gur, Heftar û Piling mirin, û




**Xêzeşêwe -2- Tevahiya barîna baranê li deverên Efrînê. /Amadekirin: Xalid Dîko/.**

ji 600 sal de mîna wê berfê neketiye. Li salên 1858an û 1878an jî dîsa berfeke wilo ket.

**Zîpik** (hûr in) û **Tûlî** (girs in): Ew jî li navçê dikevin. Lê bi piranî li Payîzê û Biharê dikevin, û gelek caran ziyanê digihînin çandin, rez û berê daran.

**Mij:** Li katên sibê dadikeve ser zemînê, û carina pir giran û stûr jî dibe.

## Germahî

Pileya germahiyê ya navîn li Na.Efrînê li meha Rêbendanê, ango di dema herî sar de, digihê 3.9 pileyên sedane. Pileya germahiyê ya navîn jî, di werzê zivistanê de digihê 16.3 pileyên sedane. Navîna germahiya bilind di miha Gelawêjê/Tebaxê de jî digihê 32.3 pileyên sedane.

Ev e lîstek bi pileyên germê yên navîn, di nîvê duyem de ji sedsala bîstan, ku li çend navendên pîvana kirdeyên heyamê li Na.Efrînê hatine tomarkirin, /lîste 2/:

| | Meydan Ekbez | Bilbil | Efrîn | Mabeta | Reco | Şiyê |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Pileya germê ya | 4 | 3.6 | 3.2 | 3.7 | 4 | 4.3 |

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| nizim/zivistan | | | | | | |
| Pileya germê ya bilind/havîn | 33 | 33.2 | 32 | 33.5 | 32.5 | 33 |

**Lîste -2- Pileyên germahiyê yên navîn li Na.Efrînê.**

Ev jî lîstek e, bi hin nizimtirîn pileyên germê li Na.Efrînê, di sedsala bîstan de, /lîste 3/:

| **Sal** | 1950 | 1973 | 1989 | 1997 |
|---|---|---|---|---|
| **Pileya germê** | -23 | -17 | -11 | -18 |

**Lîste -3- Nizimtirîn pileyên germê li Na.Efrînê**

## 3. Lihêm

Bandoreke lihêmê ye giran li ser sirûştê heye. Serhejmar diyar dikin, ku rêjeya navîn a asta lihêmê, li nîvê duyem ji sedsala bîstan li navça Efrînê %62 bû, ya herî bilind jî li mehên Berfenbar û Rêbendanê ( %78) bû, rêjeya herî dagerî jî li mehên Hezêran û Tîrmehê (%49) bû.

## 4. Ba

**Li demsal/werzê Havînê:** Ji meha Gulanê de û ra meha Gelawêjê, ba ji Bakur Rojava de bi ser Na.Efrînê de tê. Leza wî bayî nîvenîv e, û navîna leza wî 4.2/ mitir/se, leza tewir kêm jî di meha Tîrmehê de ye, û digihê 2.8m/s.

**Li werzê Zivistanê:** Herêma Rojhilata Derya Sipî, û Rojhilata Naverast bi tevahî, ji du aliyan de toşî bayê zivistanê yê sar dibin:

**Yek**: Ji Bakurê Ewrupayê. Ew li nîvê duyem ji werzê Zivistanê radibe, birûsk, baran, carina berfê jî bi xwe re tîne. Di wê demê de, guhertinên heyamê demdirêj dibin û serma peyda dibe.

**Didu**: Bayê pir sar ji Sîbîriyayê tê, û dibe sedema peydabûna pileyên sermê yên pir nizim û awarte. Hebûna ew bayê pir sar li şevên sayî û hêmin, bi taybetî jî li navçeyên Sûryê yên Bakur Rojava, Çi.Kurmênc jî di nav de, rûdawa sirûştî ya bi navê “wergerîna germê” çê dike. Bayê germ û sivik hildikşe jor, ê sar û giran jî dadikeve geliyan, zewran û cihên kort, û wilo, pileyên germê li wan cihan digihên astên pir nizim, û bi wê yekê, ziyaneke mezin digihê çandiniya deverên kort, nemaze jî darên zêtûn û

hinarê. Guhertinên germê yên wilo, gelek caran di nîvê duyem de ji sedsala bîstan li navça Çi.Kurmênc çê bûne. Li sala 1989an bi deh hezaran darên hinarê û zêtûnê li deşta Cûmê bi sermê rewisîn. Li sala 1997an jî, bi wê sedemê 3.5 milyon darên zêtûnê li Na.Efrînê ziyan dîtin, /rojnama Tişrîn, hejmara 25.5.1997/.

### 5. Hilhatina rojê

Hilhatina rojê ya navîn li Bakurê Sûryê, di salê de digihê 8.3/katan. Derhatina rojê di dema herî kin de jî, li meha Rêbendanê li Zivistanê, digihê /4.3/kat/roj, ya herî dirêj jî di meha Tîrmehê de ye, û digihê /12.6/kat/roj de.

## Av li Çi.Kurmênc

Av li sirûştê parve du cureyan dibe, Binzemînî û Serzemînî.

- **Ava Binzemînî[1]**

Ava binzemînî li Na.Efrînê û derdorên wê, di şeş zêrzemînên "golên binzemînî" sereke de kom dibe. Kûrbûna wan zêremînan di navbera 150 û 300/m de ye. Ava wan zelal e, tu kirdeyên Kîmawî yên helandî tê de tunene, û ew her sal bi ava baranê nû dibe. Tehtên wan zêrzemînan ji serdemên Zemînasî yên yekê û diduyan de ne.

Giringiya her zêrzemînekê, ji ferehiya rûbera ku ava xwe jê dibe, û ji kûrbûna wê diyar dibe. Kaniya sereke ya her zêrzemînekê jî li cihê tewir nizim derdibe, û ava beşê zêrzemînê yê di ser asta kaniyê re ye, tê re derdibe û diherike.

Ji bilî zêrzemînên fereh û kûr, gelek zêrzemînên biçûk û siwe jî hene, bi dehan kanî pê derdibin, lê belê ji ber ku ava wan hindik e, ew kanî zû dimiçiqin û giringiya wan hindike.


Zêrzemînên kûr û sereke li Na.Efrînê ev in, **[Nexşe 4]**:

1. Zêrzemîna kaniyên Basûtê û 'Endarê.
2. Zêrzemîna kaniya Serêkaniyê/Kefercenê.
3. Zêrzemîna kaniya Germikê li ber Nebî Horî.

---

[1] - Zanînên ava binzemînî, ji ba endezyarê Ciyolocî Hesen Mistefa ji gundê Meşalê hatine birin.

4. Zêrzemîna Şiyê.
5. Zêrzemîna kaniya Betmanê li Rojavaya Reco.
6. Zêrzemîna korta çemê Ava Reş.




**Nexşe -4- Zêrzemînên ava binzemînî yên sereke li Na.Çi.Kurmênc.**

## 1. Zêrzemîna kaniyên Basûtê û 'Endarê

Ev zêrzemîna, ava xwe ji devereke fereh distîne, sînorên wê deverê wiha ne: Tevahiya rûberên di navbera bajarên 'Ezazê, Tilrifadê, Dêrcimêlê û gundên (Zaretê, Aqîbê, Kîmarê), ta digihê kela Sem'anê. Av di nav tîşên tehtan re dixulxule û di kaniyên deşta Cûmê re derdikeve. Kûrahiya wê zêrzemînê ji 100î ra 250/m ye. Zêrzemîneke din a nizimtir jî di ser wê re heye, kûraniya wê di

navbera 80ê û 150m de ye. Tehtên wê zêrzemînê ji serdema Zemînasî ya sêyem in. Ji kaniyên giring ên ew zêrzemîna kûr: Kaniya hilweşnînî ya Basûtê ye, tibaba darivandina ava wê 140 L/S e, û kaniya 'Endarê, ew jî (129L/S) tibab av dide.

### 2. **Zêrzemîna kaniya Serê Kaniyê/Kefircenê**

Sînorên vê zêrzemîn wiha ne: Rûberên di navbera gundên Dêrsiwan, Meşal, Serêkaniyê, Qestela Elî Cindo, Yazibaĝ û ra derbas nav sînorê Tirkiyê jî dibe. Kûraniya wê zêrzemînê ji 150/m ra 250/m ye. Hin zêrzemînên rûkî jî di vê deverê de hene, lê ew biçûk in, ji 80m ta 100m kûr in. Tehtên vê zêrzemînê ji serdema Zemînasî ya sêyem de ne. Kaniya vê zêrzemînê ya giring a Gu.Serêkaniyê ye, ew 85/litir/s av dide .

### 3. **Zêrzemîna kaniya Germikê**

Sînorên vê zêrzemînê yên Rojhilatî li derdora gundên Şêxorz û 'Ebûdanê ne, ew li Rojava digihên Bilbilê û Gu.Qota, ji Bakur de jî derbas nav sînorê Tirkiyê dibe. Kûrahiya vê zêrzemînê ji 200/m ra 270/m ye. Zêrzemînên rûkî li vê derê tunene, çinkî qadeke tehtî ku avê bernade zêrzemîna kûr peyda nabe. Tehtên vê zêrzemînê ji serdema Zemînasî ya diduyan ji qada “Stoman Noron”, ji Kirîtasiyê Jorîn de ne. Kaniya vê zêrzemînê ya sereke “Ka.Germikê” ye, herikîna wê 90L/S e.


### 4. **Zêrzemîna kaniya Şiyê**

Devera vê zêrzemînê derdora De.Şiyê û Çi.Xastiya ne. Kaniya wê ya sereke Ka.Şiyê ye. Kûrbûna ava wê ji 100/m ra 200/m e. Tehtên wê ji serdemên Zemînasî yên diduyan û sisyan de ne.

### 5. **Zêrzemîna kaniya Betmanê - Reco**

Ev zêrzemîn ji derdora Bilbilê dest pê dike, û li Rojava li deşta Lêçe bi dawî dibe. Sînorên wê yên Başûr jî digihên gundên 'Eşûnê, Kûran, Geliyê Tîra, 'Etmana û hîn bi Rojava de diçin. Li Bakur jî, ew sînor ji Bilbilê û berve Rojava digihên gundên Maseka, 'Edema û deşta Lêçe. Tehtên vê zêrzemînê ji serdema didudyan ji Kirîtasî û ji asta Stoman Noron in. Kûrahiya wê jî dora 400/m e. Li devera vê zêrzemînê, çiya tîşbûyî û bilind in, teht jî şikestî û me'denî ne, asteke tehtî û kerûlal jî tê de tuneye, loma jî ew teht avê nagirin, di

zêrzemînê de nasekine û yekser diçe ser kaniya Betmanê ku dana wê 70L/S de ye.




### 6. **Zêrzemîna zewra Çemê reş**

Zêrzemîneke siwe û rûkî heye, kûraniya wê 70-125/m e, tehtên ku avê hildigrin baziltî, volkanî û reş in. Zêrzemîna Kûr di bin a rûkî de ye, kûraniya wê dora 350/m ye, ava wê jî di nav çiyan de guvaştî ye, ew rewş dihêle ku bi kolana bîran re, av bi xwe derkeve ser rûyê zemînê, weki ku çawa li bîra ku li ber Gu.Qerebaba bûye, /şêwe -2-/. Tehtên wê zêrzemînê ji asta Stoman Noron ji serdema Kirîtasî ne. Ew zêrzemîneke kûr e, ava wê hinekî germik e, loma jî dibe sedem ku teht bihelin, û şênberên m'edenî û nîvme'denî di avê de werin dîtin.

Şêwe -2-

Ji bilî kaniyên ku me bi bîr anîne, bi dehan ger nebêjin bi sedan kaniyên din jî li seranserî navçê hene, ewê di nav rûpelên pirtûkê de werin bîranîn.

## Bîrên avê

Bîrên Du qadên sert ên kolan, ew jî pir ne kûr in, yan jî bi alavê tên kolan, ew kûr in. Hejmara bîran a rast li navçê ne naskirî ye, lê bê guman, ew sedan derbas dike. Gelek bîr di malan de ji bo

ava vexwarinê hatine kolan, hin jî li nav zeviyan, ji bo avdana çandiniyê ne. Ji bilî wan, bîrên kevin û şûnewarî jî li gelek gundan hene, û hinek jê hîn bi kar tên.

## Ava Me'denî (lajwerdî)

Jêderên dîrokî yên berê, çêre ava me'denî ya germ li navça Çi.Kurmênc bûne. Dîroknivîs Ibin El-Şûĥnê ji Ibin Şedad biriye û wiha dibêje: ((Li "kora" Cûmê, ji deverên Qinisrînê, gelek kaniyên Kibrîtî li Gu.Cindaris hene, ew diherikin Ĥemamê. Xelk ji bo çareserkirina nexwaşiyan diçin ber, û avceniyê tê de dikin)).

Elĝezzî jî li destpêka sedsala bîstan, li derbarê wan ĥememan wiha gotiye: ((Ew ĥemameke Kibrîtî ye, pileya germahiya wê 24º e, ew li dema me ĥemama herî navdar e li wîlayeta Helebê. Ava wê di ĥewzoyekî çargoşe de derdibe, rûbera wî pênc gaz bi pênca ne, li jor qulikek heye ferehiya wê 8cm in, ava ĥewzo tê re dirjê û diçe nav zeviyên Ĥemqê, li ser ĥewzo jî qabek bi keviran ava kirine. Li derdora wê ĥemamê çend çavkaniyên ava Kibrîtî ya germ derdibin, eger ew jî kom ser hev bibin, dê ĥemameke zor hêja jê çê bibe. Li sala 1882an, şaredariya Helebê hin kozik li dora çavkaniyan ava kiri bûn, û ew bi kirê didan xelkê. Lê li dema me, ew ĥemam ji hemî kesan re serbest in, ji bilî ĥemama bi qube, ya şaredariyê)).

Lê li dema me ya îro, xeta sînor di ber gundê Ĥemamê re diçe, ava wan ĥemaman jî ziwa bûye, û yekcar hatin berdan.

Lê li destpêka sedsala bîst û yekan, mirovekî ji gundê Ĥemamê bîrek li Bakurê gund kola, ava Kibrîtî ya germ ji nû ve derxist, û ĥemamek, avjengehek û xwaringehek zor baş li ser ava kir, û ji nû ve jiyan bi wê deverê anî. Ew dever li ser sînor e, cihê wê xweşik e, gelek seyranvan û nexwş jî, ji hemî deveran tên xwe dikin ĥemaman, û bi sirûşta deverê şa dibin.

# Ava Serzemînî

## Ava Efrînê:

Çemê Efrînê ji sirtên Çi.Kurmênc ên Bakur peyda dibe. Kaniyên wî yên destpêkê ji Rojavaya bajarê 'Entabê derdibin, bi hêla Başûr de dadikevin, dibin çem û li aliyê Bakur Rojhilatê Gu.Şîlte'tê derbas nav sînorên Na.Efrînê dibe. Li wê deverê, bilindiya binê rêçûna çêm ji ser rûyê deryayê de, digihê 370/m.

Çemê Efrînê riya xwe di nav kendûkorên Na.Efrînê re vedike, û li ber Gu.Gemrûkê derbas deşta Cûmê dibe. Piştî ku ew bajarê Efrînê derbas dike bi 10/km, berê xwe dide Rojava, û li ber Gu.Milexelîla sînorê Tirkiyê derbas dike û di deşta Ĥemqê de winda dibe. Li wî cihî bilindiya binê rêçûna çêm digihê 121/m.

Rûbera serzemînî ku çemê Efrînê ava xwe jê wedigire 2850/km$^2$ e. Jê 1150 km$^2$, ango %40 di nav sînorên Tirkiyê de ye, ew jî herêmeke çiyayî ye, berf û baran lê pir dibare (barana wê herêmê 1200mm derbas dike), gelek kaniyên mezin jî lê derdibin, û %60 ji ava çemê Efrînê didinê.

Dirêjiya çemê Efrînê ji cihê derbûna wî û ra cihê ku lê bidawî dibe, digihê 149/km. Jê dora 45/km berî ku derbas Sûryê bibe, û 29/km jî piştî ku derbas Tirkiyê dibe. Ango tevahiya dirêjiya Çemê Efrînê di nav sînorên Sûryê û Na.Efrînê de 75/km in, ew jî dora nîvê dirêjiya wî ya tevahî ye.

Li gor van serhejmarên jorîn, navîna bergeha serberjêrbûna newal û rêçûna çemê Efrînê di navça Efrînê de digihê 3.33/m/km?.

Li demên berê, her du çemên Efrîn û Reş, gola Ĥemqê ya liêçeyî çê dikirin, lê li sala 1970 dewleta Tirkiyê ew gola miçiqand, û şûna wê bû zeviyên pir şov û ava.

Darivandina ava çemê Efrînê li Zivistanê û Biharê digihê 15.6 m$^3$/s, li havînê jî kêm dibe, û dadikeve 1.41/m$^3$/s. Ango asta navîn a tibaba darivandina çemê Efrînê digihê 8.6 m$^3$/s.

## Ava Sabûnsûyê:

Ev çem têserê (rafêd- ava ku tê ser) sereke ye ji çemê Efrînê re. Dirêjiya wî 45/km in, navîna darivandina wî digihê 0.425 m$^3$/s. Ew

ji nav sînorên Tirkiyê derdibe, di nav sirtên çiyayî yên bilind û newalên kûr re dimeşe, û li bilindiya 440/m derbas nav sînorêm Sûryê dibe. Pişt re, li Başûrê pira kevin ku ji serdema Romanî de ye, bi dora 2/km, û li asta bilindiya 340/m, tev çemê Efrînê dibe. Di çetelê wê pêrgîhatinê de, girekî şûnewarî yî kevin heye.

Piştî ku çemê Efrînê derbas nav xaka navçê dibe, gelek kanî û cowik tên ser, ên giringtir ev in, **[Nexşe 5]**:

1. **Li aliyê çemê Efrînê yê Rojhilat**, ji Bakur ji ber sînorê Tirkiyê de ev in:

   - Geliyê Tilîlaqê, carina bi "Geliyê Ce'nimê" jî bi nav dibe. Ew di navbera gundên Wêreganê û Tilîlaqê re diçe.
   - Ge.Sîmanê, di navbera gundên Çema û Omera de ye.
   - Ava Qerecurnê, ji Rojhilata bajarokê Şera de dest pê dibe, berê xwe dide Rojava, û bi ser çemê Efrînê de diçe.
   - Ava Cohişkê, ji ava Kaniyên Serêkaniyê/Kefircenê, Meşalê, Qeredepe û Qîbarê pev dikeve, û li Rojhilata bajarê Efrînê digihê çemê Efrînê. Ew cowikekî mezin bû, masî tê de hebûn(1), lê li van salên dawîn, û ji ber ku kaniyên bi ser de derdibûn miçiqîn, gelî jî hişk bû.
   - Kaniyên gundên 'Endarê(2) û Basûtê.
   - Bi dehan kanî li gundên deşta Cûmê hene, ji Gu.Turundê de bigre û ra dawiya wê deştê(3) li Gu.Milexelîla.

2. **Li aliyê çêmê Efrînê yê Rojava**, li Bakur, ji ber sînorê Tirkiyê de:

   - Kaniya Germikê, li Rojhilata kela Nebî Horî di kortê de derdibe, û diçe ser ava Sabûn Sûyê.
   - Cowikê geliyê Qanê, ji ber Gu.Qerqîna bi Rojhilat de berve newalê çemê Efrînê dadikeve.


---

[1]- Kaniyên Qîbar, Qerdepe û Kortikê ziwa bûne, ava kaniya Serêkaniyê jî ji bo vexwerinê ji bajarê Efrînê re diçe.

[2]- Ava wê ziwa bûye, berê ava wê ji bo vexwarinê didan gundên 'Endarê, Kurzêlê û Turundê.

[3]- Piraniya van kaniyan ziwa bûne, yan jî ava wan kêm bûye. Sedem jî kêmbûna baranê û kolandina bi sedan bîran ji bo vexwarinê û çandinê ye.

- Ava Ziravkê, cowikekî mezin e, ava wê ji van kaniyan pev dikeve: Kitix dana wê 25 L/s, Dirûmiyê, Berbe'ûşê, ava çavkaniyên ku ji hêla Reco di geliyê Tîra re tên, ava kaniyên ku di geliyê Çayê re ji hêla Bilbilê bi ser ava Ziravkê de tên, mîna ava kaniyên Çavreşkê û Ĝulĝulê li Başûrê Çi.Hawarê... û hwd. Tevahiya avên jorîn li ber girê Ziravkê digihên hev, cowika Ziravkê çê dibe, û li dora 1/km li Bakurê rawestgeha çîmanê ya Qurtqulaqê tev çemê Efrînê dibe. Rûbera ku ava geliyê Ziravkê jê dadirive 430/$km^2$ e.
- Ava kaniya 'Endîbê, li werzê Zivistanê pir dibe, nemaze piştî ku ava kaniyên gundên Dargirê û Coqê bi ser de tê.
- Geliyê Şêx Evdirehmên, ev cowik ji ava kaniyên Şêx Evdirehmên û Kanîreşkê çê dibe, bi rê de ava kaniyê gundên Gewrika, Çolaqa, TilĤemo û Firêriyê jî tên ser.
- Geliyê Gundên Xalta û Miskê, berê ew cowikekî giring bû, digihîşt çemê Efrînê.
- Berî ku barîna baranê li van dehsalên dawîn kêm bibe, bi tevahî, li her gundekî deşta Cûmê kaniyeke û carina bêtir jî hebûn, ava piraniya wan kaniyan dighîşt çemê Efrînê, lê me pêwîst ne dît navên hemiyan bibîr wînin. Ji bilî ku, piraniya geliyên ku bi ser newala çemê Efrînê de tên, li werzên Zivistanê û Biharê lehiyên mezin bi ser çem de tînin. Hin gelî jî, li salên bi baran li dirêjiya salê av jê dadirve û diherikin.




**Nexşe-5- Şebeka ava Serzemînî li Na.Efrînê.**

## Çemê Reş:

Dirêjiya Çemê Reş bi tevahî 96/km e, darivîna ava wî digihê 1.24/ $m^3$/s. Rêçûna wî li derdora Gu.Mîdan Ekbezê, bi dirêjiya çend kîlomitran di nav sînorê Sûryê re diherike.

Kaniyên vî çemî ji pesarên Rojava yên Çi.Kurmênc, ji bilindiya 560m de dest pê dibin, di asta 400/m de jî sînor derbas dike û bi nav xaka Na.Efrînê dikeve. Gelek cowik ji Çi.Gewr jî dadikevin ser rêçûna çêm.

Çemê Ava Reş li deşta Ĥemqê digihê çemê Efrînê, û bi hev re gola Ĥemqê çê dikin. Dewleta Tirkiyê bendek li Bakurê Gu.Mîdan Ekbezê li ser çêm ava kiriye, û goleke fereh li paş çê bûye. Ji aliyê Sûryê de jî, ava Ka.Betmanê diherike ser.

## Solav

Çemê Efrînê di nav navçeke çiyayî re diherike, navîna serberjêrbûna rêçûna wî 3.33 m/km e. Lewre, carina hin solav li ber benên tehtî çê dibin. Ji bilî wê, ji berê de, mirovên navçê hewil dane, ku ji bo avdanê û gerandina aşên avê, sûdê ji serberjêrbûna rêçûna çêm bibînin, lewre wan li ser hin benên tehtî, ku di nav rêçûna çêm de ne, dîwar ava kirine, û bi wê yekê, hinek solavên biçûk li ber çê bûne. Ji wan solavan:

### Solava Meydankê:

Ew li Başûr Rojhilatê Gu.Meydankê bi 1/km bû. Cihê wê 310 mitran bilind e. Pehniya berê solavê dora 50/m bû, bilindiya xwe jî ji 5 ra 10 mirtan bû. Diyar e, ku solava Meydankê ji berê de balkêş bû. Baba Bûlis Yetîm li ser wê solavê wiha gotiye: ((Mar Aqûbê Qorşî li ber solava Meydankê nasktî dikir)). Belkî ew cihê şûnewarî ku niha li hember cihê solavê li ser sirtê ye, û bi navê Keloşkê tê nasîn, cihê nasiktiya wî bû. Ji mêj de, xelkê ji bo gerandina aşên avê dîwarekî bi bilindiya bêtirî du mitran li ser ew rîfê tehtî ava kiri bû, û goleke ciwan li paş çê bibû, û bû bû cihekî geştevaniyê yî zor ciwan. Solava Meydankê li meha Şubata ji sala 2000î, dibin ava gola Meydankê de ma.

### Solava Gemrûkê:

Ew solav li Başûr Rojhilata Gu.Gemrûkê bi 2/km ye. Solav û darûberên dora wê, deverê pir şêrîn dikin. Ava solavê ji bilindiya bêtirî 8/m de, bi şêweyekî lihevhatî û bi pehniya dora 50m dikeve xwarê. Li paş dîwarê solavê, goleke avê bi dirêjiya nêzîkî 100/m çê

bûye. Şêniyê deverê ava golê ji bo xebitandina aşên avê bikar tanî. Lê mixabin, ji ber ku karûbarên qenata ava gola Meydankê di bin cihê solavê re hatiye kolan, ew solav li ber wêrankirinê ye.

### Solavên Betmanê:

Ji ber ku di bin hin beşên çemê Reş de zinarên mezin hene, li hin cihên ku rêçûna çêm pir serberjêr dibe, hin solavkên biçûk ên ciwan çê dibin.

### Solava Basûtê:

Ava kaniya Basûtê ji bilindiya dora 6 mitran de bi ser newala çemê Efrînê de dirjê, û solaveke biçûk û ciwan çê dike. Ew solav li Başûr Rojavaya gund e.

### Solava Qere Curnê:

Cihê wê dora 1/km li Rojavaya pîrozgeha Qere Curnê ye. Ava wê ji dora 7/m de di goleke biçûk werdibe, û solaveke biçûk li ser ava geliyê Qere Curnê çê dike. Cihê solavê hêmin û zor ciwan e.

## Gol li Na.Efrînê

Golên xwezayî yên mezin li Na.Efrînê tunene, lê hin golik li ber hin kaniyan hene, yan jî ava baranê di hin kortên mezin de kom dibe, û herwiha bi “Gol” hatine binavkirin. Hinek ji wan berê fereh bûn, û li dirêjiya salê diman, wek Golbi'îrê li ber Gu.Tilsilorê, gola Gu.Celemê, gola Cilfik li navbera gundên Maratê û Keferşîlê, û hîn jî cihên wan bi navên Gol tên nasîn.

Ji bilî wan, li hin gundên çiyayî, ku jêdereke avê lê peyda nabe, rûniştvanan li binê kaşan, li cihên dûz, ji bo civandina ava baranê zemîn kolane, ava baranê tê de kom dibe, û jê re “gol” tê gotin. Ava wan golan ra dawiya werzê Havînê dima, û hîn jî wisa ye. Ew av bêtir ji bona avdana dewêr bikar dihat. Û bêtir jî li gundên devera Reco tên dîtin, wek gundên: Çiyê, Goliya, Qirigolê…

## Golên xwezayî:

Golên xwezayî, ku mera kane wan “gol” bi nav bike, didu ne: Gola 'Eendarê û Gola Hopka:

### - Gola 'Endarê:

Goleke xwezayî ye, ji ava kaniya 'Endarê çê dibe. Rûbera zemîna wê dora hêktarekê ye. Ava cowika wê bi Rojava de diherike, di ber girê 'Endarê re diçe û paşê tev çemê Efrînê dibe. Lê belê, piştî ku ava kaniya 'Endarê ji bo vexwarina gundên derdorê hat bikaranîn, û gelek bîr jî ji bo avdanê li derdora wê hatin kolan, ava wê gol li Havînê kêm dibe.

### - Gola Hopka

Cihê wê li ber Gu.Hopka, li Bakur Rojavaya Reco bi nêzîk 2/km ye. Rûbera wê di asta wê ya herî fereh de, digihê dora deh hêktaran. Cihê wê koreke fere ye, di navbera sirtên çiyayî yên bilind de ye. Li salên bi baran, ava baranê di wê kortalê de kom dibe û dibe goleke mezin. Li demên berê, gol ferehtir dibû, ra digihîşt ber bajarokê Reco û ava wê ta dawiya Havînê dima. Li sal 2002an, rûbera ava golê dora pênc hêktar zevî girti bû.

## Golên çêkirî:

Du golên çêkirî li navça Efrînê hene, Gola Meydankê li paş bendava Meydankê, û goleke biçûk li ber gundê Bircê jî çê bûye. Ew her du gol li ser rêçûna çemê Efrînê ne:

### - Gola Meydankê

Ev gol li sala 2000î li paş bendava Meydankê pev ket. Bilindiya cihê wê 339/m e. Kanîna wê ya civandina avê li asta herî bilind 190 milyon $m^3$ e. Dirêjiya wê 14/km e, pehnahiya wê jî di navbera 200 ra 500/m de ye. Darên zêtûn û merxê her du peravên wê digrin. Cihê golê bûye warekî geştevaniyê yî pir ciwan û şêrîn, li salê bi hezaran geştevan seredana peravên wê dikin. Gelek xwaringehên baş jî li ser sirtên derdora wê hatine avakirin.

- **Gola Gu.Bircê**

Li sala 2001ê, bendeke biçûk ji bo bilindkirina asta ava çemê Efrînê li ber Gu.Bircê hat avakirin, û goleke biçûk li paş çê bû.

## Şînkayê li jîngeha Na.Efrînê

Cureyên şînkahiyan, bi tevahî, bi du kirdeyên sirûştî yên sereke ve girêdayî ne: Ax û Heyam.

- Ji hêla **axê** de, sirtên Çi.Kurmênc ên Bakur, Bakur Rojava û navîn tehtî ne, axa wan sor û tenik e. Sirtên çiyayên Xastiya û Ĥeştiya jî, ji cureya axa Ĥelanî Gewr in, û axa rûyê zemînê jî stûrtir e. Lê deşta Cûmê û deştên din yên biçûk axa wan sor û gelek şov û berhemdar in.

Û ji ber ku rûberên darûber û şînkahiyê li navçeyên çiyayî kêm bûne, ava baranê axa sirt û kaşan rêş dike, loma jî sal li dû salê şovîtiya wê kêm dibe, daristan û şînkahiya ku mane jî kêmtir û jartir dibin.

- Ji hêla **heyamê** de, Çi.Kurmênc ji herêma çiyayî ya Derya Naverast e, heyama wî nîv ziwa û nîv lihêmî ye.

Wekî ku tê zanîn, keskahî ji du cureyên sereke pêk tê: **Dar** û **Geya**. Dar jî du reng in: **Dara Sirûştî** û **Darên ku hatine çandin**.

### Daristana Sirûştî:

Li deverên Reco û Bilbilê, rûberên baş ji daristanên kevin hene. Lê her ku mera berve deverên Başûr û Rojhilat diçe, ew daristan siviktir dibin.

Li Çi.Lêlûn jî, hin darên daristana kevin jiserkînûve şîn dibin. Daristanên Çi.Kurmênc, demeke dirêj ji hêla komirker û şêniyê çiyê ve toşî birîneke pir giran û bê pîvan bûye. Daristana Çi.Lêlûn a kevin jî, bi destê Osmaniyan hati bû birîn, ya ku mabû jî li dema şerê cihanî yê yekê, ji bo ardûya Çîmanê birîn.

Ew birîna daran a ziyandar, kiriye ku rûberine daristanî yen fereh winda bibin, nemaze jî li sirtên çiyayên Ĥeştiya, Xastiya û

Lêlûn. Ew rûberên ku ji daran vala bûne, piraniya wan bi darên zêtûnê hatine çandin, hin jî ji bo çandiniya têvel bikar tên, hin rûber jî reqûrût mane.

Li derbarê cureyên darên daristanî yên xwezayî; Li deverên Bakur, Bakur Rojava û li deverên çiyayî yên navîn, darên xaka kilsî ya zinarî şîn dibin, piraniya wan daran jî ji cureyên Sindîganê ne.

Li sirtên Başûr Rojava jî, Xastiya û Ĥeştiya, cureyên darên Merxê şîn dibin.

Giringtirîn darên çolê ku li jîngeha Çi.Kurmênc hene, ev in:

1. Sindîgan: Navê berê wê Palût/Berûk e. Cureya wê ya pirtir, bi navê Kelem tên nasîn. Ji cureyên darên Sindîganê yên gir û temendirêj, darên Mazî û Gêlberû ne.
2. Merx: Çend cureyên wê hene, û ya bi ber jî heye.
3. Guvîj: Textê wê sert e, tiştên malê yên şîvkirinê jê çê dibin, wek kevçî... berê wê jî tê xwarin.
4. Şikoke: Berê wê mîna 'Ermûtê ye, li Payîzê dibuhure, û dibe meyweke şêrîn.
5. Ĥiloreşk: Berê wê reş û biçûk e û tê xwarin.
6. Te'wî: Berê wê ji tena 'Inabê biçûktir e, şamîkirina/tama wê jî xwaşik e.
7. Dirîreşk yan Siĝirgotik: Ji tamarên wê <u>êmzikên</u> cixaran çê dikin, ji şaxên wê jî <u>şiva</u> vexwarina titûnê çê dikirin, berê wê jî tê xwarin.
8. Tizbî: Ji dendikê berê wê, <u>tizbi</u> tên çêkirin. Ji benîştê koka wê jî <u>pixûr</u> tê çêkirin.
9. Dara Zêtûnê ya çolê.
10. Siftek: Çîçekên wê goşî, hûrik û ciwan in, aveke şêrîn bi çêşa hunguv di wan de heye.
11. Kizwan/Kewzan: Bi dara Benîştok jî bi nav dibe.
12. Simaq: Bi ber e, tirşa Simaqê jê tê çêkirin.
13. Ti'ok.
14. Kenar.
15. Şirt.
16. Êvirs.

17.Nermik. 18. Çinar. 19. Qetleb… û hwd.

## Daristana Çandî:

Dara Zêtûnê rûbera herî bêtir ji Na.Efrînê digire. Hejmara wê dozdeh milyon derbas kiriye, û navçe bûye daristaneke mezin ji darên zêtûnê. Ji bilî wê, zeviyên fereh ji darên mîna: Hinar, zerdele, sêv, gûz, xox, hurme, be'îv, çinar, bî, spîndar (qewaq), tû, hejîr… jî hene, ji bilî ku gelek cureyên darên malane û fodilkirinê jî li her malekê tên çandin.

Birêvebiriya Daristaniyê ya dewletê jî, rûberine fereh ji sirtên çiyayî li deverên Şera û Çi.Lêlûn bi darên merxê çandine, û hîn jî diçîne, û daristanên hêja jê peyda bûne.

Li gundê Baflûnê, li cihê bi navê " 'Ulma", daristaneke çandî ya bêmînak û pir balkêş heye. Şêx Ehmed Ce'ferê Êzdî, 107 cure darên daristanî li ser rûbera nêzîkî 10/hêktar zemîn ji arzûyên xwe çandine. Wî, wek ew dibêje, dar ji gelek deverên cîhanê, wek Hindistanê, Ewrupa û ji jîngeha çiyayî ya herêma Rojhilata Navîn jî anîne. Şêx Ehmed ji sala 1970yî de dest bi çandina wan daran kiriye. Ew li derbarê daristana xwe dibêje: Ew yek e ji du daristanên wilo li Rojhilata Navîn, a din jî li Tirkiyê ye.

Li sala 1994an, rîportaceke bi wêne li ser wê daristanê di kovara şalyariya çandiniyê ya Sûryê de, ku bi alîkariya "Rêxistina Xwarin û Çandinê ya Navnetewî- FAO" tê weşandin, hat belavkirin.

## Geya:

Gelek cureyên geyayên çolê li deverên çiyayî yên bê dar, û li nav daristanan şîn dibin. Lê rê li vir nîne ku em hemiyan bijmêrin û bidin nasîn.

## Lawirên çolê

Encamên ravekirina Sîrkeya Motikî /DNA/ ya hestiyên ku ji binê şikefta Duderiyê li Çi.Lêlûn hatine der, xuya kirine, ku li serdema mirovê Niyandirtalî, lawirên mîna Piling, Şîp, Yekqoç û Fîl li navçê dijîn. Kalepîrên me jî dibêjin, ku li destpêka sedsala bîstan, piling û keriyên Xezalan li seranserî navça Çi.Kurmênc hebûn.

Ji lawirên çolê ku niha li navçê hene, ev in:

- Ji yên **goştxwar**: Heftar, gur, rovî, çeqel, pisîkên bejî...
- Lawirên **Memikî**: Kêvroşk, şujî, xult, cerdûn, mişk, Pêrçemok, û beraz jî li van salên dawîn li navçê peyda bûne.
- **Balinde/Firinde**: Gelek cureyên çûk, kevokên bejî, kew, bilbil, darkutik, têrikên avî jî hene. Ji balindeyên goştxwar jî, başîq, sîsalk, qertel, qirik, kund… hene. Ji balindeyên demsalî jî, meqesok, legleg, qaz, siĝirciq/zerzol, û bilî wan jî têne navçê.
- Ji **Xuşokan**: Mar, kênefis/kêsefis, gelek cureyên Gumgumokan .
- Jîngeha Çi.Kurmênc bi pirbûna cureyên kurm, kêzên xakî û cureyên mêşan jî dewlemend e.
- Gelek cureyên **masiyan** jî di çemên Efrînê, Reş û di gola Meydankê de dijîn.

# Lêkolîna Duyem

## Jiyana Şêniyê Çi.Kurmênc

Kurdên Çi.Kurmênc ji zû de jiyana goçeberiyê berdane, û di mal û gundan de bicih bûne. Tenê hin nofên civakî yên biçûk hene, carina konan li dora gundan û li nav zeviyan vedigrin, û demeke kin di bin de dijîn, nemaze li dema berfkirina zêtûnan. Lê belê piraniya wan, xaniyên xwe jî hene.

Li gor pîvanên fermî yên siqbûna rûniştvaniyê li Sûryê, Na.Efrînê ji navçeyên ku Siqbûna kesan tê de bilind e, / li lîste12-veger/. Şêniyê Na.Efrînê li bêtirî 300 warên şên belav dibe, şênewarê mezintir û sereke bajarê Efrînê ye. Şeş bajarokên din jî hene navendên deveran e, ew jî ev in: Cindirês, Şiyê, Mabeta, Reco, Bilbil û Şera. Ji bilî wan, gelek gundên mezin jî hene, mîna gundên Be'dîna, Kefersefrê, Celemê, Basûtê, Mîdan Ekbezê, Me'mila… û hwd.

### Gund û mal:

Li navça Efrînê, gundên destpêkê li cihên ku av, çêre û rûberên ji bona çandinê lê peyda dibûn, hatine avakirin. Piraniya wan li ber û li ser pesarên çiyan, li ber kaş, avraz û li ber devgeliyan hatine damezrandin. Kendûkorên çiyayî jî hîştine, ku xaniyên gelek gundan şêweyê pêplûkan bistînin, ango bana her xaniyekî ji yê din re dibe mîna sewkiyekê.

Ji bilî wê, piraniya gundan li ser yan li ber şikêrên şûnewarî hatine avakirin. Xelkê berê, kevirên şûnewaran ji bo avakirinê bikar tanîn û bîr û se'rîncên ku berê hebûn jî dixebitandin, ji bilî ku şikeft û zêrzemînên li wan deran peyda dibûn jî, ji rûniştinê û ji xudîkirina dewêr re bikar tanîn. Bi tevahî, salixên xaniya kilasîkî li gundên çiyayî li sedsala nozdehan, li Çi.Kurmênc wiha bûn:

Bingehên xanî di zemînê de dihatin kolan, wê yekê dikir ku dîwarê xanî yê paş nizim be, û gihîştina serbana wî ji bo xebat û karê durustkirinê hêsantir dikir.

Bana xanî jî bi dîrakên darî dihat raxistin, şaxên daran û te'tik datanîn ser, ax li ser dûz û loq dikirin, paşê jî bi ĥeriya ku bi kayê dihat civlandin, dihat dûtin. Dîwar jî du qorî bû, û nêzîk mitrekê pehin bû. Pencereyên biçûk/yarîk jî li aliyê xanî yê pêşiyê vedikirin.

Ev taybetiyên xaniyan ên jorîn, dikirin ku xanî ji guhertinên heyamê, lawiran û dizan jî were parastin.

Bi tevahî, berê xanî bi Başûr de bû, lê bi piranî, li gor kendûkoran cih dihat vebjartin. Derî jî pehin, nezim û bi qentirme bûn.

Xanî li ser qentirmekê yan diduyan dihatin avakirin, û ew bi mûdêla “xaniyê qentirme” dihatin binavkirin. Hejmara qentirman li gor rewşa aborî ya xudanê malê bû. Lê bi tevahî, xanî ji hundur de parve çar beşan dibû, her beşekî jî delametek xwe hebû.

Di beşê pêşîn ê Rojhilat de, pixare dihat çêkirin, lewre li zivistanê hemî karên şîvkirin û nankirinê li wir dibûn, û dibû cihê rûniştinê jî. Beşê pêşîn yê Rojava ji bo rûniştinê û mêvanan dihat xebtandin.

Beşê paşîn ê Rojhilatî jî, ji dewêr û pêdviyên wan re bi kar dihat, wek ka, êzing û hwd. Beşê paşîn ê Rojava jî ji bo mûnetê, nivînan û hûrmûrên malê bi kar dihat.

Ev şêweyê zor parastî ji xaniyê çiyayî, dikir ku sîpera malê pir ne gerek û bê sûd be, ji ber wê jî sîperereke nizim bi kevirên ne şekirî û bi hişkeberiyê dihat avakirin, geyaya belanê, şaxên darên zêtûnê û şivên mêwan jî datanîn ser.

Dergeh jî pir bi kar ne dihat, tenê pariyek text mîna deriyekî biçûk çê dikirin, û didan ber dergehê, wê dergehê tenê tevgera dewarê malê digirt.

Bi tevahî, xaniyên gundên çiyê bi keviran dihatin avakirin, ên deştên Cûmê û Ĥemqê jî bi bilokên heriyê ku li ber rojê dihatin ziwakirin, dihatin avakirin.

Ji dawiya nîvê yekê de ji sedsala bîstan, çawahiya avahiya mala Kurdî li navçê hat guhertin û zû pêşde çû. Mûdêla Qentirme hin bi hin kêm bû, ode ji hev cuda bûn, mewadên nû wek hesin û çemento di avakirinê de hatin bikaranîn, û herwiha hundurê malê jî paktir bû.

Ji bilî wê, xanî li cihên nêzîk û dûz, û li ber rêkan hatin avakirin. Loma jî, pir caran malên kevin ên gund li ser sirtê ne, yên nû jî li dûzê, li ber rêka ziftkirî ne.

## Zanînin li ser serhejmara rûniştvanan

Serhejmara yekê li Qeza Kilisê li sala 1892an hatiye kirin. Li gor wê serhejmarê, hejmara şêniyê gundên ku di serhejmarê de hatine nivîsandin, û niha di nav sînorên navça Efrînê de ne, 23682/kes bû.

Li sala 1922an jî, hejmara şêniyê Qeza Çi.Kurmênc wiha bû: 10434/ Nêr +11389 mê = 21823/kes, /El-Ĝezzî, beş 1, rûpel 258/.

Li gor serhejmara 1927-1932an jî, hejmara şêniyê qeza Çi.Kurmênc 43 hezar bû[1].

Wekî ku xuya dibe, ew serhejmar pir li hev netên, sedem jî ew bû, ku gihana kesan û gundan dijwar bû, xelkê jî ji tirsa xûkê û çûna leşkeriyê, serhejmara xwe ya rast hewal ne dida, bi taybetî jî hejmara mêrên malê.

Li gor serhejmara 1994an jî, hejmara şêniyê Na.Efrînê, li roja pêkanîna serhejmarê, 190828 kes bû.

Hejmartina rojên 13-14 meha Êlûla sala 2004an jî diyar kiriye, ku hejmara kesên ku li Na.Efrînê rûniştine 172095 kes in, û li ser 31404 xêzanan belav dibin, ango bi tevahî her malekê 5.48 kes tê de hene.

[1]- Ev hejmar ji Ekrem Çirûsî hatiye birin. Ew li destpêka salên sihî ji sedsala bîstan, nivîskarê taybet bû li ba misteşarê Firensî li Çi.Kurmênc.

## Serhejmara şênî li Na.Efrînê li gor temen û zayendê:

Me nikanî serhejmara şêniyê navçê li gor nofên temenî bidestxistana. Lewre, emê tenê hejmara nêrza û mêzayan hewaldin. Ew jî li gor serhejmara sala 2004an, û hejmara kutikê nifûsê ya 2005an, wiha bûn, /cedwel 5-6/.

| Dever | **Jin** | **Mêr** | Tevahiya rûniştvanan |
|---|---|---|---|
| **Efrîn** | ٦٨٦٣٤ | ٦٨٢٣٩ | ١٣٦٨٧٣ |
| **Şera** | ٢٦١٥٥ | ٢٦٠٦٦ | ٥٢٢٢١ |
| **Bilbil** | ٢٥٨٦٩ | ٢٥٨٥٩ | ٥١٧٢٨ |
| **Reco** | ٣٥١٦٩ | ٣٥٨٧٣ | ٧١٠٤٢ |
| **Şiyê** | ١٥١٧٦ | ١٥١٧٤ | ٣٠٣٥٠ |
| **Cindirês** | ٣١٣١٧ | ٣٢٠٨٤ | ٦٣٤٠١ |
| **Mabeta** | ٢٦٩٠٩ | ٢٧٣٢٦ | ٥٤٢٣٥ |
| **Tevahî** | ٢٢٩٢٢٩ | ٢٣٠٦٢١ | ٤٥٩٨٥٠ |

**Cedwel -5- Hejmara kesên ku li dawiya sala 2005an di kutikê nifûsê de tomarkirî bûn.. li gor dever û zayendê.**

| Dever | **Jin** | **Mêr** | Tevahî |
|---|---|---|---|
| **Efrîn** | ٣١٩٦٠ | ٣٢٧٩٨ | ٦٤٧٥٨ |
| **Şera** | ٦٩٧٤ | ٦٦٥٨ | ١٣٦٣٢ |
| **Bilbil** | ٦٣٧١ | ٦٢٠٢ | ١٢٥٧٣ |
| **Reco** | ١٠٨١٩ | ١١١٣٦ | ٢١٩٥٥ |
| **Şiyê** | ٦٨٥٧ | ٧٠١٤ | ١٣٨٧١ |
| **Cindirês** | ١٦١٦٧ | ١٦٧٨٠ | ٣٢٩٤٧ |
| **Mabeta** | ٦٢٣١ | ٦١٢٨ | ١٢٣٥٩ |
| **Tevahî** | ٨٥٣٧٩ | ٨٦٧١٦ | ١٧٢٠٩٥ |

**Cedwel -6- Parkirina şênî li ser dever û zayendê li gor serhejmara 2004an.**

## Mişextbûn

Ji lîsteyên 7an û 8an/ li jêr, xuya dibe, ku cidatiyeke mezin di navbera hejmara şêniyê ku di kutikê nifûsê de hatine tomarkirin, û hejmara ku bi rastî li navçê rûniştine heye.

Ew cidatî jî, liva xelkê ya di hundur navçê de, û barkirina wan a derveyî navçê diyar dike. Lê belê pir pêwîst e, ku em li destpêkê, hin têbînan li derbarê serhejmartinên ku li Sûryê hatine kirin, bêjin:

1. Şêweya pilankirin û pêkanîna wan serhejmaran ne durust e.
2. Gelek şaşîtî di tomarkirin û civandina hejmaran de hene.
3. Piraniya komikên ku bi karê serhejmartinê radibin, bê rahên û taqe e, û ne jî xemwar in.
4. Tiştên dikin ku hîn guman li ser serhejmarên Na.Efrînê bilind bibe, û nedurustiya wan beloq bibe, ew e ku hejmara rûniştvanên Na.Efrînê li gor serhejmara 1994an 190828 kes bû, lê li serhejmara sala 2004an, ango piştî deh salan, ew hejmar daketiye 172095 kesan, /cedwel 7/.

| **Sal** | Hejmara kutikê nifûsê | Serhejmara fermî ya tevahî | Rûniştvanên ku li derveyî navçê rûdinin | Nisba sedane ya mişextî û kesên ku li derveyî navçê rûniştine |
|---|---|---|---|---|
| ١٩٨١ | ٢٣٢٠٠٤ | ١٣٣٣١٩ | ٩٨٦٨٥ | %٤٢,٥ |
| ١٩٩٤ | ٣٥٥٥٦٦ | ١٩٠٨٢٨ | ١٦٤٧٣٨ | %٤٦,٣٣ |
| ٢٠٠٤ | ٤٤٦٢٩٣ | ١٧٢٠٩٥ | ٢٧٤١٩٨ | %٦١,٤٣ |

**Cedwel -7- Guhertinên rûniştvanî li goriya sê serhejmarên fermî.**

| **Dever** | | **Hejmara kutikê nifûsê ya sala 2004an** | **Hejmara rûniştvanan li gor serhejmara 2004** | **Cudatî di navbera kesên tomarkirî û rûniştvanên rastînkî de** | **Nisba sedane ji guhertina rûniştvanî (penabertî)** |
|---|---|---|---|---|---|
| **Efrîn** | Bajar | ٤٦٠٣١ | ٣٦٥٦٢ | ٩٤٦٩ | %٢٠,٥٧٠ |
| | Gund | ٨٧٠٥٩ | ٢٧٦٧٨ | ٥٨٣٨١ | %٦٧,٠٥٩ |
| | **Tevahî** | **١٣٣٠٩٠** | **٦٥٢٣٨** | **٦٧٨٥٢** | **%٥٠,٩٨٢** |
| **Şera** | Bajarok | ٢٣٣٢ | ٢٥٩٦ | ٢٦٤ + | +%١١,٣٢٠ |
| | Gund | ٤٨٥٦٢ | ١١٠٣٦ | ٣٧٥٢٦ | %٧٧,٢٧٤ |
| | **Tevahî** | **٥٠٨٩٤** | **١٣٦٣٢** | **٣٧٢٦٢** | **%٧٣,٢١٤** |
| **Bilbil** | Bajarok | ٤٥٩٢ | ١٧٤٢ | ٢٨٥٠ | %٦٢,٠٦٤ |
| | Gund | ٤٥٦١٣ | ١١٠٩٤ | ٣٤٥١٩ | %٧٥,٦٧٧ |
| | **Tevahî** | **٥٠٢٠٥** | **١٢٨٣٦** | **٣٧٣٦٩** | **%٧٤,٤٣٢** |
| **Reco** | Bajarok | ٤٠٤٠ | ٣١٢٢ | ٩١٨ | %٢٢,٧٢٢ |
| | Gund | ٦٥٢٧٧ | ١٨٥٧٠ | ٤٦٧٠٧ | %٧١,٥٥٢ |
| | **Tevahî** | **٦٩٣١٧** | **٢١٦٩٢** | **٤٧٦٢٤** | **%٦٨,٧٠٤** |
| **Şiyê** | Bajarok | ٩٥٥٨ | ٥٠٦٣ | ٤٤٩٥ | %٤٧,٠٢٨ |
| | Gund | ٢٠٠٧١ | ٨٨٠٨ | ١١٢٦٣ | %٥٦,١١٥ |
| | **Tevahî** | **٢٩٦٢٩** | **١٣٨٧١** | **١٥٧٥٨** | **%٥٣,١٨٤** |
| **Cindirês** | Bajarok | ١٠١٩٢ | ١٣٦٦١ | ٣٤٦٩+ | +%٣٤,٠٣٦ |
| | Gund | ٥٠٤٣٠ | ١٨٨٠٦ | ٣١٦٢٤ | %٦٢,٦٠٧ |
| | **Tevahî** | **٦٠٦٢٢** | **٣٢٤٦٧** | **٢٨١٥٥** | **%٤٦,٤٤٣** |
| **Mabeta** | Bajarok | ٧٤٢٤ | ١٩٤١ | ٥٤٨٣ | %٧٣,٨٥٥ |
| | Gund | ٤٥١١٢ | ١١٤١٨ | ٣٣٦٩٤ | %٧٤,٦٨٩ |
| | **Tevahî** | **٥٢٥٣٦** | **١٢٣٥٩** | **٤٠١٧٧** | **%٧٦,٤٧٥** |
| Navendên deveran | | ٨٤١٦٩ | ٦٤٦٨٧ | ١٩٤٨٢ | %٢٣,١٤٦ |
| Gund | | ٣٦٢١٢٤ | ١٠٧٤١٠ | ٢٥٣٧١٤ | %٧٠,٠٦٠ |
| **Tevahî** | | **٤٤٦٢٩٣** | **١٧٢٠٩٧** | **٢٧٤١٩٦** | **%٦١,٤٣٨** |

**Cedwel -8-Serhejmara kesên tomarkirî û yên rûniştî û guhertinên rûniştvanî li Na.Efrînê li dawiya sala 2004an.**

Eger em têbînên ku me li jor, li ser çawahiya serhejmariya fermî li Sûryê gotine dînin alîkî, û em li naveroka cedwel /8/ binêrin, emê kani bin van xalan wek serencam jê bigirin:

Mişextiyeke pir mezin ji gundên navçê çê bûye, rêjeya wê digihê %70.06. Ew jî ji jor de berve berjêr, bi vê dûverêziyê li ser gundên deverên navçê belav dibe, /cedwel 9/:

| Dûverêzî | ١ | ٢ | ٣ | ٤ | ٥ | ٦ | ٧ |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Gundên deveran | **Şera** | **Bilbil** | **Mabeta** | **Reco** | **Efrîn** | **cndirês** | **Şiyê** |
| Nisba sedane ya mişextiyan % | ٧٧,٢٧ | ٧٥,٦٨ | ٧٤,٦٩ | ٧١,٥٥ | ٦٧,٠٦ | ٦٢,٦١ | ٥٦,١٢ |

**Cedwel -9- Rêjeyên guhertinên rûniştvaniyê li gundên navçê.**

1. Rêjeya guhertinên rûniştvanan li bajarokên navendên deveran digihê %23.14 ji rûniştvanan. Ew jî bi dûverêzî, ji jor de berve berjêr, wiha li ser navendên deveran belav dibe, /cedwle 10/:

| Dûverêzî | ١ | ٢ | ٣ | ٤ | ٥ | ٦ | ٧ |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Navenda deverê | **Mabeta** | **Bilbil** | **Şiyê** | **Reco** | **Efrîn** | **Şera** | **Cindirês** |
| Rêjeya sedane ya mişextiyê % | ٧٣,٨٥ | ٦٢,٠٦ | ٤٧,٠٣ | ٢٢,٧٢ | ٢٠,٦٠ | ١١,٣٢+ | ٣٤,٠٧+ |

**Cedwel -10- Rêjeya guhertinên rûniştivan li bajar û bajarokan.**

Ji cedwel -10- tê dîtin, ku hejmara şêniyê bajarokên Cindirêsê û Şera bilind bûye, lê hejmara rûniştvanên Mabeta û Bilbilê bi tibabeke pir mezin dageriyaye.

2. Rêjeya tevahî ya mişextbûnê ji Na.Efrînê gihîştiye %61.12, ji tevahiya şêniyê navçê.
3. Hejmar destnîşan dikin, ku mişextbûneke pir bilind ji deverên ku kendûkorên wan çiyayî ne çê bûye, ew jî ji ber ku zeviyên ji çandiniyê re lêhatî lê peyda nabin, û pêdviyên jiyana mirov lê bicih ne tên, hin kirdeyên din jî li wan deveran hene ji mişextiyê re dibin alîkar, wek kêmbûna kargûzariyê, wek: Ava vaxwarinê, rêkên ziftkirî, dibistan… û hwd.
4. Guhertinên rûniştvanî li navendên deveran diyar dikin, bajarokên ku ji hêla xaknîgarî ve li aliyekî ne, yan jî ji navenda

navçê dûr in, wek Bilbilê û Mabeta, hejmara rûniştvanên wan kêm bûne. Li bajarokên ku cigehên wan ên xaknîgarî lêhatine jî, wek Cindirês û Şera, hejmara rûniştvanên wan bilind bûye.

Li gor cihê ku mişextî diçinê, mişextbûn li Na.Efrînê parve sê cureyan dibe: **Herêmkî**, **Hundirkî** û **Dervekî**.

### a- Mişextbûna Herêmî:

Di vê rewşê de, mirov cihê rûniştina xwe berdide û diçe li gundekî din, yan li bajarekî din, ku di hundirê sînorên navçê de ye, rûdine. Piraniya wan mişextiyan xanî û arzûyên xwe li gundên wan ên berê hene, û têkliyên wan jî ji gundên xwe ne hatine birîn .

### b. Mişextbûna Hundirîn:

Ev mişextî di hundirê Sûryê de çê dibe. Hejmara vê curemişextiyê pir mezin e. Li vê rewşê, mişextî warên xwe berdidin, û berve bajarekî ku ji navçê ve nêzîk be, û derfetên kar û jiyaneke baştir lê peyda bibin, bicih dibin. Gelek ji mişextiyan mal, arzû û zeviyên xwe yên biçûk li gundên wan hene, têkliyên wan jî ji navçê ne hatine birîn. Mişextbûna hundirkî li Na.Efrînê di salên şêstî de ji sedsala bîstan, dest pê kiriye. Wê hingê, piraniya mişextiyan diçûn di avakirina bendava çemê Ferêt de kar dikirin û li wir bicih dibûn, û pişt ku kar li wir nema, gelek ji wan vegerîn li bajarê Helebê rûniştin, hejmareke biçûk jî li gundên xwe vegerîn. Li dema me, berê mişextiyên hundirîn yê sereke bajarê Helebê ye, lê belê gelek jî diçin li bajarê Şamê rûdinin, nemaze şêniyê devera Bilbilê. Hejmareke din jî li bajarên Sûryê yên din belav dibin.

### c. Mişextbûna Derveyî:

Ev mişexbûn bi taybetî berve welatên Ewrupayê diçe, nemaze berve Komara Aleman a Federal. Wê goçkirinê, ji destpêka salên şêstî de ji sedsala bîstan dest pê kiriye, û hîn jî berdewam e. Li destpêkê ew mişextî ji bo xwendinê dibû, carina jî ji ber sedemên siyasî dibû. Lê paşê, rewşa aborî bû sedema sereke. Mişextiya derveyî ra dawiya sedsala bîstan bi rengekî fereh û berdewam hebû, lê li roja me, belkî ji ber zagonên hişk ên dewletên Ewrupî be, ew mişextî hinekî kêm bûye.

# Siqbûna şênî li navça Efrînê

Lîsteyên jêrîn /11 û 12/, her du cureyên siqbûnê li Na.Efrînê diyar dikin. **Yek**: Siqbûna **tevahî** û siqbûna **berhemdanî**, li gor hejmara şêniyê navçê yê kutikê nifûsê li dawiya sala 2004an, /lîste 11/. **Didu:** Siqbûna **tevahî** û ya **berhemdanî**, li gor serhejmara navîna sala 2004an, /lîste 12/. Li gor hejmar û serhejmarên ku di wan lîstan de hatine, em kanin pirsa siqbûna rûniştvanan wiha rave bikin, û van encaman jê bigirin:

**a- Siqbûna tevahî:**

- Li gor hejmara kutikê nifûsê ya dawiya sala 2004an, siqbûna giştî ya jimarkî li Na.Efrînê gihîştiye 220.065 kes/km$^2$. Ew jî ji piraniyê berve hindikiyê, wiha li ser deveran belav dibe:

1.Efrîn. 2.Bilibil. 3.Reco. 4.Mabeta. 5.Şiyê. 6.Cindirês. 7.Şera.

- Lê li gor serhejmara sala 2004an, siqîtiya berhemdaniyê/rastînkî gihîştiye 84.64 kes/km$^2$. Ew jî ji piraniyê berve hindikiyê wiha li ser deveran belav dibe:

1.Efrîn. 2.Cindirês. 3.Şiyê. 4.Reco. 5.Bilibil. 6.Mabeta. 7.Şera.

**b- Siqbûna berhemdanî**:

- Li gor hejmara kutikê nifûsê li dawiya sala 2004an, siqbûna berhemdanî li navçê 3.514 kes/hêktar bû.

- Li gor encamên serhejmara sala 2004an li navçê, siqîtî digihê 1.355 kes/hêktar. Bi tevahî, dûverêziya siqbûna rûniştvanan li deverên navçê, van tiştan diyar dike:

**1.** Li deverên çiyayî, wek Mabeta, Bilbil û Reco, siqbûn dadigere, ji ber ku rûberên çandinê teng in, û ava avdanê tineye, ew jî rê nadin ku çandin fere bibe, û bi şêweyekî nûjen û siq were kirin.

**2.** Li deverên Başûr û Başûr Rojava, wek Efrîn, Cindirês û Şiyê ku kendûkorên xwe dûz in, xak şov e û ava avdanê peyda dibe, siqbûna hebûna mirovan bilind dibe.

**3.** Beşê mezin ji cihlivînê, di warê mişextbûna Hundirîn de çê bûye, ji ber ku şêniyê gundên deverên çiyayî, warên xwe yên kêmberhem û kêmxizmet hêştine û jê bar kirine. Li bervajî wê, şêniyê deverên Başûr û Rojava, li gundên xwe mane, yan jî ji gundên xwe derketine û li bajarokên deverên nêzîk rûniştine.

| Dûverêziya deveran li gor siqbûna şênî | Tevahiya tomarkiriyan | Rûbera tevahî $km^{٢}$ | Siqbûna tevahî $kes/1km^2$ | Rûbera tevahî ya hêjayê çandinê ye li navçê | Siqbûna berhemdanî Kes/hêktar |
|---|---|---|---|---|---|
| **Efrîn-navend** | ١٣٣٠٩٠ | ٣٧٧,٧٦ | ٣٦٢,١ | | |
| **Bilbil** | ٥٠٢٠٥ | ٢٢٩,٩٥ | ٢٢٤,٩ | | |
| **Mabeta** | ٥٢٥٣٦ | ٢٤٥,٧٤ | ٢٢٠,٤٦ | | |
| **Reco** | ٦٩٣١٧ | ٣٥٢,٣٥ | ٢٠١,٨ | | |
| **Cindirês** | ٦٠٦٢٢ | ٣٢٥,١ | ١٩٥ | | |
| **Şiyê** | ٢٩٦٢٩ | ١٦٥,٥ | ١٨٢,٨ | | |
| **Şera** | ٥٠٨٩٤ | ٣٣١,٣٥ | ١٥٧,٧٦ | | |
| **Tevahî** | ٤٤٦٢٩٣ | ٢٠٢٧, ٧٥ | ٢٢٠,٠٦ ٥ | ١٢٧٠٠٠ **h** | ٣,٥١٤**kes/h** |

**Cedwle -11- Siqbûna şênî li gor hejmara kutikê nifûsê li dawiya sala 2004an, (siqbûna jimarkî).**

| Dûverêziya deveran li gor siqbûna şênî | Serhejmara rûniştvanan | Rûbera tevahî $km^{٢}$ | Siqbûna tevahî $Kes/1km^2$ | Rûbera tevhî ya çandinê li navça Efrînê | Siqbûna berhemdanî Kes/Hêktar |
|---|---|---|---|---|---|
| **Efrîn-navend** | ٦٥٢٣٨ | ٣٧٧,٧٦ | ١٧٢,٥٩ | | |
| **Cindirês** | ٣٢٤٦٧ | ٣٢٥,١ | ٩٩,٨٩ | | |
| **Şiyê** | ١٣٨٧١ | ١٦٥,٥ | ٨٣,٥٦ | | |
| **Reco** | ٢١٦٩٢ | ٣٥٢,٣٥ | ٦١,٦٢ | | |
| **Bilbil** | ١٢٨٣٦ | ٢٢٩,٩٥ | ٥٥,٨٠ | | |
| **Mabeta** | ١٢٣٥٩ | ٢٤٥,٧٤ | ٥٠,٢٣ | | |
| **Şera** | ١٣٦٣٢ | ٣٣١,٣٥ | ٤١,١٨ | | |
| **Tevahî** | ١٧٢٠٩ | ٢٠٢٧,٧٥ | ٨٤,٨٦ | ١٢٧٠٠٠ **h** | **kes/h** ١,٣٥٥ |

**Cedwel -12- Siqbûna şênî li gor serhejmara 2004an (siqbûna rastînkî).**

# Lêkolîna Sêyem

## Birkirinên Kargêrî li Navça Efrînê

Emê di cedwelên jêrîn de, /cedwel 13/, navên her bajarekî, bajarokekî, gund û gundikekî, ango her wargehekî şên li Na.Efrînê û li deverên wê hewaldin, navê her şêngehekê dê bi rengan were nivîsandin: **Kurmancî** wekî ku gel bi kar tîne, û bi **Eerbî** wekî ku li serdema Osmanî dihat nivîsandin. Emê li ber her şêngehekê jî du hejmaran dînin, **yek:** Jimara serhejmara rojên 13 û 14 meha Tebaxa sala 2004an, **ya din jî**: Jimara şênî li gor kutikê nifûsê li dawiya sala 2004an:

### 1 . Devera Navend – Efrîn

| **Hejmara şênî li dawiya sala 2004an** | | **Navê gund ê gelêrî** | **Binavkirina Osmanî/ *binavkirina Erebkirî*** | |
|---|---|---|---|---|
| **Kutikê Nifûsê** | **Serhejmar** | | | |
| ٣٩٢٥ | ١١٤٢ | Bênê | أبين | ١ |
| ٤٣٢٢ | ٨٧٩ | 'Inabkê | أناب | ٢ |
| ١٧٥٧ | ١١١٦ | Îska | إسكان | ٣ |
| ٢١٨٧ | ١٦٤ | Bablîtê | بابليت | ٤ |
| ٤٠٥٠ | ٢٣٨٩ | Basûtê | باسوطه | ٥ |
| ٢٨٧٥ | ٥١٢ | Basilê | باصلحايا | ٦ |
| ٢٠١٤ | ٩٠١ | Basûfanê | باصوفان | ٧ |
| ٨٦٢ | ٦٢٦ | Bi'iyê | باعي | ٨ |
| ٢٧٥ | ٥٤ | Pitêtê | بتيته | ٩ |
| ١٣٢٥ | ١٢٢٩ | Beradê | براد | ١٠ |
| ٩١١ | ٦١٦ | Birc Ĥêderê | برج حيدر | ١١ |
| ١٩٠٨ | ١٢٢٤ | Bircê | برج عبدالو/ *برج عبدالله* | ١٢ |
| ١١٢٣ | ٢١١ | Tirtewîlê | تل طويل | ١٣ |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ٧٨٨ | ٢٠٠ | Tilifê | تلف | ١٤ |
| ١٠٥ | ؟ | Cidêdê | جديدة / *جديدة كرسانه* | ١٥ |
| ١٥١١ | ٤٦١ | Cilbirê | جلبل | ١٦ |
| ٤٥٦ | ٢٨ | Cûmkê | جومكه / *الجميله* | ١٧ |
| Ne şên e | | Şêx Seydo(Seydî) | شيخ سيدي(شيخ سيدو) | ١٨ |
| ٥٣٦٠ | ١١٣١ | Coqê | جويق / *الخضراء* | ١٩ |
| ٢٥٦ | ٢٦ | Xalta | خالتان / *خالديه* | ٢٠ |
| ١٣٨٢ | ٦٥٤ | Xurêbkê | خربة الحياة | ٢١ |
| ١١٦٨ | ١٢٢ | Xelnêrê | خلنير / *النيرة* | ٢٢ |
| ١٠ | Ne şên e | Rotenk? | روتنك | ٢٣ |
| ٤٠٨ | - | Zêdiyê | زيادية | ٢٤ |
| ١٨٢٨ | ١٠٠٩ | Zaretê | جتل زيارة/ *الزيارة* | ٢٥ |
| ٦٧ | Ne şên e | Şehrenlî? | شهرانلي | ٢٦ |
| ٦٦٥ | ٣٨٣ | Mezre'ê | شوارغة الأرز | ٢٧ |
| ٣٥٢ | ١٠٩٥ | Şewarxa | شوارغة الجوز | ٢٨ |
| ١٢٥٩ | ٧١٤ | Şadêrê | شيح الدير / *شيخ الدير* | ٢٩ |
| ٩١١ | ٣١١ | Soxĝanekê | صوغانة / *البصليه* | ٣٠ |
| ٣٢٥١ | ٧٠٦ | Turindê | طرندة / *الظريفه* | ٣١ |
| ٤٦٠٣١ | ٣٦٥٦٢ | Efrîn | عفرين | ٣٢ |
| ٣١٠٧ | ١٠٤٠ | Aqîbê | عقيبه | ٣٣ |
| ٥٧٣ | ٢٤٨ | Endarê | عيندارة | ٣٤ |
| ٥٣٤ | ٥١ | Gazê | غازي تبه / *تل غازي* | ٣٥ |
| ٢٠٨٦ | ١٤١٣ | Xezîwê | غزاويه | ٣٦ |
| ٧٠٣ | ٥٠٧ | Fafirtîn | فافرتين | ٣٧ |
| ٣٤٦٠ | ١٥٤٨ | Kurzêlê | قرزيحل | ٣٨ |
| ٦٠٢٠ | ٧٤٣ | 'Eşqîbar/Qîbarê | عرشقيبار / *الهوى* | ٣٩ |
| ٩٢٠ | ٥٨٣ | Kîbêşînê | كباشين | ٤٠ |
| ١٢٩ | Ne şên e | Kersanê | كرسانة (كرسنطاش) | ٤١ |
| ٢٧٣ | ٦٣ | Keferbetrê | كفر بطرة | ٤٢ |
| ١٢١٢ | ٧٢٧ | Keferzîtê | كفر زيت / *كفرزيد* | ٤٣ |
| ٩٧٢ | ٢٧١ | Keferşîlê | كفر شيل | ٤٤ |
| ٤٢٦ | ؟ | Kefermizê | كفر مز | ٤٥ |
| ١٣٦ | ؟ | Kefernebo | كفر نبو | ٤٦ |
| ١٤٢٤ | ٢٨٢ | Keferdelê jêrin | كفردلي تحتاني | ٤٧ |
| ١٦١٠ | ١٩٨ | Keferdelê jorin | كفردلي فوقاني | ٤٨ |
| ٥٥٥ | ٢١٣ | Kifêrê | كفير | ٤٩ |
| ٧٧٤ | ١٠٩ | Gu. Mezin | بيوك أوبة / *الكبيرة* | ٥٠ |
| ١٣٥٠ | ١٧٣ | Kokebê | كوكبة | ٥١ |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ٢١٣١ | ٦٦٠ | Kîmarê | كيمار | ٥٢ |
| ٦١٦٩ | ٨١٠ | Mêremînê | مريمين | ٥٣ |
| ٤٥٥٨ | ١١٣٤ | Maratê | معراته | ٥٤ |
| ٦٢٦ | ؟ | Me'riskê | معرسة الخطيب | ٥٥ |
| ؟ | ؟ | Gu.Astêr | استارو / *المستورة* | ٥٦ |
| | Warên ne şên | 'Endîbê | عين ديبة | ٥٧ |
| | | Dêrmişmiş | ديرمشمش | ٥٨ |
| | | Keferlab | كفرلاب | ٥٩ |
| | | Keferbelê | كفربله | 60 |
| | ؟ | Zirêgatê | زريقات | 61 |
| | | Gobekê | كوبله | 62 |
| | Ev gund li sala 1975an bi ser navça Ezazê ve xistin | Bircilqazê | ١- برج القاص (برج القاز) | ٦٣ |
| | | Gu.Mezin | ٢- زوق الكبير | ٦٤ |
| | | Başemrê | ٣-باشمرة | ٦٥ |
| | | Kilotê | ٤-كيلوته (كلوته) | ٦٦ |
| | | Xirabî Şêx 'Eqîl | ٥-خربة شيخ عقيل | ٦٧ |
| | | Meyasê | ٦-مياسة | ٦٨ |
| ١٣٣٠٩٠ | ٦٥٢٣٨ | **Tevahiya hejmarên rûniştvanên devera Efrîn-Navend** | | |

## 2 . Devera Cindirêsê

| **Hejmara şênî li dawiya sala 2004an** | | **Navê gund ê gelêrî** | **Binavkirina Osmanî/ *binavkirina Erebkirî*** | |
|---|---|---|---|---|
| **Kutikê Nifûsê** | **Serhejmar** | | | |
| ٢١٥ | ؟ | Abû ke'bê Şerqî û Xerbî | أبو كعب شرقي وأبو كعب غربي | ١ |
| ١١٩٨ | ٢٣٩ | Aşkê Şerqî | أشكان شرقي | ٢ |
| ١١٠٦ | ٩٤٧ | Aşkê Xerbî | اشكان غربي | ٣ |
| ٩٩٦ | ٦١٠ | Axcelê | آغجلة / *البياضة* | ٤ |
| ١٥١٦ | ؟ | Baflor | بافللور / *الزهرة* | ٥ |
| ٢٤٤ | ٢٥٧ | Til Ĥemo | تل حمو | ٦ |
| ٧٠٤ | ٥٣٣ | Til silorê | تل سلور | ٧ |
| ١١٧٤ | ٣٤٦ | Çeqelê Cûmê | چقللي جوم/جوم | ٨ |
| ٣٤٧٥ | ٤١٣٩ | Celemê | جلمه | ٩ |
| ٥٢٦ | ؟ | Ĥemêlkê | حميلك / *جميل* | ١٠ |
| ١٠١٩٢ | ١٣٦٦١ | Cindirês | جنديرس | ١١ |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ٤٤٨ | ١٤٣ | Çobana | چوبانلي/ *جوبان* | ١٢ |
| ١٥٠٢ | ٢٥٦ | Çolaqa | چولقان / *جلق* | ١٣ |
| ١١٢٣ | ٣٩١ | Ĥec Îskenderê | حاج اسكندر | ١٤ |
| ١٣٦١ | ٣٢٠ | Ĥec Ĥesna | حاج حسنلي/ *حاج حسن* | ١٥ |
| ١٣٧٨ | ؟ | Ĥecilerê | حاجيلر/ *الحجاج* | ١٦ |
| ٢٩٥٤ | ٨٤٨ | Ĥemamê | حمام | ١٧ |
| ١١٥٩ | ؟ | Xeltê Şerqî | خالطان شرقي | ١٨ |
| ٩٤٧ | ٣٣٥ | Xeltê Xerbî | خالطان غربي | ١٩ |
| ٦٨٨ | ٧٠ | Xerza | خرزان | ٢٠ |
| ٧٤٢ | ٤٦٥ | Dêrbelûtê | دير بلوط | ٢١ |
| ٣٩١ | Ne şên e | Dêwê Jêrin, Dêwê Ĥoko | ديوان تحتاني | ٢٢ |
| ٥٨٢ | ٢٠٨ | Dêwê Jorin | ديوان فوقاني | ٢٣ |
| ٧٨٣ | ٧٥٩ | Remadiyê | رماديه | ٢٤ |
| ٦٨٧ | ؟ | Remedena | رمضانلي/ *رمضان* | ٢٥ |
| ٣٦ | ؟ | Zelaqê Şerqî û Xerbî | زلاقة شرقي وغربي | ٢٦ |
| ٣٤٢ | ؟ | Sifriyê | سفرية | ٢٧ |
| ٥٥٦ | ١٣٤ | Sindiyankê | سنديانكي/ *زندة* | ٢٨ |
| ١٥٠٤ | ١١٢٠ | Firêriyê | فريرية | ٢٩ |
| ١٦٦٦ | ٢٧٥ | Feqîra | فقيران/قره باش، *الرأس الأسود* | ٣٠ |
| ١١٨٢ | ٦٣٥ | Qujûma | قوجه مان / الضخم | ٣١ |
| ٢٨٠ | ؟ | Qurbê | قوربة | ٣٢ |
| ٥٣٩ | ؟ | Qîlê | قيلة | ٣٣ |
| ١٠٢١ | ٢٤٧ | Ke'nêgewrikê | شيخ عبدالرحمن | ٣٤ |
| ٢٢٤٢ | ٣٥٨ | Gewrika | كاوركان/ *الفسحة* | ٣٥ |
| ٤٠٢٩ | ٢١٥٠ | Kefersefrê | كفر صفرة | ٣٦ |
| ٦٢٧ | ٨٩ | Bircikê | كموش برج/ *برج كوش* | ٣٧ |
| ١٨٦٩ | ٧٢٤ | Kora | كوران | ٣٨ |
| ١٣٢٨ | ١١٤ | Gorda | كوردانلي/ *كوردان* | ٣٩ |
| ٣١٢ | ؟ | Mehmediyê Şerqî û Xerbî | محمدية شرقي وغربي | ٤٠ |
| ٣٨ | Ne şên e | Medaya | مدايا | ٤١ |
| ٧٢٦ | ? | Merwanê Jêrin | مروانة تحتاني | ٤٢ |
| ٥٧٢ | ١٢٢٢ | Merwanê Jorin | مروانة فوقاني | ٤٣ |
| ١٣٧٦ | ٥٦٩ | Miskê jorin û jêrin | مسكة فوقاني وتحتاني | ٤٤ |
| ٥٤٧ | ٩٥ | Mile Xelîla | منلا خليل/ *شيخ خليل* | ٤٥ |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ٩٩٠ | ٢٠٨ | Nisriyê | نسرية | ٤٦ |
| ١٠٦٠ | ؟ | Ĥêkiçê | هيكچه / بدر | ٤٧ |
| ١٦٨٩ | ؟ | Yalanqozê | يلانقوز/ *الريحان* | ٤٨ |
| ؟ | ؟ | Tetera | تاتارانلي / *تاتار* | 49 |
| Ne şên in | | Gu.Fîlik | فيلك | 50 |
| | | 'Elemdar | علمدار | 51 |
| | | Çamli bêl | جاملي بيل | 52 |
| | ؟ | Qulkê, Gu.'Elûş | قلكي | 53 |
| | Tek malek lê rûdine | Zareta Şêx Ebdirehmên | زيارة شيخ عبدالرحمن | 54 |
| | Ketiye nava Cinirêsê | Rif'etiyê | رفعتية | 55 |
| | ؟ | Ĥesîrkê | حسيركي | 56 |
| ٦٠٦٢٢ | ٣٢٤٦٧ | **Tevahiya hejmarên rûniştvanên devera Cindirêsê** | | |

## 3 . Devera Şiyê

| **Hejmara şênî li dawiya sala 2004an** | | **Navê gund ê gelêrî** | **Binavkirina Osmanî/ *binavkirina Erebkirî*** | |
|---|---|---|---|---|
| **Kutikê Nifûsê** | **Serhejmar** | | | |
| 2392 | 1184 | Erendê | أرندة / *المزينة* | 1 |
| 2007 | 1299 | Anqelê û Xirabê Anqelê | أنقلة وخربة انقله | 2 |
| 161 | ? | Baziya | بازيانلي / *البازية* | 3 |
| 668 | 298 | Çeqelê Jêrin | چقاللي تحتاني/ *وادي الثعالب* | 4 |
| 548 | ? | Ĥec Bilal | حاج بلال | 5 |
| 1438 | 487 | Gu. Xelîl | خليل كولكو / *الوردية* | 6 |
| 2051 | 565 | Tirmûşa | درمشكانلي/ *درمش* | 7 |
| 1010 | 411 | Çeqelê ،Gu.Xelê Me'mikêÇeqelê Jorin | سعولجك / *السهلية* | 8 |
| 2670 | 1308 | Senarê | سنارة | 9 |
| 9558 | 5063 | Şiyê | شيخ الحديد | 10 |
| 1508 | 497 | Çeqelê Mamedê | شيخ چقاللي، چقاللي/ *تل الثعالب* | 11 |
| 1328 | 573 | Alkana | ساتي أوشاغي/ *الصاتي* | 12 |
| 2659 | 1502 | Qermîtliq | قره متلق / *الخزفية* | 13 |
| 219 | ? | Kela | كلانلي / *الملساء* | 14 |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 553 | 291 | Mistika | مستكانلي/ *مستكان* | 15 |
| 859 | 393 | Şiketka | مغارجق / *مغار* | 16 |
| Ne şên e | | Xirabî Baziya | خربة بازيانلي/ *خربة البازية* | 17 |
| **29629** | **13871** | **Tevahiya hejmarên rûniştvanên devera Şiyê** | | |

## 4. Devera Mabeta

| **Hejmara rûniştvana li saa 2004an** | | **Navê gelêrî** | **Navên Osmanî/ *Navên Erebkiriî*** | |
|---|---|---|---|---|
| **Kutikê Nifûsê** | **Serhejmar** | | | |
| ٧٩٠ | ٤٧٣ | Avraz | أبرز | ١ |
| ٦٣٧ | ٢٥٠ | 'Emara | أنبارلي / *أنبار* | ٢ |
| ٣٩٧٠ | ٨٧٦ | Kaxrê | إيكي آخور / *ياخور* | ٣ |
| ٥١٣ | ؟ | Gu.Ĥeyatê | الحياة | ٤ |
| ١٩٢٨ | ٣٧٥ | Brîmce | برمجه / *برماجه* | ٥ |
| ٢٣٥ | ؟ | Çomezna | جومازانلي / *البلوطيه* | ٦ |
| ٥٦٧ | ٨٤ | Ḣec Qasma | حاج قاسملي/ *حاج قاسم* | ٧ |
| ٧٩٨ | ١٢٩ | Ḣemlorik Gu.Ĥebo | حملورك / *الدفلة* | ٨ |
| ٦٤٨ | ١٦٠ | Reca | حمو راجو | ٩ |
| ٨٤٣ | ؟ | Xaziyanê Jêrin | خازيان تحتاني | ١٠ |
| ٦٤٦ | ؟ | Xaziyanê Jorin | خازيان فوقاني | ١١ |
| ٢٩٩٥ | ٤٢٤ | Dargirê | داركير / *دار كبير* | ١٢ |
| ٤٢٥ | ؟ | Dela | داليانلي / *الداليه* | ١٣ |
| ٩٩٠ | ؟ | Şêtana | شيطانلي / رحمانيه | ١٤ |
| ٧٤٤ | ٢٠١ | Rûta | روطانللي / المعزولة | ١٥ |
| ٤٨٢ | ؟ | Gu.Selo | سلو / مزرعة*السليمان* | ١٦ |
| ٩٢٨ | ٤٥٧ | Sêmalka | سيمالك / *السمال* / السحال | ١٧ |
| ٧٨٠ | ٥٣٦ | Sêwiya | أوكسوزلي / *اليتيمه* | ١٨ |
| ١١٢٤ | ٢٦٦ | Gu. Şorbe | شوربة أوغلي / *الشوربة* | ١٩ |
| ٧٢٣ | ٨٢ | Şêx Kêlê | شيخ كيلو / *الشيخ الأقرع* | ٢٠ |
| ٩٦٩ | ٥٢٩ | Şêxûtka | شيخ هيتكو / *الشيخاني* | ٢١ |
| ١٣٥٠ | ٣٤٥ | Şîtka | شيركانلي / *شيركان* | ٢٢ |
| ٩٥٥ | ١٨١ | Satiya | صاتيانلي / *العطية* | ٢٣ |
| ١١٤١ | ؟ | Sariya | صاري أوشاغي/ *الصفراء* | ٢٤ |
| ٣١٨٦ | ٢١٨٩ | 'Ereba, Erebê Ĥemşelek | عرب أوشاغي/ *أولاد العرب* | ٢٥ |
| ٣٨١ | ؟ | 'Ereb Şêxo | عرب شيخو / *شيخ العرب* | ٢٦ |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ١٢٩٧ | ؟ | Mala Sîno, Goçera, Gu.Omo | عين الحجر غربي | ٢٧ |
| | ؟ | Mala Xelî Pîrê | عين الحجر وسطى | ٢٨ |
| ؟ | | 'Ên Ĥecer Şerq | عين الحجر شرقي | ٣٠ |
| ١٢٥ | ؟ | Qitraniyê | قطرانلي / *قطران* | ٣١ |
| ١٨٩٥ | ؟ | Qenterê | قنطرة | ٣٢ |
| ٢٦٤٧ | ٨٥٨ | Gemrûkê | گمروك / *الجمركية* | ٣٣ |
| ١٣٢٥ | ؟ | Gobekê, Gulîka | گوبك / *الصرة* | ٣٤ |
| ٩٠٩ | ١٧٨ | Kurkê Jêrin | كوركان تحتاني/*الظاهرة التحتانية* | ٣٥ |
| ١٣٧٠ | ٢٠٨ | Kurkê Jorin | كوركان فوقاني/ *الظاهرة العليا* | ٣٦ |
| ٢٠٤١ | ١٣٠ | Kokanê Jorin | كوكان فوقاني / *الجزرونية* | ٣٧ |
| ؟ | ؟ | Kokanê Jêrin | كوكان تحتاني/*الجزرونية التحتانية* | ٣٨ |
| ٣٣٤ | ٨٩ | Kêl Îbo | كيل إيبو / *مزرعة الأقرع* | ٣٩ |
| ٥٠٠ | ١٤٩ | Mist'eşûra | مستو عاشور/ *عاشور* | ٤٠ |
| ٧٤٢٤ | ١٩٤١ | Mabeta | المعبطلي | ٤١ |
| ٩٧٣ | ٢٩٤ | Me'serkê | معصرجق / *المعصرة* | ٤٢ |
| ٢٩٤٨ | ٩٥٥ | Mîrka,Gundî Ĥusê, Ĥemtato | ميركان / *الأميرية* | ٤٣ |
| ؟ | | Xirabê Rûtê | روطو / المنعزلة | ٤4 |
| | | Birka | قشلة (بركة) | ٤٥ |
| | | 'Elcara | علي جارو | ٤٦ |
| **٥٢٥٣٦** | **١٢٣٥٩** | **Tevahiya hejmarên rûniştvanên devera Mabeta** | | |

# 5. Devera Reco

| **Navê Osmanî/ *Navê Erebkirî*** | | **Navê gelêrî** | **Hejmara rûniştvana li saa 2004an** | |
|---|---|---|---|---|
| | | | **Serhejmar** | **Kutikê Nifûsê** |
| 1 | أده مانلي / *اده* | 'Edema | 313 | 1117 |
| 2 | بانيك / *بان* | Banîkê | ? | 396 |
| 3 | بربند | Berbenê | 234 | 1570 |
| 4 | بعدنلي/ *بيت عدين* | Be'dîna | 2722 | 5146 |
| 5 | بلاليكو / *بلاليه* | Bilêlko | 642 | 1981 |
| 6 | تبه كوي / *تليلة* | Gazê | ? | 697 |
| 7 | چتال قويو / *البئرين* | Gu.Qêsim | 311 | 1675 |
| 8 | چرختلي/ *المسنة* | Çerxûta | 20 | 344 |
| 9 | چقمق كبير / *صوان كبير* | Çeqmaqê Mezin | 630 | 3215 |
| 10 | چقمق صغير / *صوان صغير* | Çeqmaqê Çûçik | 109 | 682 |
| 11 | جقلمه / *جلقمه* | Gu.Çêqilme | 172 | 229 |
| 12 | جنجلي / *جنجلة* | Çençeliya | 344 | 1317 |
| 13 | جيلانلي / *الغزلان* | Cela | 154 | 903 |
| 14 | طاغ أوبه سي / *الجبليه* | Gu. Çiyê | 133 | 852 |
| 15 | چوبانلي / *الراعي* | Çobana | 115 | 544 |
| 16 | حاج خليل | Ĥec Xelîl | 626 | 3968 |
| 17 | حجمانلي / *حجمان* | Ĥucemala | 131 | 730 |
| 18 | حاجيكانلي / *الحجيج* | Ĥecîka | 319 | 379 |
| 19 | حسن كلكاوي/ *الحسينية* | Gu. Ĥesen | ؟ | 529 |
| 20 | حمشلك / *حمشو* | Gu.Qopê Ĥemşelekê | 525 | 1582 |
| 21 | درويش أوبه سي/ *الدرويشية* | Gu. Dêwrîş | 282 | 1022 |
| 22 | دومبللي / *الأمسية* | Dumilya | 856 | 2098 |
| 23 | راجو | Reco | 3122 | 4040 |
| 24 | زركانلي / *الطله* | Zerka | 213 | 767 |
| 25 | سورك / *سور* | Sorkê | ? | 89 |
| 26 | سيمالك راجو / *الثلاثية* | Sêmala | 442 | 2576 |
| 27 | شديانلي/ *الشديان* | Şediya | 193 | 415 |
| 28 | شيخ بلال (مزرعة) | Şêx Bila | ? | 419 |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 29 | شيخلر أوبه سي / الشيوخ | Gu. Şêx | 112 | 557 |
| 30 | شيخ محمدلي / شيخ محمد | Şêx Mihemed | 716 | 993 |
| 31 | ضوضو | Dodo | 186 | 1688 |
| 32 | عطمانلي / عطمان | 'Etmana | 375 | 2010 |
| 33 | علمدار / علم دار | 'Elendara | 174 | 785 |
| 34 | عمر اوشاغي / عمر | 'Umera | 524 | 1002 |
| 35 | علي بسكي / العلياء | 'Elbîskê | 43 | 535 |
| 36 | قره بابا / السوده | Qere Baba | 256 | 920 |
| 37 | قوده كوي / المرتفعة | Gu. Qude | 675 | 1756 |
| 38 | كاونده / البتراء | Gewenda | 808 | 2624 |
| 39 | كري / النصر | Kurê | ? | 474 |
| 40 | كمرش / الطاقية | Kum Reşê | 392 | 670 |
| 41 | كورانلي /كوران | Kûra | 203 | 947 |
| 42 | كوسانلي / كوسان | Kosa | 292 | 1053 |
| 43 | كوليان فوقاني / ضحاك فوقاني | Goliyê Jorin | 85 | 702 |
| 44 | كوليان تحتاني /ضحاك تحتاني | Goliyê Jêrin | 177 | 521 |
| 45 | ماملي / الثدي | Memala | 392 | 1778 |
| 46 | ماسكانلي /ماسيكان | Maseka | 424 | 2023 |
| 47 | معمل اوشاغي/ المعامل | Me'mila | 1359 | 3428 |
| 48 | موسيك اوبه سي/ موسيه | Gu. Mûskê | 359 | 2551 |
| 49 | ميدان اكبس/ الميدان | Stesûnê, Meydan Ekbez | 1302 | 1166 |
| 50 | هوبكانلي / القادرية | Hopka | ? | 652 |
| 51 | هوليلو / هليل | Holîlê | 153 | 801 |
| 52 | واليكلي / الولي | Welîklî | ? | 399 |
| 53 | بنيرك / بندرك | Penêreka | 77 | ٧٣١ |
| 54 | حيدراوبه سي / الحيدرية | Gu.Ḧeyder, 'Eltaniya | ؟ | |
| 55 | جعنكلي / النقشة | Çe'inka | | |
| 56 | خراب سلوك / السلوك | Xirabî Silûg | Ne şên in | |
| 57 | عربلي / عروبة | 'Ereblî | | |
| 58 | قسطل | Qestel | | |
| 59 | فرفريك تحتاني / فرفرة تحتاني | Firfirkê Jêrin, Şêx Evdal | ؟ | |
| 60 | فرفريك فوقاني / فرفرة فوقاني | Firfirkê Jorin | | |
| 61 | تل كاشور | Tilî Kêşûr | | |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 62 | *أرض الدولة* | Erdê Dolê | Ne şên in | |
| 63 | خراب قوالي | Xirabî Qewala | | |
| 64 | خراب مجيد | Xirabî Mecîd | | |
| 65 | خراب سماق | Xirabî Simaq | ؟ | |
| **Tevahiya hejmarên rûniştvanên De.Reco** | | | **21692** | **69317** |

# 6. Devera Bilbilê

| **Hejmara rûniştvanan li sala 2004an** | | **Navê gelêrî** | **Navên Osmanî/ *Navên Erebkirî*** | |
|---|---|---|---|---|
| **Nifûsê** | **Serhejmar** | | | |
| ٨٧٢ | ٣٦٨ | 'Ubila | أبل أوشاغي / *أبل* | ١ |
| ٦٩٠ | ٧٥ | Gu. Bêxçe | باقچة قوناق / *باقجه* | ٢ |
| ١٠٤٠ | ٨٨ | Baliya | بالي كوي / *بالي* | ٣ |
| ٤٢٣ | ؟ | Berkaşê | بركشلي / *بركشة* | ٤ |
| ١١١٢ | ١٤٣ | Gu.Bêkê | بك أوبة سي / *أوبه* | ٥ |
| ٤٥٩٢ | ١٧٤٢ | Bilbilê | بلبل | ٦ |
| ١٢٦٧ | ٣٤٧ | Bîbaka | بيك أوشاغي / *الطفلة* | ٨ |
| ١٤٣٨ | ١٥٨ | Gu. Bêlê | بيلان كوي / *بيلان* | ٩ |
| ١٨٩٣ | ٥٩٦ | Ĥesen Dêra | حسن ديرلي/*دير حسن* | ١٠ |
| ٢٥٤٥ | ٨١٠ | Xidiriya | خضريانلي / *خضر* | ١١ |
| ٢٠٦٢ | ٤٢٣ | Xelîlaka | خليلاك أوشاغي/*الخليل* | ١٢ |
| ٨٥٠ | ٣٦١ | Gundî Dîkê | ديك أوبه سي / *الديك* | ١٣ |
| ١٥٦٩ | ؟ | Ze'rê | زعري/*زعرة* | ١٤ |
| ٧٦٢ | ٢٠٦ | Si'iriya | سعريانلي، سعركانلي/*المسعرة* | ١٥ |
| ١٠٧٢ | ١٨٩ | Şêrqiya | شرقانلي / *شرقان* | ١٦ |
| ٦٧٩ | ٢٦٣ | Şingêl | شنكيل / *شنكل* | ١٧ |
| ٢٦٥٧ | ٤٧٨ | Şêxorz | شيخ خورز (خوروس) | ١٨ |
| ١١٠٢ | ١٧٣ | Gu. Kerê | صاغر أوبه سي/*صاغر* | ١٩ |
| ٣٢٩٩ | ٦٩٣ | Xilalka | صولاقلي / *المروية* | ٢٠ |
| ٥٦٣ | ٤١٥ | 'Ebûdanê | عبودان | ٢١ |
| ٥٩١ | ١٩٣ | 'Eşûnê | عشونة /*عشاني* | ٢٢ |
| ٣٥٩ | ؟ | Zivingê | زفنك / مزرعة *عشاني* | ٢٣ |
| ٦٩١ | ٢٢٤ | 'Elî Kera | عليكار / *علي الأطرش* | ٢٤ |
| ٢٤٠٥ | ٢٦٤ | 'Uga | عوكانلي / *عوكان* | ٢٥ |
| ١٨٩ | ؟ | Qarşiqa | قارشق | ٢٦ |
| ٦٤١ | ١٢٦ | Qaşa | قاش أوغلي / *الحاجب* | ٢٧ |
| ٨٣٣ | ٢٦٨ | Qizilbaşa | قزلباش/*الرأس الأحمر* | ٢٨ |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ١٣٠٥ | ٢٠١ | Qorta | قورت أوشاغي/ *هوزان* | ٢٩ |
| ١٣٩١ | ٣٧١ | Qornê | قورنة | ٣٠ |
| ٢٢٦٥ | ٥٩٢ | Qiri Golê | قوري كول / *اليابسة* | ٣١ |
| ٢١٣١ | ٣٧٣ | Qota | قوطانلي / *قوطان* | ٣٢ |
| ٢٢٨٧ | ٦١٦ | Kotana | كوتانلي / *المدلله* | ٣٣ |
| ٧٣٠ | ١٨١ | Kurzêl | كورزيل / *السعيدة* | ٣٤ |
| ١١٩٥ | ٣٥٦ | Kêla | كيلانلي / *السمحة* | ٣٥ |
| ١٦٢ | ؟ | Topelî Meĥmûd | محمود أوبه سي/ *المحمودية* | ٣٦ |
| ٥٣٢ | ١٦٢ | Gu. Kurdo | هاي أوغلي / *العالية* | ٣٧ |
| ٩٠٧ | ٢٠١ | Heyama | هياملي / *النور* | ٣٨ |
| ٣٧٣ | ٨٣٧ | Qestelê Miqdêd | شرقانلي مقداد / مزرعة *شرقان* | ٣٩ |
| ؟ | | Dupîra | دوبيرو / دبير | 40 |
| | | Ĥazira | حاضرو / *حاضر* | 41 |
| | | Çolaqa[1] | جولاقلي / *الاكتع* | 42 |
| | | 'Elî Begê | علي بك | 43 |
| | | Gu.Ĥeftêr | حفتارو | 44 |
| | | Malê Jarê, 'Elcara | علي جارو | 45 |
| | | Cirqa | جرمقانلي | ٤٦ |
| ٥٠٢٠٥ | ١٢٨٣٦ | **Tevahiya hejmarên rûniştvanên De.Bilbilê** | | |

## 7.Devera Şera

| **Hejmara rûniştvanan li sala 2004an** | | **Navê gelêrî** | **Navên Osmanî/ *Navên Erebkirî*** | |
|---|---|---|---|---|
| **Nifûsê** | **Serhejmar** | | | |
| ١٢٥٣ | ١٦٠ | Alciya | آليجي | ١ |
| ١٣٢ | غير مسكونة | Tilîlaqê | تليلاق، الصنوبرية | ٢ |
| ٧٠٨ | ١١٣ | Îkîdamê | ايكي دام / *دامه* | ٣ |
| ٥٩٣ | ١٧٢ | Baflûnê | بافليون | ٤ |
| ٥٥١ | ٦ | Pelûsankê | بللورسنك / *بلورية* | ٥ |
| ٩٣٩ | ٤٢٧ | Çema | چمانلي / *جمان* | ٦ |
| ٥٣٨ | ٣١٠ | Gu. Elkê | حلوبي صغير | ٧ |
| ٣٦١ | ١٠٣ | Ĥilûbiyê | حلوبي كبير | ٨ |
| ٤٠٨٥ | ؟ | Xirabî Şera | خرابة شران | ٩ |
| ٤٢ | غير مسكونة | Dûdêrê | دوديرلي/ *الداودية* | ١٠ |
| ١١٤٦ | ٢٢٦ | Diraqliya | دوراقلي / *دوراقا* | ١١ |

[1] - Gundekî biçûk bi navê "Miĥa li başûrê vî gundî bi dora çend sed mitran heye.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ٣٦٧٣ | ٨٠٧ | Dêrsiwanê | دير صوان | ١٢ |
| ٧٣١ | ٢٣٧ | Dîkmedaşê | ديكمه طاش/ العمود | ١٣ |
| ٨٤٥ | ٢٣١ | Zêtûnekê | زيتوناك / الزيتونة | ١٤ |
| ٧٣٤ | ١٢٩ | Serîncekê | سعرنجك / السعر | ١٥ |
| ٢٧٧٦ | ؟ | Sînka | سنكرلي / سنكري | ١٦ |
| ٢٣٣٢ | ٢٥٩٦ | Şera | شران | ١٧ |
| ٢٦٢ | ١٦٧ | Şîlte'tê | شلتاح | ١٨ |
| ٤١١ | ١٠٢ | Ereb wêranê | عرب ويران/ العروبة | ١٩ |
| ٦٩٩ | ٢٣٣ | Be'rava | علي بازانلي / علي بازان | ٢٠ |
| ٦٣٠ | ٧٣ | Omer Simo | عمر سمو / سيم | ٢١ |
| ٨٩٧ | ٤١٣ | Omera | عمرانلي / العمرية | ٢٢ |
| ٧ | E şên e | Qetlebiyê | قوزلي بيكار / عين الجوز | ٢٣ |
| ٩٦٤ | ٢٧٤ | Gu. Dewrîş | قارقين صغير / القارة | ٢٤ |
| ٣٧٧ | ١٢٨ | Qerqîna | بيوك قارقين/ البستان الكبير | ٢٥ |
| ٥٥٢٧ | ١٢١٥ | Qitmê | قاطمه | ٢٦ |
| ١١٩٩ | ٦٢٥ | Qeredepe | قرة تبة / تل الأسود | ٢٧ |
| ٢٠٩٤ | ٦٤٥ | Qestela Elî Cindo | قسطل جندو / قسطل جند | ٢٨ |
| ٥٢٦ | ٢٠٢ | Qestela Kîşik | قسطل كشك/ القسطل | ٢٩ |
| ٨٥٠ | ٥٤ | Qurtqulaqê Çûçik | قورت قولاق صغير / الديب الصغير | ٣٠ |
| ٢٤٧٨ | ٣٦٠ | Qurtqulaqê mezin | قورت قولاق كبير / الديب الكبير | ٣١ |
| ٦٨٢ | ١٤٤ | Keferomê | كفروم | ٣٢ |
| ٧٥٠ | ٤٥٩ | Serê kaniyê | كفرجنة | ٣٣ |
| ٥٠٤ | ٣٧٠ | Gabeleka | كوبه لك / قطيرة | ٣٤ |
| ٣٤ | ؟ | Kortikê | كورتك/ الحفرة | ٣٥ |
| ١٩٣٤ | ٣٣٦ | Metîna | ماتنلي / الضحى | ٣٦ |
| ٥٣٥ | ٢٦٤ | Mersewa | مرساوا | ٣٧ |
| ٩٩٩ | ٢٨٢ | Meşalê | مشعلة | ٣٨ |
| ٤٧٢٥ | ١٢٨٣ | Meydankê | ميدانكي / الميدان | ٣٩ |
| ١٩٥٩ | ٣٠٠ | Naza | ناز أوشاغي / المحبة | ٤٠ |
| ٤١٢ | ١٨٦ | Wêreganê | ويركان / البياعة | ٤١ |
| ؟ | | 'Elîqîna | جديدة قسطل جندو/جديدة القسطل | 42 |
| | | Yazi bağ[1] | يازي باغ / الكروم | 43 |
| **٥٠٨٩٤** | **١٣٦٣٢** | **Tevahiya hejmarên rûniştvanên devera Şera** | | |

**Lîste -13-**

**Hejmara şênî li deverên Na.Efrînê li sala 2004an. (serhejmar û kutikê nifûsê ji malpera Husso ya Êlêktronî hatine birin)).**

[1] - Li sala 1988an bi ser navça Ezazê ve kirin.

# Lêkolîna Çarem

## Jiyana Aborî
## Li navça Çi.Kurmênc

Ra navîna sedsala bîstan, jiyana aborî ya şêniyê Çi.Kurmênc li ser du stûnên bingehîn radibû, **tîmarkirina sewalan û çandinî**. Û digel ku gelek guhertin di hemî warên jiyana şêniyê Çi.Kurmênc de çê bûne, lê hîn jî ew her du şaxên aboriyê, ji xelkê navçê re wek du çavkaniyên aborî yên sereke ne.

## Çandin

Li serdemên Yûnanî, Romanî û Bîzentî, navça Bakurê Helebê, Çi.Kurmênc jî di nav de, bi çandina darên zêtûn, mêw û cureyên tene navdar bû, û cureyên herî baş ji berhemên tene, zêt û meye ji wan navçan derdihat.

Li dû wê, li dirêjiya sedsalan, dîsa navça Çi.Kurmênc bi çend cureyên çandiniyê dihat nasîn, li serê wan zêtûn dihat.

Dîroknivîsê Helebî Alĝezzî, li destpêka sedsala bîstan wiha gotiye: "Dora du hezar ĥêrên/zeviyên zêtûn û rez, û wek 100 jî baxçeyên darên bi ber ên têvel li Qeza Kilisê hene. Tibabeke mezin ji birincê jî ji Qezê derdikeve û Titûneke zor hêja jî ji devera Cûmê dertê".

Rûbera tevahiya Na.Efrînê 202775 hêktar e. Ew rûber wiha li ser deverên navçê belav dibe, /lîste -14-/:

| **Efrîn-navend** | **Şiyê** | **Cindirês** | **Reco** | **Bilbil** | **Mabeta** | **Şera** | **Tavahî** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| ٣٧٧٧٦ | ١٦٥٥٠ | ٣٢٥١٠ | ٣٥٢٣٥ | ٢٢٩٩٥ | ٢٤٥٧٤ | ٣٣١٣٥ | 202775h |

**Lîste -14- Rûberên deverên Na.Efrînê/hêktar.**

Ew rûber ji hêla çandiniyê de jî du cure ne, beşek ji çandinê re dibe, li dema me bi tevahî tê bikaranîn, beşek jî ji çandiniyê re nabe, ew jî daristan, çiya, wargehên rûniştinê û ji tiştine din re bikar tê.


Ev lîsteyên jêrîn /15 û 16/, rûberên xaka ku tê çandin û ya ku ne tê çandin, û cureyên çandin û bikaranîna wan xuya dikin:

| Zeviyên bejî | | | Zeviyên avî | | | Tevahî |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Tevahî | Bi dar | Sayî | Tevahî | Sayî | Bi dar | |
| ١١٨٠4٠h | ١٠١٢٤٠h | ١٦٨٠٠h | ٧٩١٣h | 3250h | ٤٦٦٣h | **125940 h** |

**Lîste -15- Xaka ku tê çandin/hêktar û çawahiya bikaranîna wê.**

| Gol | Daristan | Mêrg , çêre | Zinar û qûm | Avahî,piroje | Tevahî |
|---|---|---|---|---|---|
| ١١٠٠h | ١٨٧٣٤h | ١٩١٣٨h | ٣٤٥٨٢h | ٣٥٢٦h | ٧٧٠٨٠h |

**Lîste -16- Rûbera ku netê çadin/hêktar û çawahiya wê.**




**Xêzeşêwe-4- Şêweya bikaranîna zeviyan. Amadekirina “Xalid Dîko”.**

## Pirojên çandiniyê li Na.Efrînê

Digel ku gelek tişt û berhemên çandiniyê li Na.Efrînê peyda dibin, lê tu pirojeyên dewletê yên berçav ta van dehsalên dawîn lê ne hatine damezrandin. Ji pirojeyên dewletê yên ku niha hene, ev in:

Li salên heştê ji sedsala bîstan, Oda Helebê ya Çandiniyê sê guvaşxaneyên (mekbezên) zêtê li navçê ava kirin. Li dawiya salên heftê jî ji sed sala bîstan, “bendava gundê 'Eşûnê” ji bo civandina ava baranê hat avakirin. Li sala 2000î jî, dewletê dozdeh lodikên lajwerdî (me'denî) ji bo hilanîna gênim li Bakur Rojavaya bajarê Efrînê li cîgehê Kortikê ava kirin.

Li sala 1984an jî dest bi avakirina bendava Meydankê li ser çemê Efrînê bû.

### 1. Bendava Meydankê:

Li sala 1984an, pirojeya avakirina bendava Meydankê li ber Gu.'Elkê/Ĥilûbiya Biçûk, li ser çemê Efrînê dest pê bû. Niha jî, gavên dawîn ji avakirina erqên sereke û şaxên wan tên avêtin. Hêvî heye, gava ku ew piroje bi dawî bibe, 30 hezar hêktar zevî av bide. Ew pirojeyeke avdanê ye mezin û pir giring e, eger biserkeftî bidawî bibe, û rast bixebite, dê berhema çandina navçê bilindtir bibe, û jiyana xelkê jî baştir bibe. Ji bilî ku, asta ava zêrzemînî jî dê ji nû ve bilind bibe, û kaniyên ku niha miçiqîne wê dîsa derbin.

Ev in hin taybetî û salixên bendava Meydankê: *Motka wê axa sor e, û bi kevirên girs hatiye pêcan. Bilindiya wê 68m in. Pehniya binyata wê 385m in. Pehniya ser wê 10/m in. Dirêjiya asta kevirên girs 983m in. Rûbera devera avrêja çem 1365/km$^2$ in. Dagirtina golê li asta bilind 338.5milyon.m$^3$. Dagirtina tewir bilind 221/milyon/m$^3$. Kanîna xwe ya dagirtinê li asta sergihayî 190/milyon/m$^3$. Dirêjiya golê /11/km, û rûbera golê 9.52/km$^2$ in. Rûbera wê li dema ku di ser re birjê 10.706/km$^2$. Dirêjiya qenala ku digihê Cindirêsê 51/km in, jê 42.3/km servekirî, 8.7/km borî û qenalên sergirtî û tûnêl in. Pênc pire bi dirêjiya 434/m li ser hene. Sêzdeh pireyeyên makînan li ser qenalan bi dirêjiya tevahî 107/m hene. Tibaba herikîna avê di qenala sereke re 17.1/m$^3$/s.*

## 2. Bendava 'Eşûnê:

Ev bendav li ber gundê 'Eşûnê li devera Reco, li ser Ge.Cirqa hat avakirin. Bingeha wê bi zinaran hatiye danîn. Ew ji bo civandina ava baranê û lêmiştan hat avakirin. Bilindiya wê bendavê 30 mitr e. Dirêjî jî di ser pişta bendavê re 340/m e. Tibaba komkirina avê 15milyon $m^3$ in. Rûbera golê 1030/hêktar e. Rûbera devera ku av jê de tê $86km^2$.

Lê belê, ji ber ku zemîna binê devera bendavê tîşbûyî ye, av di golê de kom naba, û zû bi binê zemînê de diçe, ew jî kêmaniyên ku di lêkolînên Zemînasiyê yên devera bendavê de hebûn, tazî dike.

## Berhemên çandiniyê

Li cihên devgeliyan, û li cihên deştî, mîna deşta Cûmê, gelek cureyên tene tên çandin, wek: Genim, ceh, nîsk, nok, silî... û Keskahî û kartol jî tên çandin, nemaze li gundên deşta Cûmê yên li ber perava Çemê Efrînê yê çepê. Garisê zer û sipî, berbero, kuncî û gelek cureyên din jî tên çandin.

Ji berhemên çandiniyê yên tên pêşesazkirin jî: Çelem, pembû û titûn hene. Li dehsala dawîn ji sedsala bîstan, bêtirî sed firneyên ziwakirina pelên titûnê li Gu.Celemê tenê hebûn. Li nîvê yekê ji sedsala bîstan, çeltîk/birinc jî li deştên Lêçe û Ĥemqê dihat çandin.

Tibaba berhemên çandiniyê yên sereke, li gor hatina baranê û rewşa avdanê, sal ji salê cuda dibin. Lê li van pênc salan 1995-2000, navîna tibabên berhemên sereke ên çandiniyê li Na.Efrînê wiha bûn: **Genim**: 30624.5/ton. **Pembû**: 1082/ton. **Çelem**: 55355.83/ton.**Titûn**: 293.17/ton.

## Darên berhemdar

Navça Çi.Kurmênc ji serdema Yûnanî de, bi zêtûn û mêwan navdar e. Li demên nêzîk jî, ew dar li dirêjiya sedsalan li dor gundan, li ser sirtên çiyayî û di devgeliyan de dihatin çandin.

### - Zêtûn:

Ji destpêka sedsala bîstan de, dara zêtûnê bi şêweyekî aborane û fereh tê çandin. Ji wê demê de, piraniya pir ji rûberên deştî û çiyayî ku ji çandinê re lêhatî ne, bi darên zêtûnê hatine dagirtin, ew ji aliyê

rûber, berhemdan, guhdan û karên xelkê de, çandiniya yekê ye û jêdera jiyandinê ya sereke ye. Li gor serhejmara dewletê, li destpêka sedsala bîst û yekê, 12 milyon darên zêtûnê li Na.Efrînê hebûn, çarsêk (3/4) ji wan ên berdar bûn.

Tibaba zêta zêtûnan li salên berdar, digihê 180 hezar ton, li salên din jî digihê dora 50 hezar ton. Tibabeke mezin ji zêtûnên xwarinê yên şîn, reş û 'etûn jî tên der. Ango piştî panzdeh sedsalan ji derbasbûna serdema Alefirngan, dîsa zêta “El Kurdî” ya navça Çi.Kurmênc, navdariya xwe vegerand. Lê belê, di warê firotina zêtê de, çotkar toşî pirsgirêkeke mezin dibin. Ji ber ku firotin û bihaya zêtê dibin darê zagona “bazar û daxwazê” de dimîne. Ew yek jî, pir caran cotkaran dixe bin ziyanên giran.

Zêtûnên navçê li destpêka meha Mijdarê/T2 tên berefkirin, carina jî ra meha kanûnê/K2 dimînin. Berefkirina zêtûnan bi destan tê kirin, karkerên ku beref dikin jî derdora 11% ji berhemê dibin.

- **Rez:**

Berê, piraniya rûberên ku ji bo komirkirinê dihatin rûtkirin, bi şivên mêwan dihatin çandin. Loma jî, rûberên fereh ji zeviyên mêwan li navça Çi.Kurmênc hebûn. Li wan deman, berhemên dara mêwê ji çilo, tirî, mûj, dimsa şêrîn, meye û tiştên din jî ku jê çê dibûn, kar û sermyaneke baş ji çotkaran re tanî. Lê belê li navîna sedsala bîstan, nexwaşiya "wêrana mêwê" peyda bû, û zeviyên fere ji mêwan kavil bûn. Wê hîngê li şûna şiva mêwê, dara zêtûnê hat çandin, û herwiha bû çandiniya sereke li Na.Efrînê.

- **Curene din ji darên berdar:**

Ji bilî mêwê û zêtûnê, curene din jî ji darên bi ber li navça Çi.Kurmênc têne çandin, wek: Bûyîk, sêv, hinar…û hwd. Ew bi hejmar û rûberine baş li gundên deşta Cûmê yên li ber Çi.Lêlûn tên çandin, wek: Turundê, Kurzêlê, Basûtê, Bircê…û hwd. Darên zerdele, gûz û be'îv jî, bi taybetî li devera Xastiya tên çandin. Dara fistiqê jî li devera Şera tê çandin. Dara hejîrê jî, bi tevahî, li nav baxçeyên zêtûnan û li nav rezan tê çandin. Dara simaqê jî bi şêweyekî xwezayî li dora zeviyên çiyayî û li ber geliyan şîn dibe, û berê wê tê firotin. Li her maleke Çi.Kurmênc, ji bo fodilkirinê,

gelek darên regîn tên çandin, nemaze dara tûyê, lê ew bi şêweyekî aborane netên bikaranîn.

Ev e lîstek /lîste 17/ bi hejmara darên berdar, ku li taliya sala 2000î li Na.Efrînê hebûn. Ew serhejmareke fermî ye, lê em bawer dikin ku rastiyê diyar nake:

| Be'îv | Mimiş | Bûyîk | Sêv | Mêw | Hinar | Zêtûn |
|---|---|---|---|---|---|---|
| ٩000 | ٢٢0000 | ٧٠٠٠٠ | ٧٥٠٠٠ | ٢٢٠٠٠٠ | ١,٣ milyn | ١١ milyon |
| **Hejîr** | **Gûz** | **Çiftelî** | **Hurme** | **Xox** | **Fistiq** | **Gilyaz/Kêraz** |
| [1]١٠٠٠ | ٣٠٠٠ | ٣٥٠٠ | ٥٠٠٠ | ٥٠٠٠ | ١٠٠٠٠ | ٥٠٠٠ |

**((Lîste -17- Serhejmara fermî ya darên biber li Na.Efrînê li dawiya sala 2000î))**

Ji dehsalên dawîn de ji sedsala bîstan, dewlet pilanên candiniyê datîne, rûber û cureyên wê ji cotkaran re xuya dike, tov û semad ji bo çandiniyên sereke re mîna, pembû, genim, çelem û zêtûn bi dên dide wan, û tibabek peran jî wek dênekî salane didê.

Dewlet systema gelêrî ya “Komeleyên Cotkaran” bikar tîne. Li dawiya sala 2000î, 180 "komeleyên cotkaran" li Na.Efrînê hebûn. Çardeh "yekîneyên amojkirina cotkariyan" jî li navçê hene, endezyarên çandinê tê de dixebitin, û rê û şêweyên çandina nûjen raberî cotyaran dikin.

Li gor serhejmara “Pevgirêdana Cotyaran” a dewletê li navça Efrînê li dawiya sala 2000î, ev alavên çandiniyê li Na.Efrînê hebûn: 3065 direktor, 105 patoz, 1135 matorên avdanê û 3500 bîrên avê.

[1] - Ez guman dikim ku ev hejmareke hîç şaş e, û ji rastiyê dûr e.

# Xudîkirina Sewalan

Li demên berê, xudîkirina sewalan li Çi.Kurmênc, bingeha aborî û jêdera jiyandinê ya yekê bû, şîr, mast û berhemên wan bingeha xwarin û sermiyana malê bû, ji mû û hiriya sewalan, cil, kinc dihatin çêkirin, ji çermê wan jî hinek pêdviyên malê yên din dihatin pêşesazkirin.

**Pez:** Li gor taybetiyên xaknîgarî yên her devereke navçê, û lêhatina wê ji pergalên her cureyeke pêz re, cureyên pezê ku dihat xudîkirin cida dibûn.

Li deverên navçê yên Bakur, û li gund û daristanên çiyayî, **Bizin** dihatin xudîkirin, nemaze yên Fîlik (gewr û mû dirêj). Li deverên deştî yên Başûr jî, wek deşta Cûmê, ku mêrg û geya lê şîn dibin, xudîkirina **Miyan** bêtir bû. Li Çi.Lêlûn-beşê Şêrewa jî- wekî ku kendûkorên wê dûz û zinarî ne, û geyayên kin lê şîn dibin, dîsa mî, ligel **Mangan**/çêlan dihatin xudîkirin.

Li salên pêncî ji sedsala bîstan, fermana qedexekirina çêrandina bizinan li deverên daristanî derket, ji ber wê yekê hejmara bizinan, nemaze li gundên çiyayî, pir kêm bû. Û piştî ku alavên cotkirinê yên nûjen peyda bûn, zeviyên fere li deverên deştî hatin ajotin û ji bo çandinê hatin vekirin, ew rûberên ku berê li derdora gundan bûn û ne dihatin ajotin, û ji hêla tevahiya gundiyan ve dihatin xebtandin, ew jî hatin ajotin, van guhertinên jorîn, hîştin ku rûberên çêrê pir teng bibin, û hejmara pêz jî pir kêm bibe.

Li dema me, li piraniya gundan bêtirî keriyek pez ne tê dîtin, bi piranî, li her malekê çend serî pez, yan çêlek ji bo bicihanîna pêdviyên malê tên xudî kirin. Lê li Çi.Lêlûn, û ji ber ku hîn hinekî zemîn ji bo çêrê peyda dibe, hejmarên baş ji pêz û çêlan tên xudî kirin, lê belê hejmara wan jî li gor demên berê pir kêm bûye.

**Mange:** Berê, hejmarine baş ji mangan li gelek gundên Çi.Kurmênc hebûn. Piraniya gundan bêtirî naxirekê lê dihat dîtin. Lê li dema me, ew bi şêweyekî tekane, û ji bo bicihanîna pêdviyên malê tên tîmarkirin, li gelek malan berhemên wan ji malê re dibe jêdereke diravî. Li roja me, xudîkirina mangan bi şêweyê berçav li gundên Şêrewa tê dîtin. Du mangexaneyên xudîkirina mangan jî li Na.Efrînê hene, berhemên wan li navçê tê firotin.

**Mirîşk:** Heft mirîşkxane li Na.Efrînê hene, lê ew tenê parekê ji pêdviyên navçê ji goşt û hêkan bicih tînin. Lê mirîşk, carina Qaz jî, li her maleke gundî tên xudîkirin û hinek pêdviyên wan, nemaze ji hêkan bicih tînin.

**Mêşa hunguf:** Sirûşta Çi.Kurmênc heyameke lêhatiye ji bo çêra mêşa hunguf. Loma jî, şênî hejmarine baş ji oĝilên wê tîmar dikin, û li piraniya malên gundî çend Oĝil tên dîtin. Kesin jî hene wan bi şêweyekî aborane tîmar dikin. Lê belê, dermanên ku ji bo qirkirina kurmûkêzên çandiniyê bikar tên, û kêmbûna rûberên çolî û ne ajotî, nahêlin karê perwerdekirina mêşa hunguf bi pêş keve. Lê belê, çotkarên ku endamên “komeleyên cotkaran” bûn, li dawiya sala 2000î, 5372 Oĝilên Mêşa Hunguv li ba wan hebûn.

**Sewalên malane yên yeksim:** Ew li deverên çiyayî ji bo cot û hilgirtina baran tên bikaranîn, wek: Ker, qatir û hesp. Lê piştî ku alavên cotkirinê û barhilgirtinê yên nûjen derketin, hejmara wan sewalan pir kêm bû.

Li piraniya malên gundî, pisîk û kûçik/seg jî hene. Hin kes kevok û kêvroşkan jî tîmar dikin.

Ev e lîstek, /lîste 18/, bi hejmara pêz û sewalên malane li Na.Efrînê, li gor serhejmara fermî ya dawiya sala 1998an.

| Mirşîk | Qatir | Ker | Hesp | Bizin | Mî | Çêl/Mang |
|---|---|---|---|---|---|---|
| [1]٦٧٠٠ | ١٤٦٨ | ٢٤٧٥ | ١٧٦ | ٣٤٢٦٥ | ٦٨٤٧٦ | ٣٥٥٦ |

**Lîste -18- Serhejmara fermî ya sewalan, li sala 1998an li Na. Efrînê.**

[1] - Diyar e ku ev hejmar ne durust e, ji ber ku hejmara rast çend carkî jê bêtir e.

# Pêşesazî

Li dawiya sedsala nozdehan, pêşesaziyeke destanî ye hêja li Qeza Kilisê hebû. Di pirtûka /Memalêk Osmaniye de, rûpel 167/ ku li sala 1904an hatiye çapkirin, hatiye ku 120 çirikên/nol ku bi destan dihatin gerandin hebûn, qumaşên pembî û rîsî pê dihatin ristin. Deh boyexane jî lê hebûn, tê de çermê bi navê “Kosere” dihat çêkirin.

Piştî serdema Osmanî, ew pêşesaziyên biçûk ferehtir bûn, gelek guvaşxaneyên zêtûnan, meyxane jî hatin damezrandin. Ji bilî wan, û li gor peydabûna pêdviyên pêşesaziyê û mercên lêhatî, karxanene din jî li navça Çi.Kurmênc vebûn.

Li dema me, pêşesazî li navçê li ser berhemên ku li navçê tên berhemdan radibe, lê ew pêşesazî tenê qoncekî biçûk ji aboriya Na.Efrînê digire.

Li roja me, pêşesazî û pîşeyên destanî yên sereke ku li navçê hene hev in:

## - Zêta zêtûnan:

Derhênana Zêtê ji pêşesaziyên pir kevin e li navça Çi.Kurmênc. Şûnewarên gelek guvaşxaneyên zêtê ji serdemên berê de li navçê tên dîtin. Li dawiya sedsala nozdehan 72 guvaşxaneyên zêtê li qeza Kilisê hebûn(1). Li roja îro, bêtirî 250 guvaşxaneyên zêtê li Na.Efrînê hene. Karxanek ji bo darivandina “zêta kortê” jî heye, ew jî dora 68 ton zêta xwarinê derdixe.

## - Kirina komirê:

Kirina komirê ji karên kevin e li Çi.Kurmênc. El-Ĝezzî bibîr tîne, ku li serdema Osmanî, komira herî baş ji qeza Kilisê derdihat. Û piştî hatina destlata Firensî li navça Çi.Kurmênc, karê kirina komirê li saz ket, û rêdanên fermî û rewa didan hin kesan, da ku daran bibirin û komirê bikin. Ew kar bi şêweyê fermî ra navîna salên pêncî ji sedsala bîstan, bê navber dihat kirin. Piştî wê demê, birîna daran a tewşankî ji bo komirkirinê hat qedexekirin, û ew bi şêweyekî durustkirî û ji hêla dewletê de hat kirin. Lê hîn jî pir kes li

[1] - Pirtûka (Wîlayeta Heleb a Osmanî, Salnameye sala 1332g/1903z), rûpel 274.

gundên çiyayî hene, karê komirkirinê bi dizî û li derveyî rêdana rewa dikin.

Li roja me, du navendên komirkirinê li dora bajarê Efrînê hene, ew darên ku tên birîn dikirin û dikin komir. Du navendên komirkirinê yên dewletê jî li navçê hene. Bi tevahî, tibaba komira salane ya ku ji navçê dertê, digihê 1000 tonî.

### - Cil û Ber:

Çêkirina Cil û Beran ji pêşesaziya malane ya kevin e li Çi.Kurmênc. Lê ew niha pir hindik tê dîtin, û bûye ji kelepûra gelêrî. Karxaneke cil û beran a bidestan li bajarê Efrînê heye, ew li navîna salên şêstî ji sedsala bîstan hatiye damezrandin.

### - Karxaneyên Bêrînê:

Piştî ku teneyên zêtûnê tên guvaştin, Bêrîn ji ber dimîne. Sêzdeh karxaneyên pêşesazkirina bêrînê hene, ew hemî jî yên taybet in, dora 150 karkeran tê de dixebitin. Navîna tibaba bêrîna ku ji navçê dertê digihê 120 hezar ton, û dora 12 hezar ton zêt jî ji wê tibabê derdikeve, ew jî bi taybetî ji bo çêkirina Sabûnê tê bikaranîn. Bermahiya bêrînê jî, ya ku zêt jê tê darivandin, wek ardû ji bo wê karxanê tê bikaranîn, rejiya ku ji ber şewata wê dimîne jî, dibe komir û ji bo nêrgelan bikar tê.

### - Çêkirina Sabûnê:

Ji berê de, cureya sabûna baş li navçê dihat kelandin. Roja îro, dora deh sabûnxane li navçê hene, ew nêzîk 4000 ton sabûna baş çê dikin.

### - Kan û birîna keviran:

Dora heft kanên kevirên sipî û zer, û sê kesare ji bo hûrkirina keviran li Na.Efrînê hene. Heft karxaneyên birîna keviran jî hene, ew pediviyên xwe ji keviran ji kanên Çi.Lêlûn bicih tînin, û piraniya berhema xwe jî li navçê difiroşin.

Li devera Bilbilê, kanên kevirên Rixamê û Mermerê hene. Hin kan ji hêla dewletê de, hin jî ji hêla şênî de tên bikaranîn.

Gelek karxaneyên çêkirina bilatan û kelpîçan jî li navçê hene.

### - Pêşesazkirina Bilestîk:

Sê karxeneyên pêşesazkirina Pilastîk li Na.Efrînê hene, ew li gundên Basûtê, Serêkaniyê û li Kortikê ne. Du karxane ji bo çêkirina xertûmên avê jî hene, yek li Efrînê, ya din jî li Gu.'Endarê ye. Karxanek ji bo pêşesazkirina perçeyên pilestîkî yên makînan jî li Gu.Basûtê heye.

### - Meyxane[1]:

Ji berê de, navça Çi.Kurmênc bi meye û xuşavên (şerab) zor baş navdar bû. Hebûna şûnewarên gelek guvaşxanên tirî ji demên Alfiringî de, wê yekê dupat dikin. Li dawiya sedsala nozdehan, hin dewlemendên Çi.Kurmênc çend meyxane ava kirin. Lê Meyxana sereke ya /Bozent/ e, ew li sala 1927an li bajarê Efrînê hatiye damezrandin, û hîn jî kar dike.

### - Hêrandina gênim û nankirinê:

Şêniyê Çi.kurmênc ava çemê Efrînê û cowikên ku li derdora wî ne, ji bo gerandina aşên avê bikar anîne. Di pirtûka /salnama Osamî ya wîlayeta Helebê, rûp 274/ de hatiye, ku li sala 1903an, 31 aşên avê, 25 ên bi dewêr digerîn, 3 jî bi bayê digerîn li ser Çi.Lêlûn hebûn, û 32 nanpêjgeh (firne) jî li Qeza Kilisê hebûn. Piraniya aşên avê ra navîna sedsala bîstan, yanê ta dema derhatina aşên bi matoran digerin, kar dikirin. Pişt re, ew ji kar derketin û kavil bûn.

## Karwanî û navgînî li Çi.Kurmênc

Li demên berê, navça Çi.Kurmênc devereke navgînî ye pir giring bû. Rêka bajarên Îskelê (lengergeha Iskenderon), Entekê, Helebê û şêngehên Rojavaya çemê Ferêt, di deşta Çûmê, gundên Hemamê, Cindirês û Cihê Efrînê yê niha re diçû, û di Gu.Qitmê re derbas dibû. Ew rêk, li dirêjiya serdema Osmanî û berî wê jî, riya tekûtenê bû.

Ji ber wê sedemê jî, bi dehan xanên karwan û rêwiyan li seranserî wê rêkê hebûn. Cîgehê bajarê Efrînê bi xwe jî rawastgeheke pir giring bû. Bi dehan xanên dewêr û rêwiyan ta

[1] - Meyxane: Ji du bêjeyan darijtî ye, Mey û Xan.

dawiya serdema Osmanî lê hebûn. Li wê derê pira jî herdem li ser çemê Efrînê hebû û xizmet çûnhatina rêwî û bazirganiyê dikir.

Ji bilî wê jî, li dawiya serdema Osmanî û ra destpêka serdema Firensî li Sûryê, dewlemend û axeyên navça Çi.Kurmênc hêştir/deve tîmar dikirin û piraniya karwanvaniya ku di navbera lengergeha Iskenderon, Çi.Gewr û Çi. Kurmênc de dibû, di destê wan de bû. Wek barkirina komir, tex, berhemên çandî û pêz … û hwd, bi deve û qantiran dihat kirin. Li wan deman, eger deve û qantirên  mirovekî hebana, ew ji dewlemend dihat jimartin

Piştî ku li sala 1938an sînorê nû di navbera Sûryê û Tirkiyê de li Senceq Iskenderonê hat danîn, riyeke nû di parêzgeha Idlibê re vebû, û giringiya riya kevin a ku di deşta Cûmê re diçû, kêm bû, û dema ku navenda sînorî li Gu.Hemamê hat girtin, ew rêka dîrokî ya Kevin yekcar hat birîn. Li wê demê, navenda sînorî ya Mîdan Ekbezê jî hat girtin. Girtina navendên sînorî li Na.Efrînê, bandoreke pir neyînî li ser rewşên bazirganî û aborî yên şêniyê Na.Çi.Kurmênc kir û hîn jî dike.

Ji bilî wê, riya hêsin bi dirêjiya 65km di nava navçê re deras dibe. Di wê navberê de, çar rawestgehên çîmanê li ser hene, li Qitmê, Qurtqulaq, Reco û Mîdan Ekbezê.

Li van dehsalên dawîn, pêşdeçûnên mezin di warên karwanî û navgîniyê de li Na.Efrînê çê bûn. Şebekek ji rêkên ziftkirî li navçê hatiye vekirin, ew rêk piraniya şêngehên navçê digihîne hev û bi bajarên Efrîn, Helebê û bi derdoran ve girê didin.

# Bazirganî

Li serdema Osmanî, bajarê Kilisê ji deverên Bakur û Rojhilat ên Na.Çiyayê Kurmênc re navenda bazirganiyê ya sereke bû. Şêniyê deverên Rojava jî, ku li ber deşta Lêçe û Ĥemqê ne, bi ser bajarê Qirixanê de diçûn. Ji xwe gelek karûbarên bazirganiya şêniyê Çi.Kurmênc li bajarê Helebê jî dihatin kirin.

Di warê bazirganiya navçê de, berhemên çandiniyê û yên sewalan, tiştên sereke bûn. Pêdviyên malane jî ji bazarên bajarên mezin û di riya 'Etaran re dihatin kirîn. Û ji ber ku pere li ba şênî peyda ne dibûn, gelek caran, bazirganiya 'Etaran bi şêweya berdêlkirina kelûpelan dihat kirin.

Piştî ku navça Çi.Kurmênc di navbera Tirk û Firensiyan de hat parvekirin, pêwendiyên aborî yên şêniyê Çi.Kurmênc bi bazarên Kurdî re li Bakur "Kilis" û Rojava "Qrixan" hatin birîn. Lewre, bazarine herêmkî yen nû çê bûn û şên bûn, û têkliyên bazirganî bi bazarên bajarê Helebê re jî hêgintir bûn.

Li roja me, di warê bazirganiya berhemên çandiniyê de, dewlet cureyên berhemên çandiniyê yên sereke, mîna tene, pembû, çelem û titûn… bi xwe dikire. Lê berhema herî sereke, zêta zêtûnan, li bazaran tê firotin û nirxa wê li wir tê danîn.

Dora bîst qazxanan li navçê hene, cureyên ardûya (sotemeniya) Pitrolê lê tê firotan.

Lê bi tevahî, û ji ber ku hejmar û serhejmarên durust ji bazirganiya navçê re peyda nabin, em nikanin rewşa wê wek tê xwastin binirxînin.

## - Bazarên hêrêmê:

Li navenda Na.Efrînê û li hin deverên wê, bazarine hefteyî tên lidarxistin. Li wan bazaran, tiştên xwarinê, cil, pêdviyên malane û gelek kelûpelên din tên firotin. Bazareke rojana li bajarê Efrînê jî heye, tiştên mîna keskayî, meywe, berhemên sewalan û gelek tiştên din lê tê kirînfirotan. Bazareke taybet ji bo zêtê û cureyên tene jî li navçê heye.

Ev e lîstek /lîste 19/ bi navê bazaran li Na.Efrînê, sala damezrandina wan, û roja wan di heftê de:

| **Cih** | Efrîn | Reco | Cindirês | Şiyê | Mabeta | Be'dîna | Şera | Bilbil |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **Sal** | ١٩٢٧ | ١٩٣٠ | ١٩٤٠ | ١٩٩٤ | ١٩٩٤ | 2008 | 2008 | 2008 |
| **Roj** | Çarşem | Şemî | Duşem | În | Yekşem | Sêşem | Pêncşem | În |

**Lîste -19- Bazar li Na.Efrînê.**

# Geştevanî û Seyranvanî

Sirûşta Çi.Kurmênc a ciwan, û şûnewarên wê yên zor hêja, hejmarine mezin ji geştevanan û seyranvanan bi ser xwe de dikşînin.

Ji cigehên şûnewarî û geştevanî yên sereke: Kela Sem'anê, Kela Hûrî, Girê 'Endarê, şûnewarên Çi.Lêlûn… û hwd. Her salê bi sedan geştevanên biyanî û bi hezaran welatiyên Sûrî seredana wan cîgehan dikin. Piştî ku gelek rê li Çi.Lêlûn hatin vekirin, guman heye ku gundên mîna Kîmar, Berad, Kilotê… bibin berê bi hezaran geştevanî.


Wekî ku nase, Na.Efrînê bi sirûşta xwe ya ciwan, ji xweşiktirîn navçe ye li Bakurê Helebê. Çemê Efrînê di nava wê re diherike, û bi dehan kanî û cowik di nav de derdibin û diherikin. Ew hemî tişt, jiyanê didin sirûştê û ciwaniyeke bê mînak dafrînin. Loma jî, li roja îro, Na.Efrînê seyrangeha herî balkêş û ciwan e li parêzgeha Helebê.

Ji havîngehên navdartir li navça Efrînê: Serêkaniyê, devera Gola Meydankê, Basût, 'Endar, Ge.Ziravkê, Nebî Hûrî, Solava Gemrûkê…û hwd. Lê belê ya rastir ew e, ku her bostek ji perava çemê Efrînê seyrangehek e ciwan e, û hêja ye ku mirov rojeke hêmin û xweşik li nava sirûşta wê derbas bike, **[Nexşe 6]**.

Xwaringeh jî li hin seyrangehan hene. Lê li gor ferebûna cihên geştevaniyê, hejmara wan hindik e, û karên karguzarî jî li wan seyrangehan û li cigehên geştevaniyê pir kêm in.

Mixabin, digel ku kirde û hîmên geştevaniyeke baş li Na.Efrînê peyda dibin, lê hîn şêweya jiyan û ramana cotarvaniyê li ba şêniyê navçê xort e, û ew nikanin sûdê ji rewşa lêhatî ya geştevaniya Na. Efrînê wergirin. Ew yek jî, bi rengekî neyînî hikariya xwe li pêkanîna geştevaniyeke sûdar li navça Efrînê dike.

Lê belê, peydabûna gola meydankê, dîsa hêviyan bilind dike, ku sermiyanên mezin ji bo pêkanîna pirojeyên geştevaniyê bi ser navça Efrînê de bi tevahî, û bi ser devera Gola Meydankê de bi taybetî, werin.




**Nexşe -6- Cîgehên geştevaniyê yên sereke li Na.Efrînê.**

# Beşê Duyem

# Vekolîneke Salixdanî
# ji
# Kendûkor û Dîmenên
# Çiyayê Kurmênc re

# Kendûkor û Dîmenên Sereke yên Navça Efrînê

Çiyayê Kurmênc şaxek e ji şaxên Başûr Rojava yên Çiyayên Torosê. Bilindiyên sirtên wî têvel in, sirta Çi.Kurmênc a herî bilind li beşê Sûrî Girê Mezin e, ew li ber bajarokê Bilbilê ye, bilindiya wî 1269/m e. Cihê herî nizim jî li ber gundê Merwaniyê, li binê geliyê Circim e, ew li wir dadikeve 85 mitran.

Gelek derbend, newal û zewrên fere di navbera sirt û bilindiyên Çi.Kurmênc de hene, ew li gelek ciyan fere dibin, dibin deştên biçûk, kanî tê de derdibin û zeviyên baş jê peyda dibin.


Çend deştên fereh jî li Na.Efrînê hene, wek deşta Cûmê û beşên wê yên bi deştên Kitix, Coqê û 'Emara.. bi nav dibin, **[Nexşe7]**.

Dîmen û kendûkorên xaknîgarî yên sereke li Na.Efrînê ev in:

- Çemê Efrînê, di nava navçê re ji Bakur de berve Başûr diherike.
- Çemê Reş, li ser sînorê wê yê Rojava ye.
- Gelek kanî û cowik li navçê hene.
- Deşt û geliyên fere tê de hene, deşta giringtir jî deşta Cûmê ye.
- Piraniya rûbera navçê sirt in, û bilindiya wan nîvnîv e, loma jî ew di hemî demên salê de ji çandin, çêre û rûniştinê re lêhatî ne.

Ji bo ku em salixdana kendûkorî ya navçê hêsan bikin, û dîmenên sereke û cih û navên wan nas bikin, emê her çiyakî, sirtekê, geliyekî û deşteke naskirî bi tenê salix bidin, dîmenên wan ên sereke û her tiştên ku em dibînin dê ji lêkolîna me re sûdar bin, bidin nasîn. Ji bo hêsankirinê, me kendûkorên navçê yên sereke wiha parve kirin:

1- **Geliyên giring**: Geliyên Tîra, Xastiya, Meydana, Kela-Şiyê.
2- **Deştên sereke**: Deştên Cûmê, Meydana, Baliya- Reco.
3- **Kendûkorên çiyayî**:
   - Zincîra sirtên Rojhilatî: Beşên wê yên Bakur, Başûr û Çi.Lêlûn.




**Nexşe -7- Asta bilindiyan li Çi.Kurmênc. Pîvan 1/150000.**
**Sînorên navdewletî + + + . Sînorên navça Efrînê -------**

- Zincîra sirtên berepehin: Hersê beşên wê, Bakurî (sînorî), Navînî û Başûrî (Hawar).
- Çi.Xastiya. - Çi.Ĥeştiya. - Kendûkorên Devera Şiyê.

# Lêkolîna Yekem

## Geliyên Giring[1]

### Geliyê Meydana û dûvdirêjiya wî:

Ge.Şêngêlê ku ji aliyê Bakur Rojhilat, ji ber Gu.Şingêglê de tê, digihê quncikê herî Başûr Rojava ji deşta Meydana, û ji wir de geliyê Meydana dest pê dibe. Ji wir de, Ge.Meydana di nav kendûkorên çiyayî û daristanî re bi Başûr de diçe, li Rojavayê Gu.Xilalka kendûkorên çiyayî derbas dike û digihê dawiya xwe. Dirêjiya vî gelî ta wî cihî nêzîk 5km e, pehniya wî jî kêmtirî 200/m e. Ev gelî zincîra sirtên çiyayî yên Bakurî yên li ser sînor dike du beş: Rojhilatî û Rojavayî. Ge.Meydana di navbera warên hoza Biya li Rojhilat û warên Şêxan de li Rojava jî dibe sînor.

Ew gelî li demên kevin, wek derbendeke giring bû di navbera deverên Çi.Gewr/Amanos û Bakurê Sûryê de. Li roja me jî rêkeke dûzkirî ye giring tê re derbas dibe.

Her du keviyên Ge.Meydana bilind û dîke ne, darên daristana kevin û zeviyên zêtûnan wan dipêçin. Gelek şikeft û ben jî di pesarên wî de hene.

Piştî ku ew gelî digihê Gu.Xilalka, rêçûna wî di nav kendûkorên nizim û kêrtekortî re, ku bi Deşta Camiyê bi nav dibe, bi hêla Başûr de diçe, û piştî dora 5/km digihê ber gundên 'Elendara û Kurzêlê, û li wir di navbera Çi.Cirqa li Rojhilat û Çi.Bilêl re li Rojava bi Başûr de dicçe, li wir bi "**Ge.Kurzêlê**" bi nav dibe. Beşê vî gelî yê dawîn û Başûrî li ber Gu.Zerka bi navê **Ge.Sincik** tê nasîn. Geliyê Kurzêlê geliyekî kûr e, dirêjiya wî dora 3/km, ew di nav kendûkorên çiyayî û daristanî yên dijwar re diçe.

---

[1] - Li nexşe hejmar "5" binêre.

Piştî Ge.Sincik, zemîn hinekî dûz dibe, û **Ge.Cirqa** ku di navbera sirtên çiyayê Xidiriya re li Rojhilat û Çirqa re li Rojava dimeşe, ew jî bi Ge.Sincik re dibe yek û geliyek nû çê dibe. Ew geliyê nû bi Başûr de berve Gu.'Eşûnê diçe, li wan deran bi "**Ge.'Eşûnê**" bi nav dibe, li ber wî gundî, bendava 'Eşûnê li ser gelî hatiye avakirin.

Li paş bendava 'Eşûnê, geliyekî din î fereh û dirêj bi navê "Zewra Qaçaqciya" yan "**Ge.Ziqaqa**" heye, ew ji dorhêla Gu.Qêsim de, bi dirêjiya dora 5/km tê ser. Pişt re, gelî di ber sînorên Çi.Hawarê yên Bakur û paşê yên Rojhilat re, di nav kendûkorên çiyayî, daristanî û dijwar re dimeşe û gelek çiv dide xwe, û li Rojavayê Gu.Hesendêra bi "**Ge.Hawrê**" bi nav dibe. Pişt re, piştî bergeheke ne dirêj, li Başûr rojavyê Gu.Hesendêra bi Ge.Çayê re, ku ji derdora Bilbilê de tê, dibe yek û geliyê "**Ziravkê**" yê navdar çê dibe.

Bi vî hawî, dirêjiya Ge.Meydan û dûvdirêjiya wî, ji deşta Meydana de bigire û ra derdora Gu.Hesendêra, digihê dora 20km. Û ji ber ku ew gelî di nav kendûkorên çiyayî û fere re diçe, gelek lehiyên mezin û hêzdar lê peyda dibin, piraniya wan lehiyan digihên ra rêçûna çemê Efrînê.

## Geliyê Tîra

Geliyê Tîra li navça Çi.Kurmênc ji berê de ji derbendên giring û navdar e. Ew deşta Cûmê digihîne deşta Baliya, devera Reco, deşta Lêçe û Çi.Gewr. Rêka Çîmana Rojhilatî ya Lezok û rêka ziftkirî tê re derbas dibin.

Dirêjiya Ge.Tîra ji ber Gu.Berbenê de û ra dawiya wî ya Bakur 3200/m e. Pehniya wî jî ji çend mitran de ra çend deh mitran e. Her du aliyên gelî pir bilind û dîke ne, û bi darên Zêtûnê, Benîştokê, Guvîjê, Sindîganê û gelek cureyên darên çiyayî pêçayî ne.

Ev gelî ji berê de derbendeke giring û riyeke karwanan bû. Navê gelî dest nîşan dike, ku ew ji demên bikaranîna Tîrkevanan de lê bûye.

Navê Ge.Têîra bi gelek bûyerên dîrokî ve hatiye girêdan. Li salên 1920-1921ê/, Seydê Dîkê û hevalên wî, gelek caran di wî gelî de, rê li serbazên Firensî girêdidan û ziyan digihandin wan.

Kanên hêsin di geliyê Tîran de hene. Li piraniya mehên saleê, aveke zelal jî tê re diherike, hin jê ji binê gelî dizê, hin jî ji kaniyên gundên nêzîk têne ser.

Di nîvê gelî de, li ser rûyê wî yê Rojava, zinarekî mezin heye, jê re "Kevrî Bûk" dibêjin, ew kevir ji dûr de wek bûkekê li ser hespekî xuya dibe, û li nav şêniyê wê deverê dîmenekî naskirî ye.

## Geliyê Xastiya

Ev gelî ji ber Gu.Mîrka ji bilindiya dora 600/m de dest pê dike. Ew li Rojhilat, ji gelek geliyên biçûk bi hev dikeve, û berê xwe dide Başûr Rojava. Dirêjiya tevahiya Ge.Xastiya nêzîk 17/km e.

Gelî di navbera du beşên Çi.Kurmênc re dirêj dibe, û wan ji hev dike, Çi.Xastiya li Bakur û Çi.Ĥeştiya li Başûr. Û piştî ku dora 17/km derbas dike, li dawiya xwe ya Başûr Rojava, di navbera her du gundên Merwanê li asta bilindiya /85/mitran di deşta Hemqê de bi dawî dibe.

Berê, gelek kanî li her du aliyên geliyê Xastiya derdibûn û aveke pir tê re diherikî. Tê gotin, ku heft aşên avê li ser digerîn, kelkên (qeyiq) biçûk jî tê re dimeşîn, lê li dema ku baran kêm bûye, piraniya kaniyan ziwa bûn, ava gelî jî miçiqiye, û bûye çend sal in hîç naherike.

Ge.Xastiya li her cihekî bi navekî tê nasîn, ew jî wiha ne:

Li destpêka xwe, ango li Rojhilata Gu.Kaxrê bi Ge. Erqê bi nav dibe. Beşê li dû wî jî bi Ge.Ber Til tê nasîn. Pişt re, li ber Gu.Reca bi Ge.Bîçberaqê bi nav dibe. Li ber Gu.Dela jî bi navê gund tê nasîn. Beşê li hember Gu.Remedana jî navê wî Ge.Zîn e, ew li ser navê zinarekî mezin ku mîna zîna hespan e, bi nav bûye. Li ber Gu.Baziya jî navê wî dibe Ge.Teng. Beşê dawîn jî di navbera her du gundên Merwanê "Jorin û Jêrin" de, bi navê Ge.Circim tê nasîn.

Gelek cureyên darên meywan di zewra Ge.Xastiya de hene, nemaze darên Gûzê, Be'îvê û Zerdeleyê (mişmiş)... û hwd. Beşekî

fereh ji pesarên Ge.Xastiya û newalên ku tên ser wî daristanî ne. Devera geliyê Xastiya devereke geştevaniyê ye zor ciwan û şêrîn e.

## Geliyê Kela:

Ev gelî li aliyê Rojhilat ji deşta "Dirûmiyê-Kitix" ji Bakurê Gu.Xaziyanê de dest pê dibe, û piştî ku dora 10/km bi Rojava de dimeşe, û li Bakurê Gu.Erendê derbas deşta Hemqê dibe, û li wan deveran bi Ge.Şiyê tê nasîn.

Beşê gelî yê destpêkê bi navê Gu.Kela, ango Ge.Kela tê nasîn, ew gund jî di nîvê rêçûna gelî, li ser milê wî yê Başûr e.

Geliyê Kela derbend û rêçûna tekane ye di navbera sirtên çiyayî de li wan deveran, ew deşta Kitix û Cûmê digihîne devera Şiyê û deşta Hemqê. Rêçûna wî teng e, keviyên wî bilind û bi dar in, gelek newalên biçûk jî ji sirtên derdora wî de dadikevin, û wî mezin dikin. Li salên bi baran, gelek kanok tê de derdibin û cowikekî mezin çê dikin.

Sirûşta devera geliyê Kela zor ciwan e. Her du aliyên wî bi darên Merxê pêçayî ne. Û piştî ku rêkeke zifkirî tê re vebû, jiyan bi tevaya wê deverê hat, û bû devereke geştevanî ye pir ciwan.

## Geliyê Sarisînê:

Ev gelî li ber gundê Banîkê ku li Rojavaya bajarokê Reco ye çê dibe. Pişt re, ew bi Rojava de dadikeve û bi deşta Hemqê de dere. Ev gelî di navbera Çi.'Etmana re li Başûr û Çi.Hopka li Bakur, diçe.

Dirêjiya gêlî ji cihê çêbûna wî de û ra cihê bidawîbûna wî dora 7/km ye. Her du keviyên wî çiyayî, bilind û daristanî ne, devera wî zor şêrîn û ciwan e.

Geliyê Sarisînê derbendeke giring e di navbera deverên Çi.Kurmênc, deşta Hemqê û Çi.Gewr de, loma jî li sala 2008an, riyeke ziftkirî tê re hat vekirin û jiyaneke nû bi gundên wê deverê de berda.

Li nêzîk dawiya wî, Gu.Xirabê Simaqê li ser keviyê wî yê Bakur e, gundên Kum Reşê, Kurê, Şediya jî li ser milê wî yê Başûr in, Gu.Sorkê jî li ber dawiya wî, li deşta Lêçe ye.

## Geliyê Çayê:

Ew gelî ji ber Gu.Mala Jarê (Gu.Jarê) de li Başûrê Bilbilê bi dora 7/km dest pê dike, û bi şêweyekî lihavbadayî berê xwe dide Başûr. Ew geliya sirtên çiyayî yên Rojavaya kenarê çemê Efrînê, ji her du zîncîrên çiyayê Kurmênc ên navîn û Başûr dike.

Piştî destpêkirina vî gelî bi nêzîk 4/km, digihê Gu.Qestela Miqdêd û berve Gu.Kotana diçe. Di wê navberê de, gelek newalên biçûk ji sirtên derdorê de têne ser, wî mezin dikin û dihêlin ku li salên bi baran aveke hêja tê re biherike. Li Başûrê Gu.Kotana bi nêzîka 3/km, pirek li ser gelî heye, riya Bilbilê ya sereke di ser re derbas dibe.

Piştî pirê, dîsa gelek newalên biçûk tên ser, û di Rojhilata Gu.Ĥesendêra re derbas dibe. Li Başûra wî gundî li ber Çi.Hawarê, bi Ge.Eşûnê re, ku ji Bakur Rojava ji hêla Meydana de tê, dibe yek. Piştî Gu.Hesendêra, gelek kanok û kaniyên giring mîna kaniyên 'Emara û Ĝulĝulê ji binê wî derdibin û cowikekî giring çê dikin, ew av bi Başûr de dere, û li ber girê Ziravkê tev ava Kitixê dibe. Dirêjiya Ge.Çayê ji destpêkê de û ta dawiyê, digihê dora 20/km.

## Geliyê Qerecurnê:

Ge.Qerecurnê ji kaşên Bakur ên sirtên gundên Baflûnê, Serêkaniyê û Qitmê çê dibe, û bi Rojava de berve avrêja çemê Efrînê li Rojava, dakol dibe. Piştî ku ew gelî dafire, di Başûrê Gu.Sînka re, û di navbera bajarokê Şera û Gu.Xirabî Şera re derbas dibe. Li ber pîrozgeha Qerecurnê, geliyek ji aliyê Gu.Metîna de tê ser, li wî cihî pirek li ser hatiye avakirin. Li wan derdoran, av ji binê gelî dizê, û piştî çend sed mitran dibe cowikekî mezin, darên çinarê rêçûna gelî dipêçin, û seyrangeheke ciwan çê dibe. Li Rojavaya pirê bi dora 1/km, ava gelî ji bilindahiya dora 7/ mitran de dikeve, û solaveke biçûk û ciwan çê dike. Li Rojavaya cihê wê solavê bi nêzîk 500/m jî, Girê Hilûbiyê yê şûnewarî li aliyê gelî yê Başûr heye, pireke nû li wir li ser gelî hatiye avakirin. Piştî wê, û li Rojavaya ew pira nû bi nêzîka 2/km, Ge.Qerecurnê tev çemê Efrînê dibe.

Li dirêjiya Ge.Qerecurnê ku dora 10/km ye, gelek gelî û newalên biçûk tên ser, û li Bihar û Payîzê lehiyên pir bi hêz çê dikin.

# Deşt li Navça Efrînê

Bi tevahî, du cureyên deştan hene:

- Deştên Navberî: Ew zewr û dûzahî ne, di navbera çiyan de ne. Ji deştên navberî yên giring li Na.Efrînê, deştên Meydana, Biya û Baliya- Reco.

- Deştên bi riya lehiyan çê bûne “Lehiyane”: Nimûneya wan li Na.Efrînê Deşta Cûmê ye.

## Deştên Navberî

### 1. Deşta Baliya

Rûbera vê dûziyê nêzîka du sed hêktar e, xaka wê şov e. Ji Bakur, Rojava û Başûr de çiya wê dipêçin, bajarokê Reco jî li ser sirta di nava wê de ye.

Bilindiya cihê deştê 550/m e. Li demên berê, beşê Rojavayî ji rûbera wê tijî ava baranê dibû, û gola Hopka lê çê dibû, hîn jî ew gola li salên bi baran li aliyê deştê yê Bakur Rojava çê dibe. Tê gotin, ku berê 23 bîrên avê yên kevin li deştê hebûn, lê ew niha xetimî ne.

Wek gundî dibêjin, ta destpêka sedsala bîstan, keriyên Xezalan li wê deştê û li çiyayên derdora wê diçêrîn, Piling jî li nav daristanên wan deveran digerîn.

Li destpêka sedsala bîstan, li dema ku Alemanan riya hêsin ava dikirin, wan ew deşt wek balefirgeheke biçûk ji bo karbidestên xwe bikar tanî. Rawestgeheke çîmanê ya girin li ber bajarokê Reco heye, ew ji wan deman de hatiye ava kirin, tûnêla çîmanê ya Reco ya yekê jî, li aliyê deştê yê Bakur di bin sirta 'Ermûtê re diçe.

Ev gund li dora deşta Baliya hene: Reco, Hopka, Memala, Ĥucemala, 'Etmana, Banîkê, Mûskê, Dêwrîş û Hecxelîl.

Deşta Baliya li dawiyê Geliyê Tîra yê Bakur e, loma jî li demên berê, çûna deşta Lêçe û deverên Çi.Gewr, tenê di wê deştê re gengaz bû, û riyeke bazirganiyê ye tekûtenê bû.

## 2. Deşta Meydana

Ev deşt 4/km li Başûrê sînorê Tirkiyê ye, û 10/km li Bakurê bajarokê Reco ye. Ew deşteke şov e, dirêjiya wê dora 7/km ye, pehniya wê jî ji 500/m ra 1/km ye. Bilindiya cihê deştê 750/m e. Çiya ji her çar aliyan de wê dipêçin. Pîrozgeha Şêxmûs a navdar di nava cihekî şûnewarî yî mezin di nîvê deştê de ye, hîn jî gelek stûn û kevirên avahiyên şûnewarî yên gewre li derdorên cihê pîrozgehê hene.

Şêniyê wan gundan cihekî biçûk ji aliyê deştê yê Rojava kolane, ava baranê tê de kom dibe, û li Biharê goleke biçûk lê çê dibe, ava wê ra dawiya Havînê dimîne û dewar jê vedixwe.

Şeş gundên Meydana li aliyê deştê yê Bakur û Bakur Rojava li ber avrazên çiyê hene, ew jî ev in: Gewenda, Gu.Dodê, Şêx Miĥemedlî, Gazê, Welîklî, Sêmala.

Riyeke ziftkirî di nav deştê re diçe, bi ser deşta Lêçe de dadikeve û digihê Gu.Mîdan Ekbezê û sînorê Tirkiyê. Li demên berê, riyeke giring di wir re diçû, û deverên Heleb, Hemqê û Çi.Gewr digihandin hev. Li dawiya şerê cihanî yê yekê, Mistefa Kemal (Ataturk) jî tev hinek efserên artîêşa xwe, di riya deşta Meydana re berve Navîna Enedolê vekşî.

## Deşta Cûmê

Deşta Cûmê deşteke lehiyane ye, ew li Bakur ji ber Çi.Hawarê de dest pê dike, û li Başûr Rojava li ber sînorê Tirkiyê bi dawî dibe. Herwiha, dirêjiya wê dora 40/km ye, pehniya wê jî di navbera 5 û 15/km de ye. Çemê Efrînê jî di nava wê re û li dirêjiya wê, ji Bakur de berve Başûr diherike.

Deşta Cûmê deşteke ketî û şov e, û ji gelek cureyên çandiniyê û darên berdar re pir lêhatî ye, nemaze darên zêtûnê. Loma jî zeviyên zêtûnan derdora %80 ji rûbera wê digrin.

Bi dehan kanî li nav û li çar aliyên Deşta Cûmê derdibin, carina cowikên mezin jî ji wan bi hev dikevin, wek cowikên Kitix, Ziravk, Basût, 'Endar… û hwd.

Deranîna qerqodeyê zarokê Niyandirtalî ji binê şikefta Duderiyê li Çiyayê Lêlûn jî, dest nîşan dike, ku deşta Cûmê û şikeftên rûyê Çi.Lêlûn ê Rojava, ji serdemên herî kevin de şên bûn. Roja îro bi dehan gir û cihên şûnewarî li çaraliyên deşta Cûmê hene, û dupat dikin, ku rûniştina mirov li Deşta Cûmê pir ji mêj ve ye, û ji hev ne qetiye.

Mîna ku em dizanin, sirta bajarê Efrînê "Girê Dirêj/Xemrevîn/ Tirtewîl[(1)]" Deşta Cûmê dike du beş, **Bakurî** û **Başûrî**.


### - Dîmenên giring ên beşê Bakur ji deşta Cûmê:

Şêweya vî beşî çargoşe ye, rûbera wê dora 150/$km^2$ e. Taximên wî jî wiha ne: Ji Bakur de Çi.Hawarê, ji Rojava de çiyayên Me'mila û Xastiya, ji Başûr de Girê Dirêj/sirta Efrînê û ji Rojhilat de jî çemê Efrînê.

[1] - Tir: Bêjeke Siryanî ye bi wateya Gir yan Çiya tê.

Bi dehan gundên biçûk û mezin li nav û li derdora beşê Bakur ji deşta Cûmê belav dibin. Ji gundên giring: Gemrûkê li hêla Bakur Rojhilat, Be'dîna li aliyê Bakur Rojava, Coqê li aliyê Başûr Rojava …û hwd, **[Nexşe 8]**. Cowikên Kitix û Ziravkê jî ji dîmenên vî beşî yên giring in.

Beşê Bakur ji Deşta Cûmê di nav xwe de jî parve sê perçan dibe, û bi van navan tê nasîn: **Kitix**, **Emara**, **Coqê**.




**Nexşe -8-**
**Sînorên beşê Bakur ji deşta Cûmê……. .**
**Rêkên ziftkirî ---------.**
**Pîvan: 1/150000.**

## 1. Deşta Kitix:

Ev beşa ji deşta Cûmê li aliyê wê yê Bakur Rojava ye. Ji dîmenên wê yên sereke: Ka.Kitixê “berê bi kaniya Berbenê dihat nasîn”, girê Kitixê yê şûnewarî li Başûrê kaniyê, li navîna deştê, li ber rêka çîmanê ye. Li Başûrê Gu.Kurkê Jorin jî Ka.Sêva û cihekî şûnewarî li ber girê Dirûmiyê hene, pîrozgeha Mirada/Miraza li ber wî girî ye. Sê cowikên avê li ber wî girî digihên hev: Erqa Bîrê, ji Rojava de tê. Erqa Mûsankê, ji derdora gundên Birîmce û Selo de tê. Û cowika Ka.Sêva ya ku em li jor çêrê bûne ne. Li salên bi baran Ge.Dirûmiyê fere diherike, û ava wî li Rojhilat, li ber pira Ĥesenê Mêşkê, li ser riya Reco-Efrîn digihê ava Ge.Kitixê. Hêja ye em bêjin jî, ku rêka çîmanê jî di nav deşta Kitix re diçe.

**2. Deşta 'Emara**:

Ew di navbera newala Ziravkê û rêka çîmanê li Başûr, û Gu.Şorbe û 'Emara li Bakur de ye, ew cîgeh bi navê “Sêkurê” jî tê nasîn. Sêkurê dûzeke kêrtekortî ye. Ge.Ziravkê di nav re diçe, û li ber girê Ziravkê li ber Zinarê Înê bi Ge.Kitixê re dibe yek, paşê jî bi Rojhilat de dakole ser çemê Efrînê dibe. Gi.Ziravkê yê me li jor bibîr aniye jî, ji girên şûnewarî yên pir giring û mezin e, û benê Zinarê Înê yê navdar jî li ber gir, li aliyê Başûr e[(1)], Ge. Ziravkê di navbera wan re diherike û wan ji hev dike.

**3. Deşta Coqê**:

Bi navê Gu.Coqê hatiye binavkirin. Gu.Coqê li aliyê wê deştê yê Rojava ye, sînorên vê deştê wiha ne: Li Rojhilat çemê Efrînê, li Bakur Ge.Ziravkê û li Başûr jî sirta Efrînê “Girê Dirêj” ye.

Li Rojhilata Gu.Coqê cihekî şûnewarî bi navê “Zibêbê” heye, ew li ser bêleke dûz e, navê wê bêlê jî “ Çiyayê Dûz” e, berê ew cihekî bi darên kelemê yên bi qaserî hev bûn û rengekî dûz didane wî cihî. Li ser aliyê Bakur ê Çi.Dûz, baregeha serbazî ya Osmanî hebû, piştî şerê cihanê yê yekê, xelkê ew talan kir, û kevir û textên wê ji bo avakirina xaniyan hilkirin û birin.

---

[1] - Bendekî zinarî ye, bilindiya wî dora 50m ye. Di nîvê wê yê xwarê de, şikeftek bi sê malikan heye, xuyaye, ew bi destan hatiye kolan. Şêniyê deverê li derbarê wî cihî wiha dibêje: Li demên pir Kevin, dema ku girê Ziravkê gundekî şên bû, ew malik, mala rêberê gund bû, û pirek di navbera dawiya başûr ya gir û wan odan de hebû.

Li Bakur Rojavaya Gu.Coqê, li nêzîk rêka ziftkirî, goristaneke şûnewarî ye kevin heye, herdem dizên şûnewaran wê dikolin û li şûnewar û entîkan digerin.

Kumbelê jî cihekî şûnewarî ye li nava deşta Coqê. Li nêzîkî wî cihî, cihekî şûnewarî yî din jî bi navê 'Endîbê heye, jêderên dîrokî pir li ser wî cihî deng dikin û dibêjin, ku ew li demên Romanî û Bîzentî bajarekî mezin û şên bû. Gelek kanok jî li derdora wî cihî hene.

Li Başûrê 'Endîbê, li navbera gundên Astêr û Girê Dirêj/Tirtewîlê, li ser perava çemê Efrînê yê Rojava, Girê Xelê yê şûnewarî yê giring heye, li aliyê wî yê Başûr jî, goristanek û şûnewarên kevin hene, gelek tiştên şûnewarî bi cotkirinê re ji binê zemînê dertên. Li aliyê gir yê Bakur jî, kaniyek heye, gava me cihê avzêya wê peland, xuya bû ku ew qestel e, ava wê di Lûlikeke qermîtî re ji Bakur, ji hêla Endîbê de tê.

Li Başûrê Gi.Xelê bi dora 1/km, girekî şûnewarî li ber perava çemê Efrînê ya çepê heye. Girekî şûnewarî yî din jî li hember Gu.Keferomê, li ber perava çemê Efrînê ya Rojava heye, goristaneke kevnar jî li wir heye, li wî cihî, di nîvê rêçûna çêm de, lengerên pireke şûnewarî ye kevin hene, ew mîna lengerên pirên ji serdema Romanî yên li Nebî Hûrî ne, ew lenger jî li dirêjiya sedsalan di nîvê rêçûna çem de li ser xwe mane.

Bi şêweyekî giştî, bi dehan cih û warên şûnewarî ku hêjayî lêkolînê ne li derdora beşên deşta Cûmê yên Bakur hene, ew hemî destnîşana şênbûneke pir kevin dikin, lê rê li vir nîne ku em hemiyan bijmêrin.

### - Dîmenên beşê Başûr ji deşta Cûmê:

Ev beş li Bakur, ji ber bajarê Efrînê de dest pê dike, û li Başûr Rojava li ber sînorê Tirkiyê li ba Gundên Milexelîla û Ĥemamê bi dawî dibe. Çi.Kurmênc ji Rojava û paşê jî ji Bakur de, Çi.Lêlûn jî ji Rojhilat û paşê jî ji Başûr de wê deştê sînor dikin. Dirêjiya vî beşî dora 30/km, pehniya wî jî derdora 10/km ye, Çemê Efrînê jî di nav re diherike.

Ji bo ku em salixdana dîmenên vî beşî hêsan bikin, emê li gor rêçûna çemê Efrînê wî beşî bikin du par; Para perava çêm ya Rastê, û para li perava çêm a Çepê, **[Nexşe 9]**.

## 1. Perçê deşta Cûmê yê aliyê perava çemê Efrînê ya çepê:

Ev perça li Bakur li ber Gu.Cûmkê dest pê dike. Li wir çemê Efrînê li asta 200/m berbas nav deştê dibe. Li Başûrê wî gundî, geliyê Coĥişkê tê ser çêm, ew gelî li Rojhilat, li ba Gu.Serêkaniyê (kefercenê) çê dibe, û bi Başûr Rojava de berve çemê Efrînê diçe. Berê, ava vî gelî pir bû, û masî tê de hebûn. Piştî wî gelî, li hêla Başûr, bêleke Baziltî ye fereh bi navê 'Empelkê tê, li demên berê, Rêka Sersama ya kevin di ser re bi Başûr de berve Gu.Turundê diçû. Niha kuçeyên Eşrefiyê û Qeracî Gênco yên bajarê Efrînê li ser wê bêlê Hatine avakirin[1].

Li **Rojhilata** vê bêlê, di navbera wê û Çi.Lêlûn de, deşteke fere û şov heye, ew li Bakur ji Gu.Qîbarê de dest pê dibe, û berve Başûr dirêj dibe. Ew deşta li Bakurê Gu.Qîbarê bi navê deşta Qîbarê tê nasîn, kavilên Keloşka Qîbarê di nav de xuya dibin, li Başûrê gund û ra nêzîk Gu.Turundê jî, ew deşta bi navê “Deşta 'Erşê” tê nasîn.

Ew bêla Baziltî ku em li jor çêrê bûne jî, li Başûrê Gu.Turundê, bi geliyê Turundê tê birîn. Ew gelî ji sê geliyan pev dikeve, ew her sê jî li Rojhilat ji Çi.Lêlûn de çê dibin, di deştê re bi Rojava de diçin, û li Rojhilata Gu.Turundê digihên hev, navên wan geliyan ji Bakur de berve Başûr wiha ne: Ge.'Erşê, Ge.Golesorê û Ge.Kozberxê. Li dawiya geliyê Turundê kaniya wê ya naskirî, pîrozgeha Ebdilqadirê Gêlanî û goristana gund hene, dana wê kaniyê 2L/S av bû, masiyên (pîroz) jî tê de dijîn[2].


Piştî geliyê Turundê, ew bêla Baziltî bi Başûr de dirêj dibe, û bi navê sirta Ĥesarê tê nasîn. Li ser rûyê Ĥesarê yê Rojava, li ber rêka ziftkirî, kanokek bi navê Bîrguriyê hebû, mada Kirkûtê/Kibrîtê di

[1] - "Gêncoyê Feyo", navê xudanê hin zeviyên wê derê bûn.

[2] - Ji gundê Qîbarê de û ra piştî gundê Celemê, masiyên (pîroz) di kaniyên hemî gundan de dijîn.

axa wê de hebû, loma jî ĥeriya wê ji bo dermankirina nexwaşiya Gurê dihat xebitandin, lê ew kanî niha miçiqiye[1].

[1] - Di navbera cihê vê kaniyê û Gi.Turundê de, lûlikên qermîtî di bin zemînê de hatin dîtin, guman heye, ku ava wê li serdemên berê ji bo vexawrinê dibirin girên Gu.Turundê.




Li ser wê belê, di navbera gundên Turundê û Kurzêlê de ku li ber Çi.Lêlûn e, cihekî bi navê Darpaçkê hebû, ew gorek û dareke guvîjê bû, xelkê ew pîroz didîtin, û ji bo bicihanîna hêviyan paçik bi darê ve girêdidan, lê belê dizên şûnewaran ew gor kolan, kavil kirin û dar jî hilkirin.

Pişt re, ew bêla baziltî li hêla Başûr dibe Kilsî, û li Rojavaya Gu.Kurzêla Cûmê bi navê Qeracî Zareta Şêx Saliĥ bi nav dibe, ew jî navê pîrozgeha ku li ser wê bêlê ye.

Dema ku ew bêl li ber Gu.'Endarê bi dawî dibe, her du rûberên deştî yên li Rojhilat û li Rojavaya wê bêlê digihên hev û deşta Gu.Basûtê çêdibe.

Dîmenên deşta ku li **Rojavaya** ew bêla baziltî jî, wiha ne: Ew li Başûrê bajarê Efrînê dest pê dibe, û di navbera bêla baziltî li Rojhilat û çemê Efrînê li Rojava bi Başûr de dirêj dibe. Di nîvê vê rûberê de, girê Turundê yê şûnewarî[1] û du baxçeyên dewletê ji bo çandina şitlên daran hene. Girê 'Endarê yê şûnewarî û navdar jî li aliyê deştê yê herî Başûr e.

Ev her du rûberên deştî, ango ên Rojhilat û Rojavaya wê bêla baziltî, li Başûrê Gu.'Endarê digihên hev û **deşta Basûtê û 'Endarê** çê dikin. Gelek kanî û cihên şûnewarî di çarçewa vê deştê de hene, wek gir û kaniya 'Endarê, Ka.Basûtê û solava wê, û cihê kela wê ya kevin û navdar jî. Li nav vê dûzê, di navbera gundên Kurzêla Cûmê û Basûtê de, çend cîgehên naskirî hene, mîna Deşta Oredarê, Deşta Ze'terkê û Sûskê. Beşê deşta Basûtê li ba gundê Basûtê bi dawî dibe.

Li Başûrê Gu.Basûtê, Ge.Xiyara yê teng di navbera Çi.Lêlûn li Rojhilat û Çi.Bozîkê li Rojava de ye, çemê Efrînê di wî gelî re derbas dibe, digihê Gu.Bircê, berê xwe dide Rojava û berve sînorê Tirkiyê diçe.

Piştî wî gelî, dîsa deşt fere dibe, dibe zeviyên pir şov, û gelek cureyên çandiniyê, nemaze darên meywan lê tên çandin. Ew deşt dora 15/km bi Rojava de dirêj dibe û digihê sînorên Tirkiyê.

Tu dîmenên giring di wê navberê de bala mera nakşînin, lê belê hin girên şûnewarî lê tên dîtin, hin sirtên biçûk jî tê de radibin, wek sirta "Milê" li Bakurê Gu.Îska, ku bi darên Merxê hatiye çandin. Li Rojavaya gundê Îska jî, kaniya Îska heye, ew 25L/S av dide.

---

1 - Dema ku welatiyan gir dikolan, rastî kûzekî biçûk hatin, qerqodeyê zarokekî tê de hebû. Ew jî ji şêweyên veşartina miriyan li ba Gelên Çiyayî ji hezarê diduyan berî zayînê de bû.

Pişt re, dîsa rûberên dûz berdewam dibin, û wilo ta digihên Gu.Celemê. Li Bakurê vî gundî, Gi.Qirmiz ê şûnewarî, goristana gund û Ka.Mircana hene, li salên bi baran, golek ji ava wê kaniyê çê dibe, di geliyê Zêtûnekê re bi Bakur de diherike, û li hember Gu.Ebû Ke'bê tev çemê Efrînê dibe.

Piştî Gu.Celemê, li Rojhilata Gu.Tilsilorê bi nêzîkî 1.5/km, cihê bi navê Gol Bi'îrê heye, berê ew goleke fere bû û tijî av dibû. Li wan derdoran Gu.Tilsilorê, Ka.Miraza û zêrzemînên mîna goran di tehtê de kolandî hene. Piştî Gu.Tilsilorê, deşt rast û dûz dibe û dîmenên ku hêjayî çêrêkirinê ne. Û herwiha perçê deşta Cûmê yê perava çepê ya Çemê Efrînê, li ba Gu.Milexelîla li ber sînorê Tirkiyê bi dawî dibe.

Hêja ye em bêjin jî, bi tevahî, li her gundekî deşta Cûmê girekî şûnewarî heye, û di nava axa wan de perçeyên qermîtî û bermahiyên şênbûna serdemên pir kevin têne dîtin.

## 2. Perçê deşta Cûmê yê aliyê perava rastê ya çemê Efrînê:

Sînorên vî perçî wiha ne: Çemê Efrînê li Rojhilat û paşê li Başûr, Çi.Heştiya li Rojava û paşê jî li Bakur, û sînorê Tirkiyê jî li Rojava. Bajarê Efrînê jî li aliyê herî Bakur ê vî perçî dikeve. Li Rojavaya bajêr, li ber Gu.Keferşîlê, ev beşa di riya zewra Tizbiyê re digihê deşta Coqê li Bakur.

Li destpêka vî beşî, li Bakur, geliyên Gundên Keferşîlê û Maratê ji sirtên Çi.Ĥeştiya de dadikevin û di deştê re bi Rojhilat de derin. Dûza ku di navbera wan geliyan de bi Gola Cilfik bi nav dibe, mezelê Maratê yê kevin li wir bû. Li Başûrê Gu.Maratê bi dora 2/km jî, girê Maratê yê şûnewarî û Ka.Xelîlkê hene.

Li Başûrê Gu.Maratê bi nêzîkî 1/km, bêla Çêl Kaniya ya Baziltî dest pê dibe. Kaşê wê bêlê yê Başûr bi ser riya Efrîn-Cindirsê de dadikev, û li ber Gu.Keferbetrê bi dawî dibe, ew bêla bi Qeracî Reş bi nav dibe. Gelek kanok ji wê bêlê derdibin. Kaniyek ji cureyê “Qestel” jî ji binê rêkê, li ber Gu.Keferbetrê hildavêje[1]. Kaniyeke

[1] - Guman heye ku ew kanî kifarde û çêkirî be, û ava wê ji cihê Çel Kaniya di riya lûlikan re kişandibin wir.

din jî li Rojavaya Gu.Keferbetrê hebû, jê re Ka.Musankê digotin, cowika wê bi navê Erqa Pehin dihat nasîn, ew bi Rojhilat de bi ser çemê Efrînê de diçû, lê mîna gelek kaniyên navçê, ew jî niha ziwa bûye.

Li Bakurê bêla Çêl Kaniya, cihekî bi navê Çêlmîrê heye, çend darên sindîganê yên mezin û şikavlên şûnewarî lê hene, şêniyê wan derdoran wî cihî pîroz dibînin.

Piştî Gu.Kefirbetrê, deşt berê xwe dide Rojava, û rêka Efrîn-Cindirêsê ya ziftkirî wê dike du beş, **Bakurê** Rêkê û **Başûrê** wê:

Dîmenên deştê yên li **Başûrê Rêkê**:

Kendûkorên wî kêrtekortî ne, û tu dîmenên balkêş lê tunene, tenê bêla bi navê Qotê li ber Gu.Tilifê heye. Ji Gu.Tilifê û bi Rojava de, gelek gund hene. Li ber Gu.TilĥĤemo girê Tilhemo yê şûnewarî heye, bajarokê Cindirêsê û girê wê yê şûnewarî yê navdar jî li ber bajêr e. Pişt re, gelek gundên şên ji Cindirêsê û Rojava de hene, gundê dawîn Ĥemam e, ew li aliyê deştê yê herî Rojava li ber sînorê Tirkiyê ye.

Dîmenên **Bakurê Rêkê**, ew bi tevahî wiha ne:

Li Rojavaya bêla Çêl Kaniya, Ge.'Enderiyê tê, kanî û du girên şûnewarî yên biçûk li derdora wê kaniyê ne(1). Sirta li Rojavaya cîgeha 'Endîbê (Lê Enderiyê yê) jî bi navê Kelemsêwî tê nasîn, ew bêleke fere ye, û sînorê wê yê Rojava geliyê Şêx Evdirehmên e.

Ge.Şêx Evdirehmên li ber Gu.Satiya çê dibe, ew li wir bi navê “Ge.Tirba” tê nasîn, paşê di navbera gundên Gewrika û Feqîra re dimeşe, û li ber pîrozgeh û Ka.Şex Evdirehmên bi Ge.Maraqê re, ku ji Rojhilat ji hêla Gundê Mezin û her du gundên Keferdelê de tê, dibe yek û bi navê pîrozgeha Şêx Evdireĥmên tê nasîn. Pişt re, gelî berê xwe dide Başûr, û piştî dora 5/km digihê çemê Efrînê. Berê, ava wî gelî pir bû û gelek kanî dihatin ser, lê li roja îro, tenê du kanî jê mane, Kanî Reşk û Ka.Zaretê, ew her du jî li ber girê Şêx Evdirehmên in.

1 - Yê yekemîn, li ser destê rastê piştî çateriya gundên Keferdelê û Feqîra ye. Yê diwemîn jî, li aliyê çepê yê riya Efrîn – Cindirêsê li nêzîk çaterêya 'Enderiyê ye. Ew her du jî niha tê çandin.

Paşê, li Rojavaya Ge.Şêx Evdirehmên, zemîn kêrtekortî dibe, û wilo ta digihê Çi.Qişlê li ber sînorê Tirkiyê, û li wir li ber Gu.Hemamê bi dawî dibe. Di vê navbera dirêj de, gelek gundên şên hene, gelek girên şûnewarî jî lê tên dîtin, mîna Girê gundê Qîlê, du girikên biçûk li Bakurê Gu.Sindiyankê jî hene, berê çend kanok li dora wan têdizan û ra dawiya payîzê diherikîn.

Ji bilî dîmenên ku me li jor anîne zimên, çend geliyên naskirî jî di rûbera deştî ya di navbera Ge.Şêx Evdirehmên û sînorê Tirkiyê de hene, yên giringtir ev in:

**Geliyê Xalta:** Ji Gu.Xalta de dest pê dike, di ber her du gundên Miskê, gundên Bircikê û Qurbê re derbas dibe, û li ber gundê Ebû Ke'bê digihê çemê Efrînê, ew li wir bi navê Ge.Xenzîrek tê nasîn. Ew cowikekî mezin bû, gelek gundan sûd jê werdigirt, lê niha ziwa bûye. Dirêjiya wî gelî dora 10/km ye.

**Ge.Ĥesîrkê**: Bi navê cihê ku lê dest pê dibe tê nasîn, ew di Rojavaya Cindirêsê re derbas dibe, û li nêzîk Gu.Nisriyê digihê çemê Efrînê.

Geliyê **sisiyê:** Di nav Gu.Heciskenderê re bi Başûr de berve çemê Efrînê dere.

Li destpêka sedsala bîstan, deşta Cûmê bi cureyên geyayên dirêj dihat pêçan. Lê piştî ku alavên cotkirinê yên nûjen derketin, tevahiya wê deştê hat vekirin, û bi cureyên dar û çandiniyên salane hatin çandin, nemaze jî bi darên zêtûnê, ku roja îro piraniya pir ji rûbara beşê wê yê perava çemê Efrînê ya rastê digrin.

Berê, gelek kanî li deşta Cûmê derdibûn, erq û cowikên hêja jê peyda dibûn, û piraniya wan li dirêjiya salê diherikîn. Lê ji ber kêmbûna baranê û kolandina bîran, piraniya wan kaniyan ziwa bûne, û tenê navên wan mane.

Lêkolîna Duyem

# Kendûkorên Çiyayî yên navça Efrînê

Çiyayê Kurmênc ji çend komesirtên çiyayî pêk tê. Û gelek Zewr, gelî û newalên fere di navbera wan de hene.

Komesirtên Çi.Kurmênc ên Bakur û Rojava di ber sînorê Tirkiyê re dirêj dibin.

Sirtên Rojhilatî jî, li aliyê Bakur ji ber sînorê Tirkiyê de dest pê dibin, û di ber her du keviyên çemê Efrînê re dirêj dibin ta digihên bajarê Efrînê. Zincîra navîn ji sirtên Çi.Kurmênc jî, ji Gu.Kotana de dest pê dibe, û li Rojava li ber bajarokê Reco bi dawî dibe. Zincîra sirtên Başûrî “Çi.Hawarê” û “Çi.'Etmana” jî, ji Gu.Naza de dest pê dibin, û bi Ge.Tîra li Rojava tên birîn, û li Rojava li ber û sînorê Tirkiyê bi dawî dibin.

Çi.Lêlûn jî li Başûr û Başûr Rojhilata navça Efrînê ye, ew ji hêla Xaknîgarî û kargêrî de, parçak e ji Na.Efrînê.

Emê di vê lêkolîna jêrin de, giringtirîn dîmen û kendûkorên sirtên çiyayî li Na.Efrînê salix bidin. Hêvîdar in tiştekî sûdar be û tê de bi serkevin.

# Zincîra sirtên Rojhilatî
# û dîmenên wan

Ew zincîrek e ji sirt û bêlên çiyayî ye, di ber her du peravên çemê Efrînê re dirêj dibin. Ew sirt li Bakur, ji ber sînorê Tirkiyê de dest pê dikin, û li Başûr, li ber bajarê Efrînê bi dawî dibin.

## 1. Dîmenên sirtên perava Rojhilat a çemê Efrînê.

Ew zincîrên sirtan ji du beşan pêk tên**, Bakurî** û **Başûrî**:

### A- Beşê Bakur:

Ev sirt ji ber sînorê Tirkiyê de, ji ba Gu.Dêrsiwanê ku dora 12/km li Bakurê bajarokê Şera ye, dest pê dikin, û di ber rêçûna çemê Efrînê re bi Başûr de berdirêj dibin.

Dîmena yekê ya vî beşî Gi.'Eyneliyê ye, ew li Bakur Rojavaya Gu.Dêrsiwanê dikeve, li kêleka wî Ka.'Eyneliyê heye, ava wê mîna “'eynikê/nînikê” zelal e, gir û kanî jî bi wê salixê hatine binavkirin.

Li aliyê Gu.Dêrsiwanê yê Başûr, Ge.Dêrsiwanê tê, ew bi Rojava de berve rêçûna çemê Efrînê diçe. Bêla ku li aliyê gelî yê Başûr jî, bi navê Kîşkê Gu.Wêreganê tê nasîn, gund li ser aliyê wê bêlê yê Bakur e. Ew kîşik li aliyê xwe yê Başûr bi Ge.Tilîlaqê (Ge.Êş, Ge.Ce'nimê) bi dawî dibe.

Geliyê Êş li Rojhilat ji du newalan pev dikeve, **yek:** Ge.Ze'delînê li ser navê Gundekî Kurdî ye, li paş sînorê Tirkiyê bi 2/km ye. **Didu**: Ge.'Erebwêranê, li ser navê Gu.'Erebwêranê ye, ev gelî ji derdorên wî gundî dafire, û li ber pira 'Erebwêranê bi geliyê yekê re dibe yek. Gelek kanok ji wan devgeliyan derdibin, mîna Ka.Gawira, li kêleka wê mezelkî kevin û şûnewar hene. Li nîvê Ge.Tilîlaqê jî, girê Tilîlaqê yê şûnewarî yê mezin heye, li kêleka wî Gu.Qetlebiyê yê ku niha vala bûye tê. Li demên berê çend aşên avê

li ser wî gelî digerîn[1]. Bergeha bilindahiya van kendûkorên jorîn dora 500/m e.

Li Rojhilata Gu.'Erebwêranê bi dora 3/km, Gu.Dîkmedaşê tê, ew li ser rûyê Çi.Seqirtepe ye, û dora 9/km li Bakurê bajarokê Şera ye, sînorê Tirkiyê jî li Bakurê gund dimîne.

Ji Ge.Tilîlaqê û bi Başûr de, sirt û bêl nizim dibin, rûberin jê bi darên merxê hatine çandin. Ev sirt bi çend newalan hatine birîn, mîna Ge.Rûlik û Ge.Piling…

Li Başûrê wan sirtan Çi.Pe'nik tê, li aliyê wî yê Bakur Ka.Kewa heye. Li aliyê Rojhilat jî Çi.Qerexelo heye. Ev her du sirtên çiyayî, li Başûr bi geliyê Sîmanê tên birîn.


Ge.Sîman ji ber Gu.Omera de peyda dibe, ew geliyekî kûr e, bi darên Çinarê dagirtiye, Ka.Sîmanê ya pirav jî li serê wî li ber gund derdibe, û heyameke zor ciwan dide wê deverê, loma jî navê wî gelî di hin stranên herêmkî de bi bîr hatiye.

Li aliyê wî gelî yê Bakur, li Başûrê Gu.Çema, Çi.Çûçelê tê. Li Başûr Rojavaya Gu.Çema bi 2/km jî, Gu.Be'rava heye, li kêlaka gund girek, gor û zêrzemînên şûnewarî di tehtê de kolandî hene, ev gund 4/km li Bakur Rojavayê bajarokê Şera ye.

Li Başûrê Gu.Be'rava bi dora 3/km jî, Çi.Keloşkê heye, ew nav ji kavilên şûnewarî ku li ser rûyê wî yê Rojhilat in, hatiye, ew keloşk li hember solava Meydankê li ser çemê Efrînê ye, û ji sala 2000î de gola Meydankê li ber ew dever kiriye wek buhiştê. Bilindiya wî çiyayî 600/m e, dîmena wê deverê zor ciwan e. Çi.Keloşkê ji aliyê Başûr de bi Ge.Kanî Kurkê tê birîn. Ew jî geliyekî kûr û bi dar e, riya Meydankê ya kevin tê re diçû, lê niha ew di bin ava gola Meydankê de maye, **[Nexşe10].**

Piştî wî gelî, zemîn li derdora gundên Çema, Omera û Şera hinekî dûz dibe, û bi darên Zêtûnê û Mêwan hatine çandin, hin

[1]- Guman heye, ku Cemîl Kinê di pirtûka xwe /Setemkariya Firensiyan…/ de çêre wî aşî bûye û bi “Aşê Dêrsiwanê” bi nav kiriye, ew dibêje ku li sala 1923an dara “hunguv a pîroz” li ber bû, û bi qentaran hunguv li ser hebû.




**Nexşe -10- Pîvan 1/350000. Sînorên dewletî + + +,**
**Rêkên ziftkir -----, Sînorên sirt û çiyan……, Çemê Efrînê**

govên darên merxê jî lê hene. Ew rûber bi Başûr de pehin dibe, û li aliyê Başûr bi geliyê Qerecurnê tê sînorkirin.

Geliyê Qerecurnê jî navê xwe ji pîrozgeha Qerecurnê ku li ber pira kevin e, biriye. Dibêjin curnekî mezin ji kevirê reş li wir hebû, lê ew li ber lehiyeke gelî çû. Ge.Qerecurnê geliyekî dirêj û giring e, bi dehan darên Çinarê yên mezin di rêçûna wî de hene, ew dar ligel ava gelî ya zelal, dîmeneke pir şêrîn, û seyrangeheke ciwan çê dikin.

Girê Ĥilûbiyê yê şûnewarî jî li ber pira nû ya ku li ser vî gelî hatiye avakirin e, li ser gir û li ber rûyê wî yê Başûr, şûnewarên avahiyan û serînceke kevin hene, ew tişt dest nîşan dikin, ku ew gir û cih li serdemên kevin şên bû.

Geliyê Qerecurnê li Rojava bi çemê Efrînê bi dawî dibe, û li wir bi navê Ge.Şêt tê nasîn.

### B- Beşê Başûr:


Sirtên çiyayî yên li Başûrê Ge.Qerecurnê, berekî Başûr rojavî distînin. Ew li aliyê Rojhilat, ji ber Gu.Qestela 'Elî Cindo ji Çi.Parsê de dest pê dikin, û li ba Gu.Cûmkê li Rojhilata bajarê Efrînê bi dora 1/km kuta dibin, **[Nexşe 11].**

Bilindiya Çi.Parsê 855/m e. Ew 5/km li Bakur Rojavayê bajarê Ezazê ye, û 7/km li Başûr Rojhilatê bajarê Kilisê li Torkiyê ye. Pîrozgeha Parse Xatûnê ya Êzdiyan, û kavilên kela Canpolêt li ser wî ne. Canpolat jî Mîrekî Kurdan bû, malbata wî li sedsal sêzdehan zayînî mîrîtiya Kilisê damezrandi bû, ew mîrîtî ra destpêka sedsala hevdehan li dar bû. Li aliyê wî çiyayî yê Bakur Rojava, geliyekî kûr bi navê Ge.'Entûz dafire, ew ji wir de dirêj dibe, û li ber bajarokê Şera digihê Ge.Qerecurnê.

Li Rojavayê Çi.Parsê, çiyayê Gu.Baflûnê tê, navê lodika wî “Sirta Ĥabîba” ye. Li ser aliyê wî yê Rojava, bingehên kampa şanda Înglîzî heye, Înglîzan li dehsalên çelî ji sedsala bîstan li Pêtrolê digerîn, û hinek avahî li wir ava kiri bûn. Riyeke bi endezeyeke kevirkirî ye zor ciwan jî ji gundê Qitmê de hildikşe û digihê Kampê, ew reêk jî ji çêkirina wan e û hîn xizmeta gundiyan dibîne.

Ji sirta Ĥebîba de, Ge.Cûrnê Kêrgo bi Başûr de dadikeve, daristanek li ser rûyê wî gelî yê Başûr heye, ew daristaneke bê mînak e, û dora sed cure darên çolê lê hene, ew dar ji hêla Şêxê Êzdî Ehmed Ce'fer de hatine çandin, di nava wê de pîrozgeha Şerfedîn a Êzdiyan jî bi destê wî hatiye avakirin.

Hîn li Rojava, Bêla Kerkez di navbera Çi.Baflûnê û Gu.Qitmê de ye, ew bi darên daristanî hatiye çandin. Li Başûrê Gu.Qitmê li ber rawestgeha çîmanê jî, girekî şûnewarî yî giring heye, kevirên şekirî û girs ên bengehên avahiyên şênewarî lê tên dîtin.




1-Ç.Parsê.Sirta hebîba.3-Kergez.
4-Bêla Menên.5-Sêguçkê.6-Ge.curnê kêrgo

Nexşe -11-
Pîvan 1/150000. Beşê pehnahî ji zincîra rojhilatî. Sînorên sirtan...... Rêkên ziftkirî ---- Çem

Ew bêla Gu.Qitmê bi Rojava de diçe, gundê Serêkaniyê/kefercenê derbas dike û li wir bi navê Bêla Menên, li ser navê pîrozgeha Menên ku li ser e, bi nav dibe.

Kaniyeke giring li Gu.Serêkaniyê heye, ava wê ji bo vexwarinê diçe bajarê Efrînê. Berê ava kaniyê bi ser çemê Efrînê de diherikî, li ber Gu.Meşalê jî sê kanîne din dihatin ser: Ka.Şurkê, Ka.Pozê û Ka.Mezin. Pişt re, ew cowik berve Başûr diherikî, û li Rojavaya Gu.Qîbarê bi Ge.Coĥişkê bi nav dibû û digihîşt ava çemê Efrînê. Li

dirêjiya wî gelî ku nêzîka 10/km ye, bêtirî girekî şûnewarî li ber heye, û çend aşên avê jî bi ava wî digerîn. Lê niha ew ziwa bûye.

Li Rojavaya Gu.Meşalê, li ber rêka zeftê, cihekî şûnewarî bi navê Xirabê Gawira heye, ew niha bi darên zêtûnê hatiye çandin.

Rûbereke fere di navbera gundên Meşalê, Qurtqulaqa biçûk û ya mezin de heye, bi navê Sêguçikê tê nasîn, beşê mezin ji wê deverê bi darên zêtûnê hatiye çandin.

Çend gelî ji devera Sêguçkê çê dibin û bi Rojava de berve newala çemê Efrînê diçin, wek Ge.Bîrê yê kûr ku di navbera her du gundên Qurtqulqê de ye.

Di nîvê devera sêguçkê de, koreke fere heye, ew wek kovikeke mezin e, û bi navê Kortikê tê nasîn, ferehiya devê wê dora 2/km e, û nêzîkî 300/m jî kuûr e. Li ser keviya wê, li aliyê Rojhilat, navenda kirîna gênim/mîra û malên gundê Kortikê hene. Pesarên wê Kortê yên hundur jî bi darên Merxê hatine çandin û daristaneke ciwan jê peyda bûye.

Li aliyê herî Başûr Rojava ji cîgehê Sêkurê, bêleke baziltî heye, gundên Qeredepe û Qestela Kîşik li ser rûyê wê yê Bakur in[1], Gu.Cûmkê jî li aliyê wê yê Başûr e, dûrbûna vî gundî ji Efrînê dora 1.5/km e. Ew bêla ji aliyê Rojava de jî digihê Çemê Efrînê.

## 2. **Dîmenên kendûkorên Rojavayê çemê Efrînê:**

Ew kendûkor bi ser zincîra sirtên Çi.Kurmênc ên Rojhilatî ve tên jimartin. Ew ji ber taximê Tirkiyê, di ber perava çemê Efrînê re berve Başûr dirêj dibin, û li Bakurê bajarê Efrînê bi dawî dibin. Sînorên wan sirtan ji Rojhilat de, newala çemê Efrînê ye, û ji Rojava de jî geliyê Çayê û Ziravkê ne. Dîmen û kendûkorên wan sirtan ji Bakur de berve Başûr wiha ne, **[Nexşe 11]**:

Li aliyê herî Bakur, Sirta çiyayî ya kela Nebî Horî û sirta Kalgavan ku li Rojavaya wê ye, hene. Çend gund li Bakur û

---

1 - Kîşik yan Kêşik: Ango “kaşê biçûk” e. Ew nav ji pesarên rojavaya wê bêlê re tê gotin. Hin jî ji wî cihî re “Cebel Ĥenê” dibêjin. “Ĥenê” li ba Kurdan jî navekî jina ye. Ew cih devereke geştevaniyê ye li ber perava çemê Efrînê, pireke Çîmanê jî li wir heye.

Rojavaya wan sirtan, li ber sînor belav dibin: 'Ebûdan (geliyên Sor û Gewr di ber re derin), Gu.Kurdo, Gu.Heftar û Gu.Şêxorzê. Çi.Şêxorzê jî ku bilindiya wî 765/m e, li Başûr Rojavaya şûnewarên bajarê Nebî Horî(Sîros) ye, ew ji aliyê xwe yê Rojava de bi ser gundê Qestela Miqdêd de dadikev.

Ji aliyê Çi.Şêxorzê yê Başûr Rojava de jî, Ge.Gamêşa çê dibe, û di navbera gundên Zêtûnek û Se'rîncekê re bi Rojhilat de berve çemê Efrînê dadikeve. Di navbera Gu.Se'rîncekê û Diraqliya de jî, geliyên Qanê û Hûçkê/Ge.Bîrê hene, evê dawîn ji Gu.Qizilbaşa bi Rojhilat de berve çemê Efrînê dakol dibe.

Li Başûrê Gu.Qizilbaşa, Gu.Naza tê, li Başûrê Naza zemîn hêdî hêdî dûz dibe, ta digihê Gu.Meydankê. Li Rojavaya vî gundî, Gi.Dudêrê yê şûnewarî hebû, lê ew ji dora heştê salî de vala bûye û tukes lê rûnane.

Pişt re kendûkor dûz û pêlpêlkî dibin, gelek qelaşên avê yên biçûk û mezin wê diqelêşin, û wilo ta digihê deşta 'Emara li ber dawineyên Başûr Rojhilat ên Çi.Hawarê. Ji geliyên ku di vê navberê de hêjayî bibîranînê ne: Ge.Qamîşlê, ew li ber gundên Gemrûkê û Şorbe çê dibe, û bi Başûr de berve çemê Efrînê diçe.

# Dîmenên Çiyayê Lêlûn

Çi.Lêlûn ji sirtên beşê Rojhilatî ji Çi.Kurmênc tê jimartin, loma jî ew li dirêjiya sedsalan perçakî sereke bû di nav sînorên kargêrî û Xaknîgariya Çi.Kurmênc de.

Çi.Lêlûn li Başûr, ji ber havîngeha Serêkaniyê de dest pê dibe, û li Başûr Rojava li ber sînorê Tirkiyê li ba Gu.Dêrbelûtê bi dawî dibe. Dirêjiya wî dora 50/km ye, şêweya wî yê Xaknîgarî kevankî ye.

Li serdemên kevin, Çi.Lêlûn bi Çiyayê Nebo dihat nasîn[(1)], li demên nêzîktir jî, ew bi navê çiyayê Sem'anê, li ser navê Mar Sem'anê Stûnî  hatiye binavkirin.

Berê, ew çiyakî daristanî bû, loma jî diz û rêbiran xwe tê de vedişartin. Dibêjin, ji bo ku destlata Osmanî cih li wan dizan bihermîne, rabû piraniya rûberên daristanên çiyê birîn, ên mabûn jî li destpêka sedsala bîstan ji bo ardûya çimanê hatin birîn.

Li van salên dawîn, piştî ku pez kêm bû, gelek darên daristana kevin wek guvîjê…, jiserkînûve lê şîn dibin. Dewletê jî ji hêla xwe de rûberine baş ji serê çiyê bi darên merxê çandin.

Lêlûn çiyakî zinarî ye, ji aliyê Rojhilat de bi deştên Bakurê Helebê re dûz dibe. Ji Gundên Kurdan ên Çi.Lêlûn ên herî nêzîk ji bajarê Helebê ve, Gundê Mezin e, ew 17/km li Bakur Rojava Helebê ye.

Rûyê Çi.Lêlûn ê ku bi ser deşta Cûmê de dadikeve, pir dîke û zinarî ye, gelek geliyên kûr, benên bilind û dirêj û şikeftên rengareng di pesar û geliyên çiyê de hene. Ji bilî wê, gelek kavilên avahiyên şûnewarî jî li ser Çi.Lêlûn belav dibin, nemaze li aliyê çiyê yê Başûr li ser beşê Şêrewa. Di nav wan de gundên şûnewarî, dêr, kinîse, qonaq… û gelek avahiyên şûnewarî yên ji curene û pir giring û hêja hene, ew hemî jî ji serdemên Alefiringî û yên berî wan in, pirbûna wan şûnewaran gihîştiye radekê, ku "Baba Bûlis Yetîm" li derbarî Çi.Lêlûn li ew serdemên kevin dibêje, ku ew bi şênbûna xwe, mîna Çi.Libnanê yê niha û Çi.Asosê li welatê Yûnanê bû.

---

[1] - Nebo: Xwedêyekî Mîzopotamî ye, berî hatina ola Fileh li Çi.Lêlûn dihat pîrozkirin.

Çiyayê Lêlûn ji du beşan pêk tê:

**Bakurî**: Li Bakur ji Gu.Serêkaniyê de dest pê dibe, û li Başûr li ba Kela Sem'anê kuta dibe. Dirêjiya vî beşî dora 30/km e, asta bilindiya wî a navîn jî 550/m e.

**Başûrî:** Ji ber Gu.Xezîwê de dest pê dibe, û li Rojava li ber sînorê Tirkiyê bi dawî dibe. Dirêjiya vî beşî dora 18/km e, asta navîn a bilindiya wî jî dora 300/m e.

Emê niha salixên dîmenên Çi.Lêlûn ên sereke, bi navên wan ên herêmkî hewaldin.


## 1. Beşê Bakur ji Çi.Lêlûn:

Ev beş li hêla Bakur, ji Başûrê Gu.Serêkaniyê, ji ber riya Heleb-Efrînê de dest pê dike, û li Başûr li ber Kela Sem'anê bi dirêjiya dora 30/km bi dawî dibe, **[Nexşe 12]**. Ev beşa ji Çi.Lêlûn, ji hêla civakî de jî parve du perçan dibe: **Yek:** Çi.Robariya, ew li hêla Bakur e, û yanzdeh gundên Hoza Robariyan li ser in. Rûberine fereh ji zemîna vê deverê ji çandina salane û darûberan re lêhatî ne. **Didu**: Çi.Şêrewa, ew jî li aliyê Başûr e, û hevdeh gundên Şêrewa li ser in. Ew beşa ji gundê Soĝanekê de dest pê dibe, û li Başûr li ber kela Sem'anê bi dawî dibe. Xaka devera Şêrewa zinarî ye, rûberên ku ji çandinê re dibin pir teng in, govên axî jî ku di nav zinaran de hene, bi cureyên tene û darên zêtûnê tên çandin.

Bi tevahî, zemîna ser Çi.Lêlûn zinarî ye, kendûkorên wî pêlpêlkî ne, her bi Rojhilat de diçin, dibin axî, û bi deşta Bakurê Ĥelebê re dibin yek.

Ji bilî cîgehên şûnewarî yên naskirî û navdar, tu dîmenên xaknîgarî yên taybet li ser Çi.Lêlûn ku hêjayî salixdanê ne, netên dîtin.

Lê pesarên çiyê yên Rojava, ku bi ser deşta Cûmê de dadikevin, bi dîmen û navên Xaknîgarî yên Kurdî dewlemend in. Ew yek jî destnîşan dike, ku jiyana mirovê Kurd, ji berê de û bi şêweyekî berdewam bi wî çiyayî û bi deşta Cûmê ve hati bû girêdan. Emê li vir salixên dîmenên pesarên Çi.Lêlûn ên Rojava yên li hember Deşta Cûmê hewaldin:




Nexşe -12- Pîvan 1/150000. Sînorê Beşê Bakur ji Çi.Lêlûn.....

Çi.Lêlûn li aliyê herî Bakur, bi sirta Biĥwarê dest pê dibe, ew sirt li hember Gu.Qitmê li Başûrê riya Helebê ye. Sirta li hember Gu.Meşalê jî bi sirta Qendîlê bi nav dibe, û li ser pesarê wê yê Bakur Rojava Ka.Kewa heye.

Piştî sirta Çi.Qendîlê, Çi.Sipî tê, navê kaşê wî yê Rojava, Sirta Pêftê ye. Li Başûrê wê sirtê geliyê Çivkê yan (geliyê xwar) ê kûr û dirêj tê, ew li ber Gu.Kefrermizê çê dibe, û li Bakurê Gu.Qîbarê bi dawî dibe. Piştî wî gelî, geliyê Qîbarê tê, ew jî di nava Gu.Qîbarê re derbas dibe û gund dike du perçe, Bakurî "Qîbar" e, yê Başûr jî 'Erşê ye[1].

Li Başûrê Gu.Qîbarê bi nêzîk 1/km Ge.Çêlxanê yê kûr heye, di nîvê wî de pîrozgeha Çêlxanê ya Êzdiyan heye. Pîrozgeh şikefteke biçûk e di tehtê de hatiye kolandin, avine zelal li dirêjiya salê ji binbana wê dadirve. Ew gelî li Rojhilat ji nava çiyê, ji dûzahiya axî ya bi navê Qişla Omerîkê çê dibe, û bi Rojava de dadikeve. Ew dûzeke şov e, rûbera wê dora 5/h e. Li aliyê wê yê Rojhilat, şikeftine şûnewarî hene, gundê Qîbarê yê kevin li wir bû, û berî dora 200 sal, şêniyê wê jê bar kir û daket cihê gundê yê niha. Pîrozgeha Melekadî ya Êzdiyan a navdar û kevin jî li wî cihî ye.

Li aliyê wê dûzê yê Bakur Rojava, goristaneke kevin li serê sirtê heye, û kavilên Birca Cindî jî li Rojavayê goristanê ne, dareke Sindîganê ya mezin li kêleka Bircê heye, bi "Dara Bircê" bi nav dibe, ew li ba Êzdiyan dareke pîroz e, û ji dûr de xuya dibe.

Li Başûrê Ge.Çêlxanê, Ge.Çûkê tê, ew geliyekî zirav e, zinarekî qul tê de heye bi nave "Kevirê qul" tê nasîn, zarokên ku bi nexwaşiya Kuxka Qîqî diketin, di wê qulkê re derbas dikirin û ji ava Çêlxanê jî didanê, xelkê guman dikir ku ew nexwaşî bi wê yekê çareser dibe.

Li Başûrê wî gelî, Ge.Ningerê yê kûr û fereh tê, li rûyê wî yê Başûr qulqewêreke fereh di binê cihehî zinarî de heye, jê re "Xwîşka Çêlxanê" tê gotin, ew jî mîna pîrozgeha Çêlxanê tê pîrozkirin, û av ji binbana wê jî dadirve.

---

1 - Navê gund “ 'Erş Qîbqar ” ji navê her du beşên gund hatiye.

Li dûriya 1/km li Başûrê wî gelî, Ge.Lêkê tê, şikefteke mezin di pesarê wî yê Başûr de heye. Ew geliyekî kûr, dîke û mezin e, ji rûyê çiyê de ji cihekî axî û dûz bi navê Qişla 'Îda çê dibe, rûbera wî cihî dora 10/h ye. Şûnewarên Gu.Turundê yê kevin li aliyê wê dûzê yê Rojava ne, şêniyê gund berî dora du sed sal ji çiyê daketine deştê, hîn jî mezelê gund yê kevin li Başûr Rojavaya wî cihî, li ser pesarê çiyê, li kêleke Şikefta Tirba ye. Lê mixabin, bêyî ku mirî û zindî jî werin rêzdarkirin, ew cih bû kana hilkirina keviran, û gor û şikeft jî hatin wêrankirin, û sirûşta ciyê jî tê kavilkirin.

Li Başûrê Ge.Lêkê, Ge.Odê tê, ew jî geliyekî dîke û fereh e, ji serê çiyê de dadikeve. Li destpêka wî gelî, li ser rûyê Başûr, zinarekî mezin heye jê re Nikilê Têr tê gotin, berê şêniyê devera Robariya di wî gelî re dadiketin deşta Cûmê û bazara bajarê Efrînê.

Li Başûrê Ge.Odê bi nêzîk 1/km, Ge.Kozberxê tê, li aliyê wî yê Başûr kana Ĥewarê heye, bi axa wê ya gewir (ĥeware) xanî dihatin sipîkirin.

Pişt re, Ge.Qulheftarê tê, ew di navbera arziyên gundên Turundê û Kurzêla Cûmê de ye, li demên berê, rêka devera Tatliqê û Helebê tê re diçû. Li destpêka wî gelî, cihekî bi navê Sirta Gocarî Pêlkê heye, Gocar jî bi zaravê herêmkî, wateya “komelodeke zinarî ye mezin” dide.

Li Başûr, piştî Gu.Kurzêlê, Ge.Lûlik (Rûlik) tê, ew geliyekî kûr, zinarî, dîke û dijwar e. Berê, kaniyên avê ji binê wî derdibûn û rêkeke çûndina bajarê Helebê jî tê re diçû. Ew gelî ji sê newalan pev dikeve, navên wan ji Bakur de berve Başûr wiha ne: Ge.Ĥawûda, şikefteke mezin bi navê Şikefta Sor tê de ye, Ge.Kuştiya[1] û Ge.Birqê.

Li Başûrê Ge.Lûlik, Ge.Kêrgo tê, şikavlên şûnewarî yên kevnar lê hene. Cihê bi navê Kor Ĥewarê jî li ser rûyê gelî yê Bakur e. Pişt re cihê bi navê Kirêcliq tê, li wir Kirêc ji bona avakirina xaniyan dihat çêkirin.

---

[1] - Li dema şerê cihanê yê yekê, Çeteyên Osmanî heft kesên sîvîl ji gundê Kurzêlê di wî gelî de kuştin, û gelî bi wê bûyerê navdar bû.

Li ber riya ku ji Gu.Basûtê hildkişe Gu.Kîmarê û li nava çiyê, cihên bi navê Cilĥinarê û Havîniya hene, cihê dawîn dûzeke axî ye, di ser Gu.Basûtê re ye, berê şêniyê Basûtê ji germ û kelmêşên havînê direvîn û diçûn lê rûdinştin, niha jî komgeheke geştevanî ye hêja bi nave (Ciyayê Xewnan) li wir hatiye avakirin.

Dora du sed mitr ji wir û bi Başûr de, Ge.Duderiyê tê, di nîvê gelî de, şikefteke biçûk e bi du deriyan bi navê Şikefta Duderiyê heye, riya Kîmarê ya peyade tê re derbas dibû. Ew gelî bi şêweyekî pir dîke di nava Gu.Basûtê re berve Rojava dadikeve.

Li aliyê Basûtê yê Başûr, li nîvê jêrîn ji rûyê çiyê, kaşekî tûj bi navê Kaşê Bê yan Bakaşê heye, eger çiqas ba tune be, ew herdem li wir dilîze, navê kêş jî ji wê teybetiyê hatiye. Li serê wî kaşî pîrozgeha Zaretokê heye, ew dareke Zêtûnê ye, xelk wê pîroz dibîne. Li nêzîk cihê pîrozgehê jî, cîgehê Keloşkê tê, xirabeyên şûnewarî yên kevnar li wir hene, şikeftek bi navê Şikefta Pîrê jî li wir heye, ji nava gundê Basûtê de tê dîtin(1)..

Li Başûrê Basûtê, çemê Efrînê di derbenda di navbera Çi.Lêlûn li Rojhilat û Çi.Bozîkê li Rojava re derbas dibe, derbend nêzîk 1/km dirêj e û bi "Geliyê Xiyara" tê nasîn, Gu.Bircê jî li aliyê wî yê Başûr li ser rûyê Çi.Lêlûn e.

Li Başûrê Gu.Bircê, Ge.Kûr tê, ew wek qelşeke mezin e di rûyê çiyê de, Şikefta Devsor a fereh di nîvê wî de ye.

Li Başûrê wî gelî bi dora 1/km, geliyê Duderiyê tê, ew jî geliyekî kûr e, keviyên wî pir dîke ne, şikefta Duderiyê ya navdar li ser lêva wî ya Başûr e. Qerqodeyê zarokê Niyandurtalî ji sed hezar sal de di bin axa şikeftê de hat dîtin, û wilo ew şikeftek li seranserî cîhanê navdar bûye. Şikeftine din jî di her du rûyên wî gelî de hene.

Ji wî gelî û bi Başûr de, Ge.Ĥusêniyê tê, şikefteke mezin bi wî navî tê de heye. Ge.Qertel jî li Rojhilata Gu.Xezîwê ye, şikefteke

---

1 - Şêniyê Basûtê dibêje, pîrek bi navê “Dêmîk” ango “ya bejî ” di wê şikeftê de dijî. Ew pîra bi pîra “Avîk” a ku li ber perava çemê Efrînê dijiya re herdem di şer de bû. Şivanek jî hebû di navbera wan de diçû û dihat, û gotin û gefên wan digihandin hev. Hîn şêniyê gund wan gotinên şêrîn û li hevhatî û ew çêroka evsaneyî dizanin û yek malikan jê dibêjin.

mezin bi wî navî di wî gelî de heye. Li dû wan jî, Ge.Newalê Aşa heye, du şikeftên mezin tê de hene: Şikefta Xofê û Şikefta Pîra Zînê.

Pişt re, çiya bi Başûr de dirêj dibe, û piştî dora 7/km digihê ber kela Sem'anê. Çend geliyên biçûk û dîke di wê navberê de di rûyê çiyê re bi Rojava de dadikevin, lê bi tevahî, tu pergalên taybet tê de tunene, lê rûbereke baş jê bi darên Merxê hatine çandin.

Bi tevahî, beşê Bakur ji Çi.Lêlûn zinarî ye, geliyên wî kûr û dîke ne, bi dehan qulqewêr û şikeftên rengereng tê de hene, lê me pêwîst ne dît em hemiyan bijmêrin.


## 2. Perçeyê Başûr ji Çi.Lêlûn:

Ev sirtên çiyayî li ser sînorên Na.Efrînê yên Başûr dikevin, ew ji çiyayên navça Efrînê re, mîna zincîra berepehn a çaran tê dîtin. **[Nexşe 13].**

Sirtên vî beşî ji Çi.Lêlûn, ji Rojhilata Gu.Xezîwê, ji Ge.Newalê de dest pê dibin, û li Rojava li ber sînorê Tirkiyê bi dawî dibin.

Dîmena yekê ya balkêş a vî beşî Ge.Newalê ye, rêka ziftkirî ya ku dere Helebê tê re derbas dibe. Pişt re, Ge.Toqê tê, ew li Başûr Rojavaya Gu.Xezîwê ye. Li destpêka vî gelî, li ser çiyê, di navbera gundên Xezîwê û Şadêrê de, dûzek heye, rûbera wê dora 20/hêktara ye, hin şikavil, şûnewar û bîrên kevnar lê hene, ew cih bi navê Xirabî Toqê bi nav dibe.

Li aliyê Gu.Şadêrê yê Rojhilat jî, Ge.Pêlpêlkê hey, ew bi Ge.Şadêrê yan geliyê Şêx Rikab jî, li ser navê pîrozgeha Êzdiyan a li wir e, tê nasîn, û di nava gund re derbas dibe.


Nexşe -13-
Pîvan1/150000
Beşê başûr ê
bipehnahî ji
Çi.Lêlûn
N
1-Ge.Toqê.2-Ge.Pêlpêlkê.3-Ge.kanidînkê
4-Wargê.5-Dibsizê.6-Ge.Badê.7-Ge.Zîn.
Efrîn
Cindirês
Xezîwê
Şadêrê
Celemê
Îska
Mile Xelîla
Dêrbelût
Pîrozgeha
Şêx Rikab
Heleb
1
2
3
4
5
6
7
Herêma hêrimê

Piştî sirta çiyayî ya li Rojavaya Gu.Şadêrê, Ge.Kanîdînkê tê, li wê deverê şûnewar û gorên kevin hene, ew hemî bi Kela Teqlkê[1] bi nav dibin, cihê wê zinarî û dijwar e, ew li dawiya sedsala hejdehan, baregehe mala 'Umê bû. Nofek ji xelkê, wê deverê wek cihekî pîroz dibîne.

Li aliyê Gu.Şadêrê yê Başûr, li ser çiyê, cihekî şûnewarî bi navê Ne'ûska heye, ew çar ode ne di tehtê de kolandî ne. Piçekî li Rojhilata wan, cihê bi navê Warê 'Elûkê[2]heye. Ev hemî cih di navbera gundên Şadêrê û Îska de ne.

Li Başûr Rojavaya Gu.Îska li ser çiyê, cihekî dûz û fereh bi navê Wargê heye. Di navbera gundên Îska û Celemê de jî, geliyekî bi navê Dîbsizê yan Ge.Mirtiba tê, şikefteke mezin bi wî navî di wî gelî de ye.

Ji bilî wan, li Rojavaya Gu.Îska bi dora 1.5/km, cihekî bi navê Qarsaq heye. Li destpêka salên şêstî ji sedsala bîstan, çend malên Ereb ên xudan pez, konên xwe lê danîn, û piştî ku sûd ji "zagona durustkirina çandiniyê" wergirtin, bûn xudî zevî û xanî li wir ava kirin.

Li Rojavaya Gu.Îska bi nêzîkî 5/km Gu.Celemê tê, li Rojavaya gund, Ge.Badê yan Ge.Boyecê û Ge.'Elî Qaqo hene, evê duyem zinarî û kûr e, li destpêka wî li serê çiyê cihekî bi navê Kor Xelo heye, şikavlin kevnar lê hene, li demên berê, gundê Celemê yê kevin li wir bû. Mitekî zinarî û mezin di navbera wan her du geliyan de heye, jê re Mitê Me'serkê tê gotin, guvaşgeheke kevirî ye kevnar jî li ber heye. Li Rojavaya Gu.Celemê li serê çiyê, Mitê Qîlê heye, sînorên di navbera Na.Efrînê û gundên Na.Hêrimê de, ji wir de dest pê dibin.

Pişt re, kendûkorên xwezayî yên çiyayî bi Rojava de dirêj dibin û digihên Gu.Qulkê, sirtên çiyê li aliyê gund yê Rojava û Başûr nizim

---

[1] - Ew Kela malek, kînîsek û sarînceke avê ye. Xuyaye ku ew war li sedsala dehan zayînî, li dema cengên Ĥemdanî û Bîzentiyan bibû baregeheke serbazî. Jêder: /Ebdela Ĥeccar, Kinîsa Mar Sem'an, rûpel 167/.

[2] - “ 'Elok ” yan 'Elî, xudanê keriyek bizin bû li wir rûdinişt. Dora nîvê şeniyê gundê Îska ji neviyên wî ne.

dibin. Li Rojava, berî Gu.Dêwê Jorin, geliyekî kûr bi navê Gelî Zîn heye, ew çiyê diqelêşe û bi Bakur de berve newala çemê Efrînê diçe. Li Rojavaya wî gundî, pîrozgeha Şêx Kiras li ber çiyê ye. Pişt re, ew sirtên çiyayî yên beşê berepehin ji Çi.Lêlûn, li Rojavaya Gu.Dêrbelûtê, li ber sînorê Tirkiyê bi dawî dibe.

Wekî ku em dizanin, Çi.Şêx Berkêt jî ji hêla xaknîgarî de ji kendûkorên Çi.Lêlûn tê jimartin. Û digel ku ew ne di nav parkirina kargêrî ya navça Çi.Kurmênc de ye, lê rola wî di warên civakî û olî yên şêniyê Çi.Kurmênc de giring e, loma emê wî jî li vir salix bidin.

Çi.Şêx Berkêt sirta çiyayî ya herî bilind e ji Çi.Lêlûn, bilindiya wî 870/m e, ew li Rojavaya bajarê Darazê ye, û 32/km jî li Rojavaya Helebê dikeve. Deşta Metxê û Idlibê li Başûrê wî ne, deşta Hemqê jî li aliyê wî yê Rojava ye.

Pesarên Çi.Şêx Berkêt pir dîke û zinarî ne, nemaze pesarên Rojhilat, Rojava û Başûr. Li serê çiyê perestgeheke ji serdema pûtperestiyê de hebû, ew ji bo Xwedayê Yûnanî Cobîter hati bû avakirin. Li serdemên Filehan jî, kinîsek li wê şûnê hati bû avakirin û hîn şûnewar û kavilên wê li wir hene. Li roja îro, pîrozgeha Şêx Berkêt li wê şûnê ye, û ew li ba bawermendên olên Êzdî û Dirûzî [ bilî wan jî pîroz û giring e.

Gelek şûnewar jî li derdora pîrzgehê hene. Riyeke ziftkirî ji bajarê Darazê hildikşe ser Çi.Şêx Berkêt û li ber Pîrozgehê bi dawî dibe.

# Lêkolîna Sêyem

## Sirtên Çi.Kurmênc ên Berepehin

Mîna me berê jî goti bû, ji bo hêsankirina salixdana kendûkoran, me bilindahiyên navîn ên Çi.Kurmênc wek sê zincîrên komesirtên çiyayî parve kirine: Bakurî, Navîn û Başûrî. Emê di rûpelên li pêş, li ser kendûkorên her beşekî ji wan baxivin, û dîmenên wan ên sereke salix bidin.


### 1. Dîmenên zincîra sirtên Bakurî yên li ber sînorê Tirkiyê:

Ew sirt li Bakur li ber xeta sînorê Tirkiyê ne, dirêjiya wan ji Rojhilat de berve Rojava dora 20/km ye. Kendûkorên wan bi yên li aliyê Tirkiyê re dibin yek. Li aliyê Başûr jî, pesarên sirtan dadikevin ser Kundûkorên nizimtir û deştî. Li aliyê herî Rojava yên ew sirtên çiyayî jî, pesarên çiyayî bi şêweyekî pir dîke bi ser deşta Lêçe û sînorê Tirkiyê de dadikevin, dûz dibin û li hin deran digihên çemê Reş jî, **[Nexşe 14]**.

- Ew zincîra sirtan: Li Rojhilat ji Çi.Girê Mezin[1] de, li ber bajarokê Bilbilê dest pê dibin. Ew bilintirîn çiya ye li navça Efrînê û li parêzgeha Helebê, bilindiya wî 1269m in. Rûyê Bakur yê Girê Mezin di hundur sînorê Tirkiyê de ye, bajarokê Bilbilê jî li aliyê Gir yê Başûr e, li ser rûyê wî yê Rojhilat, gundên Baliya û Qurnê hene, Gu.Ze'rê jî li ser rûyê wî yê Rojava ye.

---

1 - Li sala 1923an Cemîl Kinê ew çiya bi “Darmiq” bi nav kiriye, pirtûka /zordariyên Firensî…, rûpel 5/.




**Nexşe -14- Sirtên Çiyayî yên Bakurî li ber sînorê Tirkiyê. Pîvan 1/150000. Sînorên dewletî + + +. Rêkên ziftkirî ------. Sînorên kendûkorên çiyayî ……..**

Gelek kanî ji derdorên Çi.Girê Mezin derdibin, a giringtir Ka.Hesinê ye, ew bi axa hesînî ku kanî ji nav têdizê, hatiye binavkirin, kanî ji sirta li jorî bajarokê Bilbilê derdibe, û ava xwe dide malên Bilbilê. Ka.Baliya jî li aliyê çiyê yê Rojhilat li binê Gu.Baliya ye. Ew jî kaniyeke giring e, û cihê wê pir şêrîn e.

Girê Mezin çiyakî pir dîke û bi darûber e. Li Rojavayê Gi.Mezin, Çi.Girê Biçûk tê, bilindiya wî 1202/m e. Ew jî ji aliyê Bakur de derbas nav sînorên Tirkiyê dibe. Li ser rûyê wî yê Bakur Rojava, Gu.Bêkê heye, Ka.Si'biyê di ser gund re ji nava çiyê dirdibe. Li demên berê, ev gunda ji şêniyê deşta Lêçe re wek havîngehekê bû. Ew 8/km li Rojavaya Bilbilê ye.

Li pozê Çi.Girê Çûçik, li aliyê wî yê Rojava, şûnewarên bi navê Keloşkê hene, ew cih ji dûr de wek seriyekî tûjik xuya dibe.

Li binê çiyê, li aliyê Bakur, cihekî dûz, axî û kort heye, ava baranê tê de kom dibe, û pîrozgeha Yeĝmûr Dede li aliyê wê dûzê yê Rojava ye. Pîrozgeh dareke Sîndîganê ye pirkokî ye, û sênceke kevirî li dorê hatiye avakirin.

Gi.Biçûk çiyakî pir dîke ye, bi darên çiyayî, nemaze yên sîndîganê pêçayî ye. Ev gund li ser rûyê wî yê Başûr in: 'Elî Kera, Heyama, Gu.Bêxçe, 'Elî Bega.

Pişt re, ew sirt berve Rojava dirêj dibin, û ji pesarên wan sirtan ev gelî bi Başûr de dadikevin: Ge.Bergîra, Ge.Pîrê di navbera gundên Xilalka û 'Elî Begê de, û Ge.Meydana yê mezin û navdar.

Ge.Meydana ji aliyê Başûr Rojhilat, ji deşta Meydana de dest pê dibe, û bi Başûr de diçe, û piştî dora 4/km li Rojavaya Gu.Xilalka bi dawî dibe. Li destpêka wî, Ge.Şingêlê tê ser, ew jî ji aliyê Bakur ji ber Gu.Şingêlê tê.

Ge.Meydana geliyekî kûr e, keviyên wî bilind, dîke û bi darûber in, gelek şikeft û benên bilind di pesarên wî de hene. Li demên berê, Ge.Meydana derbendeke giring bû ji bo gihîştina deverên Çi.Gewr.

Çi.Qere Bêlê jî ji aliyê Ge.Meydana yê Rojava de dest pê dibe. Bilindiya wî li Rojhilata Gu.Bilêlko, li pozê Ĥeşargê digihê 1101/m, hin kavilên şûnewarî li ser hene. Berî bi demekê, peykerê serê gakî û jinekê bi bejna tûm lê hebûn, guman hebû ku ew peykera "Xwedêya 'Eştar" bû, lê ew niha netên dîtin. Bilindiya vî çiyayî li ber Gu.Cela digihê 1000/m.

Ji ber pozê Heşargê de, Ge.Ĥeşargê yê kûr û daristanî bi şêweyekî pir dîke bi Rojava de dadikeve, pira hêsin a navdar “Pira Ĥeşargê/Heredere” li ser wî gelî hatiye avakirin. Geliyekî din jî bi

navê Ge.Goliyê ji ber pozê Ĥeşargê de çê dibe, lê ew bi Başûr de berve Gu.Cela diçe.

- Li aliyê zincîra sirtên sînorî yên Bakur: Kendûkorên çiyayî bi yên li paş sînorê Tirkiyê re dibin yek û jê cida nabin, tenê têla husturî û mayîn, rûniştvanên Kurd li her du aliyên sînor ji hev dikin.

- Pesarên Rojava yên sirtên Bakur yên sersînorî: Ew bi şêweyekî pir dîke bi Rojava de dadikevin. Gundê Mîdan Ekbezê li ber pesarê çiyê di quncikê deştê yê herî Bakur Rojava de ye. Li Rojhilata wî gundî, cihekî şûnewarî bi navê Sûrê heye, berê Çerkezên ku ji ber şerê Rûsan û Osmaniyan ji navça Çi.Qefqasê mişext bû bûn, lê bi cih bû bûn.

- Ji Gu. Mîdan Ekbezê û berve Başûr jî: Pesarên Çi.Qerebêlê pir daristanî ne, û bi şêwekî pir dîke bi ser sînorê Tirkiyê de dadikevin. Lê di navbera wî çiyayî û çemê Reş (sînorê Tirkiyê) de, dûzeke fere heye, nav û dîmenên wê deştê ji Bakur de berve Başûr wiha ne:

Dûzahiya ku di navbera gundên Mîdan Ekbezê û 'Edema de bi deşta Wêranşehir bi nav dibe, ji dîmenên wê li Rojhilata Gu.Qerebaba pîrozgeha Mistefa Derwîş heye, ew di nav darên sindîganê yên mezin de ye, dibêjin ew gora mirovekî çêxwaz bû ji Gu. Şêx 'Evdal/Firfirkê. Beşê wê deştê yê Başûr jî, ku digihê tenga pira çîmanê ya Ĥeşargê, bi Deşta Xorê tê nasîn, li dawiya deşta Xorê dûzahî teng dibe û di navbera ciyê, çemê Reş û xeta sînor de tenê çend deh mitir dimînin.

- Pesarên Başûr ji zincîra sirtên sînorî yên Bakurî: Ew bi rûberên pêlpêlkî yên nizim û deştî re dibin yek, û bi sedema hebûna axa hesinî, rengê axa wê deverê berve reşbûnê diçe, ew dever ji gelek cureyên çandinê re lêhatî ye. Li salên bi baran gelek kanî û kanok ji wan pesaran derdibin, cowikên baş jê çê dibin û ta dawiya havînê diherikin. Lewre, ew dever li Biharê pir ciwan dibe, her gundek dibe seyrangehek, her malek jî dibe gulistanek.

Dîmen û navên ew bêlên nizim ji Rojavaya bajarokê Bilbilê de û berve Rojava ta digihê Rojhilata bajarokê Reco, wiha ne:

Gundê Qestela Xidiriya di kortê de ye, li Başûrê wî Gaza Bûra heye, li Rojavaya wê jî Girê Ĥes Silûg tê, ew girekî mezin e, goristaneke kevin li ser heye, tê gotin ku gelek şer di navbera hozên

Şêxan û Biyan de li ser û li derdora wî girî rabûne, rêka Gu.Bêxçe ji wî girî de bi Bakur de hildikşe.

Li Rojavaya wî girî bi dora 3/km, Ge.Kurzêlê tê, ew ji Ge.Meydana de berdirêj dibe, û devera hoza Biya ji ya Şêxan dike. Cihekî bi navê Merca Mara li ser keviya Rojhilat a wî gelî heye. Li aliyê wî yê Rojava jî, dûzeke bi navê Deşta Camiyê heye, berê, kesên oldar ji gundên wan derdoran mîna gundên Cela, Xilalka, 'Elendara, Çençeliya, her du Çeqmaqan, nimêja Înê li wî cihî dikirin.

Ew kendûkorên Başûrî yên nizim, li Rojhilata bajarokê Reco, li ba Gu.Ĥucemala bi dawî dibin.

Bi şweyekî tevahî, sirtên sînorî yên Bakurî ji Çi.Kurmênc, û dûziyên Başûr ên pêve girêdayî, bi darên çiyayî û zeviyên zêtûnan hatine pêçandin.

## 2. Sirtên Çi.Kurmênc ên Berepehin ên Navîn:

- Zincîrên van sirtan ji Başûrê bajarokê Bilbilê de bi nêzîkî 7/km radibin: Sirta wê ya destpêkê çiyayê gundê 'Uga ye, bilindiya wî 700/m e. Pişt re Çi.Ĥeşargê bi bilindiya 800/m tê, di ser Gu.Berkaşê re li serê çiyê, xirabê Keloşkê yê şûnewarî heye. Çend gund li ser û li derdora wan her du sirtan belav dibin, wek: Şerqiya, Ĥazira, Dupîra, Xidiriya, Çolaqa, Kurzêlê û Miĥa. Li aliyê Gu.Miĥa yê Başûr pîrozgeha “ Mêrava Eslan Dede” heye, ew komek darên sindîganê ye. Li Başûrê wê Mêravê(meqam), li ser benekî zinarî, Keloşka 'Elîman heye, ew cihekî şûnewarî û kevin e.

Hîn li Başûr, li ber Gu.Xelîlaka, mêrava Ûsib Siwar heye, gelek stûn û kavilên şûnewarî yên kevin li kêleka wê ne. Li Bakurê wî cihî, ango li Bakurê rêka Reco-Kotana, gazeke fereh heye, bi navê pîrozgeha Şêx Mihemed ku li ser gazê ye, tê nasîn, ew pîrozgeh dareke Guvîjê ye, şênî wê deverê ji bo pêkanîna hêviyan, paçikên rengîn pê ve girêdidin.

Li Rojhilata wê gazê, gaza Xorê tê, ew di navbera Gu.Qaşa li Rojhilat, Gu.Qorta li Bakur, Gu.Bîbaka li Rojava û Gu.'Upila li Başûr e, bilindiya wê gazê 720/m e.

Li aliyê Başûr yê rêka ziftkirî, li hember gaza Şêx Mihemed, sirteke din bi wî navî heye, bilindiya wê 642/m e.

Li ber Gu.Kurzêla Çiyê, geliyê bi navê wê heye, ew di navbera Çi.Xidiriya û Cirqa re diçe, Gu.Kêla jî li ser pesarê Çi.Cirqa yê Başûr e, bilindiya çiyê 892/m e, û kavilên Keloşka Cirqa li ser in.

Pişt re li Rojava, Ge.Kurzêlê tê, dirêjiya wî dora 3/km e, ew ji Ge.Meydana de berdirêj dibe, navê beşê wî yê Başûr "Ge.Sincik" e. Ge.Sincik, Çi.Cirqa (ku navê serê wî Bena Kurdê) ye, sirta Enya Zinêr û Çi.Bilêl ku li aliyê Rojava ye, ji hev dike[1]. Ew geliyekî kûr û bi dar e, û li Bakurê Gu.Zerka bi dawî dibe. Benekî zinarî yî bilind li dawiya wî gelî heye, şûnewarên bi navê Pozê Keloşka Benê Qirkê li ser in, Gu.'Elendara li aliyê gêlî yê Bakur li ser rûyê Çi.Bilêl e, Gu.Zerka jî li dawiya wî gêlî ya Başûr li ser rûyê Çi.Bilêl e.

Çi.Bilêl, girekî çiyayî, bilind, mezin û bi dar e, ji çar aliyan de dîke ye, bilindiya wî 1105/m e. Li ser pişta wî kavilên şûnewaran û zêrzemîneke kûr bi navê pîrozgeha Bilalê Ĥebeşî heye[2]. Li ser rûyê çiyê yê Bakur jî, gundên Çençeliya, Çeqmaqa hene, ew dora 7/km li Rojhilata bajarokê Reco ye. Bilindiya cihê gundê Çeqmaqa dora 800/m e.

Li ser rûyê Çi.Bilêl yê Bakur Rojhilat, gundê 'Elendara heye, di ser gund re li ser çiyê, cihekî dûz û kûr bi navê Golhopir heye, rûbera wê nêzîk 15/hêktaran e, berê li salên bi baran ew cih tijî av dibû û hîn jî av ji hin cihên wê têdizê.

Li ser rûyê çiyê yê Başûr, di ser Gu.Çobana re, koreke biçûk heye, pîvanê wê 3x4/m, kûrbûna wê jî dora 2/m e, ew bi navê Gol Aqûp tê nasîn, ew herdem tijî aveke zelal e, kesên wan deveran wî

1 - Ev çiya di navbera warên van hozan de ye: Şêxan li rojava, Amka li başûr û Biya li rojhilat.

2- Ew pîrozgeh wek zêrzemîneke kûr e, guloveriya devê wê dora 5/m ye, kûranî jî dora 8/m e. Di binê zêrzemînê de, li aliyê başûr berbeqek heye, xelk bawer dike, ku ew digihê bajarê Mekê!. Ew pîrozgeh, li demên berê, li ba şêniyê wê deverê pir giring bû, xelk li destpêka biharê dihatin ber, qurban dikirin, nemaze li salên ku baran ne dibarî. Navê kesan "Bilal" jî ku li wê deverê pir bikar tê, li ser navê wê pîrozgehê ye. Li Welatşêx li Kurdistana Êraqê jî pîrozgehek bi wî navî heye.

cihî wek cihekî pîroz dibînin[1],ji rengê wê korê xuya dibe ku ew bi destan hatiye kolan.

Li aliyê Çi.Bilêl yê Rojava jî, Ge.Şurkê ji ber Gu.Holîlê de çê dibe û bi Başûr de diçe. Ew geliyekî kûr û bi dar e, li devgeliyê wî, di navbera gundên Holîlê û Kûra de, pîrozgeha Mihemed Elî ya navdar heye, li Rojavaya Çi.Bilêl, li Bakurê Gu.Xec Xelîl Çi.Mîra heye, hesin di zemîna wî de heye, Çi.Mîra li Rojhilata bajarokê Reco bi dûrbûna 2/km dikeve.

Li Bakurê bajarokê Reco bi nêzîkî 1.5/km, cihekî bi navê Sirta 'Ermûtê tê, tûnêla çîmanê di bin re dere. Ew sirta Çi.Mîra digihîne Çi.Kurê li Rojava.

Çi.Kurê jî sirteke bilind û bi darûber e, û bi şêweyekî pir dîke bi Rojava de bi ser deşta Lêçe de dadikeve. Li aliyê Başûr yê lodika wî, xirabekî şûnewarî bi navê Xirabê Qeĥwecî heye, zinarekî gewre jî bi navê Kevirê Ker li wî cihî ye, û ji dûr de xuya dibe. Beşê wî çiyayî yê Başûr, ango li Rojavaya bajarokê Reco, bi navê Gu.Hopka tê nasîn, bilindiya wî li wir digihê 785/m, gola Hopka jî di navbera Çi.Hopka û Çi.Kurê de çê dibe.

Li aliyê wê golê yê Başûr, pîropzgeha Îbram Dede heye, li kêleka wê şikefteke mezin û mezelekî kevin hene. Pozê Çi.Hopka jî bi navê Pozê/Benê Hetkê tê nasîn, û bilindiya wî 772/m e.

Li aliyê Başûr ji Çi.Hopka, Ge.Sari Sînê dest pê dibe. Ew geliyekî kûr, dirêj û bi darûber e, dora 5/km bi Rojava de berdirêj dibe, bîreke bi navê Sînê di nîvê wî gelî de heye. “Sîn” jî navê jinekê ye, "Sari" jî bêjeyeke Tirkî ye, bi wateya “Zer, Çîl, Fîlik” tê. Li navîna gelî, li aliyê wî yê Bakur, cihekî şûnewarî bi navê Kela Qîzikê heye. Li sala 2008an rêkeke ziftkirî di wî gelî re hat verkirin û jiyan bi wê deverê de berda. Gundên li derdora wî gelî ev in: Şediya, Kurê, Xirab Simaq û Sorkê li deşta Lêçe. Hêja ye em bêjin, ku xama hêsin di her du aliyên wî gelî de tê dîtin û ji bo pêşesaziya çemento tê bikaranîn.

---

[1] - Ji demeke kin de, gava ku rêk ji bo Gu.Çobana dihat vekirin, zêrzemîneke şûnewarî û bingeha avahîne şûnewarî hatin dîtin.

Geliyê Sarisînê wek sînorekî ye di navbera her du zincîrên çiyayî yên Çi.Kurmênc ên navîn û Başûr de, û wan ji hev dike.

- Pesarên Başûr yên zincîra sirtên navîn: Ew dibin kendûkorên nizim û pêlpêlkî, û li dirêjiya dora 15/km, hin newalên biçûk tê re derbas dibin, ew kendûkor hemî ji çandiniyê re dibin, û bi tevahî bi darên zêtûnê hatine çandin.

Ji dîmenên giring yên wê navberê, Bendava Gu.'Eşûnê tê, ew bendav ji bo civandina ava baranê li ser geliyê 'Eşûnê ku ji Ge.Meydana de dirêj dibe, hati bû avakirin. Lê mixabin ev li paş wê bendavê kom nabe û bi binê zemînê de diçe.

Li ber pesarê Çi.Bilêl, li binê Gu.Çerxûta li ber rêka ziftkirî jî, Ka.Qewaqa heye, girekî şûnewarî jî bi wî navî li ber e, bîreke avê li ber rêkê, li aliyê Ge.Cawê yê Rojava ye, ew gelî berve Başûr Rojava diçe, di Gu.Çêqilme re derbas dibe û piştî dirêjiya bêtirî 5/km, di destpêka Ge.Tîra de bi dawî dibe. Gelek derandeyên şûnewarî li derdora wî gelî û wê deverê ji binê axê derdikevin, ew jî destnîşan dikin, ku ew dever li serdemên kevin pir şên û ava bû.

Li Rojavaya Gu.Qêsim jî, bêla bi navê Ebû Bekir heye, ew bêleke mezin e, gelek gelî û newal ji pesarên wê de dest pê dibin, **yek** jê Ge.Ziqaqa yan Zewra Qaçaqciya ye, ew gelî bi Rojhilat de diçe û piştî dora 8/km bi Ge.'Eşûnê re dibe yek. Ge.ziqaqa geliyekî kûr e, gundên Qêsim û Dîkê li ser milê wî yê Bakur in. Li ber Gu.Qêsim bîreke kevin bi du devikan heye. Dîsa di wî gelî de, li nêzîk wê bîrê, li navbera wan her du gundan, rîfekî zinarî yî mezin heye jê re diêjin Bena Qurşînê û çêroka wê binavkirinê heye(1).

Geliyê **diduyê**: Bi navê Ge.Çayê ye, ew di ber Gu.Çêqilme re bi Rojava de diçe, û digihê Ge.Tîra.

---

1- Tê gotin, Xelîl Âğayê Hec Omer, ku li navîna sedsala nozdehan mirovekî bi rû bû, gava ku li bin dara çinarê li ber bîra Duderî vedihesî, hespekî gundiyan bala wî kişand û ew ji xwe re bir. Dema ku xeber gihîşt Ĥenûka xudanê hespê, wî her du kurên xwe "Tangê" û "Gurê" şandin ser riya Xelîl Âğa, wan di wê benê de çeper girt, û gava ku Xelîl Âğa û peyayên wî bi binê benê ketin, wan ji Âğê xwast Hespê wan berde, û gava Âğê daxwaza wan bi cih nanî, wan agir berdayê, dibêjin qurşînek li kumê Âğê ket. Wê hîngê Âğe neçar bû hespê wan berde. Şûnên Qurşînên wê pevçûnê ta demeke dirêj li ser benê dihatin xuyakirin, ji ber wê jî, ew bi navê "Benê Qurşînê hatiye nasîn.

Gundine din di wê navberê de hene, ew ji Rojhilat de berve Rojava wiha ne: Kotana û 'Upila li ber riya Bilbilê û Meydankê ne, Gu.Kerê li Bakurê Gu.'Eşûnê, Gu.Zivingê jî li Başûrê bendava 'Eşûnê ye.

Cihê ku bi Deşta Gola Pe'in jî tê nasîn, li binê gundên Çobana û Zerka ye, ji wî navî xuya dibe, ku berê av li wî cîgehî kom dibû, loma jî ew bi "gol" bi nav bûye.

## 3. Sirtên berpehin ên Başûrî ji Çi.Kurmênc

Geliyê Tîra zincîra wan sirtan dike du beş, Rojhilatî: Bi **Çiyayê Hawarê** tê nasîn. Rojavayî: Ji Ge.Tîra de dest pê dibe û li Rojava li ber sînorê Tirkiyê bi dawî dibe, ew jî du beş in, û bi du navan tên nasîn: **Çi.'Etmana** li Bakur, û **Çi.Me'mila** li Başûr.


### - **Çiyayê Hawarê**:

Çiyayê Hawarê ji çiyayên Efrînê yê navdartir e. Çiyakî bi darûber û pir qors[Asê] e. Rengereng, dar, geya, lawir û tilûr di nava rîş, newal, sirt û darûberên wê de dijîn. Li çend salên dawîn dewletê ew mîna “xwezayeke parastî” destnîşan kiribû. Çiyayê Hawarê di navenda navça Çiyayê Kurmênc- Efrînê de ye. Loma jî ew bûye mîna sembolekê ji navçê û ji şêniyê wê re.

Çi.Hawarê ji rojihlat de berve Rojava berdirêj dibe, û xwe piçekî bi Başûr de badide. Dirêjiya wî dora 14/km ye, pahnahî jî di navbera 3 û 4/km de ye. Serê wî yê herî bilind (961/m) li ber Gu.Çiyê ye. Çi.Hawarê çiyakî zinarî bi darûber e, nemaze darên sindîganê, **[Nexşe 15].**

Sînorên Çi.Hawarê wiha ne:

Li **Rojhilat**: Geliyê 'Eşûnê di Rojavaya Gu.Qirigolê û Ĥsendêra re dere. Li hember Gu.Ĥesendêra di pesarê Çi.Hawarê de, kaviline şûnewarî hene, Şikefteke bi navê “Şikefta Bûkê” li wir e, ew şikefteke fereh û mezin e, navê xwe ji wêneyê jinekê ku li ser zinarekî li kêleka wê hatiye nikrandin, biriye. Di navbera wan her du gundan de, “Pîrozgeha Midewer” heye, ew jî komek e ji darên sindîganê.




**Nexşe -15- Pîvan: 1/150000**
**Sînorên Çi.Hawarê .........**
**Rêkên ziftkirî - - - - -**

Li aliyê **Başûr**: Em kanin ji Rojhilat de berve Rojava van dîmenên sereke bibînin: Ge.Kerîm li hember Gu.Şorbe ye. Pişt re şûnewarên Keloşka Hawarê hene, ew li ser serê çiyê li Başûrê

Gu.Çiyê bi nêzîkî 1.5/km [(1)] ye. Serê ku li Rojavaya Keloşkê ye jî bi navê Pozê Mişmişê tê nasîn, û bilindiya wî 906/m e.

Li Rojhilata Gu.Avrazê, bi dehan şikeft li binê pesarên çiyê hene, hin ji wan bi destan hatine kolan, şêniyê gundên derdorê lê dibin xudî, û berê şêniyê Gu.Avrazê ew bi kirê didan malên ku bizin xudî dikirin, nemaze şêniyê navça 'Ezazê.

Li Rojavaya Gu.Avrazê, geliyekî kûr bi navê Ge.Gerê heye, ew ji dorhêla Gu.Şêx, ji serê çiyê de dest pê dibe, û bi ser Gu.Gobekê de dadikeve, li nîvê wî gelî, geliyê bi navê Qertel tê ser, li dawiya wî jî geliyekî bi navê Ge.Heftêr tê ser.

Li hêla Çi.Hawarê ya Başûr, û ji aliyê Rojhilat de berve Rojava, ev gund hene: Xirabî Rûtê li hember Gu.'Emara, Avraz, Gobek û Sêwiya li ser bêleke bilind e, û bi ser deşta Kitixê de xûz dibe.

Li ber Gu.Sêwiya jî cihekî bi navê Deve Bonê heye, pîrozgeha Ĥec Yûsif û mezelê gund li ser in. Di nav wî mezelî de gorine kevin ji dora du sed sal de hene. Cihekî şûnewarî bi navê Kêlbêz jî li Bakurî wî gundî heye, li kêleka wî cihî jî, benek mezin bi navê Bena Tecêl heye[(2)].

Pesarê **Rojava** ji Çi.Hawarê: Ew pesarine bi darûber in, û bi şêweyekî pir dîke dadikevin ser Ge.Tîra, pozê çiyê li wir bi Ustukurê bi nav dibe, û bilindiya wî digihê 735/m. Ev gund li aliyê çiyê yê rojva, li ser çiyê û li ser pesarên wî hene: Gu.Şêx, Şêxbila, Goliyê Jorin û Jêrin û Berbenê.

Li aliyê **Bakur**: Dîsa çiya dijwar û bi darûber e, geliyekî kûr bi navê Ge.Qî ji ber Gu.Çiyê, di rûyê Çi.Hawarê yê Bakur re dadikeve, û li paş bendava 'Eşûnê digihê geliyê Zivingê.

---

[1]- Rojê Lîsko di pirtûka xwe " Çi.Kurmênc û Tevgera Mirûdan" de wê bi "Kela Nûriddîn" bi nav dike. Lê me nas nekir, ew Nûridîn Kî ye. Lê ji şêweya şekirina kevirên kelê guman dikin, ku ew ji serdemên Alefiringî de ye.

[2]- Dibêjin, berî dora sedsalî, şivanekî bi navê Tecal li Gu.Sêwiya hebû, rojekê dema ku wî pezê xwe li wir diçêrand, pilingek lê derket, û piştî pevçûnê, şivên ew piling fetisand û çêlikên wî jî anîn gund.

Çend cihên ku şênî wan pîroz dibînin jî li ser Çi.Hawarê hene, ew bi navê Suĥbe tên nasîn, wek: Suĥbe Elpî, Suĥbe Paçik û Suĥbe Dozelek.

## - **Çiyayê 'Etmana**:

Ew bi Gu.'Etmana bi nav dibe, Gu. 'Etmana jî li Başûrê bajarokê Reco ye, ew bi Çiyayê Benê jî tê nasîn.. Çiyayê 'Etmana zinarî ye, û bi gelek cureyên darên çiyayî û darên zêtûnê hatiye pêçan. Serê vî çiyayî yê herî bilind li ber Gu.Qude ye, û bi bilindiya wî 932/m e, **[Nexşe 16]**.

Sînorê vî çiyayî yê Rojhilat geliyê Tîra ye, pesarên wî gelî pir dîke, bilind û bi dar in, rêka Çîmanê û rêka zifkirî Efrîn-Reco tê re diçe.

Aliyê Çi.'Etmana yê Bakur jî zinarî û daristanî ye, pesarên wî bi ser deşta Baliya û bajarokê Reco de dadikevin. Gundên Dêwrîş, Mûskê, Hecîka, Banîkê û 'Etmana li ser wan pesaran bilav dibin.

Pesarên wî yên Rojava jî zinarî bi dar in, û bi şêweyekî pir dîke bi Rojava de, bi ser deşta Lêçe û sînorên Tirkiyê de serberjêr dibin. Ev gund li ser wan pesaran hene: Şediya, Gu.Ĥesen, Kumreşê, Kurê, û Sorkê jî li jêr, li deştê, li ber sînor e.

Sînorê çiyayê 'Etmana yê Başûr jî wek benekî gewre ye, ji Başûrê Gu.Qude, ku li serê çiyê ye, dest pê dibe, û di keviyê jorîn yê Çi.Benê re bi Rojhilat de diçe, ta digihê Ge.Tîra.

## - **Çiyayê Me'mila:**

Ew li Başûrê Çi.Benê/Çi.'Etmana ye, kendûkorên çiyayî li vir hinekî nizim dibin, rûyê zemînê jî dibe axî, û bi darên zêtûnê hatiye çandin, **[Nexşe 16]**.

Ji Ge.Tîra û bi Rojava de, ev dîmen li ser wan sirtan hene: Gu.Qopê dora 1/km li rojvaya Ge.Tîra ye, di ser re cihê Gu.Zivingê ku vala bûye heye, li kêleka wî cihî, Bîra Piling heye, berê av jê diherikî, û darên sindîganê jî li dorê hene, hin kes wî cihî pîroz dibînin. Dîsa li nêzîk wî cihî, cihekî din bi navê Mala Ĥebîba heye, ew jî wargehekî kevin û vala ye, rûniştvanên wê daketine li gundê Qopê bicih bûne.

Li Rojavaya Gu.Qopê, Gu.Be'dîna tê, li Rojavaya vî gundî Ge.Kûrik heye, ew ji nav çavê Çi.Piling de bi Başûr de dadikeve, û di Rojhilata Gu.Kurka jêrin re derbas dibe. Ew geliyekî pir dîke ye, Kana Axê li aliyê wî yê Rojava heye, axa wê ji bo dûtina xaniyan bikar dihat.

Hîn bi aliyê Rojava de, Gu.Dimiliya tê, şikefteke pir fereh bi navê Şikefta Algîta li nava gund hebû, dibêjin, berê tevahiya pezê gund tê de hildihat, lê niha tijî ax bûye û bikar netê.

Di ser Gu.Dimilya re, li aliyê Bakur, tehteke di pesarê çiyê de heye, şêweya hêvkevanekê li ser e, loma jî jê re "Kevrê Hêvê" tê gotin, li salên kêmbaran şênî diçin ber, avê bi banî de direşînin, û hêviya barîna baranê dikin.


Piştî Gu.Dimiliya, kendûkor dibin bêl û gazên dirêj, bilintir dibin û bi darên zêtûnê tên pêçan. Ew sirt li Rojhilata Gu.Me'mila bi navê Sirta Banîkê tê nasîn, di navbera wê sirtê de li Başûr û Gu.Qude li Bakur, geliyekî kûr û fereh bi navê Ge.Me'mila/Ge.Xirêbe heye.

Li Bakurê Gu.Me'mila jî, li ser keviya Bakurî ya Ge.Me'mila, benekî zinarî yî mezin bi navê "Bena Piling" heye. Li rojvaya Me'mila li ber Gu.'Umera jî, cihekî bi navê Golsorê heye, berê ava baranê tê de kom dibû.

Li Rojavaya Gu.'Umera, û li bilindiya 880/m, Kaşê Belanê dest pê dike, bi Rojava de dadikeve, û li jêr digihê deşta Dîkincî û li ber sînorên Tirkiyê bi dawî dibe. Li wî cihî kaviline şûnewarî hene, bi navê Keloşk tên nasîn.

Lodika herî bilind di nav sirtên Çi.Me'mila de, "Pozê Kera" ye, bilindiya wî 942/m e, birca Tilfizyonê li ser hatiye danîn. Ji aliyê wê sirtê yê Rojhilat de jî, Ge.Rîşê yê kûr û dirêj dafire û bi Rojhilat de diçe. Di navbera Ge.Rîşê û Ge.Kela de ku li Başûr e, dora 2/km navberî heye, ew sirtên di navbera wan de jî, ji Rojhilat de berve Rojava wiha ne: Du gundên Kurka "Jêrîn û Jorîn", Sariya li ser sirta Çi.Ĥemo, Şêtana, Gu.Ĥebo, Gu.Xelîl û Gu.Alkana li ser Çi.Zaretê ye, bilindiya wî 750/m e. Piştî Gu.Alkana, sirtên çiyayî û daristanî bi rengekî pir dîke bi Rojava de berve sînorê Tirkiyê dadikevin, û her sê gundên Çeqela li ser rûyê wî yê Rojava belav dibin. Û ji wir de devera Şiyê destpê dike.

Hêja ye em bêjin, ku geliyê Kela-Şiyê, Çi.'Etmana û devera hoza Şêxan li Bakur, û çiya û devera Xastiya li Başûr ji hev dike, û dibe sînorekî siruştî di navbera wan de. Li ser beşê dawîn yê Ge.Kela, ku li dawiya xwe bi Ge.Şiyê jî tê nasîn, gundên Ĥec Bilêl û Mistika û Erendê li ser rûyê Başûr ê çiyayê 'Etmana ne.




**Nexşe -16- Kendûkorên çiyayî yên sînorên rojava …… …**
**Sînorên dewletî ++++. Rêkên ziftkitî - - - - -. Pîvan 1/150000.**

# Lêkolîna Çarem

## Sirtên  Başûr Rojava ji Çiyayê Kurmênc

Komesirtên Çi.Kurmênc yên Başûr Rojava û bêl û dûzahiyên sersînorî yên Rojavayî, parve sê deveran dibin: **Çi.Xastiya** li Bakur, **Çi.Ĥeştiya** li Başûr û kendûkorên **Devera Şiyê** li Rojavaya wan.


## Pergal û dîmenên Çiyayê Xastiya

Xastiya devereke  çiyayî ye fereh e, sînorên wê baş diyar in: Ji Rojhilat de deşta Cûmê û sirtên Çi.Ĥeştiya, ji Rojava de devera Şiyê, ji Bakur de Ge.Kela-Şiyê û ji Başûr de jî Ge.Xastiya ne.

Sirtên Çi.Xastiya ji hêla bilindî û kendûkoriyê de mîna hev in. Asta bilindiya wan di zikhev de dora 775/m e. Ew dever bi darên zêtûnê hatine çandin, û hin govên mezin ji daristana kevin jî lê hene.

Gundên Xastiya li ser sirt û pesarên Çi.Xastiya belav dibin. Sirûşta deverê pir xweşik e. Binê Ge.Xastiya bi gelek cureyên darên berdar mişt e, nemaze darên Gûzê, Zerdele/Mişmişê û Be'îvê ku li dirêjiya pêtirî deh kîlomitran binê gelî digrin. Rûberên fere ji daristana Kevin jî li ser pesarên Ge.Xastiyê yê Başûr hene, ew li pir cihan dibin daristanên mezin, û gelek lawir û balindeyên çolê tê de dijîn.

Hejmara gundên Xastiya ligel bajarokê Mabeta, ku navenda wan e, digihê dozdehan, **[ Nexşe 17]**.




**Nexşe -17- Pîvan 1/150000**
**Sînorên Çi.Xastiya .........**
**Rêkên ziftkirî -------**

Devera Xastiya ji serdemên pir kevin de şên e, loma jî gelek şûnewar û bingehên avahiyên serdemên kevin lê tên dîtin, û gelek kevirên wan di avakirina xaniyan de bikar hatine, hin jî di bin axê de li nav gundan xuya dibin, û tu lêkolîn li ser ne hatine kirin.

Sirtên Çi.Xastiya li aliyê Başûr Rojhilat, ji sirta Şiwîte de li nêzîk Gu.Kaxrê dest pê dibin[1]. Geliyekî kûr û dirêj ji wê sirtê de berve Bakur Rojava dere, riya deverê ya ziftkirî jî tê re diçe. Ew gelî di Rojhilata Gu.Kaxrê re, û di Rojavaya Gu.Şîtka re derbas dibe, û li

[1]- Berê komir li ser wê sirtê dihat kirin, loma jî navê xwe ji şewtandinê biriye.

wê deverê bi Ge.Bîra Til, yan Ge.Bîra Gund bi nav dibe, ew gelî beşê destpêkê ye ji Ge.Xastiya.

Li wî gelî, li navbera gundên Kaxrê û Şîtka de, kaniyek avê, girekî şûnewarî, mezelekî kevin û şeş bîrên avê yên kevin hene. Berî bi demekê, kûzekî biçûk bi cotkirinê re ji binê zemînê hate der, qerqodeyê zarokekî biçûk tê de hebû[1]. Ew gelî ji darên meywan, nemaze Gûz û zerdele mişt e. Di navbera gundên Birîmce, Mîrka û Çomezna de jî, bêleke fere heye, bi zebeşên xwe yên şêrîn navdar e.

Li roja me riyeke ziftkirî di ser sirtên Çi.Xastiya re, ji Rojhilat de berve Rojava diçe, ew rêk li aliyê herî Rojava digihê Gaza Rût, pîrozgeha Sifrî Dede li ser wê gazê ye[2]. Ji wê gazê de kendûkor bi Rojava de, bi ser Gu.Erendê de serberjêr dibin, û digihên deşta Şiyê. Bi tevahî, em kanin kendûkor û dîmenên Çi.Xastiya wiha salix bidin:

- Dîmenên **aliyê rastê (Bakur) yê rêka ziftkirî ji Çi.Xastiya**: Li aliyê Rojhilat, piştî Gu.Çomezna, Gu.Birka tê. Di navbera vî gundî û Gu.Xaziyana Jorin de, ku li aliyê herî Bakur Rojava ye, zinarekî pir mezin û navdar bi navê Kevirê Ker heye. Hîn li Rojava Gu.Kela tê, ew li ser milê geliyekî kûr e, navê wî Ge.Qelpancik yan Ge.Kaniya Kela ye. Ew gelî diçe ser Ge.Kela. Ge.Kela geliyekî bi av û dar e, û heyama wî wek seyrangeheke zor ciwan e. Berê aşekî avê li ser ava vî gelî digerî, li ber Gu.Mistika jî, Qesteleke avê ya kevin diherike, meyxana mala 'Etêr ku ji Gu.Çeqela ye, li ber bû.
- Dîmenên **Çi.Xastiya yên aliyê çepê (Başûr) yê rêka ziftkirî**: Li vê deverê, ev dîmen û gund ji Rojhilat de berve Rojava tên dîtin: Gundê Reca, li kêleka wê cihekî bi navê Ûcaqê Mala Se'ira heye, Kirêca ku ji bo avahiyan dihat bikaranîn, tê de dihat şewtandin.

Pişt re Gu.'Elcara tê, geliyekî kûr li aliyê wî yê Rojava heye, bîreke kevin û çend kanok di binê gelî de hene, jê: Ka.Pîrê li Başûr,

---

[1]- Ev şêwe ji veşartina miriyan di çaryeka dawîn de ji hezarê diduyan berî zayînê li deşta Cûmê û li tevahiya Asyaya biçûk hebû, /Qiraltiya Alalxê, L.Wooly/.

[2]- Sifrî Dede, Kozikeke biçûk e, li ser pozê bêlekê di nav darên merxê de ye.

Ka.Jorî û Ka.Zaretê[1], şêniyê gundên derdorê li werzê Biharê tên ber wê zaretê û qurbanan dikin. Gelek darên Çinarê yên mezin li dora wan kanokan hene, binê gelî jî bi darên meywan, nemaze darên Gûzê mişt e. Ew gelî li nêzîk dawiya xwe digihê Ge.Kanîdûrkê, bi hev re Ge.Gûzê çê dikin û di beşê Dela de ji Ge.Xastiya li ber kaniya Gu.Dela bi dawî dibin.

Pişt re, li Rojavaya wî gelî bi çend sed mitran, Gu.Me'serkê tê, paşê gundên Şiketka û Tirmûşa hene. Bêleke fere li Rojavaya Gu.Tormûşa heye, li aliyê wê yê Rojava geliyekî teng û kûr heye, jê re Ge.Qiyametê dibêjin, ew bi Başûr de diçe, û di beşê Zinarê Zîn de ji Ge.Xastiya, bi dawî dibe.

Ji bilî gundên ku me li jor gotine, gundine din li ser pesarên Bakur ji Ge.Xastiya hene, ew ji Rojhilat de berve Rojava wiha li dû hev tên: Mist'eşûra, Ĥec Qasma û Remedana, di navbera gundê dawîn û bajarokê Şiyê de li Rojava, dora 3km navberî heye, û Çi.Hesê Xidir wan ji hev dike[2].

Li Rojavaya Gu.Remedana, gorine kevnar hene bi navê Nêzmiriya tên nasîn. Piçekî li Bakurê wan, zinarekî mezin bi navê Kevirê Ketî heye, li kêleka wî kevirî, curnekî di tehtê de kolandî heye, jê re Curnê Qîqî tê gotin, ew ji bo çareserkirina nexwaşiya Koxka Qîqî bikar dihat[3].

Ji wî cihî û hîn bi Bakur de, sirta Tilê Hêlînê, paşê jî Pozê Rût ku pîrozgeha Sifrî Dede li ser e, tên. Asta bilnidiya wan sirtan digihê 500/m. Li Bakurê gundê Xaziyana Jorin Xaziyana Jêrin jî heye.

---

1- Kaniya Pîrê, navê pîrê Gulîstan bû, karê pîriktiyê dikir û tê de navdar bû. Ew berî dora çel salî miriye û temenê wê dora 80 salî bû.

2- Ĥesê Xidir, bavê helbestvan Hamêd Bedirxan e.

3- Mîna wan keviran li gelek deverên Çi.Kurmênc hene. Ew bi piranî li ser çiyan û sirta ne. Bayê cihên bilind ziwa û pak e, ew jî jana Koxka Qîqî ko dike.

# Dîmenên Devera Ĥeştiyan

Çi.Ĥeştiya, ew ji sirtên herî Başûr ên Çi.Kurmênc re tê gotin, pesarên wan sirtan li aliyê Başûr bi ser deşta Cûmê de dadikevin. Bîst û du gundên devera Ĥeştiyan li ser wan sirtan belav dibin.

Kedûkorên Xaknîgarî yên Çi.Ĥeştiya şêweya tîpa (T) distînin, serê wê li Rojhilat e, û doxa wê jî bi Rojava de berdirêj dibe.

Dîmen û pergalên herî sereke yên devera Ĥeştiya wiha ne, **[Nexşe 18]:**


## - Kendûkorên Serî:

Seriyê wan sirtan, li Bakur ji ber Gu.Kokana Jêrin de dest pê dibin, û li Başûr li ber Gu.Keferbetrê bi dawî dibin. Ge.Zewrê li aliyê herî Bakur ji ber bajarokê Mabeta de dest pê dike, û di ber Gu.Kokana Jêrin re bi Rojhilat de berve çemê Efrînê dere. Ew geliyekî fereh û dirêj e, û bi darên zêtûnê hatiye çandin. Hersal gelek lehiyên mezin ji sirtên Çi.Ĥeştiya bi ser Ge.Zewrê de dadikevin.

Li Başûrê gundê Konkana Jêrin, li ser pişta sirtê, Gu.Kokana Jorin heye, geliyekî kûr î mîna koreke mezin di navbera her du gundan de ye, ew bi navê Korta Bêxçe tê nasîn, cihekî naskirî bi navê Sirta Gazmitê jî li wî cigehî heye.

Li Rojavaya Gu.Kokana Jorin, Ge.Qişlê û paşê jî Ge.Avgîrê hene, berê ava vî gelî li dirêjiya salê diherikî. Li destpêka wî gelî, li Başûr Rojhilata Gu.Kokanê, pîrozgeha Şêx Cemaldîn heye, Ge.Avzêmkê di navbera cihê pîrozgehê û gund de ye. Li Rojavaya pîrozgehê Ge.Warê Çeqel tê[1]. Sirta Gusmisrêfê jî ji Rojhilata Gu.Kokana Jorin de dest pê dibe, û Ge.Sor wê sirtê ji sirta Gu.Coqê ku li Rojhilat e, dike.

[1]- Belkî ew warê kesine ji hoza Çeqelî bû, û bi wê yekê hatiye binavkirin. Gelek malbatên ji hoza Çeqelî li gundê Coqê hene.




Gundê Dargirê jî li Başûrê Gu.Kokana Jorin bi dora 2/km e, pîrozgeha wê Şêx Mihemed li Bakur Rojhilata gund e. Geliyê Şêx Mîrê/Dargirê yê dirêj û kûr, ji gundê Coqê dirêj dibe û digihê Gu.Dargirê, ew gelî li Rojava ji cîgeha Şêx Mîrê ku nêzîk Gu.Mîrka ye, çê dibe. Cihekî şûnewarî bi navê Kela Ristê li destpêka wî gelî heye. Ge.Dargirê li ber Gu.Coqê bi Ge.Çolmiĝar bi nav dibe, û sirta Gu.Coqê li Bakur, û Sirta Hemberê li Başûr, ji hev dike.

Li ser sirta Hemberê, mezelekî kevin heye bi navê Tirba Ĥesîkê tê binavkirin. Li Rojavaya wî mezelî, di navbera Gu.Coqê û Gu.Gazê de, pîrozgeha Têrik Baba heye. Li Başûrê Gu.Coqê, li ser sirtê, avahiyeke biçûk bi navê pîrozgeha Qere Baba heye, pîrozgeheke din jî li Rojhilata wê ye, ew jî bi navê Sari Qiz tê nasîn.

Ji wir de, sirtên li Rojavaya karxaneyên Bêrînê dest pê dibin, û bilindiya wan li wir digihê 495/m e. Li aliyê wan sirtan ê Başûr, pîrozgeha bi navê Simaqiyê heye. Aliyê wan yê Bakur jî bi navê Çi.Horiyan yan Qeracê Horiyan tê binavkirin. Gelek şikeft di pesarên wan sirtan de hene, ew jî bi navê Şikeftên Horiyan bi nav dibin.

Li Başûrê sirtên Horiyan, qeracên Gu.Xelnêrê tên, ew jî çar sirt in: Li Bakur Sirta Xewace, li Rojhilat Çi.Zaretê, li Rojava Çi.Qerebaba û li Başûr Gaza Ĥesen. Asta bilindiya wan sirtan digihê 450/m, û ew dora 7/km li Rojavaya bajarê Efrînê ne. Li Başûrê sirta Gaza Hesen, Gaza Kurkê tê, ew li Bakurê Gu.Maratê ye, sê şikeftên mezin li ser hene, û bi navê wê gazê bi nav dibin.

Li Bakur Rojavaya Gu.Maratê, Ka.Mezin heye, ew ji dawiya Ge.Ĥêştir derdibe, curnekî mezin di wî devgelî de heye bi navê Teşta Ĥêştir tê nasîn. Berê Ka.Maratê kaniyeke pirav bû, û piraniya malên gund av dida.

Sirta ku li Rojavaya Gu.Maratê ye jî, bi navê Gaza Ĥecî tê nasîn, li aliyê wê yê Başûr, pîrozgeha Xidir Balî heye, ew çend darên Sindîganê yên mezin û kevin in. Li Başûrê wî cihî, pîrozgeha Çêlmîrê heye, çend darên mezin û kevin li wir jî hene, û cihekî şûnewarî ye jî. Geliyekî biçûk di navbera wan her du cihên pîroz re diçe, jê re Ge.Rêka Tata tê gotin, carina jî bi Sebîla Maratê û Rêka Bazarê, li ser navê bazara Efrînê, bi nav dibe. Ew rêkeke kevin e, û ra devera Şiyê diçû.

## - Dîmenên Dûv ên Çi Heştiya:

### 1. Dîmenên sirtên Başûr:

Me ew mîna dox/dûv bi nav kirine. Ew li Rojhilat, ji ber Gu.Mezin de dest pê dibin, û li Rojava bi Ge.Circim kuta dibin.

Kendûkorên wan sirtan, li aliyê herî Rojhilat ji Geliyê Gundê Mezin de peyda dibin. Ew geliyekî mezin û kûr e, li Başûr Rojhilata Gu.Mezin çê dibe, bi Başûr de diçe, û di navbera her du gundên Keferdelê re li cihê Zareta Dara Reş, têkelî Ge.Sefûnê dibe, ew jî ji ber Gu.Keferdela Jorin de tê, pişt re, ew her du gelî bi hev re geliyê

Maraqê çê dikin. Ev jî di binê Gu.Feqîra re, berve newala çemê Efrînê serberjêr dibe.

Sirtek li Başûrê Gu.Keferdela Jorin heye jê re Çi.Ĥemdo tê gotin, ew sirteke bi darên Sindîganê pêçayî ye, bilindiya wê 547/m e. Ew sirt bi Başûr de dicçe, û li wir bi navê Sirta Qantirî Pêlkê bi nav dibe, û li Bakurê Gu.Feqîra jî bi navê Pozê Kurikê tê nasîn, bilindiya wê li wir 435/m e.

Hîn li Rojava, li Bakur û Rojavaya Gu.Satiya, sirta Çi.Sitê heye, jê û bi Bakur de jî, bêla Sirta Şêx Mîrê tê, bilindiya wê sirtê 611/m e. Ew sirt li Başûrê bajarokê Mabeta ye, Geliyê Şêx Mîrê ji wê bêlê de dest pê dibe, û di ber gundên Dargirê û Coqê re bi Rojhilat de diçe.

Ge.Zimêk jî, ji ber Çi.Sitê de dafire, û di nav Gu.Satiye re bi Başûr de diçe, li Bakurê Gu.Gewrika bi nêzîk 1.5/km, li cihê Serşiketa, geliyekî din î biçûk tê ser. Serşikefta jî cihekî şûnewarî yî kevin  û giring e, mezelekî kevin û gelek zêrzemînên şênewarî lê hene, gelek ji wan zêrzemînan bi derî û pixare bûn, lê ew hemî hatine xetmandin.

Li Bakurê Gu.Satiya, sirta Şiwîte heye. Ew sirt bi Rojava de berdirêj dibe, û bi Sirta Mêdana tê nasîn, û gava ku ew sirt xwe bi Başûr de badide, li Bakurê Gu.Gewrika, bi Sirta Şikefta Poza bi nav dibe.

Ge.Bîra Satiya jî li Rojavaya wan sirta ye, ew ji cihekî bi darûber dest pê dibe, bi Başûr de dicçe, û di nav Gu.Gewrika re derbas dibe. Du bîrên kevin di nîvê gelî de li Bakurê gund hene, berê aveke pir ji wan derdibû û hemî malên gund avdidan.

Li Rojavaya Gu.Gewrika, Ge.Ĥeftêr heye, Gu.Çolaqa li dawiya Başûr a wî gelî ye. Gelek şikeft li Bakurê Gu.Çolaqa hene, ew berî dora 200/sal ji bo rûniştinê dihatin bikaranîn, wek Şikefta Xezalê li ser navê rûniştvana wê, û "şikefta Mamirya". Bîreke avê ya kevin li kêleka wan şikeftan heye jê re "Bîra Jor" tê gotin, bîrek li jêr li nav gund jî heye, bîra jêr bîrek pirav e, hemî malên Çolaqa jê vedixwin û hin enkûrên xwe jî pê tên avdan.

Dawiya Başûr a sirta ku li Rojavaya Gu.Çolaqa ye, jê re sirta Kurkê tê gotin, ew di navbera Gu.Çolaqa û Gu.Xerza de ye.

Gu.Xerza jî di zikê geliyekî Kûr de ye, sirta li Bakurê gund bi navê Çi.'Evdî Qasê tê nasîn, a li Rojava jî bi navê Çi.Simaqliyê ye. Li ser pesarê Rojava yê Çi.Simaqliyê, û li Rojhilata Gu.Aşkê Şerqî, şikefteke mezin û mezelekî kevin hene, bi navê Tirba Romanî tê nasîn. Ew cih bi tevahî bi Kersandaş bi nav dibe, berê çend me'serên tirî yên di tehtê de kolandî lê hebûn.

Li aliyê Bakur Rojava jî, di navbera gundên Aşkê Şerqî û Xalta de, cihekî bi navê Bîra Diza heye, berê bîreke avê ye kevin li wir hebû, û hîn jî dareke Çinarê ye kevin li wir heye, wek gundî dibêjin, temenê wê darê pêtirî 150 salî ye.

Li ser pesarê Rojava yê sirta Gu.Aşkê Şerqî, gelek şikeft û zêrzemîn hene, ew cihê gund yê kevin e. Li aliyê gund yê Rojava, geliyekî kûr û fereh bi navê 'Elemdêr heye, ew bi Başûr de diçe. Şikefteke mezin li dawiya wî gelî heye, mêravek tê de heye bi navê pîrozgeha 'Elendêr tê nasîn, mezelê gund jî li wir e.

Ew sirtên çiyayî bi Rojava de berdirêj dibin, û piştî dora 4/km digihên Gu.Çeqela Cûmê. Li Rojavaya wî gundî bi dora 2/km, her du gundên Miska (Jorin û Jêrin) tên, ew li aliyê Ge.Xalta yê Rojava ne.

Geliyê Xalta jî ji Bakur, ji ber Gu.Xalta tê, ew geliyekî kûr, mezin û dora 13/km dirêj e, û digihê çemê Efrînê. Bêla li aliyê wî gelî yê Rojava, bi navê sirta Bena Dirêj bi nav dibe, ew sert di navbera gundên Xalta, Gorda û Gu.Miska Jorin û Jêrin de ye. Sirteke bilind li Rojavaya gelî li ber Gundê Çeqla heye jê re Sirta Eyşa Pîr Şem Axa[1] tê gotin, hîn bermayên avahiyekê li wir tê dîtin.

Hêja ye em bêjin, ku cihê Gu.Xalta cihekî şûnewarî yî giring e, gelek derandeyên şûnewarî yên rengareng ji binê zemîna wê dertên.

Li Bakurê Miska Jorin jî, li ser pesêr, cîgehê Bircê heye, berê birceke şûnewarî li wir hebû, zêrzemînên mîna goran jî lê hebûn, şêniyê wan gundan gelek entîkeyên zor hêja li wir didîtin, û hîn jî pariyên qermîtî yên kevin, li ser rûbereke fereh tê dîtin, lê mixabin niha tiştek ji wan nemaye.

---

[1] . Guman ew e, ku Pîr Şem ji goçerên Mîr Şem be. Çinkî li sedsala nozdan gelek malbatên wê hozê li Çiyayê Kurmênc bi cih bû bûn û karê darhilkirinê dikirin kokcî).

Gu.Gorda jî dora 3/km li Bakur Rojavaya Gu.Miska Jorin e, û 10/km li Bakur Rojhilata bajarokê Cindirêsê ye. Cihê wî gundî pir parastî û li aliyekî ye, ew li ser rûyê Rojava yê Ge.Ole Cehnim ê pir dijwar dikeve, ew gelî pir dîke, dijwar û bi darûber e. Bi dehan şikeft li nav û li derdora gund hene, şêniyê berê ew ji bo pêz û rûniştinê bikar tanîn. Gelek caran entîke û tiştên şûnewarî yên zor hêja li nav û li derora gund ji bin zemînê dertên.

Ji Gu.Gorda û bi Rojava de, Gu.Kora li ser pesarekî Başûr ji sirtên Çi.Ĥeştiya ye, hin nîşandekên şûnewarî wek dîwarên kevin, stûn, bingehên avahiyan û bîreke ji serdema Romanî de li wan derdoran hene. Di encama kolana ji bo avahiyan de, hin qerqodeyên ku zincîr di lingên wan de bûn hatin dîtin, ew jî destnîşana giringiya şûnewarî ya cihê gund dike. Li Rojavaya Gu.Kora bi 2/km, gundê Kefirsefrê jî li ser pesarekî çiyayî ye.

Piştî gundê Kefirsefrê, sirtên çiyayî bi Rojava de berdirêj dibin û digihên Çi.Qaziqli. Sirûşta Çi.Qaziqlî pir şêrîn e, ew bi darên merxê û gelek cureyên geyan mişt e, dîmenên xwe ciwan in, bayê xwe pir pak e, ew havîngeheke pir hêja ye, û Gu.Tetera li ser sînorê wî çiyayî yê Rojhilat e.

Cihekî şûnewarî li nav çavê Çi.Qaziqli heye, mezelekî kevin û pîrozgeha Qaziqli di nav de ne, çiyê navê xwe ji navê pîrozgehê biriye.

## 2. Dîmenên pesarên Bakur ên Çi.Ĥeştiya:

Ji Rojhilat de berve Rojava, dîmenên wan yên sereke, ev in:

Li Bakur Rojavaya Gu.Çolaqa, Sirta Mala Nêsir heye, ew sirteke mezin e, bi Rojava de berdirêj dibe û digihê Gu.Xalta, asta bilindiya wê sirtê 737/m e.

Li ber Gu.Satiya, û li Rojavaya sirta Şiwîte, Sirta Bûra heye, bilindiya wê 762/m e, li Başûr Rojavaya wê jî Sirta Kurê tê, Ge.Ĥeftêr di navbera wan de ye.

Li Rojavaya Sirta Kurê, Ge.Gakufiya, paşê Çi.Ne'so bi bilindiya 766/m hene, sînorê wî çiyayî yê Rojava Ge.Se'rîncê[1] li Bakurê Gu.Xalta ye.

Pişt re, kendûkor digihên Ge.Xastiya, gundê destpêkê li ser pesarê wî yê Başûr Gu.Rûta ye, Ka.Rûta jî li ber gund e.

Ji Gu.Rûta û bi Rojava de, sirt û newal bi şêweyekî pir dîke bi Bakur, bi ser Ge.Xastiya de dadikevin, piraniya wan pesaran bi darên merxê yên çiyayî pêçayî ne, û gelek Ĥêrên darên zêtûnê lê hene.

Di ew navbera daristanî de, geliyekî bi navê Du Ce'nim (dojeh) heye, ew ji ber dijwariya sirûşta gelî û germa ku lê peyda dibe, bi wî navî hatiye nasîn, ew gelî bi aliyê Bakur de dadikeve ser Ge.Xastiya, û di beşê wî yê bi navê Ge.Zîn de bi dawî dibe. Gu.Ĥec Ĥesna li ser milê Ge.Du Ce'nim yê Rojava ye. Cihekî şûnewarî bi navê Xirabî Qusêrî li Rojavaya Gu.Ĥec Hesna heye, perçên qermîtî, kevirên kilisî yên şekirî, tacên serên stûnana û guvaşgehên di tehtê de kolandî lê tên dîtin.

Hîn bi Rojava de, Gu.Baziya û Xirabê Baziya hene. Ev her du gund li gel Ĥec Ĥesna, li ser sînorên Rojava yên Çi.Ĥeştiya ne. Piştî wan gundan, pesarên Bakurî ji Çi.Ĥeştiya, digihên dawineyên xwe yên Rojavayî û bi geliyê Circim bi dawî dibin.

[1] - Minakek li wê deverê heye dibêje: ((Bûye êsîrê mala Kerê)). Ji ber ku mala Kerê hin Ermenên ku ji dest dewleta Osmanî derevîn girti bûn, ew serînc bi wan kolan û pişt re ew berdan.

# Dîmen û kendûkorên devera Şiyê

Dawîneyên Rojava yên sirtên Çi.Xastiya bi ser deşta Ĥmeqê û sînorê Tirkiyê de dadikevin. Gelek gund û dîmenên taybet li wê deverê hene, ew hemî jî bi navê Devera Şiyê bi nav dibin.

Rûbera dûz a ku di navbera pesarên wan sirtan û sînor de ye, li hin cihan fere dibe û 5/Km derbas dike, wek li Rojavaya bajarokê Şiyê, carina jî teng dibe û namîne, mîna li ber gundê Ĥemamê. Rêkeke ziftkirî di nav xaka deverê re ji Başûr berve Bakur diçe û wê dike du tej, **Rojhilata** rêkê û **Rojavaya** wê.

**- Dîmenên Rojhilata rêka ziftkirî**:

Ew dîmen û kendûkor ji Bakur de berve Başûr wiha tên salixdan, **[Nexşe 19]**: Li aliyê herî Bakur, pesarên Çi.Me'mila bi şêweyekî pir dîke, bi Rojava de bi ser deşta Ĥemqê û sînorê Tirkiyê de dadikevin. Ew pesar bi cureyên darên daristanî û darên zêtûnê pêçayî ne, û dîmenên zor ciwan dafrînin. Ev gund li ser wan pesaran hene: Çeqelê Jorin, Çeqelê Ortê û Çeqelê jêrin. Piştî gundê dawîn, kendûkor nizim dibin, darên zêtûnê rûyê wan deveran digrin, û wilo ta digihên Ge.Şiyê.

Li aliyê vî gelî yê Bakur, Gu.Mistika li ser pesêr xuya dibe, li Başûr jî Gu.Erendê li binê pesarê Rojava yê sirta Pozê Kurê ye. Li ber wî gundî, Ge.Kilisiyê tev Ge.Şiyê dibe, geliyekî nû çê dikin û bi Rojava de berve deşta Ĥemqê diçe. Li salên bi baran hemêzek av di geliyê Şiyê re diherike.

Hîn bi Başûr de, li Bakur Rojhilata Bajarokê Şiyê, Sirta Hêlînê xuya dibe, li Rojhilata bajarok jî Çi.Ĥesê Xidir heye, piraniya malên Şiyê li ser pesarê wî yê Rojava ne, bilindiya wî 663m e.

Ji Şiyê û Başûr de, du gelî hene, her du jî bi Rojava de diçin, **yek**: Ge.Pisûnê, **didu**: Ge.Qe'bê, ew gelî di navbera bajarokê Şiyê û gundên Senarê û Anqelê de ne. Asta bilindiya zemînê li ber Gu.Anqelê digihê 360/m.

Hîn li Başûr, Ge.Circim wekî ku beşê dawîn e ji Ge.Xastiya, di navbera her du gundên Merwanê re derbas deşta Ĥemqê dibe, û tê de winda dibe. Li wir bilindiya binê gelî ji ser asta deryayê de digihê 85m.

Li ber Gu.Mewaniya Jorin, rêka ziftkirî dibe du şax, yek a kevin e, di Ge.Deveyolê re hildikşe, û digihê geliyê Ĥesîrkê ku li Bakur Rojavaya Cindirêsê bi dora 7/km ye. Rêka din jî di Çi.Hemamê re hildikşe, û di nava çiyê re di ber xeta sînorê Tirkiyê re bi Başûr de diçe ta digihê gundê Hemamê, malikên pasewanên sînorî yên Tirk û têla bi usturî di ber malên vî gundî de ne. Û wilo, sirtên Çi.Kurmênc li ber Gu.Ĥemamê bi dawî dibin, û deştên Cûmê û Hemqê jî digihên hev.

- **Kendûkorên Rojavaya rêka ziftkirî**:

Ji Çi.Me'mila û bi Başûr de, kendûkor bi tevahî dûz in, û bi darên zêtûnê pêçayî ne. Ji Bakur de berve Başûr, ev dîmen tên dîtin:


Cîgehê Gomîtê li Rojavaya gundên Çeqela ye, pişt re cihê Qûmliq tê, ew her du jî navên du gundên Kurdan li paş sînorê Tirkiyê bûn, bi behaneya ku ew li ser sînor in, dewleta Tirkiyê ew hilweşandin, û şêniyê wan jî bi hundurê Tirkiyê de birin.

Hîn berve Başûr, cihekî bi navê Gola Qişlê heye, ew mîna koreke volkanî ye, li zivistanê tijî av dibe.

Piştî wê, cihên bi navên Dubir, Qereqol, Qendîl û Girê Ĥesutê yê şûnewarî ku li Başûrê Gu.Qermîtliqê ne, hene, ev hemî cîgeh li ber xeta sînor in.

Li ber bajarokê Şiyê li aliyê Başûr jî, Girê 'Elûş yê şûnewarî heye. Girê Cirnas jî li Başûrê Şiyê bi nêzîk 5/km ye, li ser rûyê vî girî yê Rojhilatî, gorine şûnewarî û şêwene di kevirê reş de nikirandî hene.

Pişt re kendûkor dûz dibin, sînorê Tirkiyê wan dibire, û dîmenên aliyê Sûryê bi dawî dike.


N
Gu.Xelîl
Alkana
Çeqela
Hec Bila
Mistika
3
Erendê
Qermîtliq
Tirkiye
Şiyê
1
Senarê
Anqelê
Hêkiçê
4
Merwanê
2
Cindirês
1-Ç.Hesê xidir.2-Deve yol.3-Ge.Şiyê.4-Ge.Circim.

# Beşê Sêyem

# Nav

## Li Navça Çiyayê Kurmênc

## (( Efrîn ))

## Destpêk:

Emê di vî beşî de, li ser navên gund û warên şên, û navên Xaknîgarî yên vavdar li Na.Efrînê rawestin.

Me di vê lêkolînê de pala xwe da ser van jêderan:

- Zanînên kalepîr û kesên ku guh didin wan mijaran.

- Hin jêderên nivîskî.

- Nêrînên me yên taybet.

Ji bilî şirovekirina navan, emê hin zanînên ku em dibînin dê bi sûd û pêwîst bin li ser her gundekî û cihekî şên, hewaldin. Hêvîdar in, em di vê mijarê de bi serkevin.

# Lêkolîna Yekem

## Navên Xaknîgarî li navça Çiyayê Kurmênc

Bi sedan, na belê bi hezaran navên dîmen û cihên Xaknîgarî li der û deverên navça Efrînê hene, lê ne gengaz bû ku em hemiyan nas bikin û li vir binivîsin. Loma jî, emê tenê navên giringtir bibîr bînin, û wate û binyata wan a zimanî ya dîrokî binasin.

### Navê Çiyayê Kurmênc:

Çi.Kurmênc navekî kevin e, ji ew sirtên çiyayî re, ku di navbera çemên Efrînê û Reş de ne tê gotin. Di pirtûka bi navê ((Bîranînên min li ser welatê Hezar û Yek Şevê)), ya biservehiyê(mulĥeq) bazirganî yê Firensî li bajarê Heleb di navbera salên /1548-1556/ de, li ser Çi.Kurmênc wiha hatiye: "Ji ber taybetiya karê min di kirîna hevrîşmê de, ez pir diçûm Kilisê, Entabê, Ezazê, Çiyayê Kurmênc û …". Wek ji gotina wî xuya dibe, navê Çiyayê Kurmênc, tewir hindik, ji wan deman de bi "Kurdan" dihat nasîn[1]. Ango vî çiyayî navê xwe ji navê nijada kesên ku lê rûndnin biriye, ew jî Kurd in. Me navekî din ji Çi.Kurmênc re nas ne kir, ne bihîst û ne jî di pirtûkan de dît.

Bêjeya **Kurmanc** jî: Kurmanc navê zaravekî zimanê Kurdî ye. Lê ew ji kesên ku bê hoz bin, yan li navça hoza xwe rûnanin, yan jî li gundan dijîn û bi pezê xwe re naçin zozanan re jî tê gotin.

---

[1] - Ew pirtûk li sala 1655an li bajarê Liyon li Firensa hatiye çapkirin, Jêder /El- Esedî, Ferhenga Heleb ya Raberî, perçe 3, rûpel 240.

Zanîna ola Ezdî jî li ser bêjeya “Kurmanc” wiha dibêje: Şora Kurmanc ji du beşan pêk hatiye, Kur û Manc, ango (kurê pak, vebjartî û hêja..) dide, li gor gotina wan, ew navnîşana Pêxember Şîs kurê Adem e, û ew wek bapîrkê xwe ê yekê dinasin.

Dr.Cemîl Reşît mamosteyê zanînên Dîrokê li zanîngeha Hewlêrê, li ser şora Kurmanc wiha got: Ew ji du bêjeyan pevketiye, “Kurd û Mad”, ango “Kurdên Mad”. Kurdên Mad hozine gelê Madî bûn, ji serdemên berî zayînê de naskir bûn. Pişt re bi demê re her du bêje bûn yek, û bi şêweya “Kurdmad, Kurdmanc, Kurmanc” hat bilêvkirin.

Lê li serdema Osmanî, navê Çi.Kurmênc hat wergerandin zimanê Tirkî û bû “Kurdaĝ”, ango Çiyayê Kurdan, û bi wê raweyê di belgeyên dewletê de hat Tomarkirin. Balyozê Rûsî li Bêrûtê Qustentîn Bazîlî jî, binavkirina “Kurdaĝ” ya Osmanî ji destpêka sedsala nozdehan, bikar aniye[1].

Piştî şerê Cihanê yê Yekê, û dagîrkirina artêşa Firensî ji Sûryê re, navça Çi.Kurmênc bû du perçe, Bakurî: Li aliyê Tirkiyê ma, Başûrî: Bi ser Sûryê de çû. Li wê çaxê, navê Osmanî “Kurdaĝ” tenê ji bo beşê Sûrî re ji Çi.Kurmênc bi kar hat, û ra selên destpêkê ji serbixwebûna Sûryê, bi şêweyekî fermî hat xebtandin. Piştî serbixwebûna Sûryê, ew nav hat wergerandin Erebî û bû “Cebel El-Ekrad”.

Di salên yekitiya Misirê û Sûryayê de (1958-1961), navê “Kurd” ji navê Çi.Kurmênc hat hilanîn, û navçe û bajar bi navê Efrînê hat nasîn û bû “Navça Efrînê”. Lê belê navê Çi.Kurmênc wek navekî xaknîgarî, di pirtûk û jêderên nivîskî de ma, û hat xebtandin.

Lê li salên heftê ji sedsala bîstan, dewleta Sûryê pilana Erebkirina navên xaknîgarî û ên şêngehan li hemî navçeyên Bakurê Sûryê pêk anî, wê hîngê, û digel ku Çi.Kurmênc pêtirî 60/km ji Ĥelebê dûr e, û Çi.Lêlûn/Sem'an di navbera wan de ye, navê

[1] - Qustentîn Bazîlî (1809-1884) di rûpela 182an de li ser bûyerên dawiya dema dagîrkirina Îbrahîm Paşayê Misrî ji navçeyên Çi.Kurmênc re wiha dibêje: ((Bi têvedana Siltanê Osmanî, komine mezin ji Çi.Kurmênc û Çi.Gewr bi ser arzûyên hêzên Misrî de daketin..)), ev gotin destnîşan dike, ku navê Çi.Kurmênc ji destpêka sedsala nozdan de dihat xebtandin.

Çi.Kurmênc jî hat guhertin, ew bû “Çiyayê Helebê” û li şûna navê wî yê kevin bikar hat. Lê li ba gelê Kurd ew her Çiyayê Kurmênc e.

## Navê Deşta Cûmê:

Cûm, navê deşteke fere ye li Na.Efrînê, çemê Efrînê ji Bakur de berve Başûr di nav re diherike. Ew deşt ji deverên ku ji demên pir kevin de û bi şêweyekî berdewam şên bû. Li aliyê deştê yê Rojhilatî, li ser pesarê Çiyayê Lêlûn, di şikefta Duderiyê de, qerqodeyê zarokekî Niyandirtalî ji ber sed hezar sal de ye hate dîtin.

Navê “Cûmê” di gelek jêderên nivîskî yên piştî zayînê de hatiye gotin, jê:

Dîroknivîs Petryark Mîxayîlê Mezin navê “Cûmê” li sala 633an zayînî bikar aniye[1].

Di pirtûka /Fitûĥ El-Buldan a Bilazirî/ de jî ew nav wiha hatiye: ((Siwarên Ebû 'Ubeyde li sala 637/Z gundên Cûmê vekirin))[2].

Ibin Şedad jî navê “Cûmê” bi bîr aniye, û gotiye ku “Comê Kore ye”, Kore jî parkirineke kargêrî ya Îslamî bû[3].

Şerfxanê Bedlîsî jî di /Şerefname/ de, li sala 1596an navê Cûmê bi kar aniye[4].

Wek me dît, Kevintirîn bikaranîna navê Cûmê ku em di jêderên Dîrokî de rastê hatine, ji sala 633an/Z de ye.

Li derbarî wateya bêjeya Cûmê jî:

Di ferhenga Erebî /El-Mi'cem El-Wesît/ de wiha hatiye: Cam bi wateya “kas” e, Comê jî gelejmara wê ye[5].

Xêriddîn El-Esedî jî di pirtûka xwe de /perçe 1, rûpel 364/, ji Baba Şelĥet biriye û wiha dibêje: Com yan Coma, di zimanê Aramî de bi wateya Qesab, Berber û ewên ku “kasên bê” lê dixin dide.

---

1 - Baba Bûlis Yetîm: Gotarin di şûnewarên Sûrî de, rûpel 19-20.
2 - Elbilazirî: Fitûĥ Elbuldan, rûpel 154.
3 - Ibin Elşuĥnê: Eldur Elmuntexeb, rûpel 131.
4 - Şerfxanê Bedlîsî: Şerefname, rûpel 230.
5 - Cam, binavekirineke Farisî-Kurdî ye ji Belorê re.

Ebdela El-Ĥilo jî li derbarê navê Cûmê dibêje, ew navekî Siryanî ye, ji “Coma” hatiye, ew ji bo danasîna hin cureyên tene wek Qeretene û Tirmis bi kar tê.

Li gor nêrîna me, em bawer nakin ku ev navên jorîn, navine Xaknîgarî yen deşteke fereh mîna deşta Cûmê bin. Ji bilî ku wateyên li jor ji bo navê "Cûm" hatine, tenê li ser bingeha şêwe û bilêvkirina bêjeyan hatine ravekirin. Belkî wê ûştê jî, wateya wê di hundur zimanekî de, û li ba her lêkolînvanekî ji yê din cuda hatiye gotin.

Em jî kanin li derbarê wate û koka navê Cûmê di zimanê Kurdî de wek wan bikin, û, wiha bêjin:

Di zimanê Kurdî de, gava ku tiştekî hişk dikeve nav tiştekî nerim, ji wê yekê re dibêjin “Tê de **cûm** bû”. Û ji her madeke nerm re jî, ku gengaz hebe şêweya wê were guhertin, dibêjin “dibe **Cûm**ik”.

Bêjeya “Gom” jî, di zimanê Kurdî de, û di warê kendûkorî de, bi wateya “kor” ango cihê kort, ku ji zemîna derdora xwe nizimtir re, tê gotin. Dibêjin Ev cih **gom** e, ango cihekî kort e. Bêjeya Gom bi xwe jî wek Com û Cûm kane were bilêvkirin.

Ji ravekirina jorîn xuya dibe, ku hemahengî û lihevkirineke balkêş di navbera deşta Cûmê de, wek cihekî Xaknîgarî û kendûkorî, û wateya navê wê de, heye.

Wekî ku em dinasin, deşta Cûmê bi şêweya “hilweşîna zemînê” hatiye afrandin, ew li gor bilindiyên derdora xwe, devereke pir daketî û kort e, bilindiya wê li beşê Başûr Rojava bi zorazora sed mitrî derbas dike.

Rabûnên mezin û fere ên ava çemê Efrînê, û hebûna gelek kanî û kanok di çarçewa deşta Cûmê de, wan jî pir cihên çipilî peyda dikirin, û gelek gol û liçeyên avê jî li dirêjiya salê lê dimînin û ra niha jî wilo dibe.

Di baweriya me de, ev salxên deşta Cûmê yên xaknîgarî, bi şêweyekî zelal û durust li navê **Cûmê** yê Kurdî tên, û bi rengekî pir baş rewşa cihê wê salix didin û didin nasîn.

## Çiyayê Lêlûn:

Navê vî çiyayî yê feremî “Çiyayê Sem'anê” ye. Ew li ser navê Mar Sem'anê Stûnî û kinîsa wî, ku li aliyê çiyê yê Başûr e, bi nav bûye.

Dîroknivîsê kevin El-Bilezirî, navê Çi.Lêlûn bi rengê “Lûlûn” nivîsiye. Yaqût El-Ĥemwî jî di /perçê diduyan û rûpel 304an/ de, ew nav bi şêweyê “Lêlûn” nivîsiye. Kurd jî jê re dibêjin Çi.Lêlûn. Gelo.. Binyat û wateya vî navî çî ye?

Li derbarî navê Lêlûn Ebdela El-Ĥilo dibêje, koka wî di zimanê Aramî de, ji biçûkirina bêjeya “şevê” ye.

Di ferhenga Kurdî / Kurdistan/ de jî hatiye, ku “Lûlan” bi wateya “xarbûn, liyan, çiv û şêweyê kevanî” tê.

(Le Lûn) bêjeyeke Firensî - Latînî – Hindo Ewrupî ye jî, ew li wir jî bi wateya Hêv û hêvkevan tê.

Mîna ku em dizanin, Çi.Lêlûn jî bi şêweyê kendûkorên xwe yên kevanî, û rengê teht û zinarên xwe yên gewr, şêweyekî hêvkevankî yî diyar û balkêş distîne. Wekî ku em dizanin jî, ev navçe li demine pir dirêj, ji hêla gelên Hindo Ewrupî de hati bû şênkirin û hukumkirin, û em dizanin jî, ku miletê Kurd jî ji malbata ew gelên Hindo-Ewrupî ye. Wê ûştê jî pir bawer dibe, ku wan miletan, û li sereta Kurdan, ew çiya li gor reng, kendûkor, dîmen û pergalên wî yên Xaknîgarî bi “Lêlûn” bi nav kiri be, ango bi wateya: Çiyayê Hêvkevankî(lêlûn, le lûn..).

## Navê Çiyayê Hawarê:

Hawar çiyakî naskirî ye ji Çi.Kurmênc. Rêzdar Cemîl Kinê di pirtûka xwe /Zordariyên Firensiyan…/ de, navê wî bi şêweyê ”Çiyayê El-Ĥuwar” nivîsiye, em bawer dikin, ku wî şêweyê nivîsandina navê çiyê ji jêderên Erebî yên kevin biriye. Lê belê wekî ku nas e, cihên kevirên Ĥewarê li seranserî Çi.Hawarê netên dîtin, da em kani bin bêjin, ku çiya pê hatiye binavkirin.

Em bawer dikin, ku navê “Hawar” navekî Kurdî ye, ew di Kurdî de bi wateya bangînkirinê, gazîkirinê, alîkarîxwastinê… û hwd tê.

Ew nav û wate jî, li bejna dijiwariya kendûkorên Çi.Hawarê û daristaniya wî ya pir siq û dijwar tê.

Lê ne dûr e jî, ku têkiliya navê Hawarê bi navê gelê Horî yê kevin re jî hebe. Jêderên Erebî navê Horiyan jî wek “Ĥorî” bi lêv dikin, û tîpa “H” bi “Ĥ” diguhêrin. Em dizanin jî ku, gelê Horî ji bapîrên miletê Kurd e. Lê li aliyekî din, di zaraveya kurdî ya Soranî de ((Hewar)) wateya: Havîngeh, û warê çêre û vehesê dide. Ta niha jî mirovin ji gundên wan derdoran hene, navê çiyê mîna koka wê ya Soranî bi lêv dikin û dibêjin: Çiyayê Hewar-ê.

## Navê Nebî Hûrî:

Şûnewarên bajarê Sîros/Nebî Horî, li koşa Bakur Rojhilat in ji navça Efrînê. Ew 50/km li Bakur Rojhilata bajarê Efrînê ne, û 10/km li Rojhilata bajarokê Bilbilê ne, sînorê Tirkiyê jî 2/km li Bakurê wê ye. Ava Sabûn Sûyê jî di Rojhilata Nebî Hûrî re bi dûrbûna 1.5/km diherike, Ava kaniya Germikê jî, li wê tengê têdizê û tev ava Sabûn Sûyê dibe.

Li dema me, Nebî Horî bi du navan tê nasîn, wek: Kela Horî û Kela Nebî Horî. Jixwe navê wê yê kevin ê Girîkî jî Sîros e. Li serdema Bîzentî ew bajar bi Aciya Polîs “Bajarê du keşeyên Pîroz Kozma û Dimyanos” jî bi nav dibû, û li ser gorên wan kinîsek hati bû avakirin. Şêniyê Sîrosê li ser destê oldarê bi navê Sem'anê Ĝeyûr derbas Filetiyê bû bû. Wî kinîsek lê ava kir, lê mir û hat veşartin jî.

Dîroknivîsên Misliman ên berê jî navê bajêr bi şêweyên Qoriş yan Koriş nivîsîne, ew jî ji cidatiya tîpa /C/ ya Latînî, di nivîs û bilêvkirina Erebî de hatiye.

Li demên nêzîk, li ba Kurdan, ji bilî navê Nebî Horî, ew war bi "Xuroz" jî hatiye bilêvkirin û naskirin. Ew jî bilêvkirina Kurdan û Tirkan a binavkirina (Korş, qorş..) a Erebî ye.

Lê tiştê balkêş ew e, ku têkliyên wan hemî navan bi dîroka şênkirina avakirina bajarê Nebî Horî, û bûyerên ku li devera wî bûne re hene.

Ji bo navê "Horî", çêrokeke olî heye dibêje: Ew ji navê "Orya kurê Ĥenne" hatiye, Ĥenne jî efserekî artêşa Pêxember Dawûd bû, ew li destpêka hezarê yekê berî zayînê, di şerekî de hat kuştin, û li

wir hat veşartin. Çêroka Pêxember Dawûd jî bi jina Oriya re naskirî ye, /El-Durr El- Muntexeb, rûpel 225/[1]. Wekî ku nas e, li destpêka hezarê yekê berî Zayînê, herêma Helebê keti bû destê Qiral-Pêxember Dawûd… lê destlata wî li wir li ser destê Babiliyan kuta bû.

Dîsa li derbarê navê Horî: Horî navê netewekî Çiyayî û kivnar e, çiyayên Zagros û Torosê warên wî bûn. Dîroka wî jî li Rojhilata Nêzîk naskirî ye, ew dîrok nîvê yekê ji hezarê sisiyan û tevahiya hezarê diduyan berî zayînê digre. Wî miletî li navîna hezarê diduyan berî zayînê, impretoriya MîtaHorî ya gewre ava kiriye, û destlatdarî li tevahiya beşê Bakur ji Rojhilata Nêzîk dikir. Wek tê zanîn, ew milet wek bapîrekî kevin ji gelê Kurd re tê nasîn.

Warine din jî li Çi.Kurmênc bi navê Horî hene, wek: Şikeft û kavilên Horiyan li nêzîk Gu.Coqê, navê Çi.Hawarê jî ji navê Horî ve pir nêzîk e.

Li derbarê navê (Sîros) jî jêder dibêjin, ew bajar li serdema Sloqis Nîketor ê Yûnanî hat avakirin, û bi navê bajarekî Girîkî hati bû binavkirin. Ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî jî wê yekê dupat dike û dibêje, ku ew li ser navê bajarê Sîrhosê ku li Mekedonyayê ye, hatiye binavkirin. Hin jî dibêjin ew li ser navê qiralê Parsî “Kureş” e, ango belkî bajar li dema wî hati be avakirin.

Nêrîneke din e balkêş heye, dibêje: Navê Horî, badaneke ji navê Xwedyê Zeredeştî Ehoramezde, Nebî jî ji navê Xwedêyê Mezopotamî Nebo hatiye, û wilo ew dibe (Xwedê Ehoramezda)?.

Li derbarî dîroka avakirina bajêr, hin jêder dibêjin: Bajarekî kevin, ji serdemên berî Girîkan de li wî cihî hebû, gumana bêtir ew e, ku ew bajar ji serdema Horiyan de be. Û bi wî rengî, bingeha navê bajêr dê ji kûraniya dîroka Kurdî-Horî hati be.

Lê belê, kavilên şûnewarên ku niha hene, ên bajarê Sîrosê ne, û ji serdema rêberê Girîkî Silûqis Nîketor in, û bajar jî li dema wî hatiye avakirin.

---

[1]- Çêroka olî dibêje: Pêxember Dawûd ji jina efserê xwe Orya hez kir, loma jî ew şand şer, da ku were kuştin û jina wî ji xwe re bibe, û wilo jî bû. Lê hinek dibêjin ev bêbextiyek e, li meqama pêxemberan netê.

## Navê Geliyê Circim:

Circim, navê beşê dawiyê ye ji Ge.Xastiya, ew di navbera her du gundên Merwanê re derbas dibe, û di deşta Ĥemqê de winda dibe. Navê “Circim” di gelek jêderên dîrokî yên kevin de hatiye.

El-Bilazirî di pirtûka xwe /Fitûĥ El-Buldan/ de dibêje: ((Cercûmê bajarek e, li ser çiyayê El-Lêkam e(1)… Ebû 'Ubeyde El-Cerraĥ ew li sal 637/Z vekiriye. Lê bi sedema ku şêniyê wê Fileh bû, û dilê wan bi Bîzentiyan re bû, Xelîfeya Umewî Welîd kurê Ebdilmelêk, birayê xwe Mislîme şand, ew bajara wêran kir, û şêniyê wê jî anî li deverên Çiyayên Ĥiwarê, Lûlûn, û Tîzîna Ĥemqê, û hinek jî li Ĥumsê bicih kirin…))(2). Wekî ku em dizanin, Çi.Ĥiwarê (Hawar) û Lûlûn (Lêlûn) jî du deverên Na.Efrînê ya niha ne.

Wekî ku hatiye zanînin, bajarê “Curcum yan Gurgum” bajarê Meraşê yê li Tirkiyê ye. Ew li hezarê yekê berî zayînê, navendeke gelê Hitîtî bû, û ra dema hatina Îslamê, şêniyê wê li ser ola Fileh û ji netewa Hitît bû (3).

Li ser milê Rojhilat ê geliyê Circim, li hember Gu.Hêkiçê, şikavlên warekî kevin hene, belkî ew ji cihên ku Cercûmiyên “Hitîtî” lê hati bûn bicihkirin be. Wek me dît, eşkere ye ku navê “Circim” ji navê wan Circimiyên Arî û bajarê wan “Circim” hatiye birin.

Di vê derbarê de, rêzdar Ebdela El-Ĥilû di /rûpel 191/ de dibêje, ku “Cercûmê” navekî Siryanî ye, bi wateya takê “Xernûfê” tê. Lê piştî ku me rastiyên jorîn dîtin, mera dibîne, ku gotina El-Ĥilû ji rastiyê pir dûr de.

## Navê Deşta Baliya:

Devereke dûz e, rûbera wê dora 500 donim e. Bajarokê Reco di nava wê de ye. Ew 550/m bi ser rûyê deryayê dikeve, û dorçêwirma wî çiyayî ye.

1 - Çiyayê Lîkam, beşek e ji Çiyayên Torosê.

2 - Elbilazirî: Rûpel 166. Çi.Ĥiwar, Çi.Hawarê ye, “Siniĥ Lêlûn” jî Çi.Lêlûn e. Ew jî ji çiyayên Na.Efrînê ne. 'Umiq Tîzîn jî gundek e li deşta Ĥemqê.

3 - Jêder: Dr.M.Ĥerb Ferzat: Kurtahiyek di Dîroka Sûryayê ya Kevin de, rûpel 157. Subĥî Sewaf: Dîroka Ĥelebê, perçe1, rûpel 40.

Xelk bawer dike, ku navê wê deştê bi Tirkî ye, ji “Bal” ango ji "hunguv" hatiye, lê ya rast ew e, ku “Baliya” navekî Kurdî ye, ji bêjeya “Bêl” bi kurmanciya Bakur û “Bal” bi Kurdiya Başûr hatiye. Ew her du bêje jî wateya “bilindiyê” didin. Ango navê “Deşta Baliya” bi wateya “deşta bilind” e, û salixên cihê deştê yên Xaknîgarî dide.

## Meydan:

Navên mîna, Meydana, Meydankê, Meydan Ekbez, li navça Efrînê tên dîtin.

Li derbarê navê “Meydan”, Xêriddîn El-Esedî di /beşa yekê – rûpel 238/ de dibêje: Ew navekî Erebî ye, lê nêrînek din heye, koka wî dike Farisî: “Mey” ji şerabê, “Dan” jî hokereke cih destnîşan dike.

Lê di baweriya me de, ya rastir ew e, ku ew navekî Kurdî ye, û ji du bêjeyan pêk hatye: Mey “Şerab”, û “Dan” bi watey dandin, dankirin e. “Kê” jî ji “geh” e, ew jî parkîteke Kurdî ye, bi kêrî danasîna cih tê. Û bi wê yekê, navê “Meydan” wateya “cihê vexarina meyê” dide.

Lê eger em bejeyê wiha rave bikin: Mî +dan, ew dê wateya cihê dankirina pêz/miyan bide.

Wek me dît, a rastir “Meydan” navekî Kurdî yî resen e, û xudî weteyên civakî ye jî.

## Kaniya Dirûmiyê:

Kaniya “Dirûmiyê” kaniyeke naskirî ye, cihê wê li hêla herî Rojava ye ji deşta Kitxê. Li derbarê binyata navê wê "Dirûmiyê", kalepîrên wê deverê dibêjin, ku ew ji bêjeya Dirûm hatiye. Sedema binavkirinê jî ev e: Ava wê wek Dirûmekî ji qestela wê derdikeve, loma jî navê “Dirûm” û Dirûmiyê lê bûye.

## Navê Geliyê Ziravkê:

Ziravk, navê geliyekî û aveke naskirî ye li beşê Bakur ji deşta Cûmê. Ew nav bi wateya “Zirav” tê. Hinek bawer dikin, ku ew nav ji dirêjî û ziravbûna wî gelî hatiye û salixa wî dinimîne. Lê belê ya

rast ew e, ku malbeteke mezin û kevin li bajarokê Mabeta bi navê “Ziravkî” heye, jê li Qerecedaxê û li nêzîk bajarê Kehtê li Kurdistana Tirkiyê jî hene. Li demên berê, malbata Ziravkî li ber wî gelî rûnişti bû, û zeviyên neviyên wê hîn li wir hene, loma jî ew gelî bi navê wê malbatê hatiye binavkirin. Ziravkî navê binehozekê ye jî ji hoza Reşî ya Kurd.

## Navê Çi.Parsê:

Ev çiya li Bakur Rojavaya bajarê Ezazê bi dora 5km ye. Ew li ser navê pîrozgeha “Parse Xatûnê” ku li ser çiyê ye, hatiye binavkirin.

Li ser dîroka pîrozgeha Parse Xatûnê, di pirtûka /El-Ddur El-Muntexeb rûpel 96-97/ de wiha hatiye: ((Li Çi.Bersîsa ji devera Ezazê, gora Bersîsa û mêrava Dawûd silava Xwedê lê be hene. Dibêjin jî ku pîrozgeha Bersîsa li xaka Keferşe'ya ji devera Ezazê, mêrav û perstgeha Dawûd bû)).

Wek em jî dibînin, navê pîrozgeha Parse Xatûnê, bi şêweyê xwe yê niha, ji du beşan pêk hatiye: Parse û Xatûn. **Parse:** Bi Kurdîtiya niha wateya “parskirinê” dide, ango ew destnîşana kesê ku parsê û civê dike, dide. Bi zimanê Medî yê kevin jî, “pars” ango “yê li aliyekî, li hêlekê” ye[1]. **Xatûn**: Salixek e, ji jinên ji asta civakî ya bilind re tê gotin. Bi vî hawî, wateya tevahiya navê Parse Xatûn wiha dibe: Xatûna Parseker", yan "jina Xatûn a ku li aliyekî û bi tenê dijî". Parsekerî jî di baweriyên gelêrî de, ne herdem bi xizanî û sêfîliyê ve girêdayî ye, ew carina ji bo pêkanîna hêviyekê, yan wek perestvaniya Xwedê jî tê kirin.

Belkî hinek bêjin: Belkî têkliya navê Parsê bi navê gelê “Pars – Faris” re hebe, wê hîngê dê guman bibe, ku hinek ji wan Parsiyan, serbaz bûn an sivîl bûn, li wir bicih bû bûn û navê xwe dabûn wî cihî û wî çiyayî.

---

1 - Pars, gotineke Medî ye, bi wateya (yê li aliyekî) tê. Ew ji miletê Faris re dihat gotin, çinkî ew li aliyekî xaka Impretoriya Med dijî, /pirtûka Medya, Diyegonof, rûpel 14/. Belkî koka şora (Parsû yan Paresî) ango Paresiyên Sîng, ji wê bêjeyê be. Me ev zanîn hewaldan, belkî ew ji zêdenaskirina kela Canpolêt re, ku li serê Çi.Parsê ye, bi sûd be.

Herwiha wek me dît, tiştin ji kûraniya dîrokê de di navê “Çi.Parsê û pîrozgeha Parse Xatûnê” de tên dîtin, loma jî ew tişt dîrokî bigerekî lêkolînên feretir û kûrtir in.

## Çi.Qaziqli:

Çiyayê Qaziqli, li Bakurê bajarokê Cindirêsê bi dora 8km ye. Ew çiyakî daristanî ye, ji dawineyên Çi.Kurmênc ên Başûr Rojava tê jimartin, û pîrozgeheke bi navê “Qaziqli” li ser e. Bawerî heye ku vî çiyayî navê xwe ji navê pîrozgehê biri be.

Mera kane li derbarî navê “Qaziqli” wiha bêje: **Qaziq**, di zimanên Turkî û Kurdî de bi wateya “Stûn” tê, **Li**: Jî parkîteke Tirkî ye, wek veqetandek bikar tê. Herwiha wateya bêjeya Qaziqli ya tevahî dibe “Stûnî” yan “ê Stûnî”. Stûnî jî, li demên berê, nofek bûn ji bawermendên ola Fileh, nasiktiya xwe li ser stûnan, daran, zinaran… dikirin. Stûniyê destpêkê Sem'anê Stûnî bû. Ev şêwe ji perestvaniyê ra sedsala panzdehan li navça me hebû. Mezelekî kevin û şûnewarên Alefiringî jî li cîgehê wê pîrozgehê hene. Gumana pêtir ew e, ku têkliya pîrozgehê û navê wê û navê çiyê jî, bi naskekî Fileh î stûnî re hebe, ku li wir dijî û li wir mir û hate veşartin jî.

## Çiyayê Ĥeştiya:

Ev çiya ji sirtên Çi.Kurmênc ên Başûr e, deşta Cûmê li aliyê sirtên wî yên Başûr e.

Gotina gelêrî li derbarî navê Heştiya dibêje, ew navê binehozekê ye ji hoza Celalî ya Kurd, malbatin jê li hin deverên vî çayayî rûniştin, û ew bi wê binehozê hate binavkirin.

Li derbarî bêjeya Heştiya/Ĥeştiya jî, di pirtûka /Dewleta Dostkî, Ebdilrreqîb Yûsif, rûp 17/ de wiha hatiye: Heştiya gundeke e, li Bakurê Çi.Cûdî. Ew ji bajarên gelê Kurdoyîn (ji bapîrên Kurdan) bû. Guman ew e, ku ew li hezarê sisiyan berî zayînê, ew paytexta gelên Gotî û Nayrî bû. Lê ya herî naskirî ew e, ku Nûĥ û heştê mirovên ku pêre bûn, piştî Tofanê, warê Heştiya ava kirine û lê bi cih bûne… Lê digel wê, hîn dûman li ser binyata naveê Heştiya dimîne.

# Lêkolîna Duyem

## Gund, şênewar û binavkirinên wan

Di parkirinên kargêrî yên fermî yên dewletê yên sala 1980î de, navên 360 cih, gund û waran li navça Efrînê hatine nivîsandin. Ji wan, bîst û çar navên cih û gundên vala ne. Ew cihên ku di wê parkirinê de hatine jî, li ser heft deverên kargêrî hatine parvekirin, ew jî ev in: Efrîn- navend, Cindirês, Şiyê, Reco, Mabeta, Şera û Bilbil. Navenda navçê jî bajarê Efrînê ye, **[Nexşe 20]**:

Lê belê, li navça Efrînê, hejmara şênewarên ku ta niha xelk lê dijî, wiha li ser deveran belav dibin:

**1**. Efrîn-navend: 65.

**2**. Reco: 65.

**3**.Cindirês: 56.


**4**.Bilbil: 49.

**5**.Şera: 44.

**6**.Mabeta: 42.

**7**.Şiyê: 18.

Ango bitevahî 339 gund û şênewarên rastînkî li Na.Efrînê hene.




Nexşe-20-Navça Efrînê û deverên wê

**Pîvan 1/400000. Sînorên dewletê ++++. Sînorên navçê + - + - +.**
**Sînorên deveran - - - - . Rêkên ziftkirî ====. Çem ∿ .**

# Navên şênewaran li navça Efrînê

Di pêvajoya dîrokê de, gelek hoz, milet û dewlet li deverên Rojhilata Navîn rûniştine û lê bûne destlatdar. Wan hemiyan bandora xwe di gelek waran de li ser deveran hîştine û şopên xwe ra niha diyar dibin. Yek ji wê bandorê di warê binavkirina şênewarn de ye. Ji ber ku di serdemên dîrokî de, û ji ber sedemên têvel, gelek nav bêtirî carekê hatine guhertin û navine din li şûnê bi kar hatine.

Li derbarê navên şênewaran li Sûryê, bi taybetî jî li Bakurê wê, û guhertinên ku li serdemên dîrokî yên têvel di wan de çêbûne, lêkolînvan Ebdela El-ĤĤilû di pirtûka xwe de wiha dibêje: "Navên li Bakurê Sûryê ku ji berî serdema nijada Samî de ne, ji deverên Sûryê yên din bêtir in, ew nav jî li gor gelên ku lê rûniştine û dewletên ku destlatdarî lê kirine, ji hev cuda dibin /rûp 36/".

Ango guman heye ku li gor rûniştvan û destlatan, navê cihekî çendçarkî hati be guhertin. Ji ber ku, her hinekan ew nav bi şêweyekî fermî diguhertin, û li zimanê ku li wê hîngê bi kar dihat, tanîn, carina jî ji ber egerên siyasî dihatin guhertin.

Lê belê, yê ku li destpêkê ferman fermî da, ku hemî navan li Sûryê biguhêrin û bikin Erebî, Xelîfeyê Umewî Ebdilmelêk bû (685-705)Z, /pirtûka El-Usûl El-Suryeniye…, rûpel 4- Ebdela El-Ĥilû/.

Lê li roja îro, piraniya pir ji navên warên şên li Na.Efrînê ji kok û wateyên xwe de Kurdî ne. Hin jê navên rûniştvanên gundan ên destpêkê ne, hin navên hozên Kurd in, hin jî navên cihên ku gund lê hatine avakirin û ji salixên wan yên Xaknîgarî ne… û hwd. Tenê hejmareke hindik jê Tirkî, Erebî yan ji binyatên Aramî-Siryanî-Yûnanî ne, hejmareke biçûk jî me nikanî kok û wateya wan a zimanî û dîrokî nas bikira.

Lê bi tevahî, li roja me, em kanin navên gundan li Na.Efrînê parve sê nofan bikin:

- Gelêrî: Ku xelk bi kar tîne.
- Fermî: Di serdema Osmanî de.

- Fermî: Di parkirinên kargêrî yên Komara Sûryê de.

## I. Binavkirinên Gelêrî:

Ew nav bi şêweyên xwe yên resen û kevin ji aliyê gel ve tên xebtandin. Em kanin binyata zimanî ya nofeke mezin ji wan navan wiha rave bikin:

**1.** Navên bi tîpa “**a**” bi dawî dibin: Ew piraniya nava ne. Tîpa “a” li dawiya wan navan, tîpa yekê ye ji nîşandeka çivandina/tewandina navan “an” di zimanê Kurdî de. Lê di lêvkirina gelêrî de, tîpa “n” jê hatiye xistin û tîpa “a” bi tena xwe li dawiya navan maye. Wek mînak: Gundê Zerkan bûye Zerka, Gu.Xilalkan bûya Xilalka… û hwd.

**2.** Navên bi parkîta “ **-nd** ” û “ **-if** ” kuta dibin: Wek navên: Gund, Turind, Tilif...û hwd, Kîtên “ -if û -nd” du parkît in, ew di zimanê Hitîtî de hebûn û ji bo nasandina nav û dîmenên Xaknîgarî bi kar dihatin.

**3.** Navên bi pêrkîta “**Ba**” dest pê dibin: Hejmara wan heft in. Ji bo wate û delameta pêrkîta ’ba” jî du nêrîn hene:

**Yek:** Ew pêrkît wek “Bê, Bi, Ba” tê dîtin. Dîroka wê pêrkîtê vedigere serdemên gelên Ekadî, Ken'anî û Aramî, û destnîşana wateya “mal, xanî” dikin, wek nimûne, navê gundê “Bablît” bi wateya “ mala Bilît” tê… û hwd.

**Didu:** “Ba”, di Kurdî de bi wateya “ li cem, li nik, li rex”, û bi wateya “ ba ” jî tê. Li gor vê rastiya taliyê, wek nimûne, navê Gu.Basûtê ji du kîtan pev dikeve: Ba û Sût, ango “bayê tûj û bi şewat”. Cihê Gu.Basûtê jî li ber derbendekê ye, ji Bakur û Başûr de vekiriye, loma jî zora bayê Boraz/Bakur" ê sar, tûj, sûr, sût" yekser lê dibe, ango ew nav li salixa cihê gund tê.

**4.** Navên ku bêjeya **Qestel** tê de hene: Hejmara wan pênc in. Bi giştî navên kesan û tiştine din li dû bêjeya Qestel tên, wek “Qestela Elî Cindo, Qestela Kîşik… û hwd. Li derbarê navê Qestel jî, Yaqût El-Ĥemwî dibêje: Ew di zimanê Erebî de bi wateya “Toza Vedibrose” tê. Bi zimanê şêniyê Şamê jî, ango bi Siryanî “cihê ku

av jê peyda dibe" ye, bi zimanê şêniyê Meĝribê jî "Palûta ku tê xwarin" e.

Ebdela El-Ĥilû jî dibêje: Ew bêje di riya zimanê Aramî re derbas zimanê Sûryanî bûye. Ew di Yûnanî û Latînî de "Kastellum" e, ango lûlikên ku av tê re tê birin e, /rûpel 448/. Ew bêje li ba Kurdan jî bi wateya dawîn (lûlika avê) tê bikaranîn.

**5.** Navên ku bêjeya "**Til**" li pêş tên: Piraniya wan ji binavkirina Kurdan e, wek: Til Ĥemo, Tilîlaq…

**6.** Navên ku bêjeya "**Dêr**" tê de hene: Hejmara wan şeş in. wek Ĥesen Dêra, Dûdêrê… Ew jî ji binavkirina Kurdan e, ji ber ku piraniya caran, Kurd navên cihên şûnewarî bi "Xirabe, dêr, keloşk..." bi nav dikin. Gotina "dêr" bi xwe jî Suryanî ye, ji cihê ku nasikên ola Fileh tê de rûdiniştin re tê gotin.

**7.** Gundên bi "**kefer**" dest pê dibin: Ew heşt in, wek Kefersefrê, Keferdelê…. Ew bêje nêzîk pergala binavkirina Siryanî ne. Di pirtûka /El- Usûl El- Suryanî.. rûpel 6/ de hatiye, ku ew bêje ji "gund, warên rûniştinê yên biçûk û wekî wan re" tê gotin. Ew di zimanê Siryanî de kokek e zimanî ye, bi wateya "veşartin û sergirtina" tiştan tê.

**8.** Gundên bi bêjeya "**Birc**" dest pê dibin yan "Birc" tê de heye: Hajmara wan pênc in. Birc jî bêjeyek e Yûnanî ye, ji "Burgus" hatiye, û paşê derbas nav zimanê Siryanî, Erebî û Kurdî bûye, ew bi mebesta nasandina Kelan û cihên berevaniyê û zêrevaniyê yên bilind bi kar hatiye.

**9. Xerabe**: Heft gund pê bi nav dibin, Xirabe jî wateya "avahiya kavilbûyî û kevin" dide.

**10.** Navên gundan û cihên şên di Kurmancî de navine mêza ne. Gava ku navê mêza yê yekejmar di rewşa bireseriyê de tê, ew bi nîşandeka "ê" tê tewandin. Wek: Gundê Kîmar**<u>ê</u>**, bajarokê Bilbil**<u>ê</u>**…

Ev taybetiya rêzimanî jî ji zimanê gelê Xaltî yê kevnar de ji me re maye. Ew gel jî ji bapîrên gelê Kurd e[1].

## II. Binavkirinên serdema Osmanî:

Hin guhertin di binavkirina navên şênewaran de li serdema Osmanî li navça Çi.Kurmênc çê bûne, ew guhertin jî wiha bûn:

**a- Tirkirina navan:** Di serdema Osmanî de, Tirkan hin navên Kurdî yên gundan yekser guhertine û kirine Tirkî, wek nimûne: Navê: Gundê Mezin bûye "Biyûk Obe", Gu.Sêwiya bûye "Oksûzlî" û hwd. Hejmara navên Tirkirî panzde ne. Navê Çi.Kurmênc bi xwe jî hatiye wergerandin û bûye "Kurd Daĝi".

**b- Parkîtên Tirkî:** Ji bo ku navên Kurdî bi ser pergala zimanê Tirkî de herin, hin parkît û bêjeyên Tirkî bi dawiya navên gundan ên resen xistine. Ew bêje û parkît jî ev in:

- **li**: Ew ji bo danasînê bikar tê. Ew mîna zêder/veqetandekê ye di zimanê Kurdî de. Wek mînak, navê gundê Hopka bûye Hopkan**li**… û hwd.

- **Koy**: Ev jî bêjeyeke Tirkî ye, bi wateya "gund" tê. Mîna Gu.Qude, bûye "Qude **Koy**".

- **Ûşaĝî:** Bi mebesta " zarok, law, nevî…" tê. Bi tevahî ew parkît bi dawiya navê damezrawê gund xistine. Wek Gu.Naza bûye "Naz**ûşaĝî"** ango "Lawê Nazê"… û hwd.

- **Obe:** Wateya "kom, malbat…" dide. Wek gundê Dîkê, bûye "Dîk**obe**sî", ango "malbata Dîk".

- **ler:** Ew nîşandeka gelejimariyê ye di zimanê Tirkî de. Wek "Gudê Şêxan – Gu.Şêx" bûye Şêx**ler** Obesî.

---

[1] - Parkîta "-hî" ji koka xwe de Horî ye. Parkîta "-pî" ji koka xwe de ji zimanê gelê Gotî ye. Parkîta "-enî" ji zimanê Xaltî – Orarto ye. Ew hemî milet jî ji bapîrên gelê Kurd in. /Dr.Xelîl Cindî, rûpel 9-10-24/.

## III. Nav li dema intîdaba Firensî û piştî serbixwebûna Sûryê:

Destlata Firensî li Sûrayê, şêweya Osmanî di nivîsîna navên gundan de bi kar anî. Vê rewşê ta salên destpêkê ji serbixwebûna Sûryê ajot. Lê li dema avabûna yekitiya Misirê û Sûryê, destlata yekîtiyê biryara da, ku navên “ 'Ecemî” li navça Çi.Kurmênc werin Erebkirin. Li ber roniya wê biryarê, karmendên dewletê: Nivîskarê sînor Îbrahîm Qadir û Miftiyê Efrînê Îbrahîm Ne'so, dest bi Erebkirina navan kirin, û gaveke rind tê de avêtin, lê dema ku yekîtiya Misirê û Sûryê têk çû, pirojeya Erebkirina navan jî rawestî. Lê digel wê, hin nav li wê demê hatin guhertin, yan pergaline nivîsandina Erebî standin, yan jî kirin Erebî û di belgeyên fermî de hatin bikaranîn. Wek nimûne: Navê Gu.Xalta bû “Xaldiyê”, Gu.'Umera bû “El-'Umeriyê” Tilîlaqê bû El-Sinoberiyê… û hwd.

Li sala 1976an, komîteke nû ji bo Erebkirina navan li Na.Efrînê hat danîn, ew komîte ji van kesan pêk hat: Îbrahîm Qadir ku hîn nivîskarê karûbarên Sînorî bû li Efrîn, Corc 'Ebûd zanayekî zimanê Siryanî bû, û nûnerek ji rêvebirya karûbarên Şûnewariyê li Helebê. Wê komîtê karê xwe li ber roniya van şîretên fermî yên destlatê kir(1) û wiha xebitîn:

**1-** Navên ku ji koka xwe de Erebî, Siryanî, Romanî- Yûnanî bin û navên cihên şûnewarî, divê wek xwe bimînin.

**2-** Hemî navên Kurdî û Tirkî werin Erebkirin.

**3-** Eger gengaz tunebû ku navek wergere Erebî, divê ew bi navekî Erebî were diguhertin.

Piştî ku wê komîtê karê xwe bi dawî kir, lîsteyên fermî yên navên Erebkirî bi biryara 580 li sala 1977an ji hêla şalyarê karê hundur de li Sûryê mor bû û ji wê demê de hat bikaranîn.

---

1- Zanyarê Ĥelebî Xêriddîn El-Esedî di pirtûka xwe “Ferhenga Ĥelebê ya Raberdanî, perçe 4, rûpel 132 ” de, dibêje: Li hember Tirkirina navên Erebî ji hêla dewleta Tirkiyê de, destlata Sûryê ji min xwast ku ez di karê Erebkirina navan de beşdar bibim, wê hîngê min lêborîn xwast û got: Ev lîstineke bi rastiyê, karê Tirkan nezanî ye, nezanî jî bi nezaniyê çareser nabe.

Li gor wê biryarê, navên 190 gundên Na.Efrînê hatin guhertin û di kutik û belgeyên fermî yên tevahî û kesane de hatin bikaranîn, û li ser nîşanên çaterêyan jî hatin nivîsandin.

## Têbînên taybet li derbarê navan û şênewaran:

Emê di lêkolînên bê de, li ser binyat û wateya navên cihên şên li Na.Efrînê rawestin û zanîn û kurtegotinekê li ser her şênewarekî hewaldin. Bi tevahî ew zanîn dê wiha li dû hev werin:

1. Piraniya gundên Na.Efrînê bi bêtirî navekî tên nasîn, ew nav dê bi vê dûverêziyê werin danîn:
   - Navên **resen û kevin:** Navên ku di nav gel de bikartên. Gelek caran bêtirî navekî ji her gundekî re heye.
   - Navên ku di belgeyên **Osmanî** de hatine bikaranîn.
   - Li dema **Firensî**: Firensiyan navên ku li serdema Osmanî bi kar dihatin xebitandin, û di belgeyên fermî yên dewleta Sûryê de bikaranîn. Piştî ku destlata Firensî ji Sûryê derket û Sûrya serbixwe bû, navên ku di belgeyên Firensî de bi kar dihatin, wek xwe man û bikar hatin.
   - Li dawiya salên heftê ji sedsala bîstan, piraniya navên gundan ji hêla destlatê de hatin Erebkirin, û li şûna navên ku li serdemên berê dihatin xebtandin, bi kar hatin.
   - Eger navê berî Erebkirinê, yan ê piştî Erebkirinê li ber navê gundekî nehati be, tê wê wateyê ku navê resen di belgeyên wê demê de wek xwe maye, ne hatiye guhertin û bikar hatiye.
   - Ji bo ku navên her demekê werin zanîn, me ew bi tîpên cuda û bi dûverêziyeke naskirî wiha nivîsandin, nimûne:

> **1**. **Satiya** (navê gund ê gelêrî û resen). ***Satiyanlî*** (navê dema berî Erebkirinê). *El-'Etiye, Satî* (navên piştî Erebkirinê ye, ku di belgeyên fermî de bikar tê).
> **2**. **'Ereba**, **'Erebê Ĥemşelek** (navê gund ê resen). ***'Ereb Ĥemşelek***, ***'Ereb Ûşaĝî*** (navên barî Erebkirinê). *Ewlad El-'Ereb* (navê Erebkirî). … û hwd.

2. Ev zanîn jî dê li ber navê her gundekî werin nivîsandin:
   - Hejmara kesên gund li gor serhejmara kutikê nifûsê li dawiya sala 2005an.

- Rûbera gund li gora sînorên wê yên kargêrî.
- Dûrbûna wê ji navenda deverê de.
- Bilindiya cihê gund ji ser rûyê deryayê de.

Me hejmar û yekîneya pîvana wan her çar zanînan, bi tîpekê kurt kir û li ber navê gund bi vê dûverêziyê danîn:

| |
|---|
| - **Hejmara** [**kes = k**]: Hejmara kotikê nifûsê ya kesên gund li taliya sala 2005an. |
| –**Rûbera** [**Hêktar= h**]**:** Rûbera gund û zeviyên wî. |
| –**Dûrbûna [km]:** Dûrbûna gund ji navenda deverê. |
| –**Bilindahiya [m]**: Bilindiya cihê gund. |

3. Li ser binyata zimanî û wateya navê her gundekî dê were axaftin, û nêrînên ku li derbarê wê mijarê hene dê werin şirovekirin.

4. Hin çalakiyên sereke yên rûniştvanan, pergal, dîmen û tiştên gund ên din jî, ku em bibînnin sûdar in, dê werin nivîsîn.

5. Di warê danasîna çûkûmeziniya gundan de, ev salix dê bikar werin:

| |
|---|
| - **Biçûk:** Yanê hejmara malên gund kêmtirî 50î ye. |
| - **Orte:** Ango hejmar di navbera 50-100 malî de ye. |
| - **Mezin:** Bêtirî 100 malî ye. |

Gelek caran, dê cudatî di navbera salixdana gundan de (çûk, orte û mezin), û serhejmara wan a ku di kutikê nifûsê de hatiye, were dîtin, ew jî dê çend tiştên civakî diyar bike:

**a.** Rewşa gund a aborî, û tibaba kesên ku ji gund mişext bûne. Çinkî gundê ku niha biçûk e, û hejmara kesên wê li gor kutikê nifûsê mezin e, ew yek dê dest nîşan bike, ku ew gundekî kevin e, û tibaba mişextiyên wê bilind e.

**b.** Gundê ku hejmara kesên wî, û meziniya wî li gor hev in, yan jî gund mezin an orte ye, û hejmara kutikê nifûsê hindik e, ew dest nîşan dike, ku rewşa aborî ya wî gundî rûniştiye, yan jî baş e, û beşê mezin ji şêniyê gund hîn tê de ye, û jê derneketiye… û hwd.

# Lêkolîna Sêyem

## Nav
## Li devera Navend - "Efrîn"

Bajarê Efrînê navenda ''Devera Navend'' e, û navenda rêvebirî ya Navça Efrînê ye. Şêst û pênc gund û cihên şên di çarçewa kargêrî ya devera navend- Efrîn de hene. Pênc jê warên vala ne.

Sînorên De.Navend wiha ne: Li Rojava Devera Cindirêsê, li Bakur deverên Şera û Mabeta, li Rojhilat Navça Ezazê û ji Başûr de jî Na.Sem'anê ne.

1. **Bajarê Efrîn** [47108k, (210, 340)m[(1)]]:

**-** Efrîn, navê Çemê Efrînê ye. Me navê "Efrînê" di çar jêderên dîrokî ji serdemên destpêka Îslamî de, dît, ew jî ev bûn: [Dîroka Ĥelebê ya El-'Zîmî, di rûpela bûyerên sala 478g/1085z. SubĥEl-

[1] - Jimarên bilindiyê ji "Ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî" Dar Tilas hatine birin.

E'şa ya El-Qelqeşendî, rûpel 57. El-Durr El-Muntexeb ya Ibin El-Şuĥnê, rûp 167. Mu'cem El-Buldan ya Yaqût El-Ĥemwî, beşê diduyan, rûpel 180].

Ango jêdera herî kevin, ya ku navê Efrînê tê de hatiye, ji sala 1085z de ye. Lê belê ew jêder çêre kok û wateya navê "Efrîn"ê nebûne. Lê belê li derbarî wateya wî navî di jêderine de wiha hatiye:

**1.** "Efrîn" di jêderên Erebî de:

Di ferhenga zimanê Erebî "Ferhenga El-Wesît" de hatiye, ku ('efêr û 'efer), tiştê ku tiştine ne ji rengê wê tevlê bûne, tiştek " 'efrî ye", yanê ax tevlê bûye.

Di ferhenga "Lîsan El-Ereb" de jî hatiye: Ku ('Îfîrrîn) ango kar û kirinên Şêran e, dibêjin ew bi wateya Şêr jî tê, û ji her kesekî xort û bi hêz re jî dibêjin: Şêrê 'Îfîrrînî.

Xêriddîn El-Esedî jî di ferhenga xwe de dibêje, bêjeya Efrîn bi wateya "ax, xak" e. Wî ji Baba Şelĥet biriye û dibêje jî: Ew bi wateya "toz" jî tê, /beş 5, rûpel 413/. Ebdela El-Ĥilû jî, li derbarê şiroveyên jorîn wiha dipirse: ((Gelo! Ma ew navçe ''Efrîn'' berê pir bi toz bû, ta ku pê hatiye binavkirin? Bi rastî jî ji bilî wê şiroveyê rê tuneye!)), /rûpel 396/. Lê diyar e ku rêzdar El-Ĥilû navça Efrînê ne dîtiye, û nizane jî ku ew navçeke bi av û darûber e, û toz lê ranabe.

**2.** Efrîn di deqên Aşorî û Yûnanî de:

Di deqeke Aşûrî de ji sala 876 b.z hatiye û dibêje, ku "çemê Aprie deşta Patinê av dide"(1). Dîroknivîsê Yûnanî yê navdar Strabûn jî di sedsala yekê berî zayînê de, navê çemê Efrînê bi raweya "Aprie" nivîsiye.

Li derbarî bêjeya "Aprie", lêkolînvan li hev dikin, ku ew ji binyata xwe de ji zimanê "Lîsînî" ye, Lîsîn jî zimanekî Hindo Ewrupî yî kevin bû li Anadolê, rengê wê bêjeyê yê kevin û resen "Eple" ye.

Wekî ku em dizanin, raya/koka wê bêjeyê "Ap-" e, ew kît di zimanên Arî yên kevin de bi wateya "Av"ê tê, jixwe zimanê Kurdî jî

1 - Xêriddîn El-Esedî: Ferhenga Ĥelebê... perçe 1, rûpel 172.

di nav wan de ye. Kurd jî li gor zaravên xwe, pir caran tîpa “p” bi “v” diguhêrin û herwiha Ap dibe “Av”.

Raweya bêjeya “Ap” hîn li Nîvgirava Hindî wek şêweyê xwe yê berê maye, û wek “Ab, Ap” bi lêv dibe, nimûne, navê herêma “Bincab” ji du bêjeyan pêk tê, Pênc û Ap, ango “pênc av”. Û ji ber ku tîpa “p” di Alfebeya Erebî de tineye, ew carina bi tîpa “v” tê guhertin, tîpa “a” jî bi “ع” tê guhertin, ango kîta yekê ji bêjeya “Apre” yanê “ap” dibe “عف”.

Kîta dawiyê “-re” jî, kîta yekê ye ji bêjeya Kurdî ya kevin “riwîn, riwên”, ew jî bi wateya “rengê axî, rengê ĥeriyê yê mor” tê. Wek nimûne, Kurd ji bizina rengê wê axî yan qeĥwerengî re dibêjin: Bizina Riwîn, ango ya ‘‘bi rengê axê’’. Dibêjin jî “Ava Riwîn” ango ava ku bi rengê axê ye.

Eger em wan her du bêjeyan “Av û Riwîn” têkil hev bikin, dê navekî nû bafire:  Avariwîn yan Avriwîn.

Wek tê dîtin, ew nav hema hema mîna raweya bêjeya “Afrîn, عفرين” e, û wateya “ ava rengê wê sor û axî ” dide. Gava ku lehî ji çiyan bi ser çemê Efrînê de tên, reng û salixên ava wî wek ava “riwîn dibe”. Hîn jî şêniyê gundên Bakurî ji Na.Efrînê, navê çem wek “ 'Efran” bi lêv dikin, ew bêje jî pûş, gemara daristanan, ax û kefa ku bi ser rûyê lehiya çêm dikeve, dest nîşan dike.

Lê bi hawakî din, eger em raya diduyan ya bêjeyê “-rê, -lê” bi wateya “Rêk ango newala avê, cow…” bibin, wateya navê Efrînê dê bibe “rêk yan rêçûna avê”, wek tê dîtin, ev nav jî di çarçewa zimanê Kurdî de ye, û jê dernakeve.

**3.** Afirîn: Ev jî bêjeyeke Kurdî ye, bi wateya afrandin û dayîna bê sînor tê. Çemê Efrînê, berê jî û niha jî jiyan afrandiye, û bûye jêdera dayîna wê. Bi sedan gundên şên ji kevin de li ser kenarên wî hatine avakirin, û hîn kavilên gelek gund, bajar û kelayên kevin li ser her du milên wî hene. Ji ber wê jî, hîç ne dûr e, ku Kurdan salixa “dayîna jiyanê û berhemdayînê – Afirînê” daye wî, wekî ku navê jinan jî kirine “Afret” ku wateya “afiranvana jiyanê” dide.

Lê tevî hemî tiştî, û eger koka navê Efrînê û wateya wî çi be û ne çi be jî, gelên Horî, Hitît û piştî wan Medî, wekî ku bapîrên Kurda ne, ji demên berî zayînê de, û bi şêweyekî herdem, li

navçeyên Torosê  hebûn, û ew dever ji warên wan yên resen bû. Hîn jî bi sedan gund û warên Kurdan ên şên li dirêjiya kenarên çemê Efrînê hene, û lê rûdinin. Loma jî, eger navê çêm Aprie, Efrîn yan jî Afirîn be, ew û devera wî, herdem bi Kurdan hatiye naskirin.

Lê ya rast jî, naskirina koka navên kevin mijar û pirseke zor dijwar e, û herdem cihê danûstandinê ye.

- Li derbarî cihê bajarê Efrînê, di jêderên dîrokî de hatiye, ku li serdema Romanî, riyeke kevirkirî ya lezok tê re derbas dibû. Li encama kolana zemînê li derdora kolana "Ellîwa- Riya Cindirêsê", kevirên şekirî yên mezin, kûzên qermîtî yên mezin û qerqodeyên mirovan hatin der, ew jî destnîşan dikin, ku ew cih ji demên pir kevin de şên bû.

Ji bilî wê, gelek şikeft li Bakurê cihê kompaniya Eletrîkê ya kevin, li ber perava çemê Efrînê hebûn, ew cih wek rawestgehekê bû li aliyê çem yê rastê, ew şikeft ji bo rawestîn û rûniştina rêwiyan dihatin bikaranîn, derhatina gelek pereyên kevin ji nav axa zemîna wan şikeftan, wê yekê dupat dike.

Jêderên dîrokî bibîr tînin jî, ku li derdora sedsala çardehên zayînî, pireke bi navê "Pira Qîbar" li ser çemê Efrînê li cihê bajêr yê niha hebû. Li dawiya serdema Osmanî jî, gelek Xan ji bo rawestîna karwanan li aliyê Rojavaya pira niha hebûn.

Bajarê Efrînê yê niha li destpêka dema dagîrkirina Firensiyan, ango ji destpêka salên bîstan de ji sedsala bîstan, hatiye avakirin. Li destpêkê, avahiyên destlatê û kargêriyê hatin avakirin, wek: "Sera, baregeha polîs, girtîgeh û dibistan"... Pişt re xelk li wir hêwirî, xanî lê ava kirin û wilo berebere bû bajar û şên bû.

Li roja îro Efrîn fere bûye, bûye bajarekî mezin, û gelek guçeyên nûh lê hatine damezrandin. Guçeyên bajarê Efrînê yên sereke jî ev in:

- **Bajarê kevin:** Avahiyên destlatê û kargêriya wê, di salên di navbera 1925an û 1930î de hatin avakirin. Li wê demê, kolana riya Cindirêsê hat vekirin, û dukan, xanên kirînfirotinê, xanên dewêr û du ûtêlên biçûk jî li her du aliyên wê hatin avakirin.

Rûniştvanên bajarê Efrînê yên destpêkê, Kurdên gundê Kersanê bûn. Li wê demê, hin Aĝeyên navçê jî mal lê ava kirin, wek Aĝeyên Şêx Sim'l, Mala Robarî, Seydê Mîmê, Ehmedê Xelîl Aĝa û Dewrêşê Şemo rêberê Êzdiyan…

Bi wan re, hin Ermenên ku ji ber setema Tirkan direvîn û xwe dispartin artêşa Firensiyan jî, xanî li derdora avahiyên dewletê ava kirin, wan kinîsek jî ji xwe re ava kirin, lê belê ew li salên sî û çelî ji sedsala bîstan ji Efrînê derketin, kinîse jî li destpêka salên heftê ji sedsala bîstan hat firotan û hat hilweşandin, û dukan û avahî li şûnê rabû.

Efrîn ra dawiya salên şêstî ji sedsala bîstan wek bajarokekî biçûk bû. Xaniyên wê bi şêweyekî lihevhatî û şêrîn li ser pesarê Başûr ê bêla Efrînê rêz dibûn. Piraniya wan xaniyan bi keviran û bi axê hati bûn avakirin, banên wan jî dîrek û ax bûn.

Ji destpêka salên heftê de ji sedsala borî, hejmareke mezin ji rûniştvanên nû, ji gund, deverên navçê û ji navçeyên din jî bi ser bajarê Efrînê de hatin, herwiha bajar fere bû, avahî lê pir bûn, û guçeyên nû li bajêr zêde bûn, ew jî ev in:

**- Guçeya Meĥmûdiyê**: Li Bakur Rojavaya bajêr e. Li destpêka salên heftê ji sedsala borî, kesê bi navê Meĥmêdê Kurtancî malek lê ava kir, û guçe bi wî hat binavkirin.

**- Guçeya Zêdiyê**: Li Bakurê bajêr e. Ew gundê Zêdiyê yê kevin e. Navê Zêdiyê ji navê pîrozgeha "Şêx Zêd" ku niha li nav mezelê Zêdiyê li serê sirta Xemrevînê ye, hatiye. Pişt re, ew gund fere bû, bû guçe, bi Bakur de hilkişî û niha gihîştiye serê sirta Xemrevînê. Şêniyê vê guçeyê qarşiqek e ji Kurd, Ereb, Qurbet û Bûdikan.

**- Guçeya Eşrefiyê**: Ew li aliyê bajêr yê Rojhilat li ser bêla 'Empêlkê ye. Ew bêla di ber perava Rojhilat a çemê Efrînê re berdirêj dibe. Guçe ji dawiya salên şêstî de ji sedsala borî şên bûye. Mirovê ku li destpêkê lê rûnişt, Weĥîdê Aşvan ji Gu.Keferbetrê bû. Wî aşekî bi matorê digerî li ber mala xwe ava kiri bû, û bi xwe jî tê de dixebitî.

Eşrefiya niha guçeke mezin e, xaniyên wê li ser rûyê Rojava yê bêla 'Empêlkê belav dibin. Piraniya rûniştvanên wê mişextiyên gundên navçê ne, û di karkeriya çandiniyê de dixebitin.

**- Guçeya Qeracê Gênco**: Ev guçe li aliyê bajêr yê Başûr Rojhilat e. “Gênco” navê xudanê qeracê bû ku guçe li ser haitye avakirin. Ji ber ku ew guçe li ser riya Gu.Turundê ya berê ye, ew bi navê guçeya “Riya Turundê” jî tê binavkirin. Xaniyê yekê li derdora sala 1970î ji hêla kesê bi navê Horîkê Kirîf de, li ser wî qeracî hat ava kirin. Li dema Şerê Cîhanê yê Duyem, leşkerên Înglîz avahiyeke biçûk li wir avakiri bûn, û kiri bûn wek nivîsgehekê ji bo xebtandina karkeran.

Guçeya Qeracê Gênco li ser pesarê wê bêlê ji Bakur de berve Başûr berdirêj dibe, û niha gihaye nêzîk Gu.Turundê, li vê dawiyê, gund jî ketiye nav sînorên şaredariya bajarê Efrînê.

**- Kolana Bobeniya**: Kolaneke biçûk e, li aliyê bajarê Efrînê yê kevin, li ber perava çemê Efrînê ye. Piraniya şêniyê wê Erebên ji hoza Bobenî ne. Berê “bazara dewêr” li şûna wê guçê li dar diket.

Cîghê bajarê Efrînê pir şêrîn e, û heyameke wê ye xweşik heye. “Ferhenga Xanîgarî ya Sûrî” li derbarê Efrînê dibêje, ew ji ciwantirîn bajarên Sûryê yê biçûk e.

Bajarê Efrînê navenda kargêrî, civakî û aborî ya navça Çi.Kurmênc e. Di dehsala dawîn de, çalakiyeke avakirinê ye giring li bajarê Efrînê rûdaye. Gelek avahiyên pirasteyî lê rabûne, gelek dukan û xanên kirînfirotinê yên hêja jî lê peyda bûne.

Bazareke rojane li bajêr heye, berhemên çandinê û pêz lê tên firotan, bazareke hefteyî jî li roja çarşemê lê tê gerandin, gelek tişt û berhemên navçê lê tên danîn. Bazareke hefteyî ji bo kirînfirotina dewêr/sewalan jî li roja sêşemê lê digere.


Çend karxaneyên bêrîn, sabûn, zêtûn û pêdviyên avakirinê li bajarê Efrînê hene. Meyxana Bozant a çêkirina Meyê, ji sala 1927an de hîn digere. Ji bilî wan, gelek cihên necarî, hesinkarî, koşkarî, durustkirina alavan, makînan û gelek pîşeyên din jî li bajarê Efrînê hene, û pêdviyên şêniyê navçê bi cih tînin.

Bi dehan bijîşk, dermanxane û çar nexwaşxaneyên taybet jî li bajarê Efrînê hene.

Û ji ber ku bi deh hezaran mirovên navçê li bajarê Helebê rûdinin, çûnhatineke pir mezin û bê rawestan di navbera wê û Efrînê de heye.

Li gor texmîna şaredariya bajarê Efrînê, hejmara rastî ya rûniştvanên bajarê Efrînê li sala 2006an, dora 84000 kes bû.

Ev gund û gundik bi Devera Navend–Efrînê ve girêdayî ne, **[Nexşe 21]**:




**Nexşe - 11- Efrîn, devera navend**

**Nexşe -21- Devera navend (Efrîn).** Pîvan: 1/150000. Sînorên dewletê ++++. Sînorên navçê + - + - +. Sînorên deveran - - - - . Sînorên gundan -.-.- Rêkên ziftkirî ====. Çem ⁓. Rêka Çiîmanê .......

2. **Îska** . ***Îskan*** (1812k, 1530h[1], 20km, 210m):

- Li derbarê navê “Îska” Mala 'Umê dibêjin, ew mala destpêkê bûn ku li şûna wî gundî rûniştine û şên kirine, loma jî navê gund bûye “kan, Îskan” ango “cihê lêrûniştinê”. Ji bilî ku “Îskana” navê hozeke Kurdî ye jî, jê li derdora Bîrecikê, li Bakurê Kurdistanê hene /Barbro Karaboda/.

- Îska gundekî mezin û şên e. Neviyên mala Xalit Aĝa lê rûdinin, û Xanima nasdar Zayde Xatûn lê rûdine. Li Rojhilata gund li ser çiyê, li cihê Kanî Dînkê, şûnewarên bi navê Teqilkê ji serdemên Alefirngan de hene. Ew cih li sedsala hejdehan baregeheke giring bû ji Mala 'Umê re. Li aliyê gund ê Rojava jî kaniya gund heye, herikîna wê ya avê 28L/S de ye.

3. **Bablît** . (2251k, 4km, 260m):

- Guman heye ku ew navekî Siryanî be, ji “Ba+Bilît” pêk hati be.

- Gundekî biçûk e, li Bakurê Ge.Maratê ye. Li destpêka sedsala bîstan, mala Şêx Evdilqadir Îmamê rêyola Qadirî li Na.Efrînê lê rûdinişt. Roja îro malbatine ji hoza 'Umêrat a Ereb jî lê rûdinin.

4. **Kersanê** . ***Kersantaş*** (144k, 2km, 230m):

- Bêjeya “Kersan” di zimanê Firensî de bi wateya şerab “meye, inbît” tê, “taş” jî bi Tirkî “kevir” e. Û wateya tevahî dibe “kevirê şerabê”, ev nava destnîşan dike, ku ewên li dema kevin, cihekî giring ji bû çêkirina şeraba Inbîtê, wek xelk dibêje, berê guvaşgehên Tirî li wir hebûn. Û ta salên pêşîn zeviyên rezan jî li wir hebûn.

- Hebûna Gu.Kersanê ji Bajarê Efrîn kevintir e. Malbata Feyo ku niha li Efrînê rûdine, ji rûniştvanên wê yên destpêk ye. Gund li ser milê çemê Efrînê yê rastê ye. Roja îro çend xaniyên xerabe lê hene, ew û zeviyên derdora wê jî, bûne ji arziyên Mala Robarî.

5. **Cidêdê** (118k, 3.5km, 220m):

- Bawer dibe, ku ew navekî Siryanî be.

---

[1] - Zanînên rûberên gund ji “ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî ya Dar Tilas” hatine birin.

- Gu.Cidêdê, ji çend malan pêk tê. Ew li ser milê çemê Efrînê yê rastê ye. Berê gund ji arzûyên mala 'Evdî Reşo bû. Pişt re mala Sefer ya Helebî destê xwe danî ser rûbereke mezin ji zeviyên gund, lê niha xelkê navçê wan zeviyan diçînin. Zeviyên wê ji çemê Efrînê tên avdan.

6. **Basûtê** (4160k, 660h, 9km, 240m):

- Nêrîna giring ew e, ku "Basût" navekî Kurdî ye, û koka wî “Bayê Sût yan Bayê Sot” e. Cihê gund li ber derbendekê ye, li zivistanê bayê Boraz/Kurba lê xort dibe, hin salan ziyanên mezin jî digihîne darûber û çandiniya gund.

Xîriddîn El-Esedî, li derbarê wî navî ji Baba Şelĥt biriye û ew jî wiha dibêje: Basût, navekî Aramî ye ji “Fişûta” ku bi wateya “dûzahî yan lawê bêkêr” hatiye, ango belkî wateya wî navî “mala kurê bêkêr” be, /perçe 1, rûpel 32/. Lê em bawer nakin ku ev şiroveke durust e.

- Basût gundekî mezin e. Ava çemê Efrînê di Rojava û Başûrê wê re diherike. Kaniya Basûtê jî ji nava gund derdibe û 15/L/s av dide. Li roja me, gund bi Bakur û Rojhilat de fere dibe, û gelek malên nû li ser pesarê Çi.Lêlûn tên avakirin. Basût cihekî geştevanî yî navdar e li parêzgeha Ĥelebê. Çend xwaringehên baş lê hene. Derdorên wê hemî baxçe ne, Ĥinarên Basûtê jî zor hêja û navdar in. Karxaneke tiştên bilestîkî jî lê heye.

Dîrokeke Gu.Basûtê ya dûrûdirêj heye. Li destpêka sedsala nozdehan, kela Basûtê baregeha Betal Aĝayê Gênc bû, û ji wir de destlatdarî li Çi.Kurmênc û li deverên Bakurê Helebê jî dikir.

7. **Basûfan** (2059k, 435h, 30km, 605m):

- Dibêjin, “Sofan” bi wateya navê zanyarê ola Fileh “Keşîş/keşe” tê, û bi wî rengî tevahiya wateya navê gund dibe “Mala Sofî, Mala Keşe”. El-Esedî jî ji Baba Şelĥet biriye û dibêje: “Bêt Şofne” navekî Aramî ye ji “Mala Qetrê” hatiye, /perçe 2, rûpel 32/. Xûrî Bersûm jî di /rûpel 58/ de dibêje: Ew nav bi wateya “mala nasê Xoyê, yan mala Sabûnê” ye, çinkî zeviyên darên zêtûnê li dora gund hene.

Lê gotina şêniyê Basûfanê jî li derbarê navê gundê wan wiha ye: Li demên berê, hin "Sofiyên" Êzdî li wir bicih bû bûn, dema ku şêniyên wan derdoran nexweş dibûn, ew ji bo çareserkirina nexwaşiyan diçûn "ba Sofiyan". Pişt re, û bi demê re, her du bêje "ba sofiyan" têkel hev bûn, bûn yek bêje "Basofan", û ji cihê wan Sofiyan re, ango ji navê gund re hat gotin.

Şêx Elî jî, wekî ku Şêxekî Êzdiyan î zana bû li Na.Efrînê, û ji wî gundî bû, li ser navê Basûfanê wiha digot: Binyata wî navî "Bazîwan" e. Ew navê gundekî ye li welatê Xalta li Bakurê Kurdistanê, rûniştvanên Basûfanê yên destpêkê ji wir hatine, û gundê xwe yê nû jî bi yê kevin bi nav kirine, û bi demê re bilêvkirina "bazîwan" hatiye guhertin û bûye "Basûfan". Em bawer dikin ku ew her du gotinên jorîn, ango ya gundiyan û ya Şêx Êlî, li hev tên, û rastiya navê gund diyar dikin.

- Basûfan gundekî mezin e, li ser beşê Şêrewa ji Çi.Lêlûn e. Gelek bermahiyên şûnewarî li nav û li derdora gund hene, wek: Avahî, dîwarên kinîsan, gor, se'rîncên di tehtê de kolandî, guvaşgehên zêtê û meyê…û hwd. Şêniyê gund li ser ola Êzdî ne, pîrozgeha Şêx Elî jî li nava gund e.

8. **Bi'iyê** . ***Ba'î*** (878k, 195h, 600m):

- Bi'î, bi Kurdî navê darekê ye.

- Ew li Bakurê Gu.Basûfanê bi 2/km ye. Cihê gund zinarî ye, û di nav kendûkorên Çi.Lêlûn de hatiye veşartin. Şûnewarên ji serdema Romanî de, wek gor û bîrên di tehtê kolandî lê hene.

9. **Pitêtê** (288k, 451h, 6km, 320m):

- Baba Şelĥet dibêje, Pitêt navekî Aramî ye ji "bêt tilîte" ango "mala bidarvebûyî" hatiye, /El-Esedî beş 2, rûp 53/. Xûrî Bersûm jî dibêje, ew di zimanê Aramî de bi wateya "mala hejîrê" tê, /rûpel 56/. Mera nizane çima ev cudatî di hundurê zimanekî de û li ser navekî heye, belkî jî ji ber ku navê gund ji koka xwe de ne Aramî be.

- Gundekî biçûk e, li ber serê pesarê Bakur ê Çi.Bozîkê ye, û dora 880/m li Rojavaya çemê Efrînê ye. Bakurê wê deşteke fere û şov e.

10. **Birc Ĥêderê** (949k, 194h, 33km, 575m):

- Navê gund ji navê birceke şûnewarî u li nava gund e, hatiye. Ĥeyder jî navê mirovekî ji gund bû. Wek tê zanîn, bêjeya "Birc" bi xwe, bi zimanê Yûnanî ye û Kurd jî bi kar tînin.

- Gundekî mezin e ji gundên Şêrewa. Birceke şûnewarî û Ketidraîyeke ji serdema Bîzentî de lê hene, dîwarên wê hîn jî li pê ne, gelek gor, stûn û tacên serên stûnan li nav û li derdora gund tên dîtin.

11. **Birca 'Evdêl**, **Bircê** . ***Birc 'Ebdalo*** . *Birc 'Ebdela* (1962k, 150h, 12km, 240m):

- Birca 'Evdêl, ji navê birceke şûnewarî ku li nava gund bû, û ji navê rûniştvanê gund yê destpêkê " 'Evdal" hatiye.

- Gundekî mezin e, li ser pesarê Çi.Lêlûn ê Rojava ye. Dora 2/km li Başûrê Gu.Basûtê ye. Şûnewarên bircekê ji serdema Romanî de, bermahiyên avahiyên kevin û kevirên şekirî di nav gund de tên dîtin. Bendeke biçûk û pirek jî li kêleka gund, li ser çemê Efrînê hatine avakirin. Şikefta Duderiyê ya navdar ku qerqodeyê zarokê Niyandirtalî di nava axa binê wê de hate dîtin, dora 2/km li Başûrê gund e. Maline ji malbata Seydê Mîmê ku berê li devera Cûmê navdar bû, lê rûdinin. Dora nîvê şêniyê gund li ser ola Êzdî ne.

12. **Gundî Mezin-** Heştiya. ***Biyûk Obe***. *El-Kebîra* (790k, 9km, 585m):

- "Gundê Mezin" binavkirineke Kurdî ye. Ew li sedsala Hejdehan navenda Aĝeyên mala Ĥesen Efendî bû, loma jî bi "Gundê Mezin" bi nav bûye.

- Gund li ser sirteke bilind e ji Çi.Ĥeştiya. Lê ji ber kêmşoviya xaka wê, piraniya şênî jê barkirine. Loma jî ew gundê ku berê mezin û giring bû, bûye gundekî biçûk.

13. **Gazê** . ***Ĝazî Tepe*** . *Til Ĝazî* (548k, 177h, 9km, 670m):

- Bêjeya "Gaz" bi Kurdî wateya "sirta berdirêj" dide. Gund jî li ser sirteke bi wê salixê ye. Guman heye ku nivîskarê Osmanî bêjeya "Gaz" bi wateya bêjeya Tirkî "Ĝazî", ango "Leheng" biriye, û navê gund kiriye "Ĝazî Tepe", ango "Girê Leheng", û wilo jî nivîsiye. Komîta Erebkirinê jî dîtiye, ku "Ĝazî" bêjeyeke Tirkî ye, û navê wê

kiriye “Til Ĝazî”, ango “girê ĝazî”. Ew her du binavkirin jî ji rastiyê û ji koka navê gund ê resen “Gaz” pir dûr in.

- Gundekî biçûk e, li ser sirteke bilind e ji Çi.Ĥeştiya. Pesarên wê sirtên pir dîke û kûr in. Cihê gund pir ciwan e. Di salên heftê û heştiyan ji sedsala bîstan navendeke Partiya Komonîst bû, belkî ji ber wê jî, hijmareke mezin ji xwandevanan û xudî dîplomayên bilind tê de hene, lê li roja me piraniya şêniyê wê jê derketiyê.

14. **Tir tewîl** . *Teltwîl* (1160k, 300m):

- “Tir” di zimanê Siryanî de bi watey “gir, çiya” tê. “Tewîl” jî bêjeyeke Erebî ye, bi wateya “dirêj” e. Kurmanc ji wî gundî re dibêjin “Tirtewîl”, ango “girê dirêj”, ew gir jî bêla bajarê Efrînê ye, û Kurd jê re dibêjin “Qerac yan tile Dirêj”, Gu.Tirtewîl li ser pesarê wî yê Bakur e.

- Gundekî biçûk e, malên xwe li ser pesarê Bakur ê bêla Efrînê li binê cîgeha Xemrevînê ne. Çemê Efrînê 1/km di rojhlata wî re diherike.

15. **Tilif** (811k, 290h, 10km, 345m):

- “ Tilif ” bi Kurdî bi wateya bermahiyên guvaştina tirî û zêtûnan” tê /ferhenga Kurdistan/. Ew gund di nîvê deşteke bi darên zêtûnê de ye. Her du siyasetvanên navdar Şewket Ne'san û Kemal Ĥenan ji vî gundî bûn, û lê hatine veşartin.

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Rojava yê qeracê Tilifê ye. Digel ku ew gundekî biçûk e, lê gelek kesên dîplomayên bilind bi dest xistine tê de hene. Karxaneke pêşesazkirina hin alavên çandiniyê lê heye. Mala Zênelê ku ji Aĝeyên mala Ĥesen Efnedî ya kevin e, ku li sedsala hejdehan navdar bû, lê rûdinin.

16. **Cûmkê** . *El-Cemîle* (479k, 407h, 3km, 335m):

- Cûmkê, guman heye ku navê xwe ji navê deşta Cûmê biri be. Tu têkliyên navê Erebkirî “Elcemîlê” bi navê gund yê kevin re tuneye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Başûr yê bêla Qerdepe ye, Ew ji çend malan pêk tê. Gund ji arzûyên Mala Rûbarî bû, hîn jî maline wan lê rûdinin. Rêka hêsin a çîmanê di binê gund re dere. Gundekî bi navê **Şêx sîdî (Seydo)** jî li wir hebû, hîn jî kavilên wî li wir hene.

17. **Coqê** . ***Ciwêq*** . *El-Xedra* (5479k, 1572h, 9km, 440m):

- Em bawer dikin, ku navê gund ji biçûkirina navê “Co” ango ji “Cowik” hatiye. Çinkî, gelek kanok ji zikê geliyê ku di nava gund de ye derdibûn, û ava wan bi Rojhilat de, bi deştê de diherikî. Ji bilî ku geliyekî mezin ji aliyê gundê Dargirê de jî tê, û di Başûrê gund re diçe, ew gelî jî berê li dirêjiya salê diherikî.

- Coqê, gundekî mezin e, li ser sirtekê ye. Hejmareke mezin ji xudiyên diplomayên xwendina bilind tê de hene. Li dehsalên dawîn ên sedsala bîstan, Coqê navendeke giring bû ji partiyên siyasî re li Na.Efrînê. Her du siyastvanên naskirî: Wehîd Memûd perlementêr û komonîstê navdar, û Evdirehman Osman xebatkarê Tevgera Kurdî jê ne. Mişextiyeke mezin ji Gu.Coqê, nemaze berve Helebê heye. Hêja ye em bêjin, ku goreke bi navê Nasir Aĝa kurê Ehmed Begê li nava mezelê gund e, dîroka wê, mîna ku li ser kêlika wê hatiye nîgarkirin, ji sala (1213g/1798)z de ye.

18. **Gundê Astêr** . ***Astaro*** . *El-Mestûra* (8km, 305m):

- Astar, bi wateya qumaşê hundirê kincan û tiştan tê. Jêdera wî navî û egera lêkirina wî ji me ve ne nas e. Ew nav di Erebkirinê de bûye “El-Mestûra”, lê em bawer dikin, ku têkliya vî navî bi yê resen re hîç tuneye.

- Gundekî biçûk e, li ser milê çemê Efrînê yê Rojava ye. Rawestgeha çîmanê ya Qurtqulaqê li kêleka wî ye. Ew gundekî nû ye, û berê ji arzûyên Zekî Aĝayê Şêx Sim'el bû. Niha jî gelek cotariyên wî yên Ereb ku derveyî navçê anî bûn lê bi cih bûne.

19. **Xelnêr** . *El-Neyira* (1196k, 740h, 7km, 465m):

- Xelnêr ji navê “Xelîl” hatiye. Têkliya navê Erebkirî bi yê resen re tuneye.

- Berê, li destpêka sedsala bîstan Xelnêr gundekî mezin bû, û navendeke civakî ya giring bû jî, lê ew niha biçûk bûye, û tenê çend mal lê mane. Ew li ser pesarê Çi.Ĥeştiya yê Rojhilat e. Geliyê Xelnêrê li tenişta gund çê dibe, û bi awakî dîke bi Rojhilat de, bi ser deşta Cûmê de dadikeve.

20. **Şadêr** . ***Şêĥ El-Dêr*** . *Şêx El-Dêr* (1305k, 335h, 19km, 215m):

- Şa yan Şah, di Kurmancî de bi wateya “Qiral” tê, û wilo nav dibe “Dêra Şah”.

Hin jî dibêjin, ew navekî Siryanî ye, ji “Şêĥ El-Dêr” hatiye, û dema ku ew hat Erebkirin, bêjeya Siryanî “Şêĥ” bi bêjeya “Şêx” a

Erebî hatiye guhertin. Xûrî Bersûm jî dibêje, “Şîĥ” di Aramî de “geyeke bêhin xweş” e, /rûp103/. Ev cidatiya li ser wateyên wî navî di her du zimanên Siryanî û Aramî de, dihêle ku aliyê binavkirina Kurdî “Şahdêr” girantir bibe.

- Gundê Şadêrê li aliyê Bakur ê pesarekî zinarî ye ji Çi.Lêlûn. Geliyê “Şêx Rikab” di nava gund re diçe. Şêx Rikab jî pîrozgeheke Êzdiyan e di nav mezelê gund de ye. Berê ew mezelê piraniya gundên Êzdiyên derdorê bû. Gelek bermahiyên şûnewarî li derdora gund hene. Kaniyek jî li Başûrê gund heye. Malên Şadêrê û Gu.Ĝezîwê gihîştine hev. Û hîn bêtirî nîvê şêniyê Şadêrê li ser ola Êzdî ye. Hêja ye em bêjin, gava ku Mar Sem`anê Stûnî mir, darebesta wî di gundê Şadêrê re daxistin Deşta Cûmê û birin bajarê Entekê.

21. **Turindê** . *El-Zerîfê* (3330k, 3km, 260m):

- Bajarekî kevin bi navê Turindê li Başûr Rojavaya bajarê Meletiyê li Bakurê Kurdistanê heye. Ew bajar navendeke Bîzentiyan bû, lê piştî Mislimanan li sala 83g/702z dest danî ser, Xelîfe 'Umer bin Ebdilezîz ew bajar kavil kir, û şêniyê wê derbeder kir. Belkî rûniştvanên Gu.Turindê yên destpêkê ji ew kesên mişextbûyî bin. Li hêleke din, bêjeya “derende” di Kurdî de, bi wateya “kesê mişextbûyî û kesê hov jî” tê.

Lê eger em navê Turindê bi vî şêweyî (Torinde) bi lêv bikin, ewê mîna navên Siryanî dibe, çinkî (tor) bi wateya “çiya yan gir” tê, (inde) jî belkî navekî mirovan yan salixeke wî be. Lê belê pêwîst e em zanibin, ku “-ind” parkîteke zimanê Hitîtî ye jî, û ji bo binavkirina Xaknîgarî bi kar dihat.

Wek em dibînin, “Turind” ne navekî Erebî ye, û têkliya wî bi navê Erebkirî “Elzerîfê” re hîç tineye. Lê komîta Erebkirina navan guman kiriye, ku “Turindê” bêjeyeke Kurdî ye, ji (tu rindê) hatiye, loma jî ew wergerandiye û kiriye “El Zerîfê”. Û belkî jî ya wan rast be.

- Gundekî mezin e, li sala 2002an derbas nav sînorên kargêrî yên bajarê Efrînê bûye. Ew gundê destpêkê ye li Na.Efrînê ku li dawiya salên heftê ji sedsala bîstan Kartol lê hatin çandin, (birayê min endezyarê çandiniyê Ebdirehman Elî ew çandin).

Kaniya Turindê ya navdar li binê gund bû, û (2/L /S) av dida. Berê masiyên reş di kaniyê de hebûn, û xelkê ew pîroz didîtin, ew

kanî niha miçiqiye. Li paş gund li ser cihê bêderan, gelek kevirên mezin ên avahiyên şûnewarî ji binê xakê derdikevin, ew jî dest nîşan dike, ku ew cihekî şûnewarî û kevin e. hêja ye em bêjin ku ta niha hejmareke mezin ji şêniyê gund li ser ola Êzdî ne.

22. **'Endarê** . ***'Êndara*** (601k, 330h, 6km, 255m):

- ('Ên) bi Erebî bi wateya "kanî" tê, (Dar) jî bêjeyeke Kurdî ye, û wilo her du bêje bi hev re dibin "kaniya darê". Mera kane bêje jî, belkî pêwendiya navê gund bi navê Qiralê Êranî "Daryos" re hebe, çinkî gelek caran Farisan ev dever dagîr kirine û demine dirêj di destê wan de mane. Xûrî Bersûm jî dibêje: Ew navekî Siryanî ye bi wateya "kaniya malan" e, lê belkî jî ji şer û pevçûnê hati be, /rûpel 242/.

- 'Endarê gundekî biçûk e li ser sirteke zinarî ye. Kanî û gola 'Endarê li binê gund in. Karxaneke çêkirina lûlikên lestîkî lê heye.

**Kaniya 'Endarê**: Berê ava wê 129/L/s bû, lê niha li werzê Havînê ziwa dibe. Ava wê bi Rojava de di ber girê Endarê re bi ser çemê Efrînê de diçe. Berî salên heştê ji sedsala bîstan, gola 'Endarê bi av, dar û masiyên xwe ve navdar bû, û seyrangeheke pir şêrîn bû jî.

**Girê 'Endarê**: Girekî şûnewarî yî navdar e, dora 1/km li Rojavaya gund de. Perestgeheke ji serdema Hitît de li ser e, ew şûnewar li ser gir mîna mûzexaneke şûnewarî ye li nava sirûştê. Şûnewarên gundikekî kevin ku temenê wî deh hezar sal e, li aliyê gir yê Başûr heye. Kavilên Gundê 'Endarê yê berê jî li aliyê gir yê Bakur e, lê ew niha bi rûyê zemînê re dûz bûye, û şahiyên cejna Newrozê li ser tên gerêdan. Bermahî û şûnewarên gelek netew, dewlet û ol li cihê girê Endarê tên dîtin, wek: Hitît, Aramî, Yûnanî, Bîzentî, Zerdeştî, Farisî û Îslamî.

23. **Ĝezîwê** . ***Ĝezawiyê*** (2176k, 1020h, 18km, 240m):

- Ez guman dikim, navê gund ji navê kesan hatiye. Çinkî navên mîna Ĝez, Mala Ĝezê li gund û li gundên derdorê hene.

- Ew gundekî şên û mezin e, û li ser pesarekî zinarî ye ji Çi.Lêlûn. Cihê wê 355/m bilind e. Kaniya gund li jêrî wê ye. Dora nîvê şêniyê gund li ser ola Êzdî ne, û Şêxê Êzdiyên Na.Efrînê rêzdar Şêx Ĥusên lê rûdine. Hin neviyên Aĝeyên hoza Dina lê hene.

24. **Kurzêla Cûmê** . ***Qurzêĥil*** (611k, 485h, 7km, 360m):

- Du nêrîn li derbarê kok û wateya navê Kurzêlê hene:

**Yek**: Ew navekî Siryanî ye, bi wateya "gundê serberjêrbûyî" ye.

**Didu**: Xûrî Bersûm dibêje, ew navekî Aramî ye ji du bêjeyan pêk hatiye: Qor, bi wateya "sarbûn", destnîşana ava kaniya gund dike, û ji "Zahêl" ango "serberjêrbûyî", ango tevahiya wî navî wateya "ava kaniyê ya sar û diherike" dide, /rûpel 445/.

Wek xuya dibe, cidatiyeke eşkere di navbera her du nêrînan de heye, ew jî ji ber ku ew her du nêrîn li ser bingeha bilêvkirina bêjeya navê gund rabûne, loma jî ew her du nêrîn lawaz dibin. Lê em jî ji hêla xwe de, negihştin bingeh û wateya wî navî, digel ku beşê yekê ji nêv "kur" di Kurdî de bi wateya "cihê rût, law, kur" tê, lê dîsa jî pirsa wateya nêv bêçareserkirin dimîne.

- Kurzêl ji gundên mezin e li Na.Efrînê. Yaqût El- Ĥemwî di sala 1229an de, ew bibîr aniye, û navê wê bi şêweya "Qurzaĥêl" nivîsiye. Gund li ser pesarê Rojava yê Çi.Lêlûn e. Li serdema Romanî û Bîzentî, Kurzêl gundekî şên û giring bû, û navendeke Rahibên ola Fileh bû, xan, ûtêl, dêreke Rahiban û stûnekî perestvaniyê jî lê hebûn. Hîn jî gelek tiştên şûnewarî li nav û li derdora gund hene, wek: Kevirên mezin ên avahiyên kevin, stûn, dîwarên kinîsekê, necefe… Kaniya gund jî li ber mezel li binê gund e, lê ew jî wek bi dehan kaniyên navçê ziwa bûye. Ma em bêjin ku şêniyê gund Kurdine pir çalak û cefakêş in.

25. **Keferdela Jorin** . ***Keferdelê Foqanî*** (1647k, 303m, 15km, 520m):

- Navê gund ji du perçan pêk hatiye: Kefer û Del. Em ji hêla xwe de negihîştin wateya wî navî ya rast, lê belê "kefer" bêjeyeke Siryanî- Yûnanî ye bi wateya "Gundik" tê, "deli" jî di zimanê Tirkî de bi wateya "dîn" tê, belkî nav ji wan her du bêjeyan pêk hati be?.

- Gundekî biçûk e, malên xwe li ser her du aliyên Ge.Bîrê belav dibin, ew gelî jî bi şêweyekî dîke bi Başûr de diçe. Cihê gund ji her çar aliyan de bi pesarên çiayayî û daristanî parastî ye. Ew ji gundên pir kevin e li navça Çi.Kurmênc. Rêzdar Kemal Ebdî, wekî ku xebtkaerekî destpêkî ye di warê xebata kurdeweriyê de, ji vî gundî ye.

26. **Keferdela Jêrin**, **Gu**.**Çîlê** . ***Keferdelê Teĥtanî*** (1477k, 437h, 12km, 385m):

- Vî gundî navê xwe ji navê Gu.Keferdela Jorin biriye, rûniştvanên wê yên destpêkê jî jê bûn. Ev gund bi navê "**Gundê Çîlê**" jî tê binavkirin. Ew jî li ser navê salixa jinekê ye, ku li destpêkê lê rûnişti bû.

- Gundekî orte ye. Li ser her du aliyên geliyê Maraqê dikeve. Ew gelî ji Gu.Keferdela Jorin de dadikeve. Çi.Çêlmîrê jî ji Rojhilat de bi ser gund de xûz dibe.

27. **Keferbetrê** (282k, 327h, 7km, 295m):

- Nav ji du bêjeyan pêk tê: Kefer + Betra, me kok û wateya wî navî nas nekir, lê ew berve navên Siryanî diçe. Kefer: gundik, Betra: Jî belkî nevê kesekî be. Lê El-Esesdî ji Baba Şelĥet biriye û wiha dibêje: Ew ji Aramî ye, Keferbetra, Gundê Bîtar (ango têmarkerê hespan), ji bilî ku belkî ew ji (Betr) ya Yûnanî ye û bi wateya Zinar tê.

- Gundekî biçûk e, ji çend malan pêk tê. Ew li ser rûyê Başûr yê Qeracê Reş (qeracê çêlkaniya) ye. Kaniyeke li ber gund ji binê riya ziftkirî derdibe. Cihê gund şûnewarî ye. Karxaneke birîna keviran û yek a çêkirina kelpîçên avakirinê û du me'serên zêtê lê hene. Ew gundê mala Robarî ye û lê rûdinin, rojnamevan, rewşenbîr û nivîskar Dr.Mecîd Şêxo, lê rûdine.

28. **Keferzît** . ***Kefer Zêd*** (1266k, 542h, 15km, 300m):

- Ev nav ji du bêjeyan pev dikeve, Kefer û Zêt yan Zêd. Zêd jî di Kurdî de bi wateya "bilind, diyar" tê /ferhenga Kurdistan/. Cihê gund li ser sirtekê ye, derdora wê kendûkorên nizim û zewr in, ango wateya navê Kurdî li salixên cihê gund tê.

Lê belê, bêjeya "zêt yan zêd" di Siryanî û di Kurdî de jî bi wateya Zêt tê, loma jî hinek bawer dikin, ku belkî navê gund bi wateya "gundê zêtê" be, û ji bejeyeke Siryanî-Kurdî hati be?.

- Gundekî mezin e, li ber çemê Efrînê li ser bêlekê ye.

29. **Keferşîl** (997k, 385h, 4km, 320m):

- Elî Seydo Goranî di ferhenga xwe de li ser wateya bêjeya "Şîl" dibêje, ew wateya "ava tirî berî ku bibe sîrke" dide. Xûrî Bersûm jî dibêje, ew navekî Aramî ye, bi wateya "gundê qelişî" ye /rûp 284/. Di baweriya me de, binavkirina Kurdî nêzîktirî rastiyê ye.

- Gundekî mezin û şên e, li ser rûyê Başûr Rojava yê sirta Keferşîlê dikeve. Geliyê Tizbiyê di aliyê wî yê Rojava re diçe.

30. **Kifêrê** (576k, 350h, 7/km, 220m):

- Kifêr Xûrî Bersûm, di /rûpel 7/ de dibêje, ew navekî Siryanî ye, bi wateya "xudênenas, gawir yan gundik" tê. Belkî jî ew nêrînek rast be?

- Gundekî biçûk e, li ser dawiya Başûr a Çi.Bozîkê li ber çemê Efrînê.

31. **Kokebê** (1392k, 12km, 340m):

- Kokeb, El-Esedî dibêje Baba Şelĥet gotiye, ku ew navekî Aramî ye, Kokeba: Kewkeb, ango: stêrk.

- Gundekî biçûk e, ji çend malan pêk tê, li ser pesarê Başûr yê Çi.Bozîkê dikeve. Deşteke fereh li Başûrê wê ye, û cihê gund pir ciwan e.

32. **Bozîkê** (375m, 7km):

- Bozîk, navê rûniştvanê gund ê destpêkê ye. El- Istexrî jî /mirina wî sala/ 951g ye/ hozeke Kurdî bi navê "Bozîkan" bi bîr tîne. Ew nav ji sirta çiyayî ku gund li ser e jî, tê gotin.

- Gundekî biçûk e, ji çend malan pêk tê. Li aliyê Bakur Rojava, li ser Çi.Bozîkê ye. Cihê gund zor şêrîn e. Lê piraniya şêniyê wê jê barkiriye.

33. **Maratê** . ***Mi'ratê*** (4671k, 995h, 5km, 380m):

**- El-**Esedî ji Baba Ermelê biriye û dibêje: Ew nav ji Aramî ye: Me'riste: Şikefta Mêwê ye.

- Gundekî mezin e, geliyê Maratê ji Rojava de berve Rojhilat di nav re diçe. Li jorî gund, li aliyê Bakur Rojava, kaniya gund heye, ava wê li ser malên gund belav dibû, lê ew ava niha pir hindik bûye. Ew navenda mala 'Umer Sefûna ye ku li Çi.Kurmênc naskirî ye.

34. **Bênê** . ***Ibbîn*** (4051k, 25km, 480m):

- Bên, Bîn, bi Kurdî bi wateya nefes û bîn tê. Lê em bawer dikin ku navê gund ji bêjeya "Ben" a Kurdî ku bi wateya " sirta dirêj" e, hatiye. Xûrî Bersûm jî dibêje, ew navekî Siryanî ye, bi wateya "koma keviran, şaxên daran, berên daran" tê, ew li cihekî din jî li derbarî şora "bên" dibêje: Ew di zimanê Aramî de bi wateya "Rahib" tê. Di baweriya me de, du nêrînên têvel di zimanekî de, û li

ser bêjeyekê, wan her du nêrînan lawaz dike, û dike cihên gumanê. Loma jî binavkirina Kurdî dê rastir be.

- Gundekî mezin e ji gundên Robariyan. Gelek xwendevan tê de hene, jê mala Gedro ku bi hunerên şêwekariyê û rewşenbîrên xwe navdar e.

35. **Mêremîn** . ***Meryemîn*** (6320k, 680h, 17km, 580m):

- Meryemîn, navê darekê ye. Yaqût El-Ĥemwî /beş 2, rûpel 326/ li derbarê vî gundî gotiye, ku ew ji gundên Ĥelebê yên navdar e. Li serdemên berê kelake giring li cihê gund hebû.

- Mêremîn gundekî mezin e li ser Çi.Lêlûn li devera hoza Robarî. Hemî rûniştvanên wê Tat in û bi Erebî daxivin. Bermahiyên avahiyên şûnewarî û gorên di tehtê kolandî ji serdemên Romanî û Bîzentî de lê têne dîtin. Ew gundekî şên e, avahiyên nûjen û şêrîn tê de radibin.

36. **'Inabkê** . ***Enab*** (4448k, 440h, 20km, 545m):

- 'Inab, navê darekê ye.

- Gundekî mezin e, li kêlek Gu.Mêremînê ye, ew her du gund mezin bûne û gihîştine hev. Hemî şêniyê wê jî Tat in û bi Erebî daxivin.

37. **Basilê** . ***Basilĥaya*** (2956k, 505m):

- Nêrînek heye dibêje, navê gund Aramî ye, û wateya “Mala Darbiran/Kokciyan” dide, û bi wateya ‘‘latê têxt’’ jî tê,/El-Esedî, perçe 2, rûp 37/.

- Gundekî orte ye, li ser beşê Robarî ji Çi.Lêlûn e, ew ji gundên Robariyan ên kevn e. Gelek cîgehên şûnewarî li derdora gund hene.

38. **Berad** (1408k, 350h, 14km, 585m):

- Ebdela Ĥeccar di /rûpel 176/ dibêje, “Berad” di Siryanî de bi wateya “belavkerê naman, û cihê bezê/bazdanê” tê. Lê belê, wek em tev jî dizanin, ku cihê gund zinarî ye û hîç ji bezê re nabe. Di pirtûka "li warê Marmaron- rûpel 29" de jî wiha hatiye: Navê wê yê binyatî bi Yûnanî ((Onyoparas)) e, ango: Kaniya Berad, ‘‘kaniya sar’’, yan jî ‘‘kaniya bajarê Berdadê’’.

Xûrî Bersûm jî dibêje, koka navê "Berad" Siryanî ye, ji “Barad, Bered, Qer, Ebleq” hatiye, ew bêje destnîşana sermê dikin, çinkî

cihê gund bilind e, û dibêje jî ku wateya wî navî ne "postevan e, ne jî cihê bezê" ye, mîna ku hinek dibêjin /rûp 64/.

Bêjeya "berîd" bi xwe jî, eger navê gund jê hati be, gotineke "Kurdî- Farisî" ye, ji "Qantira dûv birî" re dihat gotin. Çinkî li demên berê, dûvê Qantira postê" dibirîn, da ku ji yên din were naskirin û parastin, paşê jî ew bêje bi demê re bû "berîd", /Yûsif Sêdawî, TVya Sûrî/.

Li gor "Ferhenga Kurdistan" jî, Berad bi wateya: Lerz, curf û kutana peran tê, ev wateya dawîn, ango kutana pereyan, li rewşa Beradê ya serdemên berê tê, çinkî li serdema Romanî û li destpêka ya Bîzentî, Berad bajarekî şên û mezin bû, û paytexta navça Çi.Lêlûn bû, û belkî pere jî lê dihatin çêkirin.

- Berad ji nav gundên Şêrewa gundekî mezin e. Gelek şûnewarên giring li nav û li derdora wî hene, gora Mar Maron jî li nav şûnewarên wê ye, li roja me kinîseke biçûk li ber hatiye avakirin.

39. **Kefer Nebo** (140k, 35km, 575m):

- Nebo, navê Xwedêyekî Mezopotamî ye, li serdemên pûtperestiyê û li destpêka belavbûna ola Fileh li Çi.Lêlûn dihat perestin, û perestgeheke xwe ye gewre jî li wir hebû. Lê El Esedî ji Baba Ermelê biriye û dibêje, ku ew navekî Aramî ye: Kefer Daba, ango: Gundê Gur.

- Ew gundekî biçûk e ji gundên Şêrewa. Cihê gund şûnewarî ye, bermahiyên gelek avahiyan, kinîse, ûtêl, zêrzemîn û pûtên hêja lê hene.

40. **Soĝanek** . ***Soĝanê*** . *El-Beseliye* (935k, 400h, 16km, 545m):

- Bêjeya "soĝan" di zimanê Tirkî de wateya "Pîvaz yan cihê xweveşartinê" dide. Loma jî wergêr ew nav wergerandiye zimanê Erebî û kiriye "El-Beseliyê" ango Pîvaz. Lê ya rast ew e, ku " Soĝan" navê hozeke Kurdî û Êzdî ye, kesên wê di ola Êzdî de ji aliyên pilevaniya olî de ji koma Şêxên Qatanî ne [(1)]. Ra dawiya sedsala nozdehan tevahiya şêniyê Soĝanekê li ser ola Êzdî bûn.

- Gundekî biçûk e ji gundên Şêrewa. Gelek bermahiyên şûnewarî wek dîwarên avahiyan, kinîsan, gor, bîr, kevirên mezin û

[1] - Dr. Xelîl Cindî: Rûpel 52.

şekirî û kevirên necefe û sivînekan jî ji serdemên Romanî û Bîzentî de lê hene.

41.**Birckê Weqês**, **Birckê Terpê**. ***Birc El-Qas***. *El-Qaz* (40km, 530m):

- Weqas, navekî mirova ye li ba Kurdan. “Terpê” jî navnîşana wî ye, şêniyê Çi.Şêrewa jî bi lêkirina navnîşanan (leqeb) pir navdar e, Weqas yan Terp jî rûniştvanê destpêkê bû ku li wir rûniştiye. Lê belê El-Esedî /peldank 2, rûp 85/ dibêje, koka wî navî ji “Borca Diqşe” hatiye, wî gumankiriye ku koka navê Weqas “diqşe” ye, ango “qeşe, keşe” ye.

- Gundekî biçûk e ji gundên Çi.Şêrewa. Ew ji bajarê Efrînê pirtir nêzîkî Ĥelebê ye. Gelek bermahiyên avahiyên şûnewarî li nav û li derdora gund hene. Hêja ye em bêjin, ku ew gund li sala 1975an, ji Na.Efrînê hat birîn û bi ser devera Niblê ve xistin.

42. **Zaretê** . ***Çetel Ziyara*** . *El-Ziyara* (1906k, 370h, 35km, 481m):

- Çetel: Bêjeyeke Tirkî ye bi wateya “zo, cot” tê, ew jî ji ber ku du zaret/pîrozgeh li gund hene. Yek jê di nav mezelê gund de ye, û bi Şêx Yûsif El-Kûfî bi nav dibe.

- Gundekî mezin e li Çi.Lêlûn, gelek kesên xudî dîplomayên bilind û karmendên dewletê lê hene.

43. **Cilbir** . ***Clibil*** (1547k, 670h, 18km, 515m):

- Navekî hevdudanî ye, ji du bêjeyan pêk hatiye: Cil û Bir yan Ber, gerg. Belkî ew nav destnîşana “cil û kincan” dike. Lê ya ji rastiyê nêzîktir ew e, ku ew nav ji van du bêjeyan pêk hatiye: Cih, ango war û şûn, û Bel, ango “cihê bilind û diyar”. Gund bixwe jî li ser cihekî bilind e, û dora wî dûzahiyeke çandiniyê ye fereh e. Em bawer dikin, ku ew her du bêje bi demê re têkel hev bûne û navekî nû jê peyda bûye, ango: Cihbel – Cibel û pişt re bûye Cilbir.

- Gundekî orte ye li ser Çi.Lêlûn. Ew navenda Mala Robarî ye, û mêvanxaneya wan a sereke li wir e. Hinek malên ciwan lê hatine avakirin. Cihê gund şûnewarî ye, û gelek kevirên mezin ên şekirî li nava gund hene.

44. **Zirêgat** . ***Zirêqat*** (540m):

- Zirêgat, bi zimanê Aşûrî bi wateya “pîrozgeh” tê. Zirêgat navê hozeke Erebî ye jî, malên wê li Libnanê û li deverine din jî hene.

- Gund li ser Çi.Lêlûn e, û ji çend malan pêk tê. Gund ji arzûyên malbata Robarî ye, ew li Rojavayê Gu.Cilbirê bi nêzîk 5/km ye. Bermahiyên avahiyên şûnewarî yên kevin li kêleka gund hene. Çend malên Erebên xudan pez lê rûdinin.

45. **Gubel** . ***Kobelê*** (576m):

- Navekî Kurdî ye ji du bêjeyan pêk hatiye: "Gu", bi wateya sirt û çiya tê, "Bel" jî bi wateya “ bilind û rep” tê. Herwiha navê gund ê sergihayî dibe: Bêla biçûk û bilind. Ew jî salixa Xaknîgarî ya cihê gund e.

- Gund ji arzûyên Robariyên Cilbirê ye, çend malên Ereb ên ku pêz xudî dikin lê rûdinin. Hin şûnewarên hêja lê hene, wek Kinîse, bermahiyên hin avahiyên kevin… û hwd

46. **Dêrmişmiş** (520m):

- Dêr + Mişmiş: Belkî "Mişmiş" navê xudanê wê dêrê bû û pê hate binavkirin. Yan jî darên Mişmişê/Zerdele li wir hebûn, û pê bi nav bû.

- Xirabakî şûnewarî yî mezin e li ser Çi.Lêlûn, cihê wî li Rojavaya Gu.Basilê bi nêzîk 5/km ye. Gelek cureyên şûnewarî yên têvel û zor hêja lê hene, ew wek bajarekî Kevin ji serdemên Romanî û Bîzentî de tê dîtin, û her kesê ku li şûnewaran meraq dike, û dixwaze li sirûşta hêmin û ciwan bibe mêvan, û bêhna hezar salan bîn bike, gerek here serdana şûnewarên Dêrmişmişê. Ew war ji arzûyên Robariyên Gu.Cilbirê ye. Li roja me çend malbat ji Gu.Kurzêlê lê rûdinin.

47. **Xalta** . ***Xaldiyê*** (279k, 200h, 15km, 566m):

- Xalta navê binehozekê ye ji hoza Milan a Kurd. Ew navê navçeke mezin e jî li Bakurê Kurdistanê, ew li serdemên berê, cihê gelê Xaltî yê kevnar bû.

- Gundekî biçûk e ji gundên Çi.Lêlûn – beşê Robarî, û ji arzûyên mala Ĥec Nesîbê Robarî ye.

48. **Xurêbkê** . ***Xirbit El-Ĥeyat*** (1435k, 178h, 36km, 445m):

- Navê gund ji bêjeya “Xirabe” hatiye, gund li ser kavilên şûnewarî hatiya avakirin, girekî şûnewarî li Başûrê gund heye. Navê Ĥeyatê ku bi navê fermî re tê nivîsandin jî, navê rûniştvaneke wê ye berê ye.

- Gundekî Orte ye, li ser Çi.Lêlûn beşê Robarî, cihê wî li Başûrê Gu.Bênê ye.

49. **Gundê Mezin** . ***Zoq El-Kibîr***:

- Gundekî mezin e ji gundên Şêrewa. Navê wî yê gelêrî bi Kurmancî ye, û wate jî naskirî ye. Lê Xûrî Bersûm de /rûp 195/ dibêje, ku bêjeya "Zoq Aramî ye, û bi wateya: Zêrevan, dilêr, cihê nêrevaniyê yê bilind" tê. Ango wateya tevahî dibe "zêrevangeha mezin, cihê bilind ê mezin", û li gor X.Bersûm, bêjeya yekê ji navê gund Siryanî ye, ya din jî Aramî ye!?

- Gundekî Şêrewa yî orte ye, li sala 1975an bi ser devera Niblê ve xistin. Gelek şûnewarên Alefiringî yên ciwan û giring li nav û li derdora gund hene.

**Xirabî Şemsê:** Cihekî şûnewarî ye, li Rojavaya Gundê Mezin bi nêzîk 1/km ye, dergeha perestgeheke ji serdemên pûtperestiyê de lê heye û hîn jî li pê ye. Du kinîse û dîwarên gelek avahiyên şûnewarî yên zor ciwan lê hene. Ew cihekî şûnewarî yî zor giring e.

50. **Başemrê** (307k, 38km, 520m):

- Ebdela Ĥeccar di /Kinîsa Mar Sem'an, rûpel 176/ de li ser navê Başemrê dibêje, ew navekî Siryanî ye, bi watey "mala şande" tê. Mamosteyê zimanê Siryanî li zanîngeha Ĥelebê Xûrî Bersûm jî li ser wateya wî navî dibêje, ew bi wateya "Cihê avêtina tîran" tê, yan jî "navê geyekê ye, ku çîçeka wê zer e, dendikên wê jî kesk, çargoşe û berdirêjûk in, û bi navê Razbang jî tê nasîn" /rûp 58/. Wekî xuya dibe, cudatiyek di navbera her du nêrînan de heye, ew yek jî wan her duyan lawaz dike.

Nêrînek din jî heye dibêje, ew navekî Kurdî yî resen e, koka xwe "Baş + mêr = Başmêr" e. Bi tevahî jî, bêjeya "Başemrê" ji aliyê reng û bilêvkirinê de, nêzîk pergalên bêjeyên Kurmancî ye.

- Gundekî Şêrewa yî biçûk e. Gelek cihên şûnewarî yên hêja li nav û li derdora gund hene.

51. **Kilotê** (535m):

- Kurd bêjeya "Kilote" ji bo salixdana kesê qels û dixwerenedî bikar tînin. Lê di pirtûka "li warê Marmaron-rûpel6" de hatiye, ku navekî Siryanî ye, bi wateya: Kasa mîron a miqris tê?

- Gundekî biçûk e ji gundên Şêrewa. Gelek şûnewarên zor hêja û zor girin li derdora wê hene, ew hemî jî ji serdemên Alefiringî ne, jê kinîseke bi navê Kela tê nasîn, û du gorên kevirî yên sandiqî jî di ĥewşa wê de hene.

52. **Xirabî Şêx 'Eqîl** (35km - 565m):

- Gund navê xwe ji pîrozgeha "Şêx 'Eqîl" ku li nava gund e, biriye.

- Gundekî biçûk e ji gundên Şêrewa.

53. **Şewarĝa** . ***Şewarĝet El-Erz*** (373k, 25km, 552m):

- Navekî Erebî ye.

- Gundekî Orte ye, li ser sînorê Na.Efrînê yê Rojhilat e. Rûniştvanên wê Ereb in.

54. **Mezre'e** . *Şewariĝt El-Coz* (715k,17km, 590m):

- Navekî Erebî ye.

- Gundekî biçûk e. Berê ew gundê mala Şêx Ebdilĥenên bû, Şêxê rêyola Rifa'î li Çi.Kurmênc, paşê jî ew firotin hin kesên Ĥelebî, wan jî gund firot rûniştvanên wê yên niha yên Ereb.

55. **Me'riskê** . ***Me'rest El-Xetîb*** (641k, 16km, 615m):

- Di Kurmanciya herêmê de, Me'ris: Mêrê hêzdar û bi hêbet e. Gava ku ji yekî re bêjin, "ev me'ris" e, ango ew kesekî "xort û bi hêz" e. Li gor /Ferhenga E.Seydo Goranî/ jî, ew bi wateya "me'sera tirî, zêtûn û tiştên mîna wan tê".

Xêriddîn El-Esedî jî wiha dibêje: Me'riste di zimanê Aramî de bi wateya "şikefta mêwê" ye?.

- Gundekî orte ye. Gelek şûnewarên kevin lê hene.

56. **Kefermiz** (453k, 7km, 670m):

- El-Elesedî ji Baba Şelĥet biriye û wiha dibêje: Kefer mîzk ang: Ji kesê bi navê Mîz hatiye.

- Gundekî biçûk e, li aliyê herî Bakur Rojava ji pesarekî Çi.Lêlûn e. Cihê wî mîna havîngehekê ye.

57. **Qîbar** . ***'Erş Qîbar*** . *El-Hewa* (614k, 335h, 3km, 360m):

- Navek e, ji du bêjeyan pêk hatiye, **'Erşê**: Beşê gund ê Başûr, û navê deşta ku li Başûrê wê ye jî. **Qîbar**: Navê beşê Bakur û dûzahiya ku li Rojavaya wê ye jî. Ew her du beş bi geliyê Qîbarê ji

hev dibin. Navê “Qîbar” ji sedsalên navîn de tê hildan. Li wan deman, kesekî bi navê “Elî Qîbar” xudanê keloşka “Qîbar” hebû û li wir destlatdar bû, û hîn kavlên wê keloşkê li Rojavaya gund in.

Di ferhenga Goranî ya Kurmancî de jî wiha hatiye, “Qîbar yan Qîvar” navê geyeke bi husturî ye, li devera deşta Cûmê jê re “Qest” tê gotin. Birastî jî ew geye bi şêweyekî pir fereh, nemaze li deşta Başûrê gund şîn dibû, û ew deşta bi “Qesta 'Erşê” navdar bû.

Li destpêkê, destlatê navê gund guhert û kir “ 'Işiq Kibar”, ango “Evîna mezin”, di Erebkirina dawîn de jî, ew kirin “El-Hewa”, lê ew her du nav, ne ji dûr ne û ji nêzîk, nagihên wateya navê gund ê resen.

- Qîbar, ji gundên kevin, mezin û xweş e li deşta Cûmê. Xaniyên wê li ser pesarê Çi.Lêlûn ê Rojava ne. Ew li destpêka sedsala bîstan navenda rêbertiya Êzdiyan bû li Na.Efrînê, û ra niha jî bêtirî nîvê şêniyê gund li ser ola Êzdî ne. Li aliyê gund yê Başûr, li şûna bêderan, gelek bermahiyên şûnewaran bi kolanê re ji binê zemînê dertên, ew jî diyar dike, ku ew cih ji berî serdemên Îslamî de şên bû. Kaneke kevin û şûnewarî ya keviran ku bi “gola Erşê” bi nav dibe li Başûrê gund heye, ew li salên bibaran tijî av dibe û di ser re dirjê.

Sê kanên hilkirina keviran li derdora gund li ser Çi.Lêlûn hatine vekirin.

58. **Aqîbê** . ***'Eqîbê*** (3184k, 35km, 505m):

- Navê xwe ji navê pîrozgeha, ku li nava mezelê gund e, hatiye.

- Gundekî mezin e li ser sînorê Rojhilatî yê beşê Şêrewa ji Çi.Lêlûn. Gelek kesên xwende û karmendên dewletê lê hene.

59. **Fafirtîn** (735k, 35km, 550m):

- Ebdela Ĥeccar bawer dike, ku Fafirtîn bi zimanê Siryanî ye, û bi wateya “gundê hejîra” ye?.

- Ew gundekî biçûk e ji gunêdên Şêrewa. Gelek şûnewarên Alefiringî li Fafirtînê hene, jê kinîseke ji dîroka sala 372/Z de ye, ew kinîsa herî kevin e li Sûryê, ku dîroka wê naskirî ye.

60. **Kibêşîn** . ***Kibaşîn*** (935k, 258h, 37km, 545m):

- Bawerî heye ku navê gund ji salixên hin Rahibên Îtalî ku “Kumên şîn” didan serê xwe hatiye. “Qub, Qube” jî cureyek e ji avahiyên kevin e. Gava ku bêjeya Kum- kub- qub bi bêjeya “şîn”

dikevin, navekî nû dafire: “Kum-şîn”. Em bawer dikin, ku ew bêje bi demê re bûye “Kubeşîn”.

Ne'ûm Bexxaş jî di /defterên cem'iyê, beş 1, rûpel 49/, li sala 1836an gotiye, ku dêreke Baba Kebûşî‘‘Xudanên kumên şîn” ya Maronî li Ĥelebê heye.

Xûrî Bersûm jî li derbarî wî navî gotiye: Ew navekî Aramî ye, bi wateya “Beran û Nêrî tê” /rûp 265/. Lê em bawer dikin ku binavkirina Kurdî ‘‘Quba Şîn yan Kumê Şîn’’ rastir e.

- Gundekî Orte ye li ser beşê Başûr ji Çi.Şêrewa. Ev şûnewar lê hene: Dîwarên Kinîsekê, dergeh, stûn, bîrên di tehtê de kolandî, ew hemî jî ji serdema Romanî de ne.

61. **Kîmar** (2214k, 400h, 15km, 555m):

- Kî, Key û Keye di zimanê gelê Medî de bi wateya “rêzdar” tê. “Mar” jî bi zimanê Siryanî “Qidîs, Kesê Pîroz” e. Ebdela Ĥeccar jî /rûpel 10/ dibêje, ew nav di Siryanî de bi wateya “nasik, tergidinya, xemgîn” e ?.

- Gundekî mezin e ji gundên Şêrewa. Gelek şûnewarên zor giring li nav û li derdora wî gundî hene, ew hemî jî ji serdemên Alefiringî yên têvel in. Cihê gund pir xweş û geştevanî ye.

62. **Meyasê** ( 40km, 490m):

- Di Ferhenga Kurdistan a Mokryanî de hatiye: Ku Meyase bi wateya “daristaneke biçûk, cihekî biçûk ku bi darûberên çolê ye” tê. Kurdên navçê jî wî navî ji keçikan re bikar tînin.

- Gundekî biçûk e ji gundên Şêrewa. Li sala 1975an ji Na.Efrînê hat birîn û bi ser De.Niblê ve çû. Ew li Rojavaya bajarokê Niblê bi çend kîlomitran e. Hin şûnewarên ji serdema Alefiringî lê hene.

63. **Qarsaq** (210m):

- Navê cihekî ye li Rojavaya Gu.Îsak bi dora 1.5/km. Me wateya wî navî nas nekir.

- Di salên şîstî de ji sedsala bîstan, çend malên Ereb ji hoza Sebxawî ku xudan pez bûn li wir danîn. Piştî ku wan sûde ji zagona durustkirina çandinyê wergirt û zevî standin, xanî lê ava kirin û lê bicih bûn. Ew niha dora deh malan e.

64. **Keferlab** (250m):

Navê cihekî şûnewarî ye, li ser pesarê Rojava yê Çi.Lêlûn, li Başûrê Gu.Birca 'Evdêl,.

65. **Kefer Bilê** (502m):

Cihekî şûnewarî ye li ser Çi.Lêlûn, li Rojavaya Gu.Cilbirê ye.

# Lêkolîna Çarem

## Nav li Devera Cindirêsê

Pêncî û şeş gund û war di çarçewa Devera Cindirêsê de hene. Şeş jê warine vala ne. Sînorên vê deverê wiha ne: Ji Rojava de Tirkiyê, li Bakur deverên Şiyê û Mabeta, ji Rojhilat de De.Navend-Efrîn, li Başûr jî Na.Hêrimê li parêzgeha Idlibê. Pêwîst e em bêjin, ku gundê Cindirêsê li sala 1939an li şûna Gu.Ĥemamê bû navenda vê deverê.

1. **Cindirês** . ***Cindêrês*** (10599k , 20km , 231m):

- Nêrînên têvel li derbarê kok û wateya navê Cindirêsê hene, emê yên giringtir hewaldin:

Hin jêder dibêjin, ew navekî hevedudanî ye, ji du bêjeyan pev ketiye, Cind: Dabeşkirineke serbazî ye Îslamî ye, û Êris: Navê rêberekî Romanî ye, /Ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî/.

Hin jî dibêjin, ew li ser navê Rahib “Cindaros” e, ku li çaryekê yekê ji sedsala çaran piştî zayînê, şagirtê Colyan Saba ku navê wî “Estiryos” bû, wî perestgehek li boyî rahib “Cindaros” ava kir, ew perestgeha Filehan a herî kevin bû li Na.'Entekê.

Lêkolînvan Ebdela El-Ĥilû jî wiha dibêje: "Navê Cindirêsê di jêderên Yûnanî de bi teşeyê “Gindaros” hatiye, di Siryanî de jî bi şêweyê “Cenderyos” hatiye, lê nediyar e eger ew berê jî wilo bi nav dibû lê na, wê hîngê ev nav, di ev raweya xwe ya dawîn de, dê vegere raweyeke Aramî ye kevintir, û bi şêweyê “Cendira” ku bi wateya “Pozbilindî, jixwerazîbûn, nefsgirtinê” ne, ew salix jî çê dibin ku bibin navê gundekî. Lê belê ew nav di jêderên Yûnanî de bi şêweyê “Gindaros” hatiye, û wek bilêvkirina Erebî ye, lê belê ya rastir bilêvkirina Erebî ji Yûnanî hatiye, bilêvkirina Yûnanî jî, yan bilêvkirineke ne durust e ji teşeya Siryanî, yan jî bilêvkirineke ne durust e ji raweyeke Aramî ye din, wek “Condira” ku wateya:

Derbendek/ astengek Zinarî dide, û wilo ev jî dibe texmîneke gengaz ji navê gund re", /rûp 201/.

Lê belê kesên ku cihê Cindirêsê nas dikin, dizanin ku ew li deşteke dûz e, û ti “derbend/astengên zinarî” lê tinene, cihê wê jî li gor derdora wê, nahêle ku ew "pozbilind û jixwerazî" bibe, loma jî em bawer nakin ku binavkirina Aramî dê rast be.

Di baweriya me de, lêkolîner pir dûr çûne û guhdarî li gotina şêniyê deverê nekirine. Ji ber ku gotina gelêrî li derbarê navê Cindirêsê wiha dibêje:

Li demên kevin, destlatdarekî Cindirêsê li şêniyê wê ferz kiri bû, ku her malek tibabek ax bikşîne ser girê wê. Wî karî demeke dirêj ajot, xelk hosan kir û jiyana şêniyê gund dijwar û **''dêris''** kir, ta radekê ew gund bi navê "**can dêris**" hat nasîn, ango “can û hêz di şêniyê gund de nema, û kavilî û dêrisî kete nav wan”, ev gotina li roja me jî hîn li Cindirêsê tê gotin, û dibêjin: “Mala filankesî dêndarê ewqas bar ax e”. Li ber roniya vê gotinê, navê “Cindirêsê” dê navekî Kurdî be, û xudî çêrokeke dîrokî ye naskirî be jî.

- Cihê bajarokê Cindirêsê ji demên pir zû de şên bû. Riya Romanî ya lezok û kevirkirî tê re derbas dibû, û bajarên mîna Sîros û Entekê… digihandin hev.

Cindirês li nav deşteke dûz û şov e, û bi darên Zêtûnê hatiye pêçan. Gelek kanî û kanok li derdora wê derdibin, çemê Efrînê jî di Başûrê wê re bi 5/km diherike. Ev cihê xaknîgarî yê baş, kiriye ku Cindirês ji demên pir kevin de ji ciwarbûnê re lêhatî be .

Gu.Cindirêsê yê kevin li aliyê girê Cindirêsê yê Bakur e. Piştî ku gund bû navenda deverê, mişextiyeke mezin ji gundên deverê de bi ser de hat, ew pir fere bû, û bû bajarokekî mezin û gulvedayî.

Li gor bajarokên Na.Efrînê yên din, çalakiyeke aborî ye baş li Cindirêsê heye. Û digel ku piraniya şêniyê wê di çandiniyê de dixebitin, lê gelek xanên kirînfirotanê û guvaşxaneyên zêtûnan lê hene. Pîşeyên mîna necarî, hesinkarî, durustkirina alavên çandiniyê û makînan, pêdviyên avakirinê û gelek tiştên din jî lê hene. Bazara wê ya hefteyî jî li roja Duşemê ye.

Ev gund bi ser devera Cindirêsê ve ne, **[Nexşe 22]**:

## **Meĥmediyê**:

Meĥmediyê, binavkirineke taybet e, ji Êzdiyên ku Misliman bûne re dihat gotin. Li sedsala nozdehan, hin Êzdiyên ku Îslam bibûn lê rûniştin û gund bi wan bi nav bû. Ew gund du beş in, **Şerqî û Xerbî**:

1. **Mihmediyê Şerqî** (118k, 5km, 140m): Gundekî biçûk e, li Başûrê Cindirêsê li ser milê çemê Efrînê yê rastê ye.

2. **Mehmediyê Xerbî** (202k, 140m): Ev gunda niha vala ye.

## **Aşka** , ***Aşkan***:

Aşkan, navê hozeke Kurdî ye, Şerefxanê Bedlîsî û B.Lêrx /rûp 75/, ew bi hoza "Aşkî" bi nav kirine. Rojhilatnasê Sovyetî Diyegonof jî, /rûp 229/, li ser miletekî bi navê "Eskêt" deng dike û dibêje, ew miletê "Eşkîda" ye, wateya navê wî jî "tiştê şûnewarî, tiştê kevin" e. Ew milet li sedsala heştan berî zayînê, ji komemiletên çiyayên Kurdistanê bû, û ji bapîrên Kurdan tê jimartin. Em bawer dikin, ku nêzîkbûneke mezin di navbera navê wî meletî û navê "Aşka" de heye. Aşka du gund in, **Şerqî û Xerbî:**

3. **Aşkê Şerqî** . ***Aşkan Şerqî*** (1215k, 560h,10km, 480m):

- Gundekî orte ye li Rojhilata Cindirêsê li ser bêlekê ye. Li Bakur û Rojavaya gund geliyekî kur heye. Derdora gund qeracî ye, gelek şikeft lê hene û piraniya wan ji kevin de bi destan hatine kolan, ew li demên berê, ji bo xudîkirina pêz û rûniştinê jî bikar dihatin.

4. **Aşkê Xerbî** . ***Aşkan Ĝerbî*** (1138k, 764h, 7km, 310m):

- Gundekî orte ye, li Rojavaya Cindirêsê li ser sirteke nizm e, cihê wê di nav ziviyên zêtûnan de maye.

5. **Aĝcelê** . *El-Beyada* (1025k, 5km, 210m):

- Aĝcelê, navekî Tirkî ye, bi wateya "dar" tê. Ti pêwendî di navbera navê wê yê resen û yê Erebkirî "El-Beyada" de hîç tineye.

- Gundekî orte ye, cihê wê şûnewarî ye û li ser sirteke nizm dikeve, dora wê zeviyên darên zêtûnê ne. Geliyê Ĥesîrkê di kêleka wê re bi Başûr de berve newalê çemê Efrîn diçe. Ew gundekî xweşik e, û avahiyên ciwan tê de rabûne.

6. **Yalanqoz** . *El-Rîĥan* (1728k, 2km, 260m):

- Yalanqoz, navekî Tirkî ye ji du bêjeyan pev ketiye (yalan + goz), bi wî rengî, ew bi wateya "çavê xinan-virek" tê. Ti têkliyên navê Erebkirî "El-Rîĥan" bi wî re nîne.

- Gundekî mezin e, li ser bêlekê hatiye avakirin. Baş xuya dibe ku ew cihekî şûnewarî yî kevin e.

7. **Til Ĥemo** ( 258k, 843h, 8km, 230m):

- Til: Bêjeyeke Erebî ye, bi wateya Gir tê. "Ĥemo" jî navekî mirovan î Kurdî yî herêmkî ye, ji navê Miĥemed tê kişandin.

- Gundekî biçûk e, girê "Til Ĥemo" yê şûnewarî di nav de ye. Cihê gund deşteke dûz e, çend newalên biçûk di nav û di dora gund re bi Başûr de berve çemê Efrînê derin.

8. **Til Silorê** ( 735k , 5km, 160m):

- Li derbarê navê "Silor" Yaqût El-Ĥemwî dibêje, ew ji navê "masiyê Silor" ango "masiyê Reş" hatiye, /beş 1, rûp 137/. Ew cure masî jî di çemê Efrînê û kaniyên golên deverê de hene. Lê belê Ebdela El-Ĥilû di pirtûka xwe /pêkanînên dîrokî… rûpel 105/ de wiha dibêje: Li ser binyata vî navî nehatiye lihevkirin eger Siryanî ye lê Yûnanî ye? Lê ya tekûz ew e, ku ew ne ji Erebî bi wateya "masiyê Silor" e. Me jî ji hêla xwe de nikanî wateya wî navî nas bikira.

- Gundekî orte ye, li ser kenarê çemê Efrînê yê çepê ye. Malên wî li dora girê Tilsilorê yê şûnewarî belav dibin. Li derdor û li Rojhilata gund, şikeft û cihên şûnewarî hene, hebûna wan dupat dike ku ew cih ji kevin de şên bû. Cih û sirûşta gund seyrangeheke zor ciwan e.

9. **Çeqelê Cûmê** . ***Çeqelî Cûm*** . *Cûm* ( 1205k, 325h, 8km, 440m):

- **Çeqel**, navê lawirekî çolê ye, û navê hozeke Kurdî ye jî. **Cûm** jî, navê deşta Cûmê ye, ew bi paş navê Çeqela ketiye da ku ji gundên Çeqlê Şiyê werin cidakirin.

- Gundekî biçûk e, xaniyên wî li ser her du aliyên geliyê Çeqela belav dibin.

10. **Celemê** ( 3605k, 1894h, 11km, 200m):

- Henry Lamans dibêje, ew gundê "Gelemo" yê Xaçperestan e, ku li Rojhilata Ebreşiya Entekê bû. Me jî nikanî wateya wî navî nas bikira.

- Gundekî mezin e ji gundên deşta Cûmê. Du kanî li dora wî hene, yek li Bakur e, ya din jî li Başûr e û 8/L/S av dide. Gu.Celemê bi çandina Titûnê navdar e, û bi dehan firnên ziwakirina wê lê hene. Girekî şûnewarî li Bakurê gund e. Celemê ji gundên Mala Gênc bû, lê piraniya kesên vê malbatê li salên çelî ji sedsala bîstan, çûn li Tirkiyê bicih bûn.

**Ebû Ke'ibê** (5km, 225 k):

Gund li ser navê pîrozgeha Êzdiyan "Ebû Ke'bê" hatiye binavkirin. Ew gund du beş in, **Xerbî** û **Şerqî**:

11. **Ebû Ke'bê Xerbî** . ***Ebû Ke'bê Ĝerbî*** (188m): Ji dora 20 malan pêk tê.

12. **Ebû Ke'bê Şerqî**. ***Ebû Ke'bê Şerqî*** (180m): Tenê malek lê maye.

13 . **Ĥecîler** . *El-Ĥiccac* (1409k, 7km, 195m):

- Nav ji bêjeya olî "Ĥecî" hatiye birin, parkîta gelejmariyê "ler" jî ji zimanê Tirkî bi paş nêv ketiye. Navê Erebkirî jî tenê wergerandina navê berê ye.
- Gundekî biçûk e. Geliyê Ĥesîrkê di Rojhilata wî re bi Başûr de diçe.

14. **Çolaqa** . ***Çolaqan*** . *Ciliq* ( 1537k, 480m):

- Çolaq, ji kesê dest (qut, xar, quloç) re tê gotin. Rûniştvanên wê yên destpêkê li şikeftên li Bakurê gund rûdiniştin, pişt re mirovekî "Çolaq" ji wan cihê bû, hat li ber bîra ku niha li nava gund e rûnişt, gundê nû ava kir û bi Çolaqa bi nav bû. Ti pêwendî di navbera navê gund yê resen û yê Erebkirî "Ciliq" de tuneye.
- Gundekî orte ye, li ser pesarên her du aliyên geliyê Ĥeftêr e. Ew li nîvê yekê ji sedsala bîstan navenda mala Seydê Mîmê bû, û gundekî şên bû, hîn jî hin neviyên wan lê rûdinin. Bîreke avê ye kevin li nava gund heye, hemî malên gund jê vedixin, ew carina di ser re jî dirjê û zevî pê tên avdan. Çolaqa gundekî ciwan û bi darûber e.

15. **Kanî Gewrkê** . *Şêx Ebdireĥman* (1040k, 7km, 270m):

- Kanî Gewrk, navê gund bi Kurdî bi wateya "Kaniya Sipî" yan jî "Kaniya mezin" tê. Şêx Evdireman jî navê pîrozgeha ku li ber

gund e. Ew pîrozgeh li ser navê Dostê Pêxember Ebdireĥman bin 'Of hatiye binavkirin.

- Gundekî orte ye, li ser milê Ge.Şêx Evdreĥmên yê Rojhilat e. Ew ji gundên mala Seydê Mîmê bû, hîn jî maline wan lê rûdinin.

16. **Ĥec Iskender** (1156k, 725h, 5m, 205m):

- Iskender, navekî mirovan e, li navçê bikar tê, û Ĥec jî navnîşaneke ola Îslamî ye.
- Gundekî biçûk e, li ber Ge.Ĥesîrkê ye.

17. **Ĥec Ĥesna** . ***Ĥec Ĥesenlî*** . *Hac Ĥesen* (1379k, 700h, 12km, 550m):

- Ĥec Ĥesna, Hesen navê rûniştvanê wê yê destpêkê ye, Ĥec jî, navnîşaneke ola Îslamî ye.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur ê Çi.Qaziqlî ye. Gund du beş in. Çend newalên biçûk li nav û di dorhêla wî re bi Bakur bi ser Ge.Circim de dadikevin. Daristanên merxê yên siq li derdora gund hene. Ew gundê devera Xastiya yê herî Rojava ye. Li Rojavaya wî bi 1/km, cigehê bi navê "Xirabê Qusêrî" heye, ew jî cihekî şûnewarî yî mezin e, û gelek bermahiyên şûnewarî û se'rîncên di tehtê kolandî lê hene, hîn jî xelk wan bikar tîne.

18. **Remedana** . ***Remedanlî*** . *Remedan* (697k, 15km, 540m):

- Remedan, navê rûniştvanê gund yê destpêkê ye.
- Ew gundekî biçûk e, li ser rûyê geliyê Circim yê Bakur e. Di navbera wî gundî û gundê hec Ĥesna de dora 3/km navberî hene. Cihê wî daristanî ye.

19. **Ĥemamê** (3088k, 588h, 8km, 170m):

- Navê gund ji "ĥemamên ava germ" ku li ber gund bûn, hatiye.
- Gundekî mezin e li ser sînorê Tirkiyê. Ew ji gundên mala Gênc a navdar bû, hîn jî qonaqeke wan e kevin û ciwan lê heye. Li nîvê yekê ji sedsala bîstan, dergeha sînorî ya çûnhatina di navbera Sûryê û Tirkiyê de li ber gund bû, lê niha ew hatiye girtin. Li dema ku Senceqa Eskenderonê bi ser Tirkiyê ve çû, gundê Ĥemamê kirin du perçe, nîvî li Sûryê ma, nîvê din jî bi ser Tirkiyê de çû. Pişt re, Tirkan beşê li aliyê xwe hilweşandin û şêniyê wê li dûrî

sînor bicih kirin. Li van salên dawîn, mirovekî ji gundê Ĥemamê bîreke avê li Bakurê gund kola, ava germ ji binê zemînê derxist, û xwaringehek û ĥemameke ava binzemînî ya Kibrîtî û germ li ser ava kirin, ew cih niha bûye cihekî geştevanî yî zor şêrîn.

20. **Xerza** . ***Xerzan*** (744k, 320h, 10km, 520m):

- Xerza, navê navçekê û hozeke Kurdî ye li wîlayeta Bedlîsê li Bakurê Kurdistanê.
- Gundekî biçûk e, malên wî li ser her du rûyên Ge.Xerza belav dibin.

21. **Xalta** . ***Xaltan*** (2183k, 575h, 15km, 560m):

- Xalta, navê navçekê û hozeke Kurdî ye li Bakurê Kurdistanê. Ew navê miletê “Xaldî, Xatlî” yê kevnar e, û ji bapîrên Kurdan tê jimartin.
- Gundekî orte ye, li destpêka Ge.Xalta dikeve. Sirt û qeracên bilind wî dipêçin. Ew sirt bi daristanên Merxê û zeviyên darên zêtûnê çandî ne. Cihê wê şûnewarî ye, gelek bermahiyên şûnewarî ji binê zemîna cihê wê dertên. Cihê wê bi ava serzemînî û binzemînî jî dewlemend e.

## **Dêwa** , ***Dêwan*** **:**

Navê gund ji bêjeya “dêw” hatiye. Hozeke Kurdî bi navê “Dêwik” li dedorên Amedê li Bakurê Kurdistanê heye. Dêwa, navê gundekî navdar e ji gundên hoza Mirdêsa ya Kurd li Tirkiyê li ser avraza Çiyayê Dêwan. Guman heye ku bêjeya “Dêw” yan salixa mirovê destpêkê bû ku li wir bicih bû bû, yan jî navê hoza wî bû. Dêwa du gund in **Jorin** û **Jêrin:**

22. **Dêwê Jorin** . ***Dêwan Foqanî*** (594k, 8km, 230m):

Gundekî orte ye, li aliyê çemê Efrîn yê çepê li ber avraza Çi.Lêlûn e.

23. **Dêwê Jêrin**, **Dêwê Ĥoko** . ***Dêwan Teĥtanî*** (400k, 175m):

Li Başûrê Dêwê Jorin, li ser milê çemê Efrînê yê çepê ye. Gundekî biçûk bû, xudanê wî Mistefayê Ĥoko, li salên sihî ji sedsala bîstan, arzûyên xwe firotin mala Siba'î ji Ĥelebê, û çû li Tirkiyê li bajarê Riĥaniyê rûnişt, şêniyê gund jî jê derket û çû li Gu.Dêwê Jorin rûnişt.

24. **Remadiyê** (809k, 6km, 200m):

- Belkî ji bêjeya Erebî “Remad” ango “ari” hati be?. Lê belê "Remadkî" hozeke Kurdî ye, jê li Bakurê Kurdistanê li derdora Ercîşê bi cih dibe. (Barbro Karaboda).

- Gundekî biçûk e, li ser milê Ge.Xalta yê Rojhilat e. Gundekî ciwan e, di nava ĥêrên zêtûnan de maye.

25. **Ĥemêlkê** . *Cemîl* (540k, 5km, 215 m).

- Koka bêjeya navê gund wiha ye: “Ĥem+êl+kê”, Ĥem: Ji Mihemed, -êl: Bêjeyeke Kurdî-Tirkî ye bi wateya çend malên ku ji yek kokê ne tê, kê: Jî parkîteka biçûkirinê ye di zimanê Kurdî de. Ti têklî di navbera navê gund ê resen "Ĥemêlkê" û yê Erebkirî “Cemîl” de tineye.

- Gundekî biçûk e, li Başûrê rêka Cindirêsê di nav Ĥêrên darên zêtûnan de veşartî ye.

26. **Ruf'etiyê** (205m):

- Li ser navê Ruf't Aĝayê mala Ĥeyder Aĝa bi nav bûye.

- Qoneqeke kevin a mala Ĥeyder Aĝa lê heye, niha ketiye nav sînorên şaredariya Cindirêsê.

27. **Sindiyankê** . ***Zindîkan*** . *Zinde* (571k, 4km, 285m):

- Sindiyankê, ji navê dara Sindîganê hatiye. Hozeke Kurdî jî bi navê “Sindikan” li derdorên Mêrdînê li Bakurê Kurdistanê heye. Têkliya navê Erebkirî “Zinde” bi navê gund yê resen re hîç tuneye.

- Gundekî biçûk e, di nav zeviyên zêtûnan de ye. Du girên biçûk li Bakurê wê hene, ew mîna du şûnewarên kevn in. Li salên bi baran gelek Kanok ji ber wan her du giran derdibin.

28. **Baflor** . *El-Zehra* (1554k, 725h, 3km, 244m):

- Bawer dibe ku "Baflor" navekî Siryanî be. Navê Erebkirî ji navê gund ê resen dûr e.

- Gundekî mezin e, li Bakur Rojavaya Cindirêsê ye.

29. **Ĥesîrkê** (9km, 350m):

- Em bawer dikin ku “Ĥesîr” navê arzûvanê wî cihî ye, “-kê - gê” jî di zaravê Kurmancî de alaveke cih e.

- Gund ji çend malan pêk tê, ew li ser her du aliyên Ge.Ĥesîrkê ne. Şikeftin li wan derdoran hene, li demên pir kevin ji hêla mirovan

ve dihatin bikaranîn. Rêka karozê ku diçe Şiyê di ber gund re derbas dibe.

30. **Firêriyê** (1554k, 1075h, 12km, 195m):

- Em bawer dikin, ku binyata vî navî wiha be: Fere + Rê = Riya Fere = Fere rê = Fererê…?

- Gundekî mezin e, dora 2/km li Bakurê Çemê Efrînê ye. Ew gundê mala Ĥeyder Aĝa ye. Gelek xaniyên ciwan lê hatine ava kirine.

31. **Feqîra** . ***Qerebaş*** . *El-Rras El-Eswed* (1706k, 475h, 11km, 435m):

- "Feqîr" binavkirineke olî ye li ba Êzdiyan. "Qerebaş" jî binavkirina Osmanî ye ji Êzdiyan re. Li demên berê hin Êzdiyên wî gundî desmalên reş didan serê xwe, loma jî karbidestên dewleta Osmanî li xwe neĥeyirîn û gund bi dana serî ya reş bi nav kirin. Navê Erebkirî jî wergerandina navê Osmanî ye.

- Gundekî mezin e, li ser sirta bi navê Kurkê dikeve. Hemî şêniyê gund Kurdên Êzdî ne.

32. **Qujûma** . ***Qucemanlî*** . *El-Ddexim* (1208k, 1286h, 7km, 310m):

- Qujûma, koka vî navî ji "qij - qijbûnê" hatiye. B.Lêrx jî /rûp 19/ dibêje ku "Qoceman" hozeke Kurdî ye, jê li derdora bajarê Qersê li Bakurê Kurdistanê heye. Navê Erebkirî jî wergerandina navê Kurdî ye.

- Gundekî mezin e. Gelek xwenedevan tê de hene. Gund di nava zeviyên zêtûnan de hatiye veşartin.

33. **Qîlê** (547k, 5km, 270m):

- Di ferhenga Goranî de hatiye, ku "Qîl" guhanê dewêr yan diranê Fîl, Ĥêştir yan jî yê sega ye. Ew bêje di Kurmanciya Na.Efrînê de jî bi wateya "rengê sade" tê, dibêjin "ev qîlî sipî, qîlî reş e…". Di hin jêderên din de hatiye jî, ku ew navekî Siryanî – Yûnanî ye, bi wateya "mala Rahib" tê. Gund li ser girikekî şûnewarî û biçûk hatiye avakirin.

- Gundekî biçûk e, Ge.Xalta di Rojhilata wî re dere. Piştî cêbecêkirina zagona durustkirina çandiniyê, ew gund bêtir şên bûye.

34. **Qurbê** (288k, 5km, 305m):

- “Qurbe”, bejeyeke Kurmancî ye, bi wateya “çiv, firkên” di rêk û geliyan de tê. Gundê Qurbê jî li cihekî ye, ku geliyê Gu.Qujûma û rêka di ber re dere, ducarkî çiv û firkan didin xwe. Em bawer dikin, ku gund navê xwe ji salixa Xaknîgarî ya cihê xwe biriye.

- Gundekî biçûk e, berê ji arzûyên mala Seydê Mîmê bû. Ew li aliyê Ge:Qujûma yê Rojava li ser sirteke biçûk e, ji xaka sirtê guman dibe, ku ew girekî şûnewarî ye. Zeviyên darên zêtûnan derdora gund pêçane. Girekî şûnewarî yî biçûk jî li Rojavaya gund e.

35. **Gewrika** . ***Gewrikan*** . *El-Fesĥa* (2325k, 700h, 15km, 470m):

- Gewrik, biçûkirina bêjeya “gewr ango sipî” ye. Gewrik navê hozeke Kurdî ye jî, li derdora bajarê Mihabadê li Rojhilata Kurdistanê heye(1). Lê ya rast, navê gund ji salixa Xaknîgarî ya wî cihî hatiye. Wateya navê gund di Kurmanciya navçê de wiha ye: “Cihê dûz, bê dar û di nav cihekî daristanî de”. Mîna şêniyê gund dibêje, berê cihê gund bê dar û rût bû. Navê Erebkirî jî wergerandineke durust e ji navê Kurdî.

- Gundekî mezin e. Geliyê gund di nav re diçe û wî dike du perçe: Rojhiltî û Rojavayî. Kaniya gund jî li Bakurê gund e, berê ava wê pir bû û li piraniya malên gund digerî. Cihê gund şûnewarî ye, û gelek şikeft û zêrzemîn di nav de hene. Ew ji gundên gulvedayî ye li De.Cindirêsê, û şaredarî jî tê de heye.

36. **Kefersefrê** (4121k, 1320h, 5km, 400m):

- Baba Şelĥet dibêje, ew ji bêjeya “sefra” ya Aramî hatiye, û wateya wê “ sibeh, çûk” yan “gundê çûkê, gundê sibehê” ye /El-Esedî, perçe 6, rûp 377/ ?.

- Gund li ser pesarê Başûr yê Çi.Qaziqlî ye. Geliyê gund wî dike du beş. Malbateke Aĝan a mezin lê heye. Ew gundekî şên, mezin û xweşik e, gelek malên ciwan lê hatine avakirin. Perlemnter û Be'siyê navdar Mihemedê Mûrêd jê ye û lê rûdine.

37. **Tetera** . ***Teteranlî*** . *Teter* (8km, 640m):

- Teter, navê rûniştvanê wê yê destpêkê bû.

1 - Dr.Konter Dêşner: Pirtûka “Torinên Selaĥidîn”, rûpel 189 û 213.

- Gundekî biçûk e, li ser sirtekê ye ji Çi.Qaziqlî. Hawîrdora wî bi ĥêrên darên zêtûnê û bi daristana xwazayî ya Merxê pêçandî ye. Cihê wî havîngeheke zor xweş e. Li salên bîstan ji sedsala bîstan, ew baregeha micahidê navdar Miĥê Îbşaşê bû, û lê hat kuştin jî.

38. **Bircikê** . ***Kemûş Birc*** . *Birc Kemûş* (637k, 492h, 6km, 310m):

- Birceke şûnewarî ku li nava gund hebû, ew li ser navê wê hatiye binavkirin, xelkê ji wê bircê re digot “Birca Zîvî”, Osmaniyan jî jê re digotin “Gumuş Birc”. Bi demê re bêjeya “Zîv” ji navê wê ket, û tenê bêjeya “Birc, Bircikê” ma.

- Gundekî biçûk e, di nav ĥêrên darên zêtûnê de ye. Ew ji gundên mala Seydê Mîmê bû, lê li salên şêstî ji sedsala bîstan piraniya zeviyên wan li cotkaran hat belavkirin. Ji bilî wê Bircê, tiştine şûnewarî yên din jî li nava gund dihatin dîtin.

39. **Kora** . ***Koran*** (1861k, 315h, 6km, 410m):

- Navê gund ji salixa cihê wî yê Xaknîgarî yê “kor, kort” hatiye. Kora, navê hozeke Kurdî ye jî li Kermenşa li Rojhilata Kurdistanê /M.Zekî, perçe 1, rûp 430/, û li Amedê jî hene, /Barbro Karaboda/. Hozeke bi wî navî li derdora Qersê li Bakurê Kurdistanê jî heye, /Lêrx, rûp 61/.

- Gundekî mezin e, li ser pesarê Başûr yê Çi.Qaziqlî ye. Gelek bermahiyên şûnewarî li nav û li derdora gund tên dîtin. Bi kolan ji avakirinê re, qerqodeyên bi zincîrê zendîkirî hatin der, ew jî distnîşana bûyerên giring û kevin ku li cihê gund bûne dike.

40. **Gorda** . ***Gordan*** (1350k, 380h, 15k, 550m):

- Mîna di Ferhenga Goranî de hatiye, “Gord” bi wateya “şûrê ko û nabire” dide. Ferhenga Kurdistan jî dibêje, ew bi wateya “hêz û wêrekiyê ye, û nîşaneke ji nîşanên hin cureyên bizinan e jî ”.

Lê belê ya rast, ew nav wekî ku hatiye, navê jinekê ye ji Gu.Sêwiya ji De.Reco. Gurd ji gundê xwe hilbû, hat li wî cihî war girt û gund pê hat binavkirin. Hîn jî bermahiyên xirabeya mala wê li Başûrê Gu.Sêwiya hene, û jê re “Xirabê Gordê” tê gotin.

- Sirtên çiyayî ji aliyên Bakur, Rojava û Rojhilat de gund vedişêrin. Gelek şikeft, zêrzemîn, bîreke avê û bermahiyên şûnewarî yên têvel di bin zemîna wan sirtan de hene, navên wan cih û sirtan wiha ne: Bena dirêj, Pozê Kol, Xirabî Kortliq… Gordaya niha gundekî biçûk e, li ser milê Rojava yê geliyê Ole Ce'nim e, ew

geliyekî bi darûber, kûr û pir dîke ye, û gelek caran meĥkûm xwe tê de vedişêrin.

41. **Çobana** . ***Çobanlî*** . *Coban* (12km, 464 k, 464m):

- Çoban, di zimanê Tirkî de bi wateya "Şivan" tê.
- Gundekî biçûk e ji gundên De. Ĥeştiya.

### **Merwanê** :

- Gund li ser navê rûniştvanê wê yê destpêkê yehatiye binavkirin. Merwanî navê hozeke Kurdî ye jî, jê li Amedê hene, (Barbro Karaboda). Merwanê du gund in, **Jorîn** û **Jêrîn**, Ge.Circim her du gundan ji hev dike:

42. **Merwanê Jêrin - *Merwanê Teĥtanî*** (740k, 13km,210m):

- Gundekî biçûk e li ser pesarê Başûr yê Çi.Anqelê ye. Ew li ser cihekî şûnewarî hatiye avakirin. Deşta Ĥemqê li Rojavaya wê ye.

43. **Merwanê Jorin** . ***Merwanê Foqanî*** (584k, 1970h, 250m):

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojava yê Çi.Merwanê ye.

44. **Hêkiçê** . *Bedir* (1090k, 14km, 320m):

- Hêkiç, bêjeya Hêgiç di Kurdî de bi wateya "mirovê wêrek û bi qîret" tê. Lê ya rastir ew e, ku Kurd ji berxê ku di temenê du saliyê de dibêjin: Hêkiç. Pêwendiya navê "El-Bedir" yê Erebkirî hîç bi salixên gund û cihê wî re nîne.
- Gundekî biçûk e, li ser sirtekê ye ji sirtên herî Başûr ji Çi.Kurmênc. Cihê gund şûnewarî û kevin e.

### **Miskê :**

Miskê, navê cihê ku gund li ser hatiye avakirin e. Lê şêniyê gund wateya navê gundê xwe nizanîn. Miskê du gund in, **Jorin** û **Jêrin:**

45. **Miska Jorin** . ***Miskê Foqanî*** (540k, 544h, 8km, 470m):

Ev Gundê Miskê yê kevin û desptêkî ye. Cihê wî Sirteke çiyayî ye. Geliyê Xalta di Rojhilata gund re dere.

46. **Miska Jêrin** . ***Miskê Teĥtanî*** (860k, 9km, 390m):

Gundekî biçûk e, li aliyê Ge.Xalta yê rastê li ser sirteke nizm e, dora 1/km li Başûrê Miska Jorîn e. Qonaqa Xelîl Aĝayê Seydê Mîmê ku berê Aĝakî navdar bû, li nava gund e.

47. **Mile Xelîla** . ***Minle Xelîl*** . *Şêx Xelîl* (561k, 920h, 14km, 125m):

- Navê gund ji navê rûniştvanê gund ê destpêkê "Xelîl" û ji navnîşana wî ya olî "Mile" hatiye.

- Gundekî biçûk e, li ser kenarê Başûr yê çemê Erfînê ye, ew çend sed mitran ji sînorê Tirkiyê dûr e. Gund yê mala Gênc bû, hîn jî qonaqeke wan lê heye.

48. **Dêrbelûtê** (756k, 12km, 160m):

- Navê gund hevdudanî ye, ji “dêr”: Mala Rahiban, û “Palût” ku binavkirineke Kurdî ye ji dara Sindîganê re, pêk hatiye. Lê belê Xûrî Bersûm dibêje, navê gund Aramî ye, û bi wateya “rizgarkirin, xelaskirinê” tê, ango navê gund ê tûm dibe “Dêra Rizgarkirinê” /rûp 187/, lê em bawer dikin, ku ev nêrîn tenê encamgirtineke bilêvkirinî ye ji hin bêjeyên Aramî, û rastiyê xuya nake.

- Gundekî orte ye, sînorê Tirkiyê dora 1/km li Rojavaya wî ye. Ew gundê herî Başûr Rojava ye di çarçewa sînorê kargêrî yê navça Efrînê de. Pîrozgeha “Şêx Rikab” a naskirî li kêleka gund e. Rêka ku derbas navça Hêrimê jî dibe, tê re derbas dibe.

49. **Nisriyê** (1004k, 7km, 140m):

- Belkî ji navê balinde “Qertel” ku bi Erebî “Nisir” e, hati be.

- Gundekî biçûk e li ber çemê Efrînê.

50. **Midaya** (38k, 150m):

- Ev nav nêzîk bilêvkirina bêjeyên Erebî ye.

- Ew xirabek e, li ser kenarê çemê Efrînê yê rastê li hember Gu.Tilsilorê ye. Ew li destpêka sedsala bîstan şên bû, û Ĥemîd Aĝayê Fîlik lê rûdininşt.

51. **Çamli Bêl:**

- “Çam”, bi Tirkî navê dara Merxê ye, “Bêl” jî bi Kurdî û bi Tirkî wateya “sirt, bilindahî, cihê bilind” dide.

- Ev nav di parkirinên kargêrî yên De.Cindirêsê de hatiye. Ew li Rojavaya Cindirêsê li kêleka Gu.Ĥemamê ye, û niha cihekî ne şên e.

52. **Sifriyê** . ***Sifleriyê*** (319k, 160m):

- Bawer dibe ku ew navekî mêza ye, û ji navê “Safîre” hatiye, ew nav jî li nav Kurd û Erebên deverê bikar tê.

- Gund li Başûr Rojavaya Cindirêsê ye, û niha tu kes lê rûnane.

53. **Zelaqê:**

- Hinek dibêjin, belkî ew nav ji "zelqa mirîşkan" hati be, ew jî dûrî rastiyê ye. Ya rast, ew navê geyakê ye, bi kincan û bi hiriya pêz ve dizeliqe, û jê re "lezaq yan zelaq" tê gotin. Ew geya li deverên derdora gund pir şîn dibe.
- Gund li Rojhilata Cindirêsê li ser kenarê çemê Efrînê yê Bakur e. Ew ji salên heftê ji sedsala bîstan de vala bûye, û tu kes lê rûnane.

54. **Gundê Fîlik** (7km, 160m):


- Mirovê bi navê "Fîlik" ji gundê Birîmce ku şaneyê Aĝan bû, gund di nav arzûyên aĝan de ava kir, û bi wî hat binavkirin.
- Gund li Başûr Rojavaya bajarokê Cindirêsê bi nêzîk 7/km, li ber kenarê çemê Efrînê yê rastê ye. Piştî pêkanîna zagona durustkirina çandiniyê, û gava ku dewletê destê xwe danî ser arzûyên hin aĝan, ew gund vala bû û tukes tê de nema.

55. **Ziving** (350m):

- Ziving, bi Kurdî bi weteya "şikeft" tê.
- Ew war li ser pesarê Rojava yê Çi.Qaziqli ye, tenê li dema berefkirina zêtûnan şên dibe.

56. **Qulkê** . **Gundê 'Elûş** (7km, 230m):

- " 'Elûş " navê kesê yekê ye ku li cihê gund rûnişt. Qulkê yan Qulikê, bêjeyeke Kurmancî ye watenas e.
- Gundekî biçûk e, li Başûrê Gu.Tilsilorê li ser rûyê Çi.Lêlûn e.




Nexşe -22- De.Cindirêsê. Pîvan: 1/150000. Sînorên dewletê ++++. Sînorên navçê + - + - +. Sînorên deveran - - - - . Sînorên gundan -.-.-.-. Rêkên ziftkirî ====. Çem ⁓.

# Lêkolîna Pêncem

## Nav li devera Şiyê

Devera Şiyê li aliyê Rojava ye ji nexşeya kargêrî ya Na.Efrînê. Navenda wê bajarokê Şiyê ye. Hejdeh gund di çarçewa deverê de hene, didu jê vala bûne. Sînorên deverê wiha ne: Li Rojava Tirkiyê, li Rojhilat De.Mabeta, li Bakur De.Reco û li Başûr jî De.Cindirêsê.

1. **Şiyê** . ***Şêx El-Ĥedîd*** (9828k, 50km, 324m):

- Gumana mezin ew e, ku navê Şiyê ji bêjeya "Şûyê" hati be, ew bêje jî ji " kel û şûyan" hatiye, li demên berê "kelşû" ango "şuştina kincan û seriyan" li ber ava Ge.Şiyê dihat kirin, navê gelî bi xwe jî ji "kelşûyê" hatiye birin.

Lê belê navê Şiyê di hin jêderên nivîskî yên serdemên Îslamî de, bi şêweya "Şîĥ El-Ĥedîd" hatiye. Ew nav li dema me jî, di belgeyên fermî yên dewletê de bi kar tê. Lê navê gelêrî û nasraw "Şiyê" ye.

- Şiyê bajarokekî gulvedayî ye. Xaniyên wî li ser rûyê Rojava yê Çi.Ĥesê Xidir belav dibin. Bajarokê Şiyê ji çend şênewaran pêk hatiye: Şikaka li Başûr, Hacê (Hacikan navê hozeke Kurdî ye) li Bakur û gundên ji Jor û Jêr, gundekî din î biçûk jî bi navê Gu.Çema li aliyê Şiyê yê Bakur hebû.

Kaniya Şiyê ya mezin li binê gund e, lê ew niha di nav malan de maye. Gelek şûnewarên kevin û giring ji serdemên berî Îslamî de li derdora kaniyê hebûn, lê mixabin ew hemî hatin kavilkirin, gelek jî di binê avahiyên malan de mane.

Çandiniya Şiyê ya sereke zêtûn e, lê belê gelek cureyên din jî tên çandin. Çend guvaşxaneyên zêtê, pîşeyên durustkirina alavên çandiniyê û makînan lê hene. Gelek cihên kirînfirotanê yên baş jî lê

vebûne. Bazara Şiyê ya hefteyî li roja înê li dar dikeve. Şiyê warê helbestvanê navdar Ĥamêd Bedirxan e û lê hatiye veşartin.

Ev gund û şênewar bi ser De.Şiyê ve ne, **[Nexşe 23]**:

2. **Erendê** . *El-Muzeyenê* (2483k, 505h, 6km, 500m):

- Erendê, me wateya navê gund bi şêweyekî zelal nas ne kir. Lê eger em wî wiha bilêv bikin: “A + rind = Arind”, ew dibe navekî Kurdî û wateya rindbûnê dide. Ewên ku nav wergerandine Erebî jî wilo hizir kirine, û navê Erendê kirine “El-Mizeynê” ango “a fodil, a rind..”.
- Gundekî orte ye, li ser pesarê Rojava yê sirta Sifrî Dede li ser milê Ge.Şiyê yê Başûr e.

3. **Baziya** . ***Baziyanlî*** . *El-Baziyê* (167k, 6km, 460m):

- Baziya, navê navçekê û hozeke Kurdî ye li Başûrê Kurdistanê. Baz jî, navê balindeke goştxwar e.
- Gundekî biçûk e li ser pesarê Bakur ê Çi.Qaziqlî ye. Gelek kevirên avahiyên şûnewarî lê hene, xelkê hinek jê di avakirina xaniyên xwe de bikar anîne. Û ji ber ku cihê gund çiyayî û dijwar e, û karên xizmetgûzariyê lê peyda nabin, rûniştvanên wê ew berdaye û vala hêştine.

Li kêleka Gu.Baziya, cihekî bi navê “**Xirabî Baziya**” heye, ew cih jî ji zûde vala bûye û kes lê nemaye. Ew jî cihekî şûnewarî ye û hewcwdarê vekolînê ye.

## Çeqela:

- Li ser navê Çeqela, şêniyê gund dibêje, berê kevirekî “koncli”/Baziltî/reş û qulqulî bi reng û şêweyê Çeqelan li cihê gundê Ortê hebû, û navê gund “çeqel” ji salixên wî kevirî hatiye birin. Hozeke Kurdî ya mezin jî bi navê “Çeqelî” li navçê heye. Sê gund bi navê Çeqela li devera Şiyê hene, **Jêr**, **Ortê** û **Jor**:

4. **Çeqelê Ĥusik**, **Çeqelê Jêrîn** . ***Çeqelî Teĥtanî*** . *Wadî El-S'alêb* (676k, 25h, 10k, 420m):

- Gundê Jêrin e. Ew bi navê rûniştvanekî xwe "Ĥsik" bi nav bûye.
- Ew li ser sirtekê ye û deşta Ĥemqê li Rojavaya wî ye. Gund derdora 1.5/km ji sînorê Tirkiyê dûr e.

5. **Çeqelê Me'mikê**, **Gundî Xelê**, **Çeqelê Ortê**. ***Çeqelî Foqanî***, ***Si'ûlcik*** , *El-Si'ûl* (1039k, 310h, 9km, 540m):

- Me'mik û Xelo: Navên du kesan e li gund rûnişti bûn. Koka şêniyê gundên Çeqelê Jêrin û Jorin ji vî gundî ye.

- Gundekî orte ye, cihê wê pesarî ye. Kevirên avahiyên şûnewarî ji serdemê Alefiringî de, û bîreke avê ye kevin lê hene.

6.**Çeqelê Mamedê**,**Çeqelê Jorîn**. ***Çeqelî Foqanî***(1545k, 10km, 470m):

- Mamed(Mihemede): Navê rûniştvanê gund yê destpêkê ye.

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Rojava yê pesarekî çiyayî û dîke ye. Geliyekî dîke û kûr di nava gund re bi Rojava de dadikeve û gund dike du beş, loma jî ew gelek caran toşî lehiyên giran bûye. Arzûyên gund ji aliyê Rojava de digihên sînorê Tirkiyê.

7. **Qermîtliq** . *El-Xezefiyê* (2718k, 3km, 230m):

- Qermît, navekî Kurdî ye ji "Qermît" hatiye. Navê Erebkirî jî wergerandina navê Kurdî ye.

- Gundekî mezin e, li ber sînorê Tirkiyê ye. Koma Efrînê ya hunerî ya Kurdî ya destpêkê li salên şêstî ji sedsala bîstan li vî gundî hat damezrandin. Li çaryeka diduyan ji sedsala nozdehan, baregeheke artêşa Îbrahîm Paşayê Misrî li derdora gund hebû.

8. **Gundê Xelîl** . ***Xelîl Gulko*** . *El-Werdiyê* (1455k, 407h, 15km, 831m):

- Xelîl: Navê rûniştvanekî gund bû, "gulik" jî biçûkirina "gul - çîçek" e, belkî ew navê diya Xelîl bû. Têkliya navê "El-Werdiyê" yê Erebkirî bi navê resen re tineye.

- Gundekî mezin e, li ser serteke çiyayî û bilind e.

9. **Tirmûşa** . ***Dirmişkanlî*** . *Dirmiş* (2106k, 700m):

- Tirmûş, navê cureke dara Merxê ye, ku li derdora gund heye. Hin jî dibêjin ew nav ji "Tirî û mûj" hatiye, ji ber ku gund ji berê de bi wan navdar bû. Navê Erebkirî "Dirmiş" jî hîç bê wate ye.

- Gundekî biçûk e ji gundên beşê Rojava ji Çi.Xastiya. Ew bi darên Gûz, Rez û Be'îvan navadar e.

10. **Senarê** (2703k, 1290h, 5km, 380m):

- Senar, bi zimanê Latînî bi wateya "cihê çareserkirina nexwaşan" tê. Lê belê mala "Dêrşoyê Kamê" ku ji rûniştvanên gund

ên destpêkê ne, dibêjin, "Senar" navê gundê wan ê li derdora Mêrdînê li Bakurê Kurdistanê ye, ew li vir bicih bûn û navê gundê xwe jî li yê nû kirin.

- Gundekî mezin e, li ser sirtekeke fere ye. Deşta Ĥemqê li Rojavaya wî ye. Li Rojavaya gund, girekî volkanî heye, li ser aliyê wî girî yê Rojava, gor û gelek wêneyên şêwekarî di zinaran de hatine nîkirandin.

11. **Anqelê** (2037k, 6km, 360m):

- Belkî çêroka binavkirina Gu.Anqelê mîna ya “Senarê” be. Lê gotinek heye dibêje, ew nav ji van bêjeyan pêk hatiye: An + Kela, ango “kelaya mak, dayîk”, bi rastî jî cihên şûnewarî yên giring li derdora gund hene.

- Gundekî mezin e, li kêleke Gu.Senarê li aliyê Başûr e. Şaredarî jî lê heye. Li aliyê wê yê Rojhilat cîgehê “**Xirabê Anqelê**” heye, ew jî warekî şên bû, lê ji destpêka sedsala bîstan de vala bûye.

12. **Alkana** . ***Satî Ûşaĝî*** . *El-Satî* (1357k, 740m):

- Alkana, navê hozeke Kurdî ye, jê li Na.Hekarî li Bakurê Kurdistanê hene, /B.Lêrx, rûp 46/. Navê "Satî" yê Erebkirî jî hîç bê wate ye.

- Gundekî biçûk e, li ser sirteke çiyayî ye, pesarên wan sirtan bi şêweyekî pir dîke bi ser Ge.Alkana de dadikevin.

13. **Ĥec Bilêl** . ***Ĥec Bîlal*** (556k, 720m):

- Ji navê “Bîlal” hatiye, ew nav jî li seranserî navçê bikar tê.

- Gundekî biçûk e, li ser sirteke kilisî ye, çend newalên biçûk ji derdorên wê dadikevin.

14. **Mistika** . ***Mistikanlî*** (573k, 118h, 5km, 500m):

- Navê gund ji navê Mistefa hatiye. Hîn jî malbata “Mistkêlê” ya kevin li gund heye. Munzêr Mûsillî jî di /rûpela 455an/ de bibîr tîne, û dibêje ku hozeke Kurdî bi navê “Mistikan” li nêzîk bajarê “Reqayê”, li Bakurê Sûryê hebû.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê sirtekê ye, ew sirt jî bi şêweyekî pir dîke bi ser geliyê Şiyê de dadikeve.

15. **Şiketka** . ***Miĝarciq*** (879k, 720m):

- Navê gund ji “şikeftan” hatiye, ji ber ku gelek şikeft li derdora gund hene, berê şêniyê gund tê de rûdinişt û bi kar tanîn. Loma jî Osmaniyan ew bi “Miĝarciq- cihê miĝaran-şikeftan” bi nav kiriye.

- Gundekî Xastiya yî biçûk e, li ser sirteke bilind e, bi darûberên Ĥejîr, rez û simaqê navdar e.

16. **Kela** . ***Kelanlî*** . *El-Melsai* (228k, 560m):

- Kela, navê hozeke Kurdî ye.


- Gundekî biçûk e, li ser milê Başûr ê Ge.Kela ye. Cihê gund daristanî û dijwar e. Kaniya Kela ya navdar li kêleka wî ye. Cihê gund havîngeheke zor ciwan e.

17. **Xirabî 'Elî Zênê** (375m):

Ev war li kêleka Şiyê ye. Ew li ser navê rûniştvanê wê yê destpêkê “'Eliyê Zênê” hatiye binavkirin. Lê ew ji destpêka sedsala bîstan de vala bûye.

18. **Çema:**

Cihê vî gundî li aliyê Şiyê yê Bakur Rojhilat e. Şêniyê wê ji destpêka sedsala bîstan de gund berdane û hatine li Şiyê bicih bûne.




**Nexşe -23- Devera Şiyê.**
**Pîvan 1/150000.**
**Sînorên dewletê ++++.**
**Sînorên navçê + - + - +.**
**Sînorên deveran - - - - .**
**Sînorên gundan -.-.-.-.**
**Rêkên ziftkirî ====.**

# Lêkolîna Şeşem

## Nav li devera Mabeta

Devera Mabeta ji 42 parkirinên kargêrî pêk tê, navenda wan gund û waran bajarokê Mabeta ye. Sînorên deverê wiha ne: Ji Bakur de De.Reco, ji Rojava de De.Şiyê, ji Başûr de De.Cindirêsê û ji rojihilat de jî deverên Şera û Efrîn- Navend.

1. **Mabeta** . ***Me'betlî*** (7663k, 15km, 530m):

- Şêniyê Mabeta dibêje, navê Mabeta ji bêjeya Erebî "miĥbet" ango "hezkirin" hatiye, ji ber ku şêniyê Mabeta pir ji hev hez dikirin, û bi wê salixê dihatin naskirin. Berê tîpa "ĥ" di bilêvkirina Kurdî de bi kar ne dihat, loma jî ew bêje wek "muhbeta-mabeta" hatiye bilêvkirin, û cihê xwe girt.

Lê hin jî dibêjin, navê Mabeta ji bêjeya "malbeta" hatiye, ango ji çar malbatên gund ên sereke, hatiye.

Hêjayî gotinê ye, ku hozeke Kurdî bi navê "Malbat" li ber çiyayê Agirî heye, û li nêzîk Mûşê jî jê hene. Diyar e ku nêzîkbûnek di navbera mabeta û malbata de heye, em guman dikin ku têklî di navera her du navan de dê hebe(1).

- Mabeta li Bakur Rojavaya Efrînê ye. Ew li ser bêleke kilsî ye, her çar aliyên wê geliyên kûr û pesarên dîke ne, ew ji Rojava de digihê gundê Qenterê. Gelek mal û avahiyên xweşik tê de rabûne, û cihê ferebûna wê pir teng bûye.

Gelek xanên kirînfirotanê li bajarokê Mabeta vebûne, kerxaneyên biçûk ji bo durustkirina makînan, alavên çandiniyê,

---

[1] - Hozên Kurdî- Wîliyem Îgilton.

necariyê, hesinkariyê… lê hene. Çend guvaşxaneyên zêtûnan jî li Mabeta hene. Li destpêka hatina Firensiyan li Sûryayê, Mabeta li demeke kin bû navenda kargêrî ya navça Çi.Kurmênc.

Bajarokê Mabeta navenda deverekê ye, û ev gund û şênewar pê ve girêdayî ne, **[Nexşe 24]**:

2. **Qitraniyê** . ***Qitranlî*** . *Qitran* (127k, 502m):

- Ji rengê “Qitranê” yê “Reş” hatiye.
- Ew li Bakurê Mabeta li serê sirtekê ye. Çend malên malbata Şêx Sim'el lê rûdinin.

3. **Avraz** . ***Ebrez*** (815k, 250h, 13km, 530m):

- Avraz, di Kurmancî de, bi wateya “pesar” tê. Ev binavkirin ji salixa cihê gund hatiye birin.
- Gundekî orte ye, li ser pesarê Başûr ê Çi.Hawarê ye.

4. **Xirabê Rûtê** . ***Rûto*** . *El-Mun'ezîle* (15km, 480m):

- Xirabê Rûtê, gund bi navê malbata ‘‘Rûtê’’ hatiye binavkirin. Bêjeya “rût” jî gotineke Kurdî ye bi wateya “bê kinc, bê tişt, cihê bê dar” tê, lê ya bêtir ew ji bo kesan bi kar tê. Navê Erebkirî jî wergera navê Kurmancî ye.
- Li destpêka salên bîstan ji sedsala bîstan, Ehmedê Rûtê li dijî Firensiyan rabû, loma jî Firensiyan ew gund kavil kir, lê ew niha dîsa şên bûye, bûye gundekî biçûk, û ji çend malên ku nû hatine avakirin pêk tê. Rûniştvanên wî yên niha ji gundê Dîkê ne, û birayên hev in, wan zevî li wir kirîne û lê bicih bûne. Gund di koka Çi.Hawarê de ye, û li aliyê wî yê Başûr e.

5. **'Emara** . ***Enbarlî*** . *Enbar* (654k, 340h, 8km, 430m):

- Navê gelêrî bi şêweyê “ 'Emara ” tê bilêvkirin. Osmaniyan jî şêweyê Embarlo-Enbarlo jê re bi kar anîne. Embarlo-Enbarlo hozeke Kurdî ye jî, warên wê li Bakurê Kurdistanê li derdora Bêtlîs, Dêrsim, Mûş û Amedê ne, /B.Lêrx, rûp 49/.
- Gundekî orte ye, li ser pesarê sirtekê ye. Geliyê Ziravkê di Bakur, Rojava û Başûrê zeviyên wê re diherike.

6. **Sêwiya** . ***Oksûzlî*** . *El-Yetîmê* (798k, 390h, 12km, 700m):

- Sêwî, navnîşana kesekî ji wî gundî bû. Çêrokeke wî kesî heye bi mala 'Umîkê ve, ku rûniştvanên gund ên kevin in, girêdayî ye. Navê Erebkirî jî wergera navê Kurdî yê resen e.

- Gundekî biçûk e, li ser sirteke çiyayî û bilind e, cih û sirûşta derdora gund pir şêrîn e. Sê gorên ji dîroka dora 180 salî de li nav mezelê gund hene, pîrozgeha gund jî di nav wî mezelî de ye. Ew gundê mala 'Umê ya kevin e.

7. **Kaxrê** . ***Îkî Axur*** . *Yaxur* (4105k, 600h, 5km, 660m):

- Îkî Axur, Îkî: Bi zimanê Tirkî "didu" ye. Axur: Jî bêjeyeke Kurdî ye, bi wateya "cihê dewêr" tê, û wateya sergihayî dibe "du axur". Bilêvkirina gelêrî "Kaxrê" jî kurtkirina wî navî ye.

LÊ belê bêjeya "Axur" wateyeke din jî dide, ew li serdema Mimalîkan pileyeke serbazî ye giring bû, hilgêrê wê, berpirsyarê Axurê Siltên û hemî hesp û dewarên wî bû, /pirtûka Ibin Aca, rûp 251/.

- Gundekî mezin e, li ser bêleke bilind e, dorçêrma wî kaşî, dîke û daristanî ye. Ew ji gundê kevin e û navdar e li Çi. Kurmênc.

8. **Birîmce** . *Birmaca* (1990k, 940h, 5km, 660m):

- Birîmce, ji navê Îbrahîm Bekir hatiye. Îbram(Birîm) mirovekî xwende bû, li navîna sedsala nozdehan, mala Omer Aĝa ew ji ber xwe ve kiri bûn endamê şaredariya Kilisê, gund bi navê wî hatiye nasîn. Lê Xûrî Bersûm dibêje, ew navekî Siryanî ye, ji "ĥeb El-Maş" hatiye, /rûpel 69/, jixwe ev nêrîna dûrî rastiyê ye.

- Gundekî mezin e, li ser sirtekê ye, sirûşta cihê wî pir ciwan e.

9. **Gu.Selo** . ***Mezre'it Silo*** . *Mezre'it El-Silêmaniyê* (490k, 4km,560m):

- Bi navê rûniştvanê wê yê destpêkê "Silêman" hatiye binavkirin. Mîna ku em dizanin, Kurd navan kurt dikin û li bilêvkirina xwe tînin.

- Gundekî biçûk e, derdora wî sirt û newal in, wê di paş xwe de vedişêrin.

10. **Ĥec Qasma** . ***Ĥec Qasimlî*** . *Ĥec Qasim* (745k, 277h, 15km, 600m):

- Qasim, navê rûniştvanê wê yê destpêkê ye, Ĥec jî navnîşana wî ya olî ye.

- Gund li ser sirteke çiyayî ji Çi.Xastiya ye. Gelek daristanên Merxê û newalên kûr li derdora wî hene.

11. **Ĥemlorik**, **Gundî Ĥebo** . *El-Diflê* (813k, 700m):

- Navê "Ĥebo" ji biçûkirin û şêrînkirina navê (Mihemed) Hebeş e. "Ĥem" jî kurtkirineke ji navê Mihemed re. Ĥem mirovê destpêkê bû ku li cihê gund rûnişti bû û jê re "Ĥemê Zer" digotin, ew mirovekî çîl û "sor" bû, û gund bi salixa benzê wî ''lorên sor'' ku li ser rûyê wî bûn hatiye binavkirin.

**Ĥebo** jî, navekî nûtir e, ew navê "Ĥeboyê Qeferê" ye, ku ji gundê Me'mila bû. Piştî ku gund vala bû, li navîna sedsala nozdehan, Ĥebû hat dîsa gund şên kir, û vê carê gund bi wî hat nasîn. Tu têkliyên navê Erebkirî "El-Difle" ango dara "Lûlê , Rûlê" bi navên gund yê resen re tuneye.

- Gundekî biçûk e, li ser sirteke çiyayî ye, her çar aliyan wî kaşên dîke ne. Piraniya şêniyê gund jê derketine û li bajarên Efrînê û Helebê bicih bûne.

## Xaziyanê:

- Navê binehozekê ye ji hoza Mizûrî ya Kurd. Du gundên serbixwe bi wî navî hene, **Jêrin** û **Jorin**:

12. **Xaziyana Jêrîn** . ***Xazyana Teĥtanî*** (860k, 345h, 6km, 660m):

- Gundekî biçûk e, cihê wê çiyayî û daristanî ye.

13. **Xaziyana Jorîn** . ***Xazyana Foqanî*** (586k, 300h, 680m):

- Gundekî biçûk di ser Xaziyana Jêrin re ye.

14. **Dargirê** . *Dar Kibîr* (3130k, 595h, 4km, 570m):

- Dargir, ango "Dara Mezin". Navê Erebkirî jî wergerandineke şaş e ji navê gund ê resen re.
- Gundekî orte ye, cihê xwe li ser pesarên devgeliyekî ye. Gelek şikeft, zêrzemîn, bîrên kevin ku bi destan kolandî û kevirên avahiyên şûnewarî lê hene.

15. **Şêtana -** *Reĥmaniyê* (1012k, 116h, 13km, 650m):

- Navê xwe yê kevin “Şîtana” ye. Hin gundiyên wê yên berê bi salixên “Şêtaniyê” dihatin naskirin, û gund jî pê hatiye binavkirin. Pişt re, xelkê ew nav baş ne dît, û guhertin kirin “Reĥmaniyê”.

- Gundekî biçûk e, li ser serteke çiyayî ye. Piraniya gundiyan ji gund derketine û li bajaran bicih bûne.

16. **Sariya** . ***Sarî Ûşaĝî*** . *El-Sefra* (1166k, 500h, 13km, 700):

- Sari, bêjeyeke Tirkî ye bi wateya “Çîl, zer, dêm sipê û por zer” tê. Ew nav salixa mirovekî ji rûniştvanên gund ên destpêkê bû. Navê Erebkirî jî wergera navê resen e.

- Gundekî biçûk e li ser sirta “Çi.Ĥemo” dikeve.

17. **Rûta** . ***Rotanlî*** . *El-Me'zûle* (755k, 290h, 15km, 580m):

Ji bêjeya “Rût” hatiye. Ew navê hozeke Kurdî ye jî, jê li Bakurê Kurdistanê li navça Meletiyê hene. Navê Erebkirî wergera yê Kurdî ye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur Rojava yê sirteke çiyayî ye. Zeviyên zêtûnan, daristanên Merxê derdorên gund digrin.

18. **Dela** . ***Delanlî*** . *El-Daliyê* (431k, 535m):

- Delî, binehozek e ji hoza Reşwan a Kurd. Jê li derdora Wanê jî heye, (Barbro Karaboda).

- Gundekî biçûk e, li ser pesarekî ji çiyayê Xastiya ye. Gelek şikeft li nav û li derdora gund hene, gelek geliyên biçûk jî ji dorhêla wî de dest pê dibin û bi Başûr de bi ser Ge.Xastiya de serberjêr dibin. Gelek kevirên avahiyan ên mezin û şekirî li nav û li derdora gund hene, ew jî destnîşan dikin, ku cihê gund şûnewarî û kevin e.

19. **Sêmalka** . ***Semalik*** . *El-Seĥal* (949k, 550h, 11km, 520m):

- Nav ji “sê malan” hatiye. Ew gund li destpêkê sê mal bûn. Navê Erebkirî "Semalik- El Seĥal" jî binavkirineke bê wate ye.

- Gundekî orte ye. Li ser pesarê Çi.Hawarê yê Başûr e.

20. **Gundî Şorbe** . ***Şorbe Oĝlu*** . *El-Şorbe* (1151k, 300h, 17km, 520m):

- Navê gund ji xwarina “Şorbê” hatiye. Tê gotin, ku berî dora du sed sal, birçîbûnek li navçê peyda bibû. Aĝeyên gund xwarina Şorbê çê dikirin, û li şêniyê gund û li rêwiyên ku di wir re derbas dibûn bilav dikirin. Tê gotin jî, ku navê gund yê kevin “Mirêşa” bû, lê me wateya wî navî nas ne kir, tevî guman heye ku ew navê jinekê ye.

- Ew gundekî biçûk e, li ser sirteke bilind e. Ew ji gundên kevin û navdar e li Na.Efrînê. Eslan Aĝa, wekî ku rêberekî berxwedana li dijî Firensiyan bû, jê wî gundî ye.

21. **Şêxkêlê** . ***Şêx Kêlo*** . *El-Şêx El-Eqre'* (739k, 480m):

- “Şêxê Kêl”, ev nav li ser nav û salixa kesekî ji gund bû. Navê Erebkirî jî wergerandina navê Kurdî ye.

- Gundekî biçûk e, di nav zeviyên darên zêtûnê de maye.

22. **Kêl Îbo** . *El-Eqre'* (338k, 1145h, 11km, 520m):

- Ji navê Îbo, Îboyê Kêl hatiye. Ew rûniştvanekî gund yî kevin bû. Îbo, di dema xwe de, tembûrvanekî navdar bû.

- Gundekî biçûk e li ser pesarê Çi.Hawawrê yê Başûr Rojava ye.

23. **Şêxûtka** . ***Şêx Hitko*** . *El-Şêxanî* (922k, 290h, 12, 440m):

- Gund li ser navê mirovekî ye, ew ji rûniştvanên gund ên destpêkê bû.

- Gundekî orte ye, li ser bêleke Kilsî ji dawîneyên Başûr Rojhilata ên Çi.Hawarê ye.

24. **Satiya** . ***Satyanlî*** . *El-'Etiyê, Satî* (981k, 15km, 580m):

- Satiya, navê hozeke Kurdî ye, jê li Bakurê Kurdistanê li Na.Hekarî heye, /B.Lêrx, rûp 46. Hin jî dibêjin, koka vî navî Tirkî ye, ji “sat” ango ji “firotinê” hatiye, dibêjin jî cihê gund li serdemên Alefiringan şên bû, û bazareke mezin lê hebû?.

- Gundekî biçûk e, xaniyên wê li ser pesarên Başûr ên sirta Şiwîte dikevin. Cihê wî qeracî ye. Gelek derandeyên şûnewarî ji nav axa gund û ji derdora wî dertên. Cihekî şûnewarî yî giring û mezelekî kevin li Başûrê gund bi nêzîka 2/km heye. Ew hemî tişt dest nîşan dikin, ku ew dever li serdemên kevin pir şên bû.

25. **Şîtka** . ***Şîrkanlî*** . *Şîrkan* (1378k, 314h, 7km, 640m):

- Şîtka, wek ferhenga Goranî dibêje, bi wateya “jîr, zana, çalak…” tê. Li devera Şêrewa hîn ew bêje bi wê wateyê bikar tê.

- Gundekî orte ye ji gundên Xastiya, ew li ser mitekî bilind hatiye avakirin.

26. **'Ereb Şêxo** . *Şêx El-'Ereb* (387k, 340m):

- Şêxo, navê mirovekî Ereb ji hoza 'Umêrat e, ew ji ber nakokiyeke civakî ji Na.Ezazê hat, li cihê gund rûnişt û şên kir.

- Gundekî biçûk e, li Başûr Rojavaya Gemrûkê bi 1/km ye. Ew çend mal in, û hemî bira û pismanên hev in.

27. **'Ereba**, **'Erebê Ĥemşelek** .***'Ereb Ûşaĝî*** . *Ewlad El-'Ereb* (3331k, 410h, 3km, 580m):

- Maline Ereb li ba Mirovekî bi navê Ĥemşelek ku xudanê Gu.Ĥemşelekê bû, kar dikirin, wî mirovî rabû cihê gundê 'Ereba yê niha da wan, da ku konên xwe lê dînin, û şikeftên ku li wir jî hebûn bikar wînin. Pişt re, hinekan ji wan xanî li wir ava kirin û lê bicih bûn, paşê gund mezin bû û bi navê “Erebên Ĥemşelekê” hat nasîn.

- Gundekî mezin e, li ser bêleke çiyayî ye. Deşta Kitxê li Bakurê wê bêlê ye.

**Kokanê** . *El-Cezrûniyê* (2082 k):

- Navê gund ji bêjeya “kok, koka daran…” hatiye. Navê Erebkirî jî, wergerandineke ne durust e ji navê gund re. Ew du gund in, **Jorin** û **Jêrin**:

28. **Kokana Jorîn**. ***Kokan Foqanî***. *Cezrûniyê Foqanî* (925h, 8km, 440m):

- Ew gundê Kokanê yê kevin e. Silêmanê Ĥelebî yê ku li sala 1800î Ceneralê Firensî Kilîperê li Misirê kuşti bû û di dîroka nûjen de navdar e, ji wî gundî ye, hîn jî ji malbata wî li gund hene. Kaniya Kokanê jî li Rojavaya gund e.

29. **Kokana Jêrîn**, **Gu.Berkêt**. ***Kokan Teĥtanî*** . *Cezrûniyê Teĥtanî* (380m):

- Gundekî biçûk û nû ye, li Bakurê Kokana Jorin bi dora 1/km ye. Geliyê Zewrê yê fere, ku ji hêla bajarokê Mabeta de tê, di Bakurê wî re dere. Koka şêniyê vî gundî ji Gu.Basilê yê Robarî ye, ew berî dora sed salî ji wir hatin, li cihê bi navê “Xirabî Delê” danîn, xanî ava kirine û gund şên kirin.

**'Ên Ĥecer** (1339k, 430m):

- Sê gund bi navê “ 'Ên Ĥecer ” hene, lê her gundek ji wan bi navekî din jî tê nasîn. Her sê gund li ser rûyê Başûr yê gazeke dirêj in, ew gaz jî ji Rojhilat de berve Rojava berdirêj dibe, û di navbera her gundekî û yê din de dora 1/km heye. Geliyê Ziravkê di aliyê wê gazê yê Bakur re bi Rojhilat de berve çemê Efrînê diçe.

30. **'Ên Ĥecer Şerqî** . *Mezre'it 'Ên Ĥecer Şerqî* (9km):

- Gundekî biçûk e.

31. **Mala Xelî Pîrê** . ***'Ên Ĥecer El-Wista:***

- Gundekî orte ye, navê gund ji kesê bi navê "Xelîlê Pîrê" hatiye.

32. **Gundî Omo**, **Goçera**, **Mala Sîno**. ***'Ên Ĥecer El-Xerbiyê*** (440h , 8km):

- Gundekî biçûk e, bi sê navên herêmkî yên Kurdî tê naskirin (Omo û Simo) navên kesan e. Goçera jî, ji ber şêniyê gund ji hoza "Goçera" ye û gund pê hatiye nasîn.

33. **Qenterê** . ***Qentera*** (2000k, 560 k):

- Navê gund ji şêweyê avahiya "Qentirme" hatiye. Dibêjin avahiyeke şûnewarî bi şêweya qentirme li nava gund hebû, û navê gund jê hatiye. 'Ebdela El-Ĥilû jî li ser koka bêjeya "Qentere" wiha dibêje: Ew ji Aramî û ji Siryanî hatiye Erebkirin, lê belê koka wî yan Yûnanî yan jî Latînî ye, /rûp 53/.

- Gundekî biçûk e, li Rojavaya bajarokê Mabeta ye. Her sê aliyên cihê wî Bakur, Rojava û Başûr kaşên pir dîke ne. Xaniyên gund ji hêla Rojhilat de gihîştine bajarokê Mabeta.

34. **Gemrûk** . *El-Cumrukiyê* (2791k, 640h, 12km, 390m):

- Li demên berê, rêkeke di şûna Gu.Gemrûka niha re diçû, gumrika Osmanî jî li wan deveran rê girêdida, û herwiha gund navê xwe ji cihê qereqola Gumrikê bir. Şêniyê gemrûkê yê kevin, li kêleka çemê Efrînê li cihê "Qûçkê" rûdiniştin, û berî dora 150 salî hilgerîne jor, û li cihê Gu.Gemrûkê yê niha mal ava kirin.

- Gundekî mezin e, li ser bêleke fere ye. Dora 2/km li Rojavaya çemê Efrînê ye. Solava Gemrûkê ya ciwan li nêzîk gund e.

## **Kurka** , ***Kurkan***:

- Kurka, ji "Kur" hatiye. Ew jî bêjeyeke salixdanî ye, ji sirtên biçûk û bê dar re dihat gotin, li wan deman, ew sirt mîna serên kurkirî xuya dibûn. Malên her du gundan li ser wan her du "kurkan" hatine avakirin. Ew du gund in, **Jêrin** û **Jorin**:

35. **Kurkê Jêrîn**. ***Kurkan Teĥtanî***. *El-Zahîra El-Teĥtaniye* (932k, 134h, 14km, 550m): Gundekî biçûk e, li ser sirtekê ye.

36. **Kurkê Jorin** . ***Kurkan Foqanî*** . *El-Zahîra El-'ulya* (1397k, 382h, 13km, 620m):

- Gundekî biçûk e, li Bakur Rojavaya Mabeta li ser pesarekî çiyayî ye. Şêx Ĥusên kurê Elî, Şêxê rêola Neqişbendî jê ye.

37. **Me'serkê**. ***Me'serciq*** . *El-Me'sera* (986k, 1150h, 15km, 710m):

- Ji "Me'sera tirî yan zêtê" hatiye.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur ê Ge.Xastiya ye.

38. **Mist'eşûra** . ***Misto 'Aşûr*** . *'Aşûr* (508k, 14km, 620m):

- Ji navê "Mistefa" û navnîşaneke wî ye. Hîn neviyên wê malbatê li wir dijîn. Wergêrê Erebî, bêjeya " 'Eşûr" bi tenê biriye.
- Gundekî biçûk e ji gundên Xastiya. Gelek govên daristanî yên Merxê û sindîganê li derdora wî hene.

39. **Reca** . *Ĥemo Reco* (660k, 15km, 690m):

- Rec, navê jinekê ye. Mirovekî bi navê "Ĥusênê Recê" li sedsala nozdehan li gund hebû, guman ew e, ku gund navê xwe ji navê diya "Ĥusên", ango ji "Recê" biriye.
- Gundekî biçûk e ji gundên Xastiya, li ser pesarekî ji Çi.Xastiya dikeve.

40. **Çomezna** . ***Comezinlî*** . *El-Belûtiyê* (15km, 670m):

- Çomezna, ango "xudanê çoyên mezin". Ew ji salixên rûniştvanên gund ên destpêkê ên xudî pez bû, û herwiha gund pê hate binavkirin.
- Gundekî biçûk e ji gundên Xastiya, li ser pesarê Başûr yê Ge.Xastiya dikeve.

41. **Birka** . ***Birka***, ***Qişlê*** . *Berekê* (580m):

- Navê hozeke Kurdî ye, jê li Botanê hene, /B.Lêrx, rûpel 48/. Têkliya navê Erebkirî bi navê resen re hîç nîne.
- Gundekî biçûk e ji gundên Devera Xastiya.

42. **'Elcara** . ***'Elî Caro*** . *El-Carûra* (226, 13km, 670m):

- Jê re " 'Elê Jarê " jî tê gotin. Guman ew e, ku "Jar" salixa jinekê ye, çinkî ew mîna navekî mêza hatiye bilêvkirin. Navê Erebkirî jî hîç bê wate ye.

- Gundekî biçûk e ji gundên Xastiya. Gelek newalên biçûk ji sirtên derdora gund de dadikevin.

43. **Mîrka** . ***Mîrkan*** . *El-Eemîriyê* (3085k, 920h, 5km, 630m):

- Ev gund bi sê navan tê nasîn, her sê jî Kurdî ne, Mîrka: Navê hozeke Kurdî ye jê li Şengalê hene, /B.Lêrx, rûp 51/. Gundê Ĥusê: Ji navê Ĥusên hatiye. Ĥem Tato: Miĥemedê Tat, ew Kurdekî mîna çîl û sor bû, gund jî bi salixa wî hat naskirin. Navê Erebkirî jî wergera navê yekê ye.

- Gundekî mezin e, xaniyên xwe li ser pesarê Rojava yê kaşekî dirêj belav dibin. Geliyê Xastiya ji aliyê wê yê Rojava de dest pê dibe. Mizgefta Mîrka li destpêka salên bîstan ji sedsala bîstan hatiye avakirin, û guman heye ku ew a herî kevin e li Na.Efrînê. Û ji ber ku ew gund li ser çateriyeke giring e, hin xanên kirînfirotinê û karên durustkirina alavan û makînan lê vebûne.

44. **Gobek** . *El-Ssura* (1407k, 540m):

Ev gund du beş in, her yek jî bi navekî tê nasîn:

**Gobek**: Beşê Rojhilat e: Ew navê cihê ku gund li ser hatiye avakirin e, wateya wî "navend yan navik" e. Navê Erebkirî jî ji wergerandina navê Kurdî ye.


**Gulîka**: Beşê gund ê Rojava ye, ji "porê cênîkê yê dirêj" re dibêjin''Gulîk'', ew jî ji pergalên kesên ji hoza Goçera bûn, ku rûniştvavên gund ên kevin in.

- Gundekî orte ye, geliyê Gobekê ku ji Çi.Hawarê de dadikeve, di nîvê Gu.Gobekê re bi Başûre de diçe û wî dike du beş. Gelek kesên gund di bazirganiya pêz de dixbitin.

45. **Gundê Ĥeyatê** . *El-Ĥeyat, Ĥeyat* (520k, 8km, 440m):

- Ji navê jinan "Ĥeyat" hatiye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê sirta herî Başûr Rojava ye ji Çi.Hawarê. Ew gundekî nû ye, ji sala 1963an de şên bûye. Rûniştvanên wî ji Gu.Sêwiya daketine û li wir bicih bûne. Hinek ji şêniyê wê daketine ber riya Efrîn-Reco jî, û cihên kirînfirtinê lê ava kirine.




**Nexşe -24- Devera Mabeta. Pîvan 1/150000. Sînorên deverê - - - - .**
**Sînorên gundan -.-.-.-. . Rêkên ziftkirî ==== . Rêka Çiîmanê .‗‗‗‗‗.**

# Lêkolîna Heftem

## Nav li Devera Reco

Devera Reco ji deverên kevin e li navça Efrînê. Navenda wê bajarokê Reco ye. Şêst û pênc gund û war pê ve girêdayî ne, heft jê warine vala ne. Sînorên deverê wiha ne: Li Rojava û Bakur sînorê Tirkiyê, li Başûr Rojhilat De.Mabeta û ji Başûr Rojava de jî De.Şiyê.

1. **Reco** (4110k, 25km, 565m):

- Navê gund yê resen "Reca" ye, ew navekî kesan e.

- Bajarokê Reco li Bakur Rojavaya bajarê Efrînê ye. Ew di nîvê Deşta Baliya de, li ser rûyê Rojava yê sirtekê ye, xaniyên wê bişêweyekî xweşik bi Rojava de dadikevin. Gelek xanên kirînfirotinê û karxaneyên durustkitina alavên biçûk û guvaşxaneyên zêtûnan lê hene. Bazara Reco ya hefteyî li roja Şemiyê ye. Rêka çîmanê di ber re dere û rawestgeheke çîmanê ye mezin ji serdema Osmanî de li ber e. Cihê Reco pir xweşik e, çiyayên bilind û daristanên darên Sindîganê derdora wê dadigrin.

Ev gund û şênewar bi ser devera Reco ve ne, **[Nexşe 25]**:

2. **Hopka**. ***Hopkanlî***. *El-Qadiriye* (677k, 2km, 650m):

- Bêjeya "Hopka" ji hêla rawe û bilêvkirinê de bêjeyeke Kurdî ye, lê em ne gihîştin rastiya wate û bingeha wî navî. Navê "El Qadiriyê" yê Erebkirî jî, paşnava Îbrahîm Qadir e, ew ji wî gundî ye û endamê komîta Erebkirina navên navçê bû, loma jî komîta Erebkirinê, wek spasî, paşnavê wî "Qadir" li gund kir.

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Rojhilat yê çiyakî daristanî ye. Siyasetvanê navdar Reşîd Ĥemo jê ye û lê rûdine.

3. **Berbenê**. ***Berbend*** (1600k, 8km, 500m):

- Wateya navê gund wiha ye: “yê li ber benê”. Xaniyên gund jî li koka Çi.Hawarê li bin beneke zinarî ye gewre ne.
- Gundekî orte ye, li aliyê Başûr ê destpêka geliyê Tîra ye.

4. **Be'dîna**. ***Be'dinlî*** . *Bêt 'Edîn* (5246k, 906h, 10km, 530m):

- Be'dîna, bawereyek heye dibêje, ew ji navê “Behdîna” hatiye, ew jî navê navçeke fere ye li Başûrê Kurdistanê. Eger ew yek rast û ne rast be jî, lê tu pêwendî di navbera navê gund ê resen û yê Erebkirî de hîç tuneye.
- Ji gundên mezin e li Na.Efrînê, şaredarî lê heye. Hinek kargehên xizmetgûzariyê û guvaştina zêtûnan jî lê hene. Xaniyên wê li ser pesarê Başûr ê Çi.Piling hatine avakirin.

5. **Gundê Qêsim**. ***Çetel Quyu***. *El-Bîrên* (1720k, 332h, 8km, 778m):

- Ji navê kesan “Qasim” hatiye. Navê Tirkî “Çetel Quyu” jî, ji salixa “bîra bi du deriyan” ku li Başûrê gund e hatiye birin. Navê Erebkirî jî wergerandina yê Tirkî ye.
- Gundekî orte ye, li ser sirteke qeracî û bilind hatiye avakirin. Ew gundê Seydê Dîkê û mala Dîkê ye ku rêberên hoza Amka ne, û piraniya malên wan lê rûdinin.

6. **Çerxûta - *Çerxitlî* -** *El-Mîseneh* (364k, 62h, 6km, 700m):

- Çerxûte/Çerxote, ango yê xirab û ji hev ketî, ew pergala rûniştvanê gund yê destpêkê dide xuyan. Wergêrê Erebî bawer kiriye, ku navê Kurdî bi wateya “çerx” e, û wilo jî wergerandiye Erebî û kiriye "El Mîseneh".
- Gundekî biçûk e li ser pesarê Başûr yê Çi.Bilêl.

## Çeqmaqa:

Çeqmaq, bêjeyeke Kurdî/Tirkî ye, ji nav û pergalên kevirên Çeqmqaqî yên zemîna cihê gund hatiye. Navê Erebkirî jî wergera navê Kurdî ye. Ew du gund in, **çûçik** û **mezin**, navbera wan dora 1.5/km e:

7. **Çeqmaqê Çûçik**. ***Çeqmeq Siĝîr*** . *El-Suwan El-Seĝîr* (703k, 88h, 6km, 821m ):

Gundekî orte ye li ser pesarê Bakur ê Çi.Bilêl e.

8. **Çeqmaqa Mezin**. ***Çeqmeq Kibîr*** . *El-Suwan El-Kebîr* (3270k, 189h, 5km, 820m):

Gundekî orte ye li ser pesarekî çiyayî hatiya avakirin.

9. **Gundê Çêqilme**. ***Çeqleme***. *Celqemê* (249k, 116h, 6km, 635m):

- Çeqilme, "mastê çelqandî, dew" e. Çêrokeke vî navî ye rastî heye. Dibêjin, li dema Osmaniyan, hêzeke artêşa Osmanî di navçê re derbas dibû, û li ba Aĝayê gund yê Kurd danî. Aĝê ew serbaz dan kirin û razî kirin, lê belkî ji camêriyê bû yan jî ji xeydê bû, wî ferman da peyayên xwe, da ku hinek "Çeqilme" boşe ava kaniyê jî bikin, û got: Bila hespên leşkeran jî dêw vexwin, û ji wê rojê de, û bi wê sedemê, ew gund bi navê "Çeqilme" hat nasîn. Navê Erebkirî, di zimanê Erebî de jî bê wate ye.

- Gundekî biçûk e, li ser dawiya Rojava ya sirta Ebû Bekir e.

10. **Şêx Bila**. ***Şêx Bîlal*** (439k, 5km, 690m):

- Şêx Bilal, navê rûniştvanê wê yê yekê ye.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur Rojava yê Çi.Hawarê ye.

11. **Çençelî**. *Cencelê* (1347k, 69h, 8km, 800 ):

- Ji "çençûl" hatiye, çençûl jî firaqeke bi qulp e, ji bo hilanîna xwarinê bikar tê. Dibêjin, mala destpêkê ku li vî gundî daniye, Ermen bû.
- Gundekî orte ye, li ser pesarê Bakur Rojava yê Çi.Bilêl e.

12. **Çobana**. ***Çobanlî*** . *El-Ra'î* (564k, 765m):

- Çoban, di zimanê Tirkî de bi wateya "Şivan" tê.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Başûr yê Çi.Bilêl e. Bîreke kevin li binê gund heye, xerafeke kevin ku bi dewêr digere li ser e. Cihê gund şûnewarî ye.

13. **Cela**. ***Cêlanlî*** . *El-Ĝizlan* (933k, 217h, 12km, 790m):

- Celalî, navê hozeke Kurdî ye, jê li pesarên Çi.Araratê, û li kêleka bajarê Amîdiyê, û li navça Şarezorê li Başûrê Kurdistanê hene. Wergêr bawer kiriye ku ew navekî Tirkî ye, ji navê "Ĝezalê" hatiye, û wilo jî wergerandiye Erebî.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Başûr yê Çi.Bilêl e.

14. **Gundî Ĥesen**. ***Ĥesen Kilkawî***. *El-Ĥusêniyê* (554k, 9km, 885m):

- Ji navê Ĥesen hatiye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojava yê Çi.'Etmana ye. Derdorên wê hemî daristanên darên Sindîganê û zêtûnê ne. Li Rojavaya gund deşta Lêçe ya fere raxistiye, Çi.Gewr jî aso digre. Cihê gund zor ciwan e.

15. **Ĥucemala**. ***Ĥucemanlî***. *Ĥecman* (755k, 69h, 7km, 806m):

- Navê Kevin ê Kurdî ji du bêjeyan pêk hatiye: “Ĥec û Cemal”, Cemal jî kesekî ji rûniştvanên gund ên destpêkê bû. Navê gund yê Erebkirî jî hîç bê wate ye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojhilat yê Çi.Bilêlko ye. Derdorên wê bi daristanên Sindîganê û cureyên darên çiyayî hatine pêçan.

16. **Ĥemşelek**, **Gundê Qopê**, **Zivingê**. *Ĥemşo*. (1627k, 10km, 550m):

Ev gund bi sê navan tê nasîn:

**Ĥemşelek**: “Ĥem” ji navê Miĥemed e, “şelek” jî hemêza pûş û qijika ye, ev salix ji kesê ku laşê wî girs re tê gotin. Xuya ye "Ĥem" mirovekî girs bû, loma jî ew bi pergala govdê xwe hatiye naskirin.

**Gundê Qopê**: Qop, “perçê goşt ê kelandî” ye. Dibêjin, xudanê gund ê berê mirovekî camêr bû, herdem dewar şerjê dikirin û xelk vedixwand, loma jî gund bi navê “Qopê goşt, Qopê” jî hatiye nasîn.

**Ziving**: Bi wateya “şikeft” e.

- Qopê, Ĥemşelekê, Zivingê: Gundekî biçûk e, li ser pesarê Başûr ê Çi.Benê, li ser milê Rojava yê Ge.Tîra ye. Ew ji çar gundikên ku nêzîk hev bûn pêk hatiye, ew jî ev in: 'Elî Palo, Ziving, Mala Ĥebîba û Gu.Qopê. Ew gund li nava pesarekî çiyayî bûn, şêniyê wan warên xwe berdan, û daketin binê çiyê û li cihê Gu.Qopê xanî ava kirin.

17. **Ĥec Xelîl** (4033k, 267h, 2km, 640m):

- Navê gund ji du navan hevristiye: “Xec” ji navê jinan Xedîce, û “Xelîl” navê mêrê wê ye. Ew her du kes ji niştecihên gund ên destpêkê bûn, û gund bi wan bi nav bûye. Pişt re ew her du nav têkilhev bûne û bûne “Xecxelîl”, paşê jî wek “Ĥecxelîl” hatiye

bilêvkirin. Hîn şêniyên gundên derdorê navê gund wek “Xecxelîl” hildidin.

- Gundekî mezin e, li Başûrê Çi.Mîrê li ser sirtekê ye. Hesin di wî çiyayî de heye. Ew gundekî şên û ciwan e, şaredarî jî tê de heye.

18. **Gundî Dêwrîş**. ***Derwîş Obesî***. *El-Derwîşiyê* (1052k, 219h, 5km, 935m):

- Derwîş, navekî kesan e, li ba Kurdên navçê bi kar tê.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarekî çiyayî û daristanî ye.

19. **Dumilya**. ***Dunbilî***. *El-Umsiyê* (2148k, 232h, 12km, 600):

- Bêjeya "Dumilî", ji navê hoza Dunbilî ya Kurd e, jê li Botanê li Bakurê Kurdistanê hene /B.Lêrx, rûp 48/. Ew hoz di bin destlata Sefewiyên Êranê de dijiya, pişt re ji wir barkir, û hat di nav sînorên dewleta Osmanî de danî, û mîrîtiyeke nîvserbixwe li Rojavaya Amedê û bajarê Palo damezrand, /ferhenga Goranî/.

Di pirtûka El-Mesalêk de jî hatiye, ku “Dunbilî” miletek e, li Çi.Meqlûb û Mixtar li (Bakurê Kurdistanê) rûdinişt, wî warên xwe ji ber zulmê berda û li deverên Mûsilê, Ezirbîcanê bicih bû, lê belê bi hişmendiya xwe kanî destlateke serbixwe li Kurdistanê û li Ezirbîcanê damezranda. Şerefname jî li derbarî ola wan dibêje, ew Êzdî ne. Mihemed Emîn Zekî jî /beş 1, rûpel 664/ dibêje, ev hoz ji Beraziya ye. Rêzdar E.Wesfî Zekeriya jî /rûpel 664/ gotiye, ku ew ji hoza Milî ne. Barbro Karaboda jî navê vê hozê wiha nivîsiye “Dumbulan” û gotiye, ew li Bakurê Kurdistanê li Çi.Mazî hene.

Navê vî gundî yê Erebkirî jî binavkirineke keyfî ye, ji hêla komîta Erebkirinê de hatiye lêkirin.

- Gundekî orte ye, li ber pesarê Başûr yê Çi.Benê ye. Ew dora 3/km li Rojavaya Ge.Tîra ye.

20. **Zerka**. ***Zerkanlî***. *El-Telê, El-Metelê* (792k, 131h, 15km, 740m):

- Zerka, navê hozeke Kurdî ye, jê li derdora Dêrsimê hene, /B.Lêrx, rûp 49/. Berê mîrîtiyeke bi navê “Zirakî, Zirîkî, Zirqî” li Mêrdînê hebû. Ew mîrîtiya bi destê Şêx Ĥusên ku ji Sûryê hati bû, hati bû avakirin. Çar malbatên destlatdar ji silaleta wî peyda bûn, yek jê malbata Derzînî ye, tê gotin ku têkliya wê malbatê bi

“Îsma'îlê Durzî” damezrawê bineola Dirzî re heye, û ew li nava wê mîrîtiyê jidayîk bûye. Ew mîrîtî li serdema Osmanî hebû û destlatdar bû jî, /M.Zekî, perçe2, rûp375/. Navê gund ê Erebkirî jî hîç bê wate ye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojhilat yê Çi.Hawarê ye.

21. **Şediya**. ***Şedyanlî***. *El-Şezyan* (440k, 198h, 8km, 420m):

- Şediya, ev nava bi şêwe û wateya xwe Kurdî ye, û ji “şadiya” hatiye. " Şediyan" navê hozeke Kurdî ye li navçeya Me'dan li Bakurê Kurdistanê, mirovê Kurd ê navdar Nûriddîn Zaza ji wê hozê ye[1]. Navê Erebkirî jî tenê lîstinek e bi tîpan.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarekî daristanî ye, ji hêla Rojava de bi ser deşta Ĥemqê de dakol dibe. Gund sê kîlomitran ji sînorê Tirkiyê dûr e. Geliyê Sarisînê û rêka ziftkirî di Bakurê gund re diçin. Û ji ber ku zeviyên gund li deşta Ĥemqê ne, keskayî, zebeş, Qawîn... û berhemên çandiniyê yên turfende li deşta wê dibin. Gund ji du beşan pêk tê, beşê Jorin ê kevin, û beşê Jêrin ê nû. Cihê gund bi daristanên sindîganê pêçayî ye, û bûye seyrangeheke sirûştî ye zor ciwan.

22. **Gundê Şêx**. ***Şêxler Obesî***. *El-Şiyûx* (582k, 111h, 10km, 910m):

- Gund li ser navê damezrawê gund “Şêx Eĥmed” hatiye binavkirin.

- Gundekî biçûk e, li aliyê Çi.Hawarê yê Rojava ye, û di nava daristana çiyayî de maye.

23. **Gundê Çiyê**. ***Dağobesî***. *El-Cebeliyê* (882k, 87h, 18km, 960m):

- Ji ber ku gund li nav çavê çiyê ye, loma jî bi “Gundê Çiyê” hatiye binavkirin.

- Gundekî biçûk e, li ser cihekî herî bilind e ji Çi.Hawarê hatiye avakirin. Li Başûrê gund bi nêzîk 1.5/km şûnewarên "Keloşka Hawarê" hene. Gund li nava devereke daristanî û fere ye. Ew gundê

---

[1] - Pirtûka Nûriddîn Zaza, rûpel 8.

siyasetvanê Kurd yê naskirî Horîk Ehmed e. Navê Erebkirî jî wergerandina navê Kurdî ye.

24. **'Etmana**. ***'Etmanlî***. *'Etman* (2055k, 458h, 680m):

- 'Etman, ji navê "Osman" hatiye, ew navê mirovekî ji rûniştvanên gund ên destpêkê bû. Etmanî navê hozeke Kurdî ye jî, jê li Bakurê Kurdistanê li navça Sasûnê hene (Barbro Karaboda).

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur ê Çi.'Etmana ye. Deşta Baliya û bajarokê Reco li Bakurê wî ne.

25. **Banîkê**. ***Banîk*** . *El-'Elye, El-'Aliye* (560k, 3km, 660m):

- Banîk, biçûkirina bêjeya Kurdî "banî, li banî, li cihê bilind…" ye. Gund bi xwe jî li ser mitekî çiyayî ye.

- Gundekî biçûk e, ji çend malan pêk tê. Ew li serê sirtekê ji çiyayê 'Etmana ye. Geliyê Sarisînê li Bakurê wê dest pê dibê.

26. **'Elendara**.*'Elemdar* (810k, 433h, 10km, 750m):

- Koka navê gund ji " 'Eliyê Darê " hatiye. Elî kesê destpêkê bû ku konê xwe li wî cihî li ber darekê vegirt û lê bicih bû û gund bi navê 'Eliyê Darê – Elê Darê- 'Elemdara... hat naskirin. Li wê demê, Elî ji xwe re holkek li ser wê darê ava kiri bû û li ser rûdinişt.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarekî Bakur Rojhilat e ji Çi.Bilêl. Ew gundê Micahidê Kurd Resûlê Ĥecî Reşît e, ku li salên sihî ji sedsala bîstan bi destê Firensyan hat bidardekirin.

27. **'Umera**. ***'Umer Ûşaĝî*** . *'Umer* (1029k, 192h, 9km, 820):

- 'Umeranlî, binehozeke Kurdî ye ji hoza Milan, jê li Çi.Qerecedaxê hene.

- Gundekî orte ye li ser Çi.Me'mila. Deşta Ĥemqê li aliyê wî yê Rojava ye. Derdora wî bi daristanên xwezayî û zeviyên darên zêtûnê mişt e.

28. **Gundê Qude**. ***Qude Koy***. *El-Murtefî'e* (1794k, 373h, 7km, 920m):

- Qude, di Kurmancî de bi wateya “bejna bilind” tê. Ew pergala mirovekî ji gundê Çeqilme bû, li wir rûnişt û gund şên kir, û piraniya malên gund neviyên wî ne.

- Gundekî biçûk e, li ser pozê Başûr yê Çi.'Etmana ye. Derdora wî daristan û kendûkorên çiyayî yên zor dijwar in. Cihê gund pir xweş e, heyameke gund e çiyayî ye pir ciwan heye.

29. **Kumreş** . *El-Taqiyê* (695k, 5km, 760 m ):

- Kumreş, ji du bêjeyên Kurdî pêk tê (kum + reş). Binavkirina Erebkî jî wergerandina navê Kurdî ye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojava yê Çi.'Etmana. Derdora gund pesarên pir dîke û daristanî ne. Cihê gund pir ciwan e, û deşta Ĥemqê di bin re raxistiye.

30. **Tilê Kêşûr** . *Kişûr* (275m):

- Li derbarê wateya navê gund, di ferhenga Mokiryenî de hatiye, ku “kaşû” cureyek e ji daran. Kaşû û Kaşûr bi xwe jî li navçê wek nav û navnîşanên kesan bi kar tên.

- Ew girekî şûnewarî ye li ber sînorê Tirkiyê, gelek kavilên şûnewarî yên têvel li derdora wî hene. Ew dora 1/km li Başûrê Gu.Şediya ye. Berê û niha jî kesên ku pêz xudî dikin, li ber wî bicih dibin.

31. **Sorkê** . ***Sorik*** . *El-Sûr, Mezre'it Sorik* (91k, 260m):

- Sorkê, zemîna deşta Lêçe zinarî û reş e, lê rengê axa cihê vî gundî sor e, loma jî gund navê xwe ji pergala axa xwe biriye. Navê Erebkirî jî pêlîstinek e bi navê Kurdî yê resen.

- Gundê Sorkê ji nêzîk 20 malan pêk tê. Piraniya xaniyên wê “zinc” in, dîwarên wan kevir in, bana wan jî qamîş e. Ew li deşta Lêçe li ber sînorê Tirkiyê ye. Lê niha malên ku bi kevir û çemento lê tên avakirin.

32. **Kurê** . *El-Nesir* (494k, 674m):

- Kurê, bi wateya “kurkirî, rût” tê. Ew nav ji pergala cihê gund hatiye, ew cih yan berê bê dar û rût bû, yan jî bejnên darên wê bi qaserî hev bûn, wek tê zanîn navê “kurê” ji cihên çiyayî ku salixên

darên wan mîna hev in re tê gotin. Navê Erebkirî jî, ne ji hêla wate, ne jî ji aliyê şêwe de, nêzîk wateya navê resen dibe.

- Gundekî biçûk e, li ser serteke çiyayî ye ji pesarên Rojava yên Çi.'Etman. Cihê wê çiyayî û daristanî ye. Deşta Lêçe li Rojavaya wî ye. Geliyê Sarisînê yê navdar jî di aliyê gund ê Bakur re diçe. Cihê gund zor şêrîn û ciwan e.

33. **Xirab Simaq** (350 m):

- Cihê gund ji kevin de şên e, darên Simaqê li deverên derdora wî pir hene, û navê xwe dane gund.

- Gundekî biçûk e, ji çend malan pêk tê. Xaniyên wî ji mûdêla "Zincî" ne. Ew li ser pesarekî çiyayî û daristanî ye. Deşta Lêçe li Rojavaya gund e, geliyê Sarisînê jî di Başûrê wî re bi Rojava de diçe.

34. **Kûra** . ***Kûranlî*** . *Kûran* (972k, 123h, 4km, 630m):

- Navê gund bi wateya kesên "kûr, kor " ku ji roniya çavan bêpar in hatiye. Kûran navê hozeke Kurdî ye jî, jê li Bakurê Kurdistanê li derdora Qarsê heye, /B.Lêrx, rûp 61/. Û li derdora Mêrdînê jî hene, /Barbro Karaboda/.

- Gundekî orte ye, li aliyê Başûr Rojavayê Çi.Bilêl, li ser sirtekê ye. Geliyê Holîlê yê Kûr di Rojavaya wî re bi Başûr de diçe, pîrozgeha Miĥemed Elî ya naskirî jî, li Rojavaya gund di zikê gelî de ye.

35. **Goliya** , ***Goliyan*** . *El-Deĥĥak*:

Goleke avê ye biçûk ku bi destan kolandî li ber gundê Jêrin heye, ava baranê tê de dicive, diyar e ku gund navê xwe ji wê golê biriye. Têkliya navê Erebkirî jî hîç bi yê resen re tuneye. Goliya bi xwe du gund in, **Jêrîn** û **Jorîn**:

36. **Goliya Jêrîn** . *El-Deĥak Teĥtanî* (542k, 106h, 15km, 680m):

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Başûr Rojava yê Çi.Hawarê ye.

37. **Goliya Jorîn** . *El-Deĥak Foqanî* (727k, 30h, 10km,785m):

- Gundekî biçûk e, dora 1/km li Rojavaya gundê Jêrin, li ser rûyê Çi.Hawarê yê Rojava ye.

38. **Maseka** . ***Maskanlî*** . *Masîkan* (2068k, 166h, 2km, 620m):

- Maseka, navê hozeke Kurdî ye, jê li Bakurê Kurdistanê li Botanê hene, /B.Lêrx, rûp 48/. Şerfxanê Bedlîsî ew nav wek “Masek” nivîsiye. Navê gund ê Erebkirî tenê pêlîstinek e bi navê Kurdî.

- Gundekî orte ye, li ser pesarê Başûr Rojhilat ê Çi.Bilêlko.

39. **Memala** . ***Memalî*** . *El-Ssedî* (1813k, 218h, 3km, 740m):

- Navê hozeke Kurdî ye, jê li Bakurê Kurdistan li Melezgirdê hene, /B.Lêrx, rûp48/. Dîroknîvîsê kevin El-Estexrî jî dibêje: Memalî ji hozên Kurdan e li welatê Faris /Mûsilî, rûp 455/.

- Gund li ser pesarê Başûr Rojhilat yê Çi.Bilêlko li ser cihê bi navê “Qilçiq an Kelacik” hatiye avakirin, şûnewarên ji serdemên Alefiringî de li wî cihî hene. Gund du beş in: Rojavayî û Rojhilatî, gelî û rêka ziftkirî wan ji hev dikin.

40. **Gundê Ĥeyder**, **'Eltaniya** . ***Ĥeyder Obesî*** . *El-Ĥeyderiyê* (5km, 870m):

- Ĥeyder, navê mirovekî ye. “ 'Eltane ” jî du bêjeyan hevristî ye, ('Elî û Tane). Tane jî: Binavkirineke bi wateya “Gayê ku di xortaniya xwe de ye”. Dibêjin dema ku ew 'Elî hat, û mala xwe li cihê gund danî, şêniyê Gu.Hopka çûn seredana wî, wê hîngê wî ew şande di camêriyê hêşt, û dema ku ew ji ba Elî vegerîn, pir pesna wî dan û wiha li ser gotin: Ew “tanakî meriya ye!” Ango mêrekî pir gernas e, û herwiha ew nav li wî û li gund hat kirin. **Ĥeyderan** jî navê hozeke Kurdî ye, jê li Bakurê Kurdistanê li derdora Motkê û Wanê hene, (Barbro Karaboda).

- Gundekî biçûk e li ser rûyê Rojava yê Çi.Bilêlko. Cihê wî çiyayî û daristanî ye, û mîna seyrangeheke pir şêrîn e.

41. **Sêlek**: Gundekî vala ye, cihê xwe li Bakurê Gu.'Eltaniya ye.

42. **Gundê Şêx**: Gundekî vala ye, cihê wî li Rojavaya Gu.'Eltaniya ye.

43. **Me'mila** . ***Me'milûşaĝî*** . *El-Me'amêl* (3488k, 14km, 850m):

- Navê gund ji du bêjeyên Kurdî pêk hatiye, Me'im: Ji kurtkirina navê Meĥmûd e, Êl”: Jî bi Tirkî û Kurdî bi wateya “binehoz, malbat..” tê. Ew her du bêje bi demê re bi hev ketine, û bûn bêjeyek: Me'im + Êl= Me'imêl= Me'mil + a (nîşana tewangê ya gelejimariyê) = Me'mila. Ango ew nav mebesta “êl û famîla Meĥmûd” dide. Bêjeya

“ûşaĝî” jî bi Tirkî ye, wateya tevahî dike: “Neviyên êla Mieĥmûd”. Wek xuya dibe, tu têkliya navê Erebkirî bi navê gund ê resen re tuneye.

- Ji gundên mezin e li devera Reco. Ew li aliyê Rojava yê Çi.Me'mila ye. Gund li nîvê yekê ji sedsala bîstan warê Ehmedê Xelîl Aĝa bû, hîn jî neviyên wî lê rûdinin.

44. **Gundê Mûskê**. ***Mûsîkobesî***. *Mûsîyê* (2590k, 126h, 4km, 75m):

- Kesê destpêkê ku li cihê gund rûnişt û xanî lê ava kir, bi navê “Mûso, Mîso, Mîsik” dihat nasîn, gund jî navê xwe jê biriye. Binavkirina “Mûsîkobesî” jî Osmanî ye û bi wateya “civata Mûsîk” tê. Binavkirina Erebî jî ji badana bêjeya Kurdî bi ser Erebî de hatiye. Li hêleke din, “Mûse Beg” hozeke Kurdî ye mezin e, jê li Kobaniyê, Qamîşlo û Kurdistana Êraqê hene. Li aliyê Tirkiyê li Rojavaya bajarê Kilisê jî bajarokekî bi navê “Mûsbeglî” heye, ew berê navenda deverekê bû li Çi.Kurmênc, niha jî navenda deverkê ye li Tirkiyê. Dîsa, Mûskan, Mûsikan, Misikî navên binehozine Kurdî ne, jê li Bakurê Kurdistanê li deverên Xerza, Wanê… hene, (Barbro Karaboda).

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur ê Çi.'Etmana ye. Cihê gund çiyayî û daristanî ye, û sirûşta wî zor ciwan e.

45. **Gundê Holîlê** . ***Holîlo*** . *Helîl* (792k, 81h, 5km, 720m):

- Holîl, navnîşana niştecihê destpêkê ye ku gund pê hatiye binavkirin, hîn jî malbateke mezin bi wê paşnavê li gund heye. “Holîlan” jî binehozeke Kurdî ye, jê li Rojhilata Kurdistanê li Kermenşahê hene, /B.Lêrx, rûp 75/, ew binehoz bi hozên Lor- Feylî yên Kurdî ve girêdayî ye. Navê Erebkirî “Helîl” jî, ji navê gund ê Kurdî hatiye badan.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojava yê Çi.Bilêl e. Cihê wî çiyayî û daristanî ye. Ge.Holîlê yê kûr li ber gund çê dibe û bi Başûr de dadikeve. Sirûşta gund pir xweş e.

46. **'Edema** . ***Edemanlî*** . *Ede* (1142k, 174h, 18km, 570m):

- Navê hozeke Kurdî ye, jê li Bakurê gola Wanê li Bakurê Kurdistanê heye, /M.Zekî, perçe 1, rûp 407/. Navê Erebkirî jî tenê beşek e ji navê resen û tu wateyê nade.

- Gundekî biçûk e,  li ser pesarê Çi.Bilêlko yê Rojava ye. Sînorê Tirkiyê û Çemê Reş dora 2/km di Rojavaya wî re derin. Cihê 'Edema çiyayî û daristanî ye.

47. **Bilêlko** . ***Bilelîko*** . *Bilaliyê* (2016k, 196h, 9km, 970m):

- Ji navê kesan "Bîlal" hatiye. Navê Erebkirî jî badanek e ji yê Kurdî.

- Gund li ser sirteke zinarî ye ji pesarên Rojava yên Çi.Bilêlko. Cihê gund daristanî ye, û mîna seyrangeheke pir ciwan e.

48. **Çe'inka** . ***Ce'niklî*** . *El-Betra* (2674k, 386h, 9km, 920m):

- Çe'inka, navekî Kurdî ye, bi wateya "neqiş" tê. Têkliya navê Erebkirî bi yê kevin re tuneye.

- Gund li ser pesarê Rojava yê Çi.Bilêlko ye. Cihê wî çiyayî, daristanî û zor xweş e.

49. **Xirabê Silûg** . *El-Silûk* (417k, 440m ):

- Silûg, navê jinekê bû, kurmên xwînmij "Zêrî" bi kar tanîn, li wir rûdinişt û mir û gund pê hat binavkirin. Navê Erebkirî "El-Silûk" ji nîvê navê Kurmancî hatiye birin.

- Gundekî biçûk e, li binê pesarê Rojava yê Çi.Bilêlko ye. Ew 3/Km li Rojhilata sînorê Tirkiyê ye. Rêka çîmanê di bin re dere. Daristaneke sîndîganê ye fere û siq li derdora gund heye.

50. **Qerebaba** . *El-Sode*  (942k, 430h, 11km, 480m):

- Navekî Tirkî ye, bi wateya "bavê reş" tê. ``Baba`` li ba Kurd û Tirkên `Elwî jî navnîşaneke olî ye. Pîrozgehek bi wî navî li ber gund heye. Navê Erebkirî jî wergerandineke ji nîvê navê gund.

- Gundekî orte ye, li aliyê Rojava yê bêleke fere ye. Cihekî şûnewarî yî giring li aliyê wê bêlê yê Rojhilat heye. Ava çemê Reş û sînorê Tirkiyê di Rojavaya gund re diçin.

## Firfirk:

Bêjeya "Firfirkê", bi Kurdî wateya "perwane" dide. Ew ji navê firfirka ku li destpêka sedsala bîstan li ber xeta hêsin hati bû venan hatiye.Firfirk du gund in, **Jêrin** û **Jorin**:

51. **Firfirka Jêrin**, **Şêx 'Evdal** . ***Firfirîk Teĥtanî*** (100h, 290m):

- Ev gunda bi du navan tê nasîn. Navê kevin: Gundê Şêx 'Evdêl, 'Evdal jî mirovekî xudan ûcaq bû. Navê nû jî "Firfirk" e, ew jî navê nû ye.

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Rojava yê Çi.Bilêlko ye. Sînorê Tirkiyê dora 1/km li Rojavaya wî ye. Arzûyên gund û zeviyên gundiyan, wekî govan di nav daristanên sindîganê û deşta Lêçe de ne.

52. **Firfirka Jorin** . ***Firfirîk Foqanî*** (670m):

- Ev gund vala bûye, û piraniya şêniyê wê li Reco bicih bûne.

53. **Şêx Mihemed** , **Gundê Kurê** . ***Şêx Mihemedlî*** . *Şêx Mihemed* (1023k, 114h, 13km, 750m):

- Du navên vî gundî hene, **Kurê**: Ji cihê rût û bê dar re tê gotin. Navê Şêx Mihemed jî: Ji navê pîrozgeha ku li ber gund e hatiye.
- Gundekî orte ye ji gundên Meydana, li ser pesarê Başûr Rojhilat ê Çi.Be'îvê ye.

54. **Sêmalka** . *Semalik Reco* (2626k, 742m):

- Ev nav ji biwêja "sê malan" hatiye kurtkirin.
- Gundekî biçûk e ji gundên Meydana.

55. **Gazê** .***Tebe Koy*** .*Tilêlê* (722k, 810m):

- Gaz, di Kurmancî de bi wateya "gir û bilindiya dirêj" tê. Navên Osmanî û Erebkirî jî wergera navê Kurdî ne.
- Gundekî biçûk e ji gundên Meydana.

56. **Welîklî** , **Bindarê .** *El-Welî* (419, 14km, 760m):

- Welo, ji navê kesan "Welo" hatiye, ev nav pir li navçê bikar tê. Gund bi navê "Bin darê" jî tê nasîn, ew jî li ser navê dareke kevnar ku li ber gund bû. Navê Erebkirî "El-Welî" çêkirî ye. ''Weliyan'' jî navê hozeke Kurdî ye, jê li navça Xerzan li Bakurê Kurdistanê hene, (Barbro Karaboda).
- Gundekî biçûk e ji gundên Meydana, li ser pesarê Başûr Rojava yê Çi.Be'îvê ye.

57. **Gundê Dodê** . ***Dodo*** (1723k, 72h, 13km, 800m):

- Dodo, navê mirovan e, ew wek bêje salixa "dilêrî, wêrekî, gernasiyê.." dide, /ferhenga Kurdistan/. Ji bilî ku Dûdikan, Dodikan navê hozeke Kurdî ye, li derdora Mêrdînê û Wanê ji Bakurê

Kurdistanê hene, (Barbro Karaboda). Xûrî Besûm jî ji hêla xwe de li derbarî navê gund wiha gotiye: Ew navekî Aramî ye, salixa kesê “têrî, ne hişmend” dide. Lê em bawer nakin ku ev nêrîn rast be.

- Gundekî biçûk e ji gundên Meydana.

58. **'Elbîskê** . *El-'Elya* (560k, 94h, 11km, 870m):

- Ev nav ji du bêjeyan pêk tê: 'Elî navekî kesan e. Bêsk jî navê binehozeke Kurdî ji hoza Milan e, /M.Zekî, perçe 1, rûp 398/. Navê Erebkirî jî hema wilo bê wate hatiye.

- Gund li ser pesarê Rojava yê Çi.Bilêlko ye. Derdora wî daristanên pir siq in. Cihê gund geştevanî û pir şêrîn e.

59. **Penêreka** . *Benderek* (755k, 13km, 560m):

- Penêr, bêjeyeke Kurdî ye naskirî ye. Penêrok jî, navê geyakê ye. Ti pêwendiya navê Erebkirî bi yê resen re tineye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur yê Çi.Be'îvê ye. Cihê gund çiyayî û kêrtekortî ye, û dora 1.5/km li Başûrê sînorê Tirkiyê ye.

60. **Kosa** . ***Kosanlî*** . *Kosan* (1088k, 47h, 22km, 600m):

- Kose, bi wateya “kesê bê rî û simbêl” tê. Kûsî jî, navê binehozekê ye ji hoza Reşwan a Kurd, jê li Şarezorê li Başûrê Kurdistanê heye, /B.Lêrx, rûp 57/. Navê hoza “Kose, Kosiye” li ba "Ibin Betûta" jî hatiye gotin. Ji bilî ku hozeke bi navê “Kasan” li Rewndozê li Başûrê Kurdistanê jî heye, /B.Lêrx, rûp55/.

- Ev gundê biçûk li bin pesarê Bakur yê Çi.Be'îvê ye. Dora 2/km li Başûrê xeta sînorê Tirkiyê ye. Cihê wî gelîkî ye. Li salên bi baran, gelek kanok ji derdorên gund têdizên.

61. **Mîdan Ekbez** (1216k, 502h, 22km, 372m):

- Meydan, bi Kurmancî wateya “cihê dûz û vala dide”. “Ekbez” jî navê gundekî ye li aliyê Turkiyê, ango tevahiya nêv bi wateya “Meydana gundê Ekbezê” dide. Rawestgeheke Çîmanê li serdema Osmanî, li meydana Gu.Ekbezê hat avakirin, paşê jî ew cih şên bû û bû gundê “Meydan Ekbezê”. Wê lomê jî, hîn navsalên wan dedoran ji gund re dibêjin “Stesûn”, ew jî bêjeyeke Firensî ye bi wateya “Rawestgeh” tê.

- Ev gund li destpêka sedsala bîstan bi avakirina rawestgeha çîmanê re şên bûye. Kesên ku li destpêkê lê rûniştine Ermen bûn,

ew ji ber qirkirinê direvîn û li dora hêzên Firensî dicivîn. Gund li nav deşta Lêçe ye, Çemê Reş di Rojavaya wî re diherike. Axa derdora gund volkanî û şov e. Ew li ser sînorê Tirkiyê ye, şêniyê wê ji bilî çandiniyê karê bazirganiya navsînorî jî dikin.

62. **Ĥecîka** . ***Ĥecîklî*** . *El-Ĥecîc* (404k, 4km, 920m):

- Navê gund ji bêjeya "Ĥecî" ku navnîşana kesekî ji gund bû hatiye. Ji bilî ku Hacikan navê hozeke Kurdî ye, jê li Bakurê Kurdistanê heye, (Barbro Karaboda).
- Ĥecîka du beş in: **Jorin** û **Jêrin**. Ew gundê biçûk li ser sirteke çiyayî û daristanî ye ji Çi.'Etmana. Cihê wî pir xweşik e. Bîreke avê ye kevin û navdar li ber gund e.

63. **Xirabî Mecît :**

- Ji navê mirovan: "Mecît" hatiye.
- Wareke e li deşta Lêçe, şivan lê datînin û ji arzûyên şêniyê Gu.'Etmana ye.

64. **Xirabî Qewala** . ***Xirab Qewalî*** :


- Qewal, navnîşaneke oldarine Êzdî ye. Guman heye ku ew li demekê, li wir rûdiniştin û cih bi wan hat binavkirin.
- Ew li roja me cîgehekî ne şên e.

65. **'Erdê dolê** . *Erd El-Dewlê* **:**

- 'Erdê Dolê, "Dol" navê jinekê ye, li wî cihî rûdinişt û pê bi nav bû. Niha kes lê rûnane. Çend cihên din jî li wan derdoran hene, bi navên jinan bi nav dibin, wek "Ge.Sari Sînê". Sîn jî navekî jina ye ji "Sînem" hatiye. Bilêvkirina vî navê Kurmancî, nêzîk peyvênên Erebî ye û wiha tê nivîsandin "Erd El-Dewlê", ango "Erdê ku ji arzûyên dewletê ye", wek me dît ew jî ji rastiyê dûr e.

66. **Tetera** (2km):

- Teter, navê kesan e, li ba Kurdên navçê bikar tê.
- Ew çend mal in, ji dora bîst salan de li Bakurê Reco li ser riya Gu.Memala hatine avakirin.




Nexşe -25- Devera Reco. Pîvan 1/150000

**Sînorên dewletê ++++. Sînorên navçê + - + - +. Sînorên deveran - - - . Sînorên gundan -.-.-. Rêkên ziftkirî ====. Rêka Çiîmanê .......**

Lêkolîna Heştem

# Nav li devera Bilbilê

Devera Bilbilê ji 48 şêngeh û parkirinên kargêrî pêk tê. Navenda wê bajarokê Bilbilê ye. Sînorên deverê wiha ne: Li Rojhilat De.Şera, li Rojava De.Reco, li Başûr De.Mabeta û ji Bakur de jî sînorê Tirkiyê ye.

1. **Bilbil** (4683k, 50km, 640m):

- Bilbil, navê tilûr/balindekî ye li daristanê çiyayê derdora Bilbilê pir tê dîtin. Lê belê navê deverê li serdema Osmanî “ 'Ezê ” bû, guman heye ku ew nav ji navê 'Ezdîn hati be.

Bajarokê Bilbilê li ser pesarê Başûr yê Girê Mezin e. Bilindiya wî çiyayî 1269m e, ew çiyayê herî bilind e li parêzgeha Ĥelebê. Asta bilindiya bajarokê Bilbilê ji ser rûyê deryayê de 690/m e. Bilbil 48/km li Bakurê bajarê Efrînê ye, û 90/km li Bakur Rojavaya Ĥelebê ye. Bilbil navenda hoza Biyan bû û ji warên mala Şêx Sim'el bû. Digel ku Bilbil ji serdema Osmanî de navenda deverekê bû, lê ew wek bajarokekî biçûk maye û mezin nebûye.

Piraniya şêniyê Bilbilê di çandiniyê de kar dikin. Gelek xanên kirînfirotina pêdviyên malan, guvaşxanên zêtê û karxaneyên pîşesaziyên destanî li Bilbilê hene, wek durustkirina alavên çandiniyê, makînan û hwd.

Cigeha şûnewarî ya navdar “Nebî Horî - bajarê Sêrosê yê kevin” e, ew 12/km li Rojhilatê Bilbilê ye. Ew cîgehekî şûnewarî û geştevanî yî pir giring û şêrîn e, her du çem: Sabûn Su û Efrîn di Rojhilata Nebî Horî û Bilbilê re diherikin.

Li mehên Biharê û Havînê, bi dehan kanî û kanok li piraniya gundên Bilbilê û derdora wan derdibin, û deverê dikin gulîstaneke

mezin û ciwan. Gelek cihên xama Hêsin, Baqir û kevirên Rixamê yên rengîn li De.Bilbilê hene, lê mixabin ew bi şêweyên aborî û zanistî nayên bikaranîn.

Ev şênewar bi ser devera Bilbilê ve ne, **[Nexşe 26]:**

2. **'Upila** . ***Ubil Ûşaĝî*** . *Abil* (900k, 160h, 12km, 600m):

- Upil yan Up, bêjeyek e, li wê deverê ji milikê Ĥêştiran re tê gotin. Belkî jî ew veguhastineke Kurdî be ji bêjeya Erebî “Îbil”, ango Ĥêştir. Tê zanîn, ku mirovekî ji rûniştvanên gund ên destpêkê, Ĥêştirên xwe hebûn, û ew gund bi wan hat binavkirin.
- Gundekî orte ye, li ser rûyê Başûr ê Çi.'Upila ye. Çend guvaşxaneyên zêtê lê hene.

3. **Gundê Bêxçe** . ***Baqce Qonaq*** . *Beqce* (703k, 290h, 7km, 900m):

- Navê gund ê gelêrî yê Kurdî ji baxçeyên ku li nav û li derdora gund bûn hatiye. Gelek kanok ji nav û ji derdora gund derdibin û diherikin. Binavkirina Osmanî ji gund re ji Qonaqa Aĝan ku di nava baxçan de bû hatiye. Navê Erebkirî jî hîç bê wate ye.
- Gundekî biçûk e. Ax û zinarên zemîna derdora wî hesinî ne. Gelek kanok ji derdora gund der dibin. Şêniyê gund ji Aĝeyên mala Şêx Sim'el in.

4. **Qarşiqa -** *Mezre'it Qarşiq* (204k, 920m):

- Rûniştvanên gund ên destpêkê, ji çar malbatên cuda pêk dihat, loma jî ew wek gundekî “Qarşiq” dihat dîtin û pê bi nav jî bû.
- Gundekî biçûk e.

5. **Baliya** . ***Balî Koy*** . *Balî* (1054 k, 130h, 4km, 800m):

- Bal, di Kurdî de bi wateya “cihê bilind” tê, ew nav ji pergalên Xaknîgarî yên cihê gund hatiye. Baliya, navê hozeke Kurdî ye jî, jê li nêzîk navça Xoy li Rojhilata Kurdistanê hene, /M.Zekî, perçe 1, rûp 390/. Hinek jî dibêjin, “bal” bêjeyeke Tirkî ye bi wateya “hunguv” e. Lê ya rast, koka navê gund Kurdî ye û ji bilindiyê hatiye. Têkliya binavkirina Erebî “bal” jî hîç bi navê wî yê resen re nîne.
- Baliya gundekî biçûk e. Cihê wî li binê pesarê Rojhilat ê Çi.Girê Mezin e. Ka.Baliya li binê gund e. Gund ji du beşan pêk tê, di navbera wan de dora 1/km navberî heye: Gundê **Jorin:** Beşê kevin û mezin e, li ber sînorê Tirkiyê ye. Û ji ber ku gundê kevin li

ser pesarê çiyê li ber sînor Tirkiyê ye, û cihê wî jî dijwar e, hinek ji şêniyê gund xaniyên xwe yên kevin berdan, û daketin li binê pesêr li nêzîk kaniyê xanî ava kirin, û hweriwha gundê **Jêrin** çê bû.

6. **Gundê Bêkê** . ***Beg Obesî*** . *Obe* (1151k, 345h, 8km, 1000m):

- Gundê Bêkê, ji navê "Gundê Begê" hatiye. Berê Axĝeyên mala Şêx Sim'el lê rûdiniştin, loma jî Osmaniyan navê wî wiha hildane "***Beg Obesî***", ango "Malbata Begê". Şerfxanê Bedlîsî jî hozeke Kurdî bi navê "Bêkan" bibîr tîne, /B.Lêrx, rûp 48/. Navê Erebkirî "Obe" jî tenê nîvê navê gund yê Osmanî ye.
- Gundekî orte e, li ser aliyê Rojava yê Çi.Girê Biçûk e, ew dora 1/km li Başûrê xeta Sînor e. Gund bi daristanên Sindîganê pêçayî ye. Hin malên mezin û xweşik lê hatine avakirin. Kaniyeke biçûk ji nav çiyê derdibe û bi nav gund de tê.

7. **Bîbaka** . ***Bêg Ûşaĝî*** . *El-Tifle* (1292k, 275h, 13km, 650m):

- Digel ku ew nav ji çarçewa pergalên zimanê Kurdî dernakeve, lê em ne gihîştin wateya wî. Lê belê navê Osmanî "***Bêg Ûşaĝî***" wateya "neviyên begê" dide. Navê Erebkirî "*El-Tifle"* jî ango "zaroka keçik", bi pergalên gund û navê resen ve netê girêdan.
- Gundekî biçûk e, li ser bêleke fere ye.

8. **Gundê Bêlê** . ***Bêlan Koy*** . *Bêlan* (1483k, 493h, 11km, 610m):

- Bêl, di Kurdî de bi wateya "sirt, bilindahî" tê. Binavkirina "Bêlan Koy" ya Osmanî jî, wergera navê Kurdî ye. Binavkirina Erebkirî jî tenê nîvê navê gund ê kevin biriye.
- Gundekî biçûk e, li ser bêleke bilind e. Ge.Çayê di Rojavaya wî re bi Başûr de berdirêj dibe.

9. **Ĥesendêra** . ***Ĥesen Dêrlî*** . *Dêr Ĥesen* (1947k, 150h, 17k, 480m):

- Ĥesen, navê mirovekî ye, ku li destpêkê li nav kavilên şûnewarî ku li cihê gund bûn rûnişt, û gund bi wî hat binavkirin, ew şûnewar jî bi "dêr" hatin nasîn. Hîn jî piraniya şêniyê gund bi paşnava Ĥiso (ji Ĥesen) bi nav dibin. Navên Osmanî û Erebkirî jî ji navê resen hatine birin.
- Gundekî orte ye, li aliyê Rojhilat ê Çi.Hawarê ye. Ge.'Eşûnê di navbera wan re diçe. Li Rojavaya gund, cihekî şûnewarî yî hêja li

ser pesarê Çi.Hawarê heye, şikeft û gelek wêne û neqşên di zinêr de nîgarkirî lê hene.

10.**Xidiriya** . ***Xidiryanlî*** . *El-Xidir* (2628k, 435h, 7km,750m):

- Xidiranlo, navê binehozekê ye ji hoza Reşwan a Kurd, û hin jî dibêjin ew ji hoza Milî ye. Ji Xidiranlo li ber Çi.Araratê hene, /M.Zekî, perçe 1, rûp 432/. Xidirkan û Xidirî jî du binehozên kurdî ne, jê li Bakurê Kurdistanê hene, (Barbro Karaboda). Navên Osmanî û Erebkirî ji yê Kurdî hatine birin.
- Gundekî orte ye li ser pesarê Bakur Rojhilat ê Çi.Simaqê ye. Piraniya şêniyê gund ji çiyê daktine û li Bakurê gund bi dora 1/km gundekî nû bi navê "Qestela Xidiriya" ava kirine.

11.**Ĥazira** . ***Ĥadiro*** . *Ĥadir* (111k, 775m):

- Navê gund wateya " ĥazir- amade" dide. Navê Osmanî û Erebkirî jî jê hatine birin.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur yê Çi.Simaqê ye, dora 1/km li Başûr Rojavaya Gu.Xidiriya ye.

12. **Miĥa** (775m):

- Ji navê Miĥemed hatiye.
- Ew li Başûrê gundê Ĥazira bi çend sed mitran e. Gundekî biçûk e û hîn di nav parkirinên kargêrî yên deverê ne hatiye tomarkirin.

13.**Dupîra** . ***Dubîro*** . *Dibîr* (159k, 820m):

- Bingeha navê gund Kurdî ye, ji "du pîra- du pîrejina" hatiye. Bingeha navên Osmanî û Erebkirî jî ji wî navî ye.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Bakur Rojhilat yê Çi.Simaqê ye. Ew dora kîlomirtekê li Başûrê Gu.Xidiriya ye. Gund du beş in: Jorin û Jêrin. Bergeha di navbera wan de 400m e.

14. **Çolaqa** . ***Çolaqlî*** . *El-Ekte'* (133k, 860m):

- Çolaq, bi Kurmancî ji kesê ku dest yan piyên xwe ne durust bin re tê gotin. Navên Erebkirî û yê Osmanî jî ji wê salixê hatine.
- Gundekî biçûk e, li aliyê Bakur Rojhilat ê Çi.Simaqê. Cihê wî dijwar û daristanî ye. Ew du kîlomitran li Başûr Rojavaya Gu.Xidiriya ye.

15.**Xelîlaka** . ***Xelîlak Ûşaĝî*** . *El-Xelîl* (2104k, 22km, 620m):

- Ji "Xelîl" hatiye. Binyata navên Osmanî û Erebkirî jî ji wî navî ye.

- Gundekî Orte ye, li aliyê Başûr ê pesarekî çiyayî, bilind, daristanî û dîke ye, her sê gundên: 'Eşûnê, Zivingê û Xelîlaka li ser pesarên wî çiyayî yên Başûr û Rojava belav dibin. Çi.Hawarê dora 700/m li Başûrê gund e, û geliyê 'Eşûnê wan ji hev dike. Gu.Xelîlaka du beş in: Beşê **Jorin**, gundê kevin e, beşê **Jêrin:** Ê nû û mezintir e.

16. **Gundê Dîkê** . ***Dîk Obesî*** . *El-Dîk* (923k, 24km, 710m):

- Navê gund ji navê mala Dîkê hatiye. Navên Osmanî û Erebkirî jî jê hatiye kişandin.

- Gundekî biçûk e, li ser milê gazeke çiyayî, dijwar û daristanî ye.

17. **Ze'rê** . ***Ze're*** (1611k, 230h, 3km, 900m):

- Di ferhenga Goranî de hatiye, ku “ze'r” bi wateya “çiya” tê, gund jî li ser pesarekî çiyayî ye. Lê Xûrî Bersûm dibêje, ew navekî Aramî ye û ji Zi'ora: bi wateya “kin bû, biçûk bû, teng bû” hatiye, em bawer dikin, ku ew gotin ji rastiyê dûr e.

- Gundekî biçûk e di nîvê pesarê Başûr Rojava yê Çi.Girê Mezin de ye. Ew dora 1/km ji sînor dûr e.

18. **Şerqiya** . ***Şerqanlî*** . *Şerqan* (1121k, 260h, 7km, 660m):

- Şerqiya, navê hozeke Kurdî ye, jê di navbera Mêrdîn û Rihayê de heye, /B.Lêrx, rûp 58/.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojhilat ê Çi.Şerqiya dikeve. Gava ku serbazên Îslamî li sala 636Z, gihîştin ber bajarê Sîrosê, û xawestin wî dagîr bikin, peymana radestkirina bajêr ji Mislimanan re, bi Rahibê bajêr re li gundê "Şerqîna" hat morkirin, /El- Bilazirî, rûp 163/.

19. **Qestela Miqdêd** . ***Qestel Miqdad*** . *Mezre'et Şerqan, El-Muşrîqe* (388k, 7km, 560m):

- Qestel, bi wateya berbeqa avê ye, ew qestel li aliyê Rojava yê girê şûnewarî ku li Rojhilatê gund e. Miqdad jî navê mirovekî ye, hîn neviyên wî li gund rûdinin.

- Gundekî mezin e, li ser pesarê Rojhilat ê Çi.Şerqiya ye. Gundê berê li Rojavaya cihê xwe yê niha bi dûrbûna 1/km li serê "Sirta Gazê" bû. Lê ji dawiya salên çelî de ji sedsala bîstan, şêniyê wê daketin jêr û xanî li ber rêka Bilbilê ava kirin. Hin karxaneyên pîşeyên biçûk û durustkirina alavên çandiniyê, ligel hin dukanên kirînfirotinê li gund vebûne.

20. **Berkaşê** . ***Berkeşlî*** . *Berkeşê* (427k, 11km, 700m):

- Berkaşê, ji du bêjeyên Kurdî pêk hatiye: “Ber û Kaş”, gund bi xwe jî li ser pesarê kaşekî dîke ye, û navê xwe ji pergala cihê xwe biriye. Lê Xûrî Bersûm dibêje, ew nav ji Aramî ye, û bi wateya “Mala teşqelan” e, yan jî ji Siryanî û bi wateya “tergidinyayên ku li ser çokan, û şikeft jî… tê” te, /rûp 69/, em jî bawer nakin ku navê gund ji wan hati be.

- Gundekî bikçûk e, li ser pesarekî dîke ye, li aliyê Çi.Simaqê yê Başûr e. Cihê gund çep û veşartî ye.

21. **Şêxorz** . ***Şêx Xorz*** . *Şêx Xiroz* (2770k, 1180h, 5km, 640m):

- Navê Şêxorz ji du bêjeyan hatiye darijtin, **Şêx**: Binavkirineke olî ye, ji xudanê gora ku di binê Birca kevin a ku li wir e, tê gotin. Ew birca li Başûrê şûnewarên bajarê Sîrosê ye, jêderên dîrokî dibêjin, ew gora efserekî Romanî ye, piştî ku bajarê Sîrosê wêran bû, birc û gor, li ba şêniyê derdorê wek cihekî pîroz hate dîtin, û bi Şêx hat binakirin. Li sedsala nozdehan (1303g/1885z) nimêjgeheke biçûk li kêleka wê bircê hate avakirin, û birc jî wek minare hat bikaranîn, û bi wî rengî, ji tevahiya ew cihê “pîroz” re binavkirina olî "Şêx" bi kar hat. **Xorz**: Ew jî binavkirina Kurdî ya bajarê Sîrosê ye, mîna ku em dizanin, ew bajar bi demê re, bi gelek navan hatiye binavkirin, wek: Koroş, Koriş, Qoroş, Qoris, Nebî Hûrî, Xoros, û Xoroz û Xorz jî. Û ji ber ku ew pîrozgeha(birc û gor) li ber şûnewarên bajarê Sîrosê/Xorzê ye, Kurdan ew avahî bi **Şêx Xorz/Şêxorz** bi nav kiriye. Gundê Şêxorzê yê niha jî, nêzîkî Nebî Hûrî/Xorz û pîrozgeha Şêxorzê ye, loma jî gund bi wê pîrozgehê, ango bi **"Şêxorzê"** hat nasîn û pê bi nav bû. Gund di salên sî de ji sedsala bîstan, navendeke giring bû ji tevgera Mirûdan re, û pîrozgeha Nebî Horî jî wek mizgeft bi kar tanîn.

Wek me dît, Şêxorz ne ji bêjeya Tirkî “Xoroz” ango “dîk” hatiye, çinkî berî ku Osmanî bigihên van herêman, ew gund bi wî navî, li wî cihî hebû.

- Gundekî mezin e, ji sê beşan pêk tê: Rojhilat, navîn, Rojava. Ew li ser pesarên Bakur yên Çi.Şêxorzê hatine avakirin. Ew gundê nêzîktir e ji kavilên bajarê Sîrosê ve.

22. **Gundî Kerê** . ***Saĝirobesî*** . *Saĝir* (1142k, 22h, 20km, 630m):

- Ji salixa “Ker”, ango yê ku nabihîse hatiye, ew jî binavkirina rûniştvanekî gund î destpêkê ye. Navên Osmanî û Erebkirî jî, ji navê Kurdî yê kevin hatine birin.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Başûr ê bêleke çiyayî ye. Ge.Cirqa di aliyê gund ê Başûr re diçe.

23. **Xilalka** . ***Solaqlî*** . *El-Merwîyê* (3387k, 390h, 11km, 750m):

- Xilalka, salixa dengê derbûn û herikîna avê ye, jixwe gelek kanî li derdora gund derdibûn û hîn jî hinek jê hene. Navên Osmanî û Erebkirî jî ji navê gund ê Kurdî hatine birin.

- Gundekî navîn e, li binê pesarê Başûr Rojava yê Çi.Girê biçûk e. Gelek kanî û kanok li derdora wî hildavêjin. Li nîvê diduyan ji sedsala bîstan, piraniya şêniyê Xilalka aligirên Partiya Komonîst bûn, loma jî gelek xortên gund çûn li dewletên Sosyelîst xwendin û dîplomayên bilind bi dest xistin. Hêja ye em bêjin, ku mirovekî ji gund (Xocê Xilalka), tevî ku komonîstekî naskirî bû, lê bêtirî deh salan Îmamtiya mizgefta gund dikir, û bawermendên Misliman nimêja xwe li pê dikirin.

24.**'Elî Beg** (149k, 9km,  810m ):

- Ji navê “Elî” û navnîşana wî ”Beg” hatiye.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Başûr Rojava yê Çi.Girê Biçûk e. Cihê wî çiyayî û daristanî ye.

25. **'Ebûdan** (595k, 295h, 12km, 530m):

- Em bawer dikin, ku ew nav ji biçûkirina navê “'Ebdo” hatiye.

- Gundekî orte ye li ser rûyê Başûr Rojhilat yê sirtekê ye. Geliyê Sor di aliyê gund ê Başûr re û Ge.Gewir jî di aliyê wî yê Rojhilat re diçin. Daristanên Sindîganê li derdora gund hene.

26. **Gundî Ĥeftêr** . ***Ĥeftaro*** . *El-Debi'* (115k, 6km, 540m):

- Ĥeftar, binavkirina rûniştvanekî gund e, hîn jî neviyên wî "Mala Ĥeftêr" li gund rûdinin. Navê Erebkirî jî wergerandina navê Kurdî yê kevin e.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojava yê kaşekî ye.

27. **Gundê 'Eeşûnê**. ***'Eşanlî,'Eşûnê***. *'Eşanî* (619k, 160h, 21km, 660m):

- 'Eşûn, navê jinekê bû ji rûniştvanên gund ên destpêkê. Ew jin ji Gu.Şêx bû, û gund pê hatiye binavkirin. Navên Osmanî û Erebkirî jî ji wî navî hatine.
- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Başûr Rojava yê Çi.Xelîlaka ye. Benda 'Eşûnê li kêleka gund hatiye avakirin.

28. **Zivingê -** *Mezre'it 'Eşûnê* (385k, 22km, 640m):

- Ziving, di Kurmancî de bi wateya "şikeft" tê.
- Gundekî biçûk e, li aliyê Bakur Rojhilat ê Çi.Hawarê ye. Geliyê Cirqa di ber gund re diçe. Derdora wî daristanên sirûştî yên pir siq in.

29. **'Elîkera** . ***'Elîker*** . *'Elî El-Etreş* (699k, 130h, 5km, 990m):

- 'Elî Ker: Ango 'Eliyê ku nabihîse. Navê Erebkirî jî ji wergerandina yê Kurdî hatiye.
- Gundekî biçûk e li ser pesarê Rojhilat yê Çi.Girê Biçûk. Li salên pirbaran, gelek kanok li derdora gund derdibin. Hin kanên kevirê Rixamê jî li nêzîk gund hene.

30. **'Uga** . ***'Ukanlî*** . *'Ukan* (2488k, 465h, 6km, 660m):

- Baweriya xort ew e, ku ew nav yan navnîşaneke kesan yan jî ya deverkî ye.
- Gundekî biçûk e, li serê sirteke bilind e.

31. **Malê Jarê** , **Gundî Jarê** . ***'Elî Caro*** (5km, 640m):

- Mal yan Gundê Jarê: Ji salixa jinekê hatiye. Wekî ku diyar dibe, 'Elî jî kurê ew jina "jar" bû, û ji rûniştvanên gund ên destpêkê bûn û gund bi wî jî hatiye nasîn. Têkliya navê Erebkirî bi yê resen re hîç tineye.
- Gundekî biçûk e, li serê sirtekê ye, ew di nav zeviyên darên zêtûnê de maye.

32. **Qaşa** . ***Qaş Ûşaĝî*** . *El-Ĥacêb* (693k, 240h, 6.5km, 600m):

- Qaş, binavkirina rûniştvanekî gund î destpêkê ye. Navê Osmanî jî bi wateya "lawên Qaşê" tê. Pêwendiyên navê Erebkirî "El-Ĥacêb" bi navê Kurdî yê kevin re hîç tuneye.

- Gundekî biçûk e, li serê sirtekê ye.

33. **Qizilbaşa** . *El-Ras El-Eĥmer* (859k, 347h, 19km, 620m):

- Qizilbaş, binavekirineke Osmanî ye ji kesên ku li ser rêola "Şî'î" ne. Li dawiya sedsala panzdehan zayînî, dewleta Sefewî li Êranê û Şahê wê Isma'îlê Sefewî, li ser rêola Şî'î bûn, û dijîtiya dewleta Osmanî ya Sine dikirin. Li wan deman Osmaniyan ji Sefewiyên Şî'î re digotin "Qizilbaş", û ew wek xwînvexar didan nasîn. Çêroka binavkirina gund jî bi wî navî ve girêdayî ye, çêrok wiha ye: Rûniştvanekî gund î pir sert û şerar hebû, û di nav xelkê de bi "Qizilbaş" dihat nîşandan, navê vî gundî ji navnîşana wî kesî hatiye. Navê Erebkirî jî wergera yê Kurdî ye.

- Gundekî biçûk e, li ser gazeke bilind û mezin e. Çemê Efrînê di Rojavaya wî re bi nêzîk 5/km diherike, Ge.Çayê jî di Rojavaya wî re diçe. Xaniyên gund li ser sê sirtên biçûk belav bûne.

34. **Qurta** . ***Qurt Ûşaĝî*** . *Hozan* (1334kes, 272h, 9km, 640m):

- Navekî Tirkî ye, wateya "kurên gur" dide. Navê Erebkirî jî hîç bê wate ye. Qurt (gor) navnîşana rûniştvanekî gund î destpêkê bû.

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Bakur Rojhilat ê bêlekê ye. Mirovê bi navê "Xocê Qorta", ku rêberekî Mirûdan î navdar bû, jê ye.

35. **Qurnê** (1437k, 380h, 4km, 720m):

- Qurnê, bi wateya " koşe, qunc" tê. Gund jî li ser koşeya Başûr Rojhilat a Çi.Girê Mezin e.

- Gundekî mezin e, ji du beşan pêk tê: **Jorin** û **Jêrin**. Ew li ser dawiya pesarê Rojhilat ê Çi.Girê Mezin e, û dora 2/km li Başûrê sînorê Tirkiyê ye.

36. **Topelî Meĥmûd**. ***Meĥmûd Obesî***. *El-Meĥmûdiyê* (168k, 7km, 690m):

- Meĥmûd, navê rûniştvanê gund ê destpêkê bû, û xuya ye ew kesekî "kulek - topel" bû, gund jî bi wî hatiye binavkirin, hîn jî

neviyên wî lê rûdidnin. Navên Osmanî û Erebkirî jî ji navê kevin hatine birin.

- Gundekî biçûk e, ji çend malan pêk tê. Derdora wî zinarî û dûz e, û bi darên Sindîganê pêçayî ye. Li ser kevirê deriyê xaniyekî gund, dîroka (sal 1032g) hatiya nikrandin, guman heye ku ew ji xaniyên herî kevin be li navça Efrînê. Avahiya wî xanî ji mûdêla qentirme ye.

**41. Qirigol** . ***Qurî Gol*** . *El-Yebîse* (2324k, 517h, 15km, 600m):

- Qiri, bêjeyeke Tirkî ye, bi wateya "ziwa, hişk" tê, "gol" jî bêjeyeke Kurdî/Tirkî ye wateya "gola avê" dide. Ango bêje bi tûmî dibe "gola ziwa- hişk". Navê Erebkirî jî wergera nîvê navê gund e.

- Gundekî orte ye, li ser sirteke çiyayî ye. Xaniyên wê li ser du mitên çiyayî bicih dibin, loma jî ew wek du beşan xuya dibe: **Rojhilatî**, kevin û mezin e, **Rojavayî**, nû û biçûk e. Derdora gund daristanî ye.

**42. Qota** . ***Qotanlî*** . *Qotan* (2148k, 700m):

- Qot, di Kurdî de, ji kes û tiştê ku "tiştek li ser serê wî tuneye", tê gotin, ew bêje di wê rewşê de, bi raweya "serqot" tê. Xirabekî şûnewarî bi navê "qotê, kotê" li ser sirtekê li ber gund heye, gumana pir ew e, ku gund navê xwe jê biri be. Ji bilî ku "Qot" navê hozeke Kurdî ye jî.

- Gundekî orte ye, li ser bêleke çiyayî ye. Kavilên aşekî avê li nava gund hene, ava wî bi dewêr ji se'rîncê dihat kişandin û aş pê dihat gerandin, em bawer dikin ku wek wî aşî li seranserî navçê tuneye.

39. **Kotana** . ***Kotanlî*** . *El-Midelelê* (2356k, 703h, 12km, 560m):

- Navê gund ji du bêjeyan hevristî ye: "**Kût**" bi wateya "kulek", û "**an**" bi wateya "dayîk" e. Herwiha navê sergihayî dibe "diya kût". Ew diya kulek ji rûniştvanên gund ên destpêkê bû. Lê hin kes jî dibêjin, na! Ew jin bi jana "Kûtîbûnê" keti bû, lewre jî ew bi çeperbûn û çirkîniya rûyê xwe dihat nasîn, û gund navê xwe ji " kotî an, ana kotî" biriye. Nêrîna diduyan ji bo (kêrç û tinazî) bi şêniyê gund re, tê gotin.

- Gundekî mezin e, ji du beşan pev dikeve, her beşek jê li serê sirtekê ye, gundê kevin li ser sirta Rojhilat e, yê din jî beşê nû ye, ew li Rojava li ser pesarê Çi.'Upila ye. Riya Bilbilê ya sereke di nav her du beşan re derbas dibe. Aliyê sirta gund ê Rojhilat kaşekî dîke û kûr e, û bi ser Ge.Çayê de dadikeve. Wekî hemî gundên ku li ser rêkên sereke, karxaneyên pîşeyên bi destan, durustkirina alavên çandiniyê, gelek dukan, guvaşxaneyên zêtê û Qazxanek jî li gund heye. Gelek kevirên avahiyên şûnewarî yên kevin li nava gund tên der. Gund bi xwe jî li ser girekî şûnewarî hatiye avakirin.

40. **Kurzêl –** *El-Se'îde* (754k, 14km, 740m):

- Ev nav mîna navê Kurzêla Cûmê ye. Dibêjin, pêwendiyên mirovatiyê di navbera maline ji her du gundan de hene. Li gor pirtûka Cemîl Kinê… Hejmara malên gund li sala 1923an dora sî bû.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojava yê sirtekê ji Çi.Simaqê ye, Ge.Cirqa di Rojavaya wê re diçe. Hin malên malbata Şêx Sim'el li gund rûdinin.

41. **Cirqa** . ***Cirmiqanlî*** . *Cirqa* (230h, 5km, 690m):

- Navê hozekê ye, jê li derdora Mêrdînê hene, /B.Lûrx, rûp 37/. Di nivîsa binê rûpela 37an de ji pirtûka Şerefnamê jî hatiye, ku: Corq yan Corqan nofek e ji Kurdan, li dorhêla Ĥilwanê, li Rojhilata Bexdadê û li ber çemê Diyalayê rûdinin… El- Mes'ûdî jî navê vê hozê bibîr tîne /Mûslî, Ereb û Kurd, rûp 445/. Binavkirina Osmanî jî ji navê Kurdî hatiye birin.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Rojava yê Çi.Simaqê ye.

42. **Kêla** . ***Kêlanlî*** . *El-SemĥA* (1231k, 230h, 22km, 660m):

- Kêl, di Kurdî de "kesê bê por - keçel" e. Hin gundî li ser navê gundê xwe dibêjin, ew navê gundekî li derdora Mêrdînê ye, rûniştvanên gund ên destpêkê ji wir hatine, û navê gundê xwe jî bi xwe re anîne.

- Gundekî orte ye, li ser pesarekî Başûrî ji Çi.Simaqê ye. Gund du beşin: **Jêrin** û **Jorin**.

43. **Gundê Kurdo** . ***Hay Oĝlî*** . *El-'Aliye* (554k, 680h, 5km, 570m):

- Gundê Kurdo navê gund yê resen e, têkliya navên Osmanî û Erebkirî bi yê resen re nîne.

- Gundekî biçûk e, ji du beşan pêk tê: **Jorin** û **Jêrin**. Gund li ser rûyê Başûr Rojhilat ê bêlekê hatiye avakirin. Çemê Sabûnsûyê li aliyê Bakur û Rojhilat bi dûriya dora 500/m di binê gund re diherike, û li wir dibe beşek ji xeta sînorê Tirkiyê.

44. **Heyama** . ***Heyamlî*** . *El-Nûr* (922k, 309h, 4km, 830m):

- Heyam, navekî Kurdî ye, bi wateya bêjeya "Menax a Erebî, weather-Înglîzî" tê. Navê Erebkirî " El-Nûr" wateya navê resen nade.

- Gundekî biçûk e, li ser pesarê Başûr Rojhilat ê Çi.Girê Biçûk e. Cihê gund pir xwaşik e, û mîna havîngehekê ye. Hin kanên Rixamê li derdora gund hene.

45. **Si'iriya** . ***Si'iryanlî*** . *El-Se're* (805k, 4km, 900m):

- Em negihîştin kok û wateya navê gund, lê belê nav bi pergala xwe û bi ((tewanga dawiya wî)) –a berve kurdî diçe, û guman heye ku serenava kesekî, malbatekê yan binehozeke kurd be?.
- Gundekî biçûk e, li jêr pesarê Rojhilat ê Çi.Girê biçûk e.

46. **Şingêlê** . *Şenkel* (689k, 13km, 850m):

- Navê gund ji navê dara "Şingêlê" hatiye. Ew dar ji cureya dara Guvîjê ye, berê wê piçekî ji yê dara fistiqên çiyayê Reşa(Helebî) biçûktir e. Gund li devereke çiyayî û daristanî ye.

- Gundekî orte ye, tenê çend sed mitran li Başûrê xeta sînorê Tirkiyê ye. Cihê gund çiyayî û daristanî ye, û bi şêweyekî dîke bi Bakur bi ser sînor de dadikeve.

47. **Qestela Xidiriya** (720m):

- Qestel, ji cihê ku av ji binê zemînê hildavêje re tê gotin. Xidiriya navê gundê kevin e, ê ku li Başûrê gundê nû bû. Xidiriya navê hozeke Kurdî ye jî.

- Gundekî orte ye, li ser riya Bilbilê û Reco ye. Ji destpêka salên şêstî de ji sedsala bîstan şên bûye, xelkê wî ji gundên derdorê hatine û lê rûniştine. Hin pîşeyên biçûk û dukanên kirînfirotina pêdviyên gundiyan lê hatine vekirin.


48. **Baxaşê** . **Çatê** (17km)**:**

- Baxaşê: Ango gundê ku bayê wê xwaş e. Û ji ber ku ew li ser çateriyeke giring e, jê re **Çatê** jî tê gotin.

- Ew li nevbera gundên Ĥesendêra û Naza ye. Gund ji çend malan pêk tê, ew ji destpêka salên heftê de ji sedsala bîstan hatine avakirin. Koka şêniyê vî gundî ji Gu.Ĥesendêra ye. Ev şêngeh hîn derbas nav parkirinên kargêrî yên Na.Efrînê ne bûye.

### ٤٩. **Mala Esmetê Seydê**, **Gazê**:

Ev şêngeh, ji çend malan pêk tê. Ew ji dora 30 salî de ji hêla kesê bi navê 'Esmetê Seydê ji Gu.Ĥesendêra de hatiye damezrandin, û hîn jî ew û mirovên xwe lê rûdinin. Gund li ser sirtekê ye, dora 5/km li Bakurê Gu.Meydankê ye. Ev gundik hîn ne ketiye nav parkirinên kargêrî yên devera Bilbilê. Ew gundik bi **Gazê** jî bi nav dibe, gund bi xwe jî li ser gazeke bilind hatiye avakirin.




Nexşe -26- Devera Bilbilê.
Pîvan 1/150000.

**Sînorên dewletê ++++. Sînorên navçê + - + - +. Sînorên deveran - - - -.**
**Sînorên gundan -.-.-.-. Rêkên ziftkirî ====.**

# Lêkolîna Nehem

## Nav li Devera Şera

Navenda vê deverê bajarokê Şera ye, çêl û çar gund û şêngeh di çarçewa wê de hene, çar jê vala ne. Sînorên De.Şera wiha ne: Li Rojhilat Na.'Ezazê, li Başûr De.Navend- Efrînê, li Rojava deverên Mabeta û Bilbilê, li Bakur jî sînorê Tirkiyê ye.

1. **Şera** (2381k, 480m):

- Navê "Şer" di Kurmancî de mebesta "pevçûnê" dide. Şarri: Di zimanî Horî yê kevin de jî bi wateya "Qiral" tê /Mamed Cimo, rûpel 170/.

- Bajarokê Şera li ser pesarê Rojava yê bêleke fere ye. Cihê wî şûnewarî ye, hîn jî gelek kevirên avahiyên kevin, bîr û gorên di Tehtê de kolandî li nav û li derdora gund tên dîtin. **Xirabê Şera** gundê kevintir e, ew li Başûrê Şera ye, geliyê 'Entûz wan ji hev dike, lê ew niha gihîştine hev. Gundê Sînka jî dora 1/km li Rojhilata Şera ye, û ketiye nav sînorên şaredariya bajarokê Şera. Bajarokê Şera sêzdeh kîlomitran li Bakur Rojhilata bajarê Efrînê ye.

Piraniya şêniyê Şera di çandiniyê de kar dikin. Gelek karxaneyên pîşeyên biçûk, wek necarî, hesinkarî, durustkirina alavên çandiniyê lê vebûne. Gelek dukanên kirînfirotina pêdviyên malan, û çend guvaşxaneyên zêtê jî lê hene.

Şera bajarokekî ciwan e, kolanên wê paqij in, xaniyên wê bi şêweyekî şêrîn ji ser pesêr de bi Rojava de dadikevin. Li van salên dawîn, gelek malên xweşik jî li bajarokê Şera hatine avakirin.

Ev gund û war bi ser devera Şera de ne, **[Nexşe 27]**:

2. **Xirabî Şera** . ***Xirabit Şeran*** (4157k, 520m):

- Berê xirabakî şûnewarî û kevin li wir hebû, navê gund jê hatiye.

- Gundekî mezin e, li Başûrê bajarokê Şera li ser kaşekî zinarî hatiye avakirin. Gund niha fere bûye û tev bajarokê Şera bûye.

3. **Keferom** (705k, 352h, 8km, 366m):

- Bawer dibe ku ew navekî Yûnanî-Siryanî ye, bi wateya "Zeviyên Romiyan" tê. Xûrî Bersûm jî dibêje, ew navekî Aramî ye û wateya "gundê bilind" dide. Cihê gund li ser kendalekî ji perava Rojhilat yê çemê Efrînê ye.

- Gundekî orte ye, çemê Efrînê di ber re diherike. Berê, ew gundê Aĝeyê naskirî Koreşîtê Şêx Sem'el bû û lê rûdinişt.

4. **Baflûn**, **Bafelûn** . ***Bafilyon*** (602k, 157h, 13km, 770m):

- Bawer dibe, ku ew navekî Siryanî be, lê me bi şêweyekî zelal wateya wî nas ne kir.

- Gundekî biçûk e, li ser sirteke çiyayî û bilind e. Heyama wî pir xweşik e, loma jî hin Aĝeyên berê, havîna xwe li wir derbas dikirin. Bermahiyên kampeke Înglîzan li Bakurê gund heye, ew ji dawiya dehsalên pêncî ji sedsala bîstan de ne, li wê demê, Înglîz li Pitrolê digerîn û bîrek jî li wir kolan. Wan riyeke kevirkirî jî ji Rojhilata gundê Qitmê de birin cihê kampê, ew rê hîn jî bikar tê.

5. **Qerqîna**. ***Biyûk Qerqîn***. *El-Bistan El-Kebîr*(30k, 193h, 8km, 380m):

- Qerqîna, ji hêla teşe û bilêvkirinê de bêjeke Kurdî ye, em guman dikin ku ew ji şora "Xelqîn" hati be. Di binavkirina Osmanî de, bêjeya "Biyûk" ango "mezin" jî bi dawiya nêv ketiye. Navê Erebkirî jî bi wateya "baxçeyê mezin" e, me nizanî navê Erebkirî ji kû anîne.

- Gundekî orte ye, li aliyê çemê Efrînê yê Rojhilat li ser sirtekê ye. Gola Meydankê gihîştiye ber gund û ew kiriye havîngeheke pir şêrîn.

6. **Gundê Dêwrîş** . ***Qerqîn Seĝîr*** . *El-Qara* (979k, 152h, 7km, 450m):

- Xelk vî gundî bi navê Gu.Dêwrîş dinase. Dewrîş jî navê kesan e, li Çi.Kurmênc pir bi kar tê. Navê “El-Qarra” yê Erebkirî jî hîç bê wate ye.

- Gundekî biçûk e, li aliyê Rojava yê gola Meydankê li ser sirtekê ye.

7. **Çema** . ***Çemanlî*** . *Ceman* (956k, 428h, 3km, 585m):

- Çema, navê hozeke Kurdî ye, jê li derdora Bedlîsê li Bakurê Kurdistanê hene, /B.Lêrx, rûp49/. Jixwe wateya navê ‘‘çem’’ nas e.

- Gundekî orte ye, li ser bêleke fere ye, pesarê wê bi Rojava bi ser newala çemê Efrînê de dadikeve. Gelek govên darên Merxê û daristanên çandî li derdora wê hene.

## Ĥilûbiyê:

Bêjeya Ĥilûbî, wek di ferhenga Goranî de hatiye, wateya “rabûyî, li pê” dide. Şêniyê gund jî li ser wî navî wiha dibêjin: Berê darên “Bîyê” yên mezin û xweşik li ser Ge.Qerecurnê, li ber gund hebûn, navê gund ji salixa ew darên “Bîyê” û bêjeya Erebî “Ĥilû” ango “xweşik” hatiye birîn. Hîn jî gelek darên Biyê li ber Ge.Qrecurnê hene. Ĥilûbiyê du gund in:

8. **Gundê 'Elkê** . *Ĥilûbî Kebîr* (553k, 5km, 380m):

- 'Elik: Biçûkirina navê 'Elî ye, ew mirovê destpêkê bû ku li şûna gund rûnişt û gund bi wî bi nav bû. Û ji ber ku Aĝeyên mala Çirûsan li vî gundî rûdiniştin, ew bi Gu.Ĥilûbiya Mezin bi nav bûye. Lê li roja îro, tukes navê “Ĥilûbiya Mezin” hilnade, ew bi navê “Gu.'Elkê” tê nasîn.

- Ew niha gundekî biçûk e, li ser milê Başûr yê Ge.Qerecurnê ye.

9. **Ĥilûbiyê -** *Ĥilûbî Seĝîr* (369k, 5km, 425m):

- Gundekî biçûk e, li aliyê Başûr ê benda Meydankê ye. Hin avahiyên fermî ji bo karker û kargêrên bendavê lê hatine avakirin û ew şêntir kirine.

10. **Sînka** . ***Senkerlî***, ***Sinkanlî*** . *Senkerî* (2818k, 590h, 1km, 550m):

- Sînik, navê balindeyeke zivistanê ye. Sîno jî, navê mirovan e. “Senkerlî” jî kesê ku aletan çê dike ye, ew jî bêjeyeke Kurdî/Tirkî ye. Sinka, Sînika, Sinika, Sînkanî bi xwe jî, navên hozeke Kurdî ne, jê li çend navçeyên Bakurê Kurditanê hene, wek Batman, Urfa, Bişêriyê… (Barbro Karaboda).

- Gundekî mezin e, li ser bêleke fere ye. Gelek şikeft û zêrzemînên kolandî yên kevin li ser rûyê wê bêlê hene, ew jî dest nîşan dikin ku cihê gund ji kevin de şên e.

11. **Qeredepe** . *El-Tel El-Eswed* (1241k, 606h, 8km, 440m):

- Qeredepe, binavkirineke Tirkî ye, bi wateya “bêla reş” tê. Gund jî li ser rûyê Bakur ê bêleke volkanî ye û axa wê xalîkî ye. Navê Erebkirî jî ji wergerandina navê Tirkî hatiye.

- Gundekî orte ye. Çend şaxane ji bo lidarxistina ahengên zemawendan/dawetan li Rojhilata gund li ber riya Ĥelebê hatine avakirin, û gund şêntir kirine. Geliyê Serê Kaniyê di Rojhilata wî re diçe, du girikên şûnewarî yên biçûk jî li nêzîk gund li ber wî gelî hene.

12. **Kortikê** . *El-Ĥufra* (35k, 400m):

- Kortik, binavkirineke Kurdî ye, ji salixa Xaknîgariya cihê gund û derdora wî ya kort hatiye. Ew kort mîna kovikeke mezin e, ferehbûna wê dora 1.5/km ye. Zemîna binê kortê rez û zêtûn in, pesarên hundurê wê jî bi darên merxê hatine çandin. Ew gund li Rojavaya cihê kirîna gênim (mîrê) ye, wê kortê navê xwe daye ew gundê biçûk jî.

- Gund ji çend malan pêk tê. Aĝeyên malbata Çirûsan ên Şikakî lê rûdinin. Zeviyên wan li derdora gund in.

13. **Be'rava** . ***Elî Bazanlî*** . ***Elî Bazan*** (719k, 6km, 390m):

- Gumana mezin ew e, ku navê gund ji “ ber ava” hati be. Gund bi xwe jî li ser milê çepê yê çemê Efrînê ye. Dîsa, “Baravan” navê komehozeke Kurdî ye, jê li Başûrê Kurdistanê, li bajarê Şamê û li devera Ĥeskêfê li Bakurê Kurdistanê jî hene, /Barbro Karaboda/. Micahidê Şamî yê navdar Eĥmedê Baravî ku li dijî hêzên Firensî rabû bû, ji wê hozê ye.

- Gundekî orte ye, gola meydankê li aliyê wî yê Rojava ye, ava golê gihîştiye ber xaniyên gund. Cihekî şûnewarî li Rojhilata gund heye, hin gor û zêrzemînên fere du tehtê de kolandî lê hene.

14. **Omera** . ***'Umeranlî*** . *El-'Umeriyê* (935k, 1008h, 4km, 570m):

- Navê gund ji navê 'Umer hatiye. Ew navê binehozekê ye jî ji hoza Milî, jê li Çi.Qerecedaĝê, Cizîra Botan, Qoserê û li Rojavaya Qîrşehirê jî hene, /M.Zekî, perçe 1, rûp 414/.

- Gundekî orte ye li ser bêleke fere ye, pesarê wê yê Rojhilatî bi ser gola Meydankê de dadikeve. Geliyê Sîmanê jî di Başûrê wê re diçe, ew geliyekî kûr û bi av e, gelek darên Çinarê yên gewre di binê wî de hene, û ew dever bûye wek seyrangeheke pir ciwan. Aliyê gund ê Başûr û Rojava jî bi darên Merxê hatine çandin.

15. **Qetlebiyê** . ***Qozlî Bêkar*** . *El-Coz* (7k, 460m):

- Qetleb, navê dareke daristanî ye li Çi.Kurmênc.

- Gund ji çend malan pêk tê. Ew li ser milê Ge.Tilîlaqê yê Başûr e, û dora 2/km li Başûrê Gu.Dêrsiwanê ye.

16. **Qitmê** (5749k, 988h, 4km, 650m):

- Guman heye ku ew binavekirineke Tirkî bi wateya "tevlehev meke" hati be. Çêrokeke gelêrî li ser wî navî heye, bi diya rêberê Megolî Teymûrling ve girêdayî ye [(1)].

- Gundekî mezin û gulvedayî ye. Xaniyên wê li ser rûyê Başûr ê bêleke çiyayî balav bûne. Rawestgeheke çîmanê ye giring li Başûrê wê ye. Li binê gund girekî şûnewarî yî mezin heye, gelek kevirên avahiyên şûnewarî yên mezin ji bin axa wî dertên, gelek perçeyên qermît jî li ser belav dibin. Qeracên li aliyên gund ên Bakur, Rojhilat û Rojava bi darên Merxê hatine çandin. Li demên berê

[1] - Dibêjin, rêberê Megolî Teymûrleng, diya xwe ya pîr bi xwe re digerand. Dema ku wî li deşta Ĥemqê danî, diya wî dilxwaziya zewaciyê jê kir, Teymûrleng ji wê yekê mat ma. Lê gava ku ew ji deşta Ĥemqê derket û gihîşt derdora Gu.Qitmê, diya wî dilxwaziya xwe ya zewaciyê înkar kir. Dibêjin wê hîngê Teymûrling şand, biçek ax ji deşta Ĥemqê anî, û xist bi nivînên wê, wî dît ku wê dîsa nîşanên dilxwaziya zewaciyê nîşan dan. Wê hîngê wî bawer kir, ku axa Ĥemqê sebeba wê dilxawziyê ye. Dibêjin, wê hîngê wî got ((Qatme)), ango axa Ĥemqê tev axa Qitmê mekin, û ji wê hîngê de navê gund bû Qitmê…!?

Qitmê ji artêşên Osmanî û pişt re ji yên Firensî re jî bargeheke sereke bû.

17. **Qestela kîşik** . *El-Qestel* (539k, 9km, 480m):

- Qestel, cihê derbûna avê ye. "Kîşik" jî biçûkirina bêjeya "kaş" a Kurdî ye, gund li ser kaşê Bakur ê girê Gu.Qeredepe ye. Kanîke biçûk li binê gund heye, gund navê xwe ji pergal û kendûkora cihê kaniyê biriye.

- Gundekî biçûk e, dora 1/km li Rojhilata çemê Efrînê ye.

**Qurtqulaq -** *El-Dîb* **:**

- Qurtqulaq, navekî Tirkî ye, bi wateya "Guhê Gur" tê. Navê Erebkirî jî beşek e, ji nîvê navê gund. Ew du gundên cida ne, **Mezin** û **Çûçik:**

18. **Qurtqulaqê Mezin** . ***Qurtqulaq Kebîr*** . *El-Dîb El-Kebîr* (2549k, 5km, 380m):

- Gundekî biçûk e, li ser kendalê Rojhilat ê çemê Efrînê ye.

19. **Qurtqulaqê Çûçik** . ***Qurtqulaq Seğîr*** . *El-Dîb El-Seğîr* (869k, 285h, 8km, 370m):

- Gundekî biçûk e, li aliyê çemê Efrînê yê Rojhilat e.

20. **Serê Kaniyê** . ***Kefercenê*** (771k, 180h, 7km, 560m):

- Navê gund ê resen "Serê Kaniyê" ye, ew nav ji kaniya mezin ku li ber gund e, hatiye. Piraniyê şêniyên gundên derdorê wî navî bikar tînin. Lê belê ji gund re "Kefercenê" jî tê gotin û pê navdar e. El-Esedî di /peldank 6, rûp 374/ de ji Baba Şelĥet biriye û dibêje, ew navekî Aramî ye, ji "kefer cinta" ango "Gundê Bêxçe" hatiye.

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Başûr ê bêla Menên e. Kaniya wê 330L/s av dide, ew av ji bo vexarinê kişandine bajarê Efrînê. Rêka çîmanê di binê gund re diçe. Çend xweringehên baş li derdora gund hene, kampa "pêşengên partiya Be's" jî li ber gund li ser rûbereke fere hatiye avakirin. Gu.Serê Kaniyê bi cih û heyama xwe seyrangeheke ciwan e, cihê wê li ser çateriyeke giring e, loma jî gelek karxaneyên biçûk ji bo durustkirina alet û makînan, du Qazxane û gelek dukanên din jî li ber gund hatine vekirin.

Li van bîst salên dawîn, di navbera çata Gu.Serê Kaniyê û Gu.Qitmê de, bi dirêjiya dora 2/km, bi dehan xanî û vêleyên sipehî

hatine avakirin. Ji çar salan de, şaĝek ji zanîngeheke taybet jî li wir hatiye vekirin.

21. **Gabeleka** . *El-Fetîra* (522k, 460m):

- Navekî Kurdî ye, bi wateya (Gayê Belek "reş û sipî") tê. Dibêjin, li demên destpêkê, gayên bi wî rengî li ba maline ji wî gund hebûn û li wan derdoran diçêrîn, û herwiha gund bi salixa wan Gayan hatiye binavkirin. Tu têkliya navê Erebkirî "El-Fetîra" bi navê gund ê resen re hîç tuneye.

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Başûr ê sirtekê ye, geliyê gund ê kûr di Başûrê wî re dere.

22. **Metîna** . ***Metînlî*** . *El-Duĥa* (1962k, 405h, 3km, 530m):

- Metîna, navê çiyakî û navçeke naskirî ye li Başûrê Kurdistanê. Metînan binehozek e jî ji hoza Milan a Kurd, /E.Wesfî Zekeriya, rûp 664/, jê li Amedê û li Çi.Mazî li Bakurê Kurdistanê heye. Tu têkliya navê Erebkirî bi navê Kurdî yê resen re tuneye.

- Gundekî orte ye, li ser rûyê Başûr ê bêleke fere ye.

23. **Meşalê** . ***Meş'elê*** (1024k, 520m):

- Ibin El-Şuĥnê û Yaqût El-Ĥemwî navê vî gundî bi şêweya "Meşĥele" nivîsandine û gotine, ku gora birayê Pêxember Dawûd li wir e. Em jî negihîştin wateya wî navî.

- Gundekî orte ye li ser rûyê Başûr yê sirteke çiyayî ye. Ge.Serê Kaniyê di Başûrê gund re diçe. Rêka çîmanê jî di ber re dere, tûnêla çîmanê jî di binê gund re hatiye kolandin. Pîrozgeha Ebdilĥenên a navdar li kêleke gund e. Li aliyê gund ê Rojava, dûzeke şûnewarî heye, gelek perçeyên qermîtî û kevirên avahiyên kevin lê tên dîtin. Kavilên aşekî avê yî kevin li binê gund e.

24. **Meydankê** . *El-Mîdan* (4969k, 255h, 10km, 360m):

- Meydankê, navekî Kurdî bi wateya (cihê dûz û fere) tê.

- Gundekî mezin û şên e, ji du beşan pêk tê: **Jorin** û **Jêrin**. Gola Meydankê li aliyê wî yê Rojhilat e, loma jî ew bûye seyrangeheke gulvedayî û gelek dukanên firotina kelûpelan lê vebûne, hin karxaneyên biçûk jî ji bo durustkirin alav û makînan lê hatine vekirin. Berî ku gola avê li paş bendava Meydankê were dagirtin, cihê solava Meydankê seyrangeheke navdar bû li parêzgeha Helebê, pirak ji serdema Osmanî de û aşekî avê jî li ber solavê digerî û

genimê xelkê dihêra. Lê ew hemî li sala 2000î dibin ava golê de man.

25. **Naza** . ***Nazûşaĝî*** . *El-Muĥebebê* (1873k, 565h, 4km, 500m):

- Navê gund “Nazan” ji du bêjeyan pêk hatiye: “Naz-” navekî jina ye, û “-an” jî “dayîk” e. Binavkirina Osmanî û ya Erebkirî jî ji navê gund ê Kurdî yê resen hatine.

- Gundekî orte ye, li ser rûyê Başûr ê sirteke çiyayî ye. Ew du kîlomitir û nîvan li Bakurê Gu.Meydankê ye. Gelek stranbêj ji vî gundî hene, wek: Hes Nazî, 'Evdê Şe'rê, Bavê Mes'ûd…

26. **Alciya** . *Alîcî* . *El-'Etiye* (1259k, 1015h, 20km, 390m):

- Navê gund wateya “xudanên Alê” dide.

- Gundekî biçûk e, li ser girekî şûnewarî ye, çemê Efrînê bi çend kîlomitran di Rojhilata wî re diçe, rêka kela Nebî Horî jî di ber re dere.

27. **Îkîdam** . *Dame* (729k, 350h, 15km, 540m):

- Îkîdam, bêjeyeke Tirkî ye, bi wateya “du stûn” tê. Lê belê bêjeya “Dam” di kurdî de bi wateya “xemgîn, melûl” tê, /ferhenga Goranî/. Navê Erebkirî jî tenê beşek e ji navê resen.

- Gundekî orte ye, li ser rûyê Başûr ê gazeke çiyayî ye. Sînorê Tirkiyê dora 300/m li Bakurê gund e.

28. **Diraqliya** . ***Doraqlî*** . *Doraq* (1166k, 110h, 15km, 90m):

- Deraq, di Kuramncî de bi wateya “rewş, ĥal” tê, dibe jî ku navê gund jê hati be. “Duraq” di zimanê Tirkî de jî bi wateya “xweragirtin/sekinandin an cihê xweragirtinê” tê. Navê Erebkirî jî veguhastineke bê wate ye ji navê gund ê resen.

- Gundekî biçûk e, li ser milê Rojava yê çemê Efrînê ye. Gola Meydankê gihîştiye nêzîk wî.

29. **Dêrsiwan** (3802k, 2090h, 12km, 480m):

- Dêrsiwan, navek e, ji du bejeyan hevristî ye: Dêr+Siwan.

- Gundekî mezin e, li aliyê çemê Efrînê yê Rojhilat li ser bêleke fere ye. Pirake kevin ji serdema Romanî de li Rojavaya gund heye, ew hîn jî li pê ye û karê çûnhatina di ser çemê Efrînê re dibîne. Pirake din jî li Rojavaya wê bi dora 1/km li ser ava Sabûn Sûyê heye, ew jî hîn di kar de ye. Li demên berê, Dêrsiwan navendeke girin bû ji mala Ĥec Omer re, ew jî malbateke navdar e di dîroka

Na.Çi.Kurmênc de. Li roja me, gelek mirovên mala Şêx Sim'el lê rûdinin.

30. **Dîkmedaş** . *El-'Amûd* (755k, 620h, 9km, 690m):

- Navekî Tirkî ye, "Dîkme" bi wateya "stûn" tê, "daş" jî bi wateya "kevir" e. Navê Erebkirî jî wergera navê resen e.
- Gundekî orte ye, li ser pesarekî çiyayî ye, sînorê Tirkiyê di Bakurê wî re diçe.

31. **Zêtûnek** . *El-Zêtûn* (864k, 595h, 18km, 470m):

- Ji navê dara zêtûnê hatiye.
- Gundekî orte ye. Ew navendeke mala Şêx Sim'el bû, hîn jî xaniyên wan ên kevin lê hene. Çemê Efrînê jî di Rojhilata wî re diçe.

32. **Se'rîncek**. ***Si'irkanlî,Se'rîncek***. *El-Si'ur* (752k, 840h, 15km, 600m):

- Se'rînc, zêrzemîna civandina avê ye, "ek" jî di Kurmancî de nîşandeka biçûkirinê ye. Navê Erebkirî jî hîç bê wate ye, û têkliya xwe bi navê resen re tineye.
- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Başûr Rojhilat yê sirtekê dikeve, ew 3/km li Rojavaya çemê Efrînê ye.

33. **Şîlte't** . ***Şîltaĥ*** (280k, 300h, 15km, 430m):

- Navê gund wateya " tehtên şîn" dide, lê mîna ku Kurmanc dikin, tîpa "N" bi "L" hatiye guhertin. Birastî jî, zinar û tehtên deverên derdora gund berşînî ne, nemaze jî li ber kendalê çemê Efrînê, ew teht li wir, ji dûr de, bi rengê Xalîkî xuya dibin.
- Gundekî biçûk e, li ser bêleke fere ye, aliyê wî yê Rojhilat bi şêweyekî dîke bi ser rêçûna çemê Efrînê de dadikeve. Zeviyên gund li aliyê Bakur digihên sînorê Tirkiyê. Xirabeyên şûnewarî û gelek şikeftên kevin li derdora gund hene.

34. **'Erebwêran** . *El-'Urûbe* (426k, 595h, 9km, 565m):

- Navekî Kurdî ye, bi wateya "xirabê Ereban" tê. El-'Urûbe jî binavkirineke Erebî ye siyasî ye, hîç li bejn û balava ew gundê biçûk û perîşan ne tê.
- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Bakur ê bêlekê ye. Sînorê Tirkiyê dora 2/km li Bakurê wê ye. Daristanên Merxê li derdora gund hatine çandin. Ew gundê mala Ĥec Omer e.

35. **Omer Simo** . ***'Umer Simo*** . *El-Sîm* (647k, 545h, 13km, 550m):

- Navê gund ji navê rûniştvanê wê yê destpêkê “Omerê Simo” hatiye. Hîn jî neviyên wî li gund rûdinin. Navê Erebkirî “El-Sîm” ta di zimanê Erebî de jî bê wate ye.

- Gundekî biçûk e, li ser rûyê Rojhilat ê sirteke çiyayî ye, çemê Efrîn dora 4/km di Rojhilata gund re diherike.

36. **Qestela 'Elî Cindo** . ***Qestel Cindo*** (2138k, 590h, 8km, 700m):

- Navê xwe yê tûmi “Qestela 'Elî Cindo” ye, ew navê rûniştvanekî gund î destpêkê ye. Bêjeya “cindo, cindî” jî li ba Êzdiyan bi wateya “bawermend,” tê.

- Gundekî mezin, şên û gulvedayî ye, li binê pesarê Rojava yê Çi.Parsê dikeve. Hejmareke mezin ji mirovên gund ji zû de çûne li dewleta Aleman bi cih bûne, lê hîn têkliyên wan bi gund re baş e, wê yekê jî bandoreke baş li rewşa gund a aborî kiriye. Piraniya gundiyan li ser ola Êzdî ne. Pîrozgeha Êzdiyan a navdar “Parse Xatûn” li bera gund li ser Çi.Parsê ye.

37. **'Elîqîna** . ***Cidêdit Qestel Cindo*** . *Mezre'it Qestel* (140k, 660m):

- Ji navê “ 'Elî ” û navnîşana wî “Qîn” hatiye.

- Gundekî biçûk e, li Başûr Rojavaya Gu.Qestela Elî Cindo bi dora 1/km ye. Gund di nav ĥêrên zêtûnê de maye. Ew pir nêzîk bajarê 'Ezazê ye.

38. **Mersewa** (551k, 290h, 23km, 410m):

- Li ser navê hozeke Kurdî ye, jê li deverên Rihayê li Bakurê Kurdistanê hene. Lê El-Esedî ji Baba Ermelê biriye û dibêje, ku ew ji Aramî ye, bi wateya: Mar Saba.

- Gundekî biçûk e, li ser bêlekê ye, aliyê wî yê Başûr bi ser newala ava Sabûnsuyê de dadikeve. Sînorê Tirkiyê jî dora 1/km li Bakurê wî ye.

39. **Wêregan**. ***Wêregin,Wêrgan*** . *El-Beya'e* (441k, 465h, 10km, 460m):

- Ev nav di zimanê Farisî yê kevin de bi wateya “Gur” tê. Di zimanê Tirkî de jî bi wateya “firoşkar yan daner” tê. Navê Erebkirî jî ji navê Tirkî yê gumanbar hatiye wergerandin.

- Gundekî biçûk e, li ser bêleke pehnik e ku bi Rojava de bi ser çemê Efrînê de dadikeve. Girê “Tilîlaqê” yê şûnewarî jî li Başûrê gund e, kevirên avahiyên şûnewarî yên kevin li nav û derdora gund hene.

40. **Yazibaĝ** . ***Yazî Baĝî*** . *El-Kurûm* (315k, 215h, 12km, 660m):

- Baĝ, bêjeyeke Kurdî ye, bi wateya “cihê bi dar” tê, “yaz” jî bêjeyeke Tirkî ye, bi wateya “havîn yan rû” ye. Navê Erebkirî jî bi wateya “zeviyên rezan” e, ew jî ji ber ku gelek rez li dora gund hene.

- Gundekî biçûk e, li ber pesarê Bakur yê Çi.Parsê ye. Xaniyên wî ji aliyê Bakur de digihên sînorê Tirkiyê.

41. **Tilîlaq** . *Mezre'it El-Sinoberiye* (132k, 525m):

- Tilîlaq, navê girekî şûnewarî ye, çend mal lê hebûn, lê niha vala ye.

42. **Dudêrê** . *El-Dudêriyê* (42k):

- Koka vî navî wiha ye “du +dêr” û ew e navê rast. Lê ‘‘Dudêran, Dudeyran’’ navê Hozeke Kurdî ye jî, jê li Hezexê li Bakurê Kurdistanê heye, (Barbro Karaboda).

- Cihê gund li Rojavaya Gu.Meydankê ye, berê gundekî şên bû, lê ji çaryekê diduyan ji sedsala bîstan de vala bûye. Girekî şûnewarî li wî cihî heye, belkî ew kavilê wan her du dêran e.

43. **Pelûsank** . *Beloriyê* (521k):


- Navê dara ”pelûsankê/ beylesanê” ye, çîçekên wê sipî û bînxweş in.

- Cihê wî di navbera gundên Alciya û Zêtûnekê de ye. Ew gundê Fayiq Aĝayê Şêx Sim'el bû û cotkarên wî lê rûdiniştin. Piştî ku ew li destpêka salên şêstî ji sedsala bîstan mir, gund jî vala bû.

44. **Dargir**:

- Dargir: Ango “Dara mezin”, navekî Kurdî yî zelal e.

- Warekî vala ye, bi ser gundê Pelûsankê ve ye.




**Nexşe -27- Devera Şera.**
Pîvan 1/150000. Sînorên dewletê ++++. Sînorên navçê + - + -. Sînorên deveran - - - . Sînorên gundan -.-.-.-. Rêkên ziftkirî ====. Çem. Rêka Çimanê.

# Gundên valabûyî

# û Şênegehên nû

## Gundên valabûyî:

Di sedsala bîstan de gelek gund li Çi.Kurmênc vala bûne. Şêniyên wan gundan warên xwe berdane û li gundên nêzîk, yan li bajarokên navendên deveran bi cih bûne, gelek jî çûne li bajarên Sûryê yên mezin rûniştine, hejmareke din jî li welatên biyanî, bitaybetî jî li dewletên Ewrupa belav bûn.

Ji gundên ku bi sedema mişextbûnê vala bûne, û me kanî nas bikirana ev in:

### = Devera Navend-Efrîn:

- **Kersanê**: Gundekî  kevin e, li kêleka bajarê Efrînê ye, ew gunda berî bajarê Efrînê hebû. Dema ku Efrîn hat avakirin, rûniştivanên wê jê barkirin û hatin lê rûniştin. Niha xirabeyên çend xaniyan lê hene.

- **Keferlab**: Li Başûrê Gu.Bircê li pesarê Çiyayê Lêlûn e. Şûnewarên kevin lê hene.

- **Keferbilê:** Li nêzîk Gu.Cilbirê ye.

**- Gobelê:** Li ser Çiyayê Lêlûn li Rojavaya Gu.Cilbirê ye. Li werzên Biharê û Payîzê şivan lê rûdinin.

- **'Êndîbê:** Li Rojhilata Gu.Coqê li deştê ye. Şûnewarên kevin lê hene.

### = Devera Cindirêsê:

- **Çamlibêl:** Li ber Gu.Hemamê li ber sînorê Tirkiyê ye.

- **Ebû Ke'bê Xerbî:** Li Başûrê Gu.Firêriyê ye. Berê ew gundekî Êzdiyan î giring bû, ew navîna sedsala bîstan vala bû.

- **Zelaqê:** Li Rojhilata Cindirêsê ye. Di salên heftê de ji sedsala bîstan vala bûye.

- **Baziya û Xirabî Baziya:** Li ser Çi.Qaziqli ne. Di dehsala dawîn de ji sedsala bîstan vala bûn.

- **Dêwê Jêrin:** Li Başûrê Cindirêsê ye. Di salên heftê de ji sedsala bîstan vala bûye.

- **Gundê Fîlik:** Li hember Gu.Dêwê jorin li ser kenarê çemê Efrînê yê rastê bû. Fîlik mirovekî ji Gu.Birîmce bû, Şaneyê (wekîl) Aĝan bû. Wî ew gund ava kir û pê hat binavkirin. Ew di salên heftê de ji sedsala bîstan vala bûye.

- **Midaya:** Cihê wî li aliyê çemê Efrînê yê rastê li hember Gu.Tilsilorê ye.

- **Sifriyê:** Cihê gund li Rojavaya Cindirêsê ye

## = Devera Şiyê:

- **Xirabê 'Elî Zênê û Gu.Çema:** Li ber bajarokê Şiyê ne.

- **Gu.Zivingê:** Li hember Gu.Hêkiçê li ser kenarê Rojava yê Ge.Circim e.

- **Xirabî Anqelê:** Li Rojhilata Gu.Anqelê ye. Ji destpêka sedsala bîstan de vala bûye.

## = Devera Şera:

- **Qetlebiyê:** Li Başûr Rojavaya gu.Dêrsiwanê li ser milê Ge.Tilîlaqê ye. Di salên heştê de ji sedsala bîstan vala bûye.

- **Dudêrê:** Li Rojavaya Gu.Meydankê ye. Di çaryeka(1/4) diduyan de ji sedsala bîstan vala bûye.

- **Pelûsankê:** Di navbera gundên Zêtûnek û Alciya de ye. Ew Gu.Fayiq Axa bû. Di salên şêstî de ji sedsala bîstan, piştî ku Fayiq Aĝa mir vala bû.

- **Dargir:** Bi ser pelûsankê ve bû.

## = Devera Bilbilê:

**- Dupîra:** Li Başûr Rojavaya Bilbilê ye. Piraniya şêniyê wê di çaryeka dawîn de ji sedsala bîstan çûn li Gu.Qestela Xidirya rûniştin.

## = Devera Reco:

**- Xirabî Mecîd:** Warek e, li deşta Lêçe ye. Ew war ê şêniyê Gu.'Etmana ye, ew ji bo tîmarkirina pêz bi kar dihat.

- **Xirabî Qewala:** Li Rojavaya Reco ye, roja îro tu kes lê rûnane.

- **Gelî Zivingê:** Xirabeyên wê di ser Gu.Qopê re ne.

- **Gu.Sêlekê:** Li Bakurê Gu.'Eltaniya ye.

**- Gu.Şêx:** Li Rojavaya Gu.'Eltaniya ye.

**- Firfirkê Jorin:** Li ber çemê Ava Reş e. Piraniya şêniyê wê çûne li bajarokê Reco rûniştine.

**- Gu.Ortê:** Cihê wê li Başûrê Gu.Xirabî Silûg bû.

**- Gu.Şikêrê**: Ew li nêzîk Gu.'Umera bû, şêniyê wê jê bar kirine, hinek çûn li Gu.Coqê, hin jî li Gu.Mabeta bi cih bûn.

## Şêngehên nû:

Digel ku mişextbûneke mezin û berdewam ji Na.Efrînê heye, lê çalakiyên avakirinê ranawestin, nemaze jî li beşên deştî ji navçê.

Roja îro bi sedan xanî li dora gundan, li ber rêkan û li nav zeviyan tên avakirin, û hin bi hin navçe dibe mîna şêngeheke mezin. Şêngehên nû ku li van deh salên dawîn li navçê zêde bûne, û navê wan jî hene, ev in:

- **Qarsaq:** Çend mal in. Dora kîlomitir û nîvekê li Rojavaya Gu.Îska ye. Rûniştvanên wê Erebên gundên derdora Helebê bûn. Di salên şêstî de ji sedsala bîstan, li Gu.Celemê kon danî bûn, û dema ku gundiyan ew ji gund bi dûr xistin, hin Aĝan cihê Qarsêq dane wan da ku konên xwe lê vegirin. Û dema ku zagona durustkirina çandinê (Îslah Zîra'î) hat pêkanîn, wan sûd jê wergirt, zevî standin û pişt re xanî avakirin û lê bicih bûn.

- **Kanî Dînkê:** Ji çend xaniyan pêk tê, di navbera gundên Şadêrê û Îska de ye. Li destpêkê, hin Erebên ji derveyî navçê konên

xwe lê vegirtin, paşê jî dema ku sûd ji zagona durustkirina çandinê wergirtin, li wir man û xanî ava kirin.

- **Mensûra:** Li Başûrê Gu.Firêriyê, li kêleka Gu.Ebû Ke'bê yê valabûyî ye. Rûniştvanên wê Erebên konan bûn, sûd ji zagona durustkirina çandinê wergirtin û li wir bi cih bûn.

- **Baxwaşê (Çatê):** Di navber gundên Hesendêra û Naza de ye. Li ber çateriyeke giring hatiye avakirin. Ew di salên heftiyan de ji sedsala bîstan şên bûye, û dora deh malan e, rûniştvanên wê ji gundê Hesendêra ne.

- **Serê Kaniyê** (**Kefercenê) ya nû:** Avahiyên wê di navbera gundên Serê Kaniyê û Qitmê de ne, ew li her du aliyên riya Helebê û Efrînê hatine avakirin. Avahiyên wê ciwan in. Gelek xwaringeh û dukanên ji hemî rengan lê hatine vekirin. Çend cihên lidarxistina zemawendan lê hene û zanîngeheke taybet jî li wir hatine vekirin.

# Têbînên tevahî
# Li ser navên xaknîgarî li Navça Efrînê

Navên Xaknîgarî li navça Çi.Kurmênc parve du cureyan dibin: Navên dîmen û kendûkoran, û navên şêngehan (bajar, gund, gundik, wargeh...).

Li ber roniya vekolîn û şiroveyên ku me di beşên didu û sisiyan de li ser navên Xaknîgarî li Na.Efrînê kirine, em kanin van têbîn û kurtencaman jê wergirin:

1. Li derbarê **Navên Xaknîgarî:** Xuya bû, ku piraniya pir, eger em nebêjin hemî navên kendûkor û dîmenên xaknîgarî, wek navên çiyan, sirtan, geliyan, gir, girik, deşt, cowikên avê, navên zinar, dar, şikeft… û hwd, ango navên dîmenên sereke ji kendûkorên Na.Efrînê û pêkhatiyên wê yên xaknîgarî, ji aliyê bilêvkirin û wateyên xwe de Kurdî ne. Belkî hejmareke pir hindik jê, navine Îsalmî bin, ew jî ji bo pîrozgeh û cihên pîroz bi kar hatine.
   Û ji ber ku navên Xaknîgarî di belgeyên fermî de netên tomarkirin, ew nav ne hatine guhertin û wek çawa ji sedsalan de bi kar dihatin, wilo mane û têne xebtandin.
2. Li derbarê **Navên şêngeh û waran:** Hejmara wan dora 360î ye. Diyar bû, ku binyata bêtirî 80% ji wan an Kurdî ne, yan jî ji binavkirina wan in. Ew binavkirin jî, yan navên kesan e, yan navên hozan e, yan jî ji salix û pergalên dîmenên xaknîgarî yên cihên wan in. Hejmara din, ango 20% ji wan navan jî, wiha parve dibin:
   - 33 nav Siryanî ne.
   - 18 Tirkî ne.
   - Dora 12an jî Erebî ne.
3. Navên Siryanî û Erebî li deverên Efrîna-Navend û Cindirêsê hene. Navên Tirkî jî li deverên Cindirêsê û Şera hene.

4. Nav li deverên Şiyê, Reco, Mabeta û Bilbilê hemahema bi tevahî Kurdî ne. Ew rastî jî, rastiya rewşa netewî ya Kurdî ya sade ya wan deveran diyar dike.

# Jêder


1. Dr.Ebdela El-Ĥilû: Lêkolînên dîrokî yên zimanî li ser navên xaknîgarî yên Sûrî. Bîsan ji bo Belavkirinê, Lubnan, Bêrût, çapa yekê 1999.
2. Ne'ûm Bexaş: Nûçeyên Helebê di defterên Cem'iyê de, beş 1 û 2, çapxana Îĥsan Ĥeleb.
3. Xûrî Bersûm Eyûb mamosteyê zimanê Siryanî li zanîngeha Helebê: Bingehên Siryanî di navên bajar û gundên Sûryê de û wateyên wan, Dar Mardîn, çapa yekê 2000.
4. Ebdela Ĥeccar: Kinîsa Mar Sem'anê Stûnî û şûnewarên çiyayên Sem'anê û Ĥeleqa, Dar Mardîn, çapxaneya Elêf Ba, dar El-Edîb 1995.
5. Ferhenga Wesît di zimanê Erebî de, Kora Zimanê Erebî, çap3, Dar Sadêr, Bêrût 1993.
6. Elî Seydo Goranî: Ferhenga Kurdî ya nûjen, çapxana Rojhilata naverast, 'Emman- Urdun.
7. Gîwê Mokryanî: Ferhenga Kurdistan, weşanxana Aras, Hewlêr, çapa yekê, 1999.
8. B.Lêrx (1828-1884): Lêkolîn li derbarê Kurdan û bapîrên wan Xaldiyên Bakurî, wegerandina Dr.Ĥacî 'Ebdî, çapa Erebî ya yekê 1992.
9. Mihemed Emîn Zekî: Dîroka Kurd û Kurdistanê, beşê yekê, dîroka dewlet û mîrîtiyên Kurdan, beşê diduyan, wergerandin ji Kurdî Mihemed Elî 'Ewnî 1945.
10. Xêriddîn El-Esedî: Ferhenga Ĥeleb a raberkirinî, çapa duyem di heft perçan de, zankoya kelepûra zanistî li zanîngeha Ĥelebê, çapa yekê, 1988.
11. Mihemed kurê Meĥmûdê Ĥelebî ku bi navê "Ibin Aca" tê nasîn: Pevçûn di navbera Memalîk û Osmaniyên Tirk de, pirtûk ji hêla Mihemed Ehmed Dehman de hatiye zêdekirin û paqîjkirin, Dar El-Fikir 1986.
12. Ehmed Wesfî Zekeriya 1889-1962: Hozên Şamê, Dar El-Fikir, Dîmeşq 1997.
13. Mîr Şerefxanê Bedlîsî: Şerefname, çapxana Necaĥ, Beĝdad 1953.

14. Munzêr Mûsilî: Ereb û Kurd, Dar El-'Ilim, Dîmeşq, çap 2, 1991.
15. Cemîl Kinê: Kurtegotinek li ser zordariya Firensî di girtîgeha tekane ya leşkerî de li Qitmê û Xana Stembûlê li Ĥelebê, beşê yekê, çapxana Welatê Ereban, Ĥeleb 1967.
16. Miceledên Ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî, Dar Tilas, Dîmeşq.
17. Yûsif Şoro: Geştevanî li navça Efrînê, nameke derçûnî ji zanîngeha Ĥelebê, beşê Xaknîgariyê, sal 2005.
18. Kamêl El-Balî El-Ĥelebî ku bi El-Ĝezzî navdar e: Çemê Zêr di Dîroka Helebê de, sê beş in, Dar El-Qelem El-'Erebî, Ĥeleb, çapa diduyan, 1999.
19. Yaqût El-Hemwî, mirina wî sala 1229Z ye: Ferhenga Welatan, beşê sisiyan, bira yekê û diduyan, ji belavokên wezareta Çandê li Sûryayê sal 1983.
20. Baba Yûsif Qoşaqcî û Baba Bûlis Yetîm: Lehengên Xwedê (Stûnî li derdora Ĥelebê), Çapxana Îman, Heleb 1967.
21. Dr.Adil Ebdisselam: Xaknîgariya Sûryayê ya tevahî, zanîngeha Dîmeşqê 1990.
22. Pirtûka Wîlayeta Ĥeleb a Osmanî, Salnameye sala 1332/G=190/٤Z.
23. Dr. Elî Mûse: Heyama Sûryayê, çapxana El-Ĥîcaz, Dîmeşq.
24. Dr.Mi'awiye Berzincî: Rojnama Tişrîn, hejmar 677, dîrok 29.3.1997. Rojnama Tişrîn, hejmara 25.5.1997. Dr.Telal Bellanî: Rojnama Tişrîn, hejmar 750, dîrok 18.9.1999.
25. Dr.Mîxaîl Mu'tî: Pirtûka Ciyolocî, şalyara Perwerdeyê li Sûryayê, sal 1972-1973.
26. Baba Bûlis Yetîm: Gotarin di Şûnewarên Sûrî de, Çapxana Îman, Heleb 1967.
27. Qustentîn Bezîlî (1809-1884): Sûrye û Filestîn di bin nîrê Osmanitan de, sal 1840.
28. El-Bilazirî: Fitûĥ El-Buldan, beşê diduyan, çapa Bêrûtê 1978.
29. Ebû El-Fedil Mihemed Ibin El-Şuĥnê (1402-1485)Z: El-Durr El-Muntexeb di Dîroka Memleketa Ĥelebê de, Dar El-Katêb El-'Erebî, Dîmeşq.
30. Dr.Mihemed Ĥerb Ferzat: Kurtebiriya Dîroka Sûriyê ya kevin, zankoya Şamê 1993.
31. Subĥî Sewaf: Tarîxa Heleb a Berî Îslamê, beşê yekê, Heleb 1972.

32. Diyegonof: Pirtûka Medya, werger Dr.Wehbiye Şewket, Ram ji bo Çapê, Dîmeşq.
33. Dr.Konter Dişner: Neviyên Selahedîn, wergerandina "Ebdislam Sidîq, çapxana xebat, Dihok 1997.
34. Dr.Xelîl Cindî: Ji bo zanîna rastiya ola Êzdî, sîstema qadî, 1994.
35. Mihemed Elî El-'Ezîmî (El-Ĥelebî) 1090-1161/G: Dîroka Ĥeleb, durustkirina Îbrahîm Ze'rûr, Dîmeşq, 1984.
36. El-Qelqeşendî 1355-1418/Z: Subĥ El-E'şa fî Kîtabet El-Înşa, perçê Pêncan, Şalyara Rewşenbîriyê li Sûryê, Dîmeşq 1983.
37. Yaqût El-Ĥemwî, mirina wî 1229an/Z: Ferhenga Welatan, perçê sisiyan, peşên yekê û dudiyan, ji weşanên Şalyara Rewşenbîriyê li Sûryê, 1983.
38. Barbro Karaboda (Nivîskareke Siwêdî ye): Berhema wê bi navê "Li Rohilata Feratê li Welatê Kurdan". Wê li dawiya salên 50î ji sedsala bîstan gera xwe li Bakurê Kurdistanê kiriye, û navê gelek hozên Kurdî, û warê wan nivîsiye. Wê berhema xwe li sala 1960î, li Stockholmê, li paytexta Dewleta Swêdê weşandiye.
39. Ĝessan El-Şamî, Li warê Marmaron, çapa yekem, Bêrût 2010.
40. Nûriddîn Zaza: Jiyana min a Kurdî… yan Qêrîna gelê Kurd, dar Aras ji bo çap û weşanê, 2001 Erbîl.
41. Wîliyem Îgilton- Hozên Kurdî- wergêr: Dr. Ehemed.M. Xelîl, Erbîl 2006- çapxana şalyra perwerdeyê.

# Naverok

## Beşa Yekemîn

### Pergalên Xaknîgarî û çalakiyên rûniştvanan li Çi.Kurmênc


**Pêşgotin**. 3

**Lêkolîna yekê:** 9

Beşê Sûrî ji Çi.Kurmênc: Cîgeh . Heyam . kurtahiyek Zemînasî . taybetiyên Zerzeleyî . samanên binzemînî . rewşên tevahî û çalakiyên şênî.

**Lêkolîna Diduyan:** Jiyana şênî. 43

**Lêkolîna Sisiyan:**Dabirînên kargêrî li navça Efrînê. 53

**Lêkolîna Çaran:** Jiyana aborî. 65


……………………..

## Beşa Duyemîn

### Vekolîneke salixdanî ji kendûkor û dîmenên sereke yên Çi.Kurmênc re


**Lêkolîna yekê:** Gelî. Deşt. Çemê Efrînê. Solav. Gol… 85

**Lêkolîna diduyan:** Sirtên zincîra Rojhilatî. 103

**Lêkolîna sisiyan:** Sirtên Çi.Kurmênc ên berepehn. 121

**Lêkolîna çaran:** Sirtên Başûrî yên çiyayê Kurmênc: 135

- Çi.Xastiya. Çi.Ĥeştiya. Dîmenên devera Şiyê.
- Darên daristanî li Çi.Kurmênc.

# Beşa Sêyemîn

## Nav li Çi.Kurmênc.


**Lêkolîna yekê:** 153

Navên Xaknîgarî li Na.Efrînê: Efrîn, Cûm, Lêlûn, Hawar, Circim, Baliya, Cindirês, Meydan, Dirûmiyê, Ziravkê.

**Lêkolîna didyan:** Gund û war û binavkirina wan. 165

- Binavkirina Osmanî.
- Nav di serdemên Firensî û dewleta Sûrî de.

**Lêkolîna sisiyan:** Nav li devera Navend- Efrîn. 175

**Lêkolîna çaran:** Nav li devera Cindirêsê. 201

**Lêkolîna pêncan:** Nav li devera Şiyê. 217

**Lêkolîna şeşan:** Nav li devera Mabeta. 223

**Lêkolîna heftan:** Nav li devera Reco. 235

**Lêkolîna heştan:** Nav li devera Bilbilê. 251

**Lêkolîna nehan:** Nav li devera Şera 265

**Lêkolîna dehan:** 277

- Gundên valabûyî û şênewarên nû
- Têbîn li ser navan li Na.Efrînê.

**Jêder** 283

**Naverok** 287


==================


Di malpera Yek-Dem, meha Cotmehê 2024 .Z- 2636 .K de, hate weşandin

www.yek-dem.net

info@ye-dem.net

# ÇIYAYÊ KURMÊNC

# ((EFRÎN))

## Lêkolîneke Xaknîgarî ye Gistî



**Dr. Mihemed Ebdo Elî**